

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Muzaffer EKİNCİ

**M. EMİN BOZARSLAN'IN "MESELOKÊN LAWIRAN" ADLI HAYVAN
MASALLARI SERİSİNDE YER ALAN HAYVAN MOTİFLERİ
ÜZERİNE BİR İNCELEME**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2017

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Muzaffer EKİNCİ

**M. EMİN BOZARSLAN'IN "MESELOKÊN LAWIRAN" ADLI HAYVAN
MASALLARI SERİSİNDE YER ALAN HAYVAN MOTİFLERİ
ÜZERİNE BİR İNCELEME**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Doç. Dr. Murat KAYRI

MUŞ -2017

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Muzaffer EKÎNCÎ

LÊKOLÎNEKE LI SER MOTÎFÊN LAWIRAN ÊN KU DI BERHEMA M.
EMÎN BOZARSLAN YA RÊZEÇÎROKÊN LAWIRAN A BI NAVÊ
“MESELOKÊN LAWIRAN” DE CIH DIGIRIN

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Doç. Dr. Murat KAYRÎ

MÛŞ- 2017

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim – Öğretim Yönergesine göre hazırlamış olduğum “Lêkolîneke Li Ser Motîfên Lawiran Ên Ku Di Berhema M. Emîn Bozarslan Ya Rêzeçîrokên Lawiran A Bi Navê “Meselokên Lawiran” De Cih Digirin” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim - Öğretim Yönergesinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Teziminyıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.


31/01/2017
Muzaffer EKİNCİ

TEZ KABUL TUTANAĐI
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE

Doç. Dr. Murat KAYRI danışmanlığında, Muzaffer EKİNCİ tarafından hazırlanan bu çalışma 16./12./2016 tarihinde aşığıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Doç. Dr. Kemal EROL

İmza: 

Jüri Üyesi : Doç. Dr. Murat KAYRI

İmza: 

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza: 

NAVEROK

NAVEROK	II
KURTE	VII
ÖZET	IX
ABSTRACT	XI
KURTEBÊJE.....	XIII
PÊŞGOTIN	XIII
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

JÎNENÎGARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ BERHEMÊN WÎ ŞÊWAZ Û ZIMANÊ WÎ Û TÊKARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ JI BO ÇAND Û ZIMANÊ KURDÎ

1.1. JÎNENÎGARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ.....	11
1.2. ŞÊWAZ Û ZIMANÊ BOZARSLANÎ	12
1.3. BERHEMÊN M. EMÎN BOZARSLANÎ.....	12
1.3.1. Hin Pirtûkên Ku M. Emîn Bozarslanî Nivîsine An Jî Wergerandine Ev in: Berhemên Zargotina Kurdî (Meselokên Lawiran, Pêkenokên Kurdî, Çîrokên Gelî):	14
1.3.2. Berhemên Wergerî Yên Çapemaniya Kurdî:.....	15
1.3.3. Berhemên Wergerê Yên Di Derbarê Dîroka Kurdan:.....	15
1.3.4. Berhemên Olî-Civakî-Siyasî:.....	16
1.3.5. Berhemên Kurteçîrok:	16
1.3.6. Werger Û Tîpguhêziya Berhemên Edebî:	16
1.3.7. Berhemên Li Ser Alfabe, Ferheng Û Etîmolojiya Kurdî:	16
1.4. TÊKARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ JI BO ÇAND Û ZIMANÊ KURDÎ	17

BEŞA DUYEM
ÇÎROK, TAYBETMENDIYÊN ÇÎROKAN (ÊN KURMANCÎ/ KURDÎ) Û DI
DERBARÊ ÇÎROKAN DE HIN AGAHİYÊN GIRING

2.1. ÇÎROK	20
2.2. TAYBETIYÊN ÇÎROKÊN KURMANCÎ/ KURDÎ	21
2.3. MESELOKÊN LAWIRAN	22
2.3.1. Taybetiyên Meselokên Lawiran.....	23
2.3.2. Hêmanên Meselokên Lawiran	24
2.3.3. Beşên Meselokên Lawiran.....	24
2.4. CÛREYÊN ÇÎROKÊ YÊN BI KURMANCÎ/ KURDÎ	25
2.4.1. Çîrokên Lawiran	26
2.4.2. Çîrokên Muteselsîl / Zîncîreyî.....	26
2.4.3. Çîrokên Rasteqîn.....	26
2.4.4. Çîrokên Fewqulade	26
2.4.5. Çîrokên Pêkenokî Yên Lawiran.....	27
2.5. FORMELÊN MESELOKÊN LAWIRAN	27
2.5.1. Formelên Pêşrev Yên Zûgotinokî	27
2.5.2. Formelên Destpêkê Yên Xwerû/ Sade	28
2.5.3. Formelên Ku Bi Şêweyê “Hebû Tunebû” Dest Pê Dikin.....	28
2.5.4. Formelên Ku Bi Şêweyê “Hebû ” Dest Pê Dikin	28
2.5.5. Formelên Ku Bi Şêweyê “Bûn” Ê Dest Pê Dikin.....	29
2.5.6. Formelên Ku Bi Şêweyê “Carekê” Dest Pê Dikin.....	29
2.5.7. Formelên Ku Bi Şêweyê “Rojekê” Dest Pê Dikin.....	30
2.5.8. Formelên Ku Bi Dema Ne Diyar Dest Pê Dikin.....	31
2.5.9. Formelên Rîwayetî Yên Destpêkê Yên Ku Bi Şêweyê “Dibêjin” Dest Pê Dikin	31
2.5.10. Formelên Rîwayetî Yên Destpêkê Yên Ku Bi Şêweyê “Digotin” Dest Pê Dikin	32
2.5.11. Formelên Rîwayetî Yên Destpêkê Yên Ku Bi Şêweyê “Gotina Gotiyê” Dest Pê Dikin.....	32
2.5.12. Formelên Ku Bi Demê Diyar Dest Pê Dikin	32

2.5.13. Formelên Ku Bi Şêweyê Dersalê Dest Pê Dikin	32
2.6. FORMELÊN HILBESTÎNÊ	33
2.6.1. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Rojek Ji Rojan/ Rojekê/ Şevê Ji Şevan/ Salek Ji Salan” Dêst Pê Dikin.....	33
2.6.2. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Carekê ji caran/ Carekê” Dêst Pê Dikin	34
2.6.3. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dît Ku” Dêst Pê Dikin.....	34
2.6.4. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dibîne Ku” Dêst Pê Dikin	35
2.6.5. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Mêze Kir” Dêst Pê Dikin.....	35
2.6.6. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “ Niherî Ku / Dinihêre Ku” Dêst Pê Dikin	35
2.6.7. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Bala Xwe Daye / Dîna Xwe Daneye” Dêst Pê Dikin	35
2.6.8. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Çawa Dît/ Çawa Dibîne ” Dêst Pê Dikin	35
2.6.9. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dît Ku Çî Bibine!” Dêst Pê Dikin	36
2.6.10. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dema Çavê Wî Bi....Ket” Dêst Pê Dikin.....	36
2.6.11. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Nişka Ve” Dêst Pê Dikin	36
2.7. FORMELÊN TÊPERÎ/NAVBERIYÊ	37
2.7.1. Formelên Derbasker Yên Ku Bi Zûgotinokî Dest Pê Dikin.....	37
2.7.2. Hin Diyalog Jî Mîna Formelên Têperî Tê Bikaranîn	39
2.7.3. Formelên Derbasker Di Rewşên Dirûznêz De.....	39
2.8. FORMELÊN DAWÎ	40
2.8.1. Formelên Dawî Yên Bi Şêweyê Zûgotinokî.....	40
2.8.2. Formelên Dawî Yên Xwerû/ Sade	40
2.8.3. Formelên Dawî Yên Bi Şêweyê Kurt.....	41
2.8.4. Formelên Dawî Yên Bi Şêweyê Rîwayetiyê	42
2.8.5. Formelên Dawiyê Yên Ku Ji Nişka Ve Xelas Dibin	42
2.8.6. Formelên Dawiyê Yên Ku Bi Bextewarî Bi Dawî Dibin.....	42
2.9. FORMELÊN CIHAN	42

2.10. FORMELÊN HEJMARAN.....	43
2.10.1. Formela Hejmara Sisêyan.....	43
2.10.2. Formela Hejmara Heftan	45
2.10.3. Formela Hejmara Çilî.....	47
2.11. FORMELÊN RENGAN	48
2.11.1. Rengê Reş	49
2.11.2. Rengê Spî.....	50
2.11.3. Rengê Sor	51
2.11.4. Rengê Zer	53
2.11.5. Rengê Şîn:.....	54
2.11.6. Rengê Kesk.....	54
2.12. ÇAVKANIYÊN ÇÎROKAN	55
2.13. DI EDEBIYATA CÎHANÊ DE PIRTÛKÊN GIRÎNG ÊN ÇÎROKAN.....	56
2.13.1. Çîrokên Hindan.....	56
2.13.2. Çîrokên Ereban	57
2.13.3. Çîrokên Îraniyan	57
2.13.4. Çîrokên Ewrûpiyan	57

BEŞA SIYEM

TÊGEHA MOTÎFÊ Û MOTÎFÊN LAWIRAN ÊN KU DI RÊZEÇÎROKÊN

“MESELOKÊN LAWIRAN” DE CIH DIGIRIN

3.1. TÊGEHA MOTÎFÊ	59
3.2. MOTÎFÊN ÇÎROKAN Û KATALOGÊN GIRÎNG ÊN MOTÎFAN	60
3.3. MOTÎFÊN LAWIRAN ÊN KU DI RÊZEÇÎROKÊN “MESELOKÊN LAWIRAN” DE CIH DIGIRIN	61
3.3.1. Dîk/ Dîkil/ Keleşêr/ Kelebab/ Heke	62
3.3.2. Gur/ Gurg/ Verg/ Ganawir/ Cinawir	64
3.3.3. Hirç/ Heş.....	67
3.3.4. Jûjî/ Jîjo / Jûje/ Dije.....	68
3.3.5. Ker/ Merkeb/ Her/ Çarpê.....	70
3.3.6. Kêzik/ Hûrmêş/ Mêşlok/ Bûxik/ Buhik/ Heşare	71

3.3.7. Kûsî/ Kîso/ Kîsî/ Kesa/ Kese	72
3.3.8. Mar/ Ma'r / Maar/ Mahr/ Me'r/ Merre	74
3.3.9. Meymûn/ Maymun/ Meymun/ Meymîn/ Meymwîn/ Mêmûn/ Mêmwîn	75
3.3.10. Mişk/ Merre	77
3.3.11. Mûrî/ Muri / Morî/ Gêrik/ Gele/ Gêle/ Morcela/ Morcele	79
3.3.12. Pisîk/ Pisîng/ Pising/ Kitik.....	81
3.3.13. Qijik/ Qirrik/ Qijike/ Qela/ Qirawile/ Qerpelase	84
3.3.14. Rovî/ Rûvî/ Rwîvî/ Rîvî/ Luwî/ Luye	86
3.3.15. Şêr	89
3.3.16. Teyr/ Çûk/ Çivîk/ Balinde/ Firrinde/ Mîlçik/ Çûçik	91
3.3.16.1. Kevok/ Kevot/ Kevoke/ Gogerçîne/ Borane/ Kurkurike	94
3.3.16.2. Kund/ Bum/ Bûm/ Pepûk/ Kundê Kûr/ Kundê Kor/ Puyo Kor.....	96
3.3.16.3. Legleg/ Leklek/ Leglege	97
3.3.16.4. Pepûk/ Bakir/ Goyîn/ Kekû	98
ENCAM.....	100
ÇAVKANÎ.....	102
PÊVEK 1: Ji Rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” Çend Nimûne.....	107
PÊVEK 2: Wêneyek M. Emîn Bozarlanî	138
PÊVEK 3: Wêneyek Dî Yên M. Emîn Bozarlanî.....	139
PÊVEK 4: Wêneyên Pirtûkên Rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran”	140
PÊVEK 5: Nameya Ku Ji Bo Bersivdayina M. Emîn Bozarlanî Re Hatiye	
Şandin.	145
PÊVEK 6: Bersiva M. Emîn Bozarlanî Ya Di Derbarê Nameya Ku Hatiye	
Şandin De.....	147
PÊVEK 7: Rapora Dirûvtiyê / Întihal Raporu.....	149
JÎNENÎGARÎ	150
ÖZGEÇMİŞ	151

KURTE
TEZA MASTIRÊ
LÊKOLÎNEKE LI SER MOTÎFÊN LAWIRAN ÊN KU DI BERHEMA M. EMÎN
BOZARSLAN YA RÊZEÇÎROKÊN LAWIRAN A BI NAVÊ “MESELOKÊN
LAWIRAN” DE CIH DIGIRIN

EKÎNCÎ, Muzaffer

Şêwirmend: Doç. Dr. Murat KAYRÎ

2017, 164 Rûpel

Edebiyata Devkî ya Kurdî bi zimanê Kurdî re hevsa e. Di navbera edebiyata devkî û jiyana Kurd ya çandî de têkiliyeke organîk heye. Cûreyên edebiyata devkî ji pêşgotin, biwêj (îdyom), zûgotinok, mamik (tiştonek), destan, serpêhatî, stran, klam, lawij, lorî, lava (du'a), nifîr, çîrokan û hwd. pêk tên.

Sedema ku di nav cûreyên edebiyata devkî de çîrok, gelek taybetmendiyên cûreyên edebiyata devkî hildigirin, cihekî girîng girtine.

M. Emîn Bozarlan, çîrokên lawiran berhev kirine û bi şêweyeke edebî ji nû ve nivîsandine. Xebata me jî li ser motîfên lawiran yên van çîrokan e. Lê wexta me ev xebata xwe bir serî bala me kete ser çand û baweriya Kurdan jî. Bi vî awayî ji bo ku mijar baştir bê fêhm kirin. Dû re motîfên ku di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de hene bi awayekî kurt hatine behs kirin û taybetiyên sereke yên vê motîfê rasterast ji van çîrokan hatine girtin da mijar baştir bê fêhm kirin.

Ev xebat ji destpêk, sê beş û encamekê pêk tê.

Di destpêkê de bi giştî li ser Edebiyata Devkî ya Kurdî û herdu saziyên vê yên taybet weke dengbêjî û çîrokbêjîyê û li ser peywira van ên çandî û civakî hatiye rawestandî. Dû re di bin serenavê “Di Edebiyata Rojhilatî De Temsîl û Teşbîhên Lawiran” de mijar bi awakî berfireh hatiye vêkolîn kirin. Beşa destpêkê bi serenavê “Di Çanda Kurdî De Lawir” hatiye bidawî kirin.

Di beşa ewil de li ser jiyana M. Emîn Bozarlanî, berhemên wî, şêwaz, ziman û têkariya Bozarlanî a ji bo çand û zimanê Kurdî hatiye rawestîn.

Di beşa duyem de di bin serenavê çîrokê de cûreyên çîrokê, formelên çîrokan, jêderkên çîrokê, pirtûkên girîng ên çîrokan hatine vegotin.

Di beşa sêyemîn de piştî ku têgehên motîfî hatin vegotin, li ser motîfên lawiran ên ku di pirtûkê çîrokên ê bi navê “Pepûk, Mir Zoro, Gurê Bılırvan, Kêz Xatûn, Serketîna Mîşkan” ku di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de ne hatin lêkolîn kirin.

Piştî lêkolîn û şirovekirina motîfên lawiran di beşa encamê de li ser mijarê hatiye rawestîn û têgihîştinên li ser vê xebatê bi kurtasî hatine nivîsandin.

Peyvên Sereke: Edebiyata Devkî, Çand, Çîrok, Motîf, Temsîl û Teşbîh, Meselokên Lawiran



ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

M. EMİN BOZARSLAN'IN “MESELOKÊN LAWIRAN” ADLI HAYVAN MASALLARI SERİSİNDE YER ALAN HAYVAN MOTİFLERİ ÜZERİNE BİR İNCELEME

Muzaffer EKİNCİ

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Murat KAYRİ

2017, 164 Sayfa

Sözlü Kürt edebiyatı, Kürt diliyle yaşattır. Kürt kültür yaşamıyla organik ilişkisi olan bu edebiyat; atasözü, deyim, mani, tekerleme, bilmece, destan, stran, klam, lawij, ninni, dua, beddua masal gibi zengin türlerden oluşmaktadır. Bu türler içerisinde masallar, Sözlü Kürt edebiyatının çoğu özelliklerini barındırması bakımından ayrı bir önem arz etmektedir.

Bu çalışmada, M. Emin Bozarslan tarafından derlenip daha sonra edebi bir üslupla kaleme alınan “Meselokên Lawıran” adlı hayvan masalları serisinde yer alan hayvan motifleri incelenerek, incelenen motifler Kürt kültür ve inanç yaşamı dikkate alınarak işlenmiştir. Daha sonra ise açıklanmaya çalışılan motifin masalarda temsil ettiği anlamlar irdelendikten sonra üzerinde çalışılan “Meselokên Lawıran” adlı hayvan masalları serisinde motifin yer aldığı masal metinleri özetlenerek, o motifin öne çıkan özellikleri masaldan doğrudan alıntı yapılarak motifin daha iyi anlaşılması sağlanmıştır.

Bu çalışma; giriş, üç bölüm ve sonuç kısımdan oluşmaktadır:

Giriş bölümünde, Sözlü Kürt edebiyatı ile Sözlü Kürt edebiyatının özgün iki dalı olan “Dengbêjlik” ve “Çirokbêjlik” geleneğinin toplumsal ve edebi misyonu ele alındı. Ayrıca Doğu edebiyatında temsil ve teşbih konusu irdelenip, Kürt kültür yaşamında hayvanın yeri anlatılmıştır.

Birinci Bölümde, M. Emin Bozarslan'ın hayatı, üslubu, eserleri anlatılarak; Bozarslan'ın, Kürt kültür yaşamına olan katkısı irdelenmiştir.

İkinci Bölümde masal ana başlığı altında masalın özellikleri, türleri, formelleri, kökeni ile dünyaca ünlü masal kitapları anlatılmıştır.

Üçüncü Bölümde ise “motif” kavramı açıklandıktan sonra “Meselokên Lawıran” adlı hayvan masalları serisinde bulunan “Pepûk, Mir Zoro, Gûrê Bılırvan, Kêz Xatûn, Serketına Mışkan” adlı masal kitaplarında yer alan hayvan motifleri incelenmiştir.

Sonuç Bölümünde ise “Meselokên Lawıran” adlı hayvan masalları serisinde yer alan hayvan motifleri üzerinde yapılan araştırma ve incelemeler sonucu ulaşılan değerlendirmeler dile getirilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Sözlü Edebiyat, Kültür, Masal, Motif, Temsil ve Teşbih, Meselokên Lawıran



ABSTRACT
MASTER’S THESIS
AN ANALYSIS ON ANIMAL MOTIVES IN THE SERIES OF ANIMAL TALES
“MESELOKÊN LAWIRAN” OF M. EMİN BOZARSLAN

Muzaffer EKİNCİ

Advisor: Assoc. Prof. Dr. Murat KAYRI

2017, Page: 164

Oral Kurdish Literature is of the same age with the Kurdish language. This literature, which has an organic relationship with the Kurdish cultural life, consists of rich literary genres such as proverbs, tales, idioms, manis, riddles, legends, strans, klams, lawijs, lullabies, prayers, curses. Among these genres, tales have an importance as they involve most characteristics of the Oral Kurdish Literature.

In this study, the subject of animal motives in the series of animal tales called Maseloken Lawıran, which was examined by M. Emin Bozarslan and then literarily written, was discussed considering Kurdish cultural and belief life.

This study consists of three chapters and a conclusion part:

In the introduction chapter, the Oral Kurdish Literature and the social and literary mision of Dengbêjî and Çirokbêjî tradition, which are two unique branches of the Oral Kurdish Literature, were discussed. Also, the place of animals in the Kurdish cultural life was discussed, considering the subjects of similitude and representation in the Eastern Literature. After scrutinizing the meanings of the motives explained and represented in the tales, the texts of the tales including the motives in the animal tales series “Meselokên Lawıran” were summarized; it was tried to make the motive better understood by directly quoting the outstanding characteristics of those motives from the tales themselves.

In the first chapter, Bozarslan’s contribution to Kurdish Cultural life was discussed considering Bozarslan’s life, style and studies.

In the second chapter, the characteristics, types, formelles, origin of tales under the main title-tales and World-wide known tale books were explained.

In the third chapter, after the concept of “motive” was explained, the books in the series of animal tales called Meselokên Lawıran, which are Pepûk, Mir Zoro, Gûrê Bılırvan, Kêz Xatûn, Serketına Mıřkan, were examined in terms of animal motives.

In the result part, the discussion of results related to the animal motives in the series of animal tales called Meselokên Lawıran was made.

Key Words: Oral Literature, Culture, Tale, Motive, Similitude and Representation, Meselokên Lawıran (Animal Tales)



KURTEBÊJE

- amd.** : amadekar
Alk. : Alîkar
b.z. : berî zayînê
BL. : Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedisi
bnr. : binêrin
C. : Cîld
Ç. : Çap
Hj. : Hejmar
hwd. : her wekî din
J. : Jimare
K.T. : Komara Tirkiyeyê
p.z. : piştî zayînê
r. : rûpel
S. : sal
Wer. : werger, wergêr
Weş. : weşanên, weşanxane

PÊŞGOTIN

Ji hin sedemên cuda heta demeke nêzîk berhemên Edebiyata Devkî ya Kurdî derbasî nivîsê nebûbûn. Ji ber vê yekê edebiyata nivîskî ya Kurdî gelek qels maye. Gelek amûrên edebiyata devkî ji vê sedemê yan hatin jibîr kirin yan jî ji aliyê hin kesan ve hatin dizîn û van kesan wiha amûrên edebiyata devkî yên Kurdî li xwe kirin mal.

Lê bi saya xebatên rewşenbîr û nivîskarên mîna M. Emîn Bozarslan, ku wî gelek amûrên edebiyata devkî rasterast ji nav gel berhev kirin bi vî awayî ev amûrên giranbuha jibîr kirin, tunebûn û ji diziyê rizgar kirin. Ev amûrên girîng bi vî awayî ghiştine ber destên xwendevanên nîşên nû. Bozarslan bi van xebatên girîng ji bo pêşveçûna zaravayê Kurmancî gelek hewldanên bi rûmet pêk anîye. Wî tenê ev amûr berhev nekirin, her wiha wî ev amûr ji nû ve bi zimanekî edebî afirandine ku îro yek ji wan berhemên giranbuha pirtûkên rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” in.

Daxwaz û xwesteka me ev bû ku bi saya vê xebata ku me li ser pirtûkên rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” pêk anîye, gencîneya çîrokên Kurdî (Kurmancî) bide diyar kirin û ji bo ku nîşên nû hest û ramanên Kurdan ên bi hezaran salan ên veşartî yên di nav rêzikên çîrokan de bidin nîşandan. Xebata me li ser vê fikr û ramanê şax da. Ji bo ku em vê armanca xwe pêk bînin, bi taybetî li wateyên vê motîfê yên di çand û baweriya Kurdan de heye û her wiha di çand û baweriya gelên din de hûr bûne û rave kirine.

Di dawiyê de ez dixwazim malavayiyê li rêvebirê teza min, Mamoste Doç. Dr. Murat Kayrî bikim. Min di vê xebatê de ji gelek haydariyên wî yên girîng sîd wergirt. Her wiha ji bo nêrîn û pêşniyazên her du endamê jûriya min a tezê di serî de brêz Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ û Doç. Dr. Kemal EROL re gelek spas dikim. Ji bo amadekirin û redaksiyona tezê Dr. Recep Çiçek, Yahya Yalçinkaya, Veysî Sûlûk, Şexmus Orkîn, Îlyas Sayîm, Baver Erîşen gelek alîkariya min kirin. Bi rastî ne ji alîkariya Dr. Recep Çiçek bibûya, belkî min ev kar nekarîba bibira serî. Ji bo alîkarî û pêşniyazên wan mirovên hêja ez malavayiyê li wan dikim. Ji bilî vê ji bo teşwîq kirina Dr. Yunus Dogan û Zeynelabidîn Zinar ez rêzdarîya xwe peşkeş dikim.

Hêviya min ev e ku ev xebat bibe bingeş û stûna berhemên baştir û hêjatir. Ger Xwedê vê daxwaza min li lev bîne ez ê gelek dilşa bibim.

Elezîz - 2017

Muzaffer EKÎNCÎ

DESTPÊK

Di nav cûreyên Edebiyata Devkî ya Kurdî de xalên herî dewlemend bêguman çîrok in. Di nav babetên çîrokan de jî yên herî rengîn û dewlemend meselokên lawiran in. Van babetên rengîn û dewlemend bandoreke giring li ser hiş û ramanên gelê Kurd kirine. Ji ber vê yekê dema ku gelê Kurd, bûyerek yan jî mijarekê teswîr dike ji motîfên lawiran sûd werdigre. Ev sûdwegirtin ji çandê kevnare dest pê kiriye ku ev çanda kevnare jêgîrya xwe bîr û baweriya Kurdî hilgirtiye.

Di vê xebatê de her yek motîfên lawiran ê ku rêzeçîrokê “Meselokên Lawiran” cih digirin bi awayekî berfireh di bin siya çanda kevnare de hatinê lêkolîn kirin. Çawa ku tê zanîn her yek motîfên lawiran karakterekî mirovan temsîl dike. Di van motîfan de tenê rengîniya meselokên lawiran nehatine nîşandan. Her wiha derbarê civaka Kurdî de gelek agahiyên giring jî hatine diyar kirin.

Ji bo ku ev xebat, ji hin hêlan ve bê ronî kirin li jêr de di binê çend serenavan de hin agahiyên giring ku bi vê xebatê re tekildar in hatine dayîn:

EDEBIYATA DEVKÎ (ZARGOTIN - EDEBIYATA GEL)

Edebiyata devkî yan jî zargotin, bi awayekî bedew û bi terzekî edebî vegotina hiş û ramanên hezar sale, çand û hunera bav û kalan û bîr û baweriya wan a bêhempa ye. Li gorî pênaseyeke din:

“Zargotin ew zanyarî ye ku li bawerî, dad, gerdiş, kevneşopî, gotegot, stran û wêjeya gelan dikole. Herçendî ku pêwendîya zargotinê bi peyvên “zar” û “gotin”ê re hebe jî li gorî lêkolînên zanistî û folklornasên dinê, zargotin, binyata xwe ji peyva îngilîzî ya folklor û ya ku tê wateya “herêma gel” werdigire (Jiyan, 2003: 7).

Edebiyata devkî, carinan wek hunerên gelêrî yan jî wek edebiyata gel tê binav kirin.

Ev cureya vegotina devkî ji her hêlê ve bi jiyana gel ve girêdayî ye û vegotin û zimanê vê cureyê ji her hêlê ve siruştî ye û çavkanî û rengê xwe ji çand û hunera gel wergirtiye. Derbarê vê mijarê de Cizîrî (2012: 68-74) wiha dibêje:

“Zimanê edebiyata zargotinî, zimanê gel e û ji nava kêrhiya jiyana gel derketiye. Bersiva hewcedariya wan a dide, zanebûna wana formulîze dike û zimanekî berbiçav e. Ew ziman bi tu awayan ne zimanekî çêkirî ye. Di navbera mirovan û rastiyên civatî de, ew perdeyên ku agahdariyê dinixûmînî di mala xwe de danaliqîne! Rastiyê, weke ku di civatê de heye, ji mirovan re vediguhêze nava

kesayetiya wana. Ji aliyê agahdariyê ve ne zimanekî vala ye û ne jî zimanekî formel e.”

Di vê vegotinê de Cizîrî, çavkanî û siruştiya zimanê devkî daye diyar kirin.

Çawa zimanê edebiyata devkî zimanekî siruştî ye, cûreyên edebiyatê mîna çîrok, kurteçîrok, pêkenok, efsane, mîtolojî, zûgotinok, mamik û hwd. her yek bi tena serê xwe mîna deryayekê ne û bi jiyana mirovan ve girêdayî ne û derûniya wan bi şêwazeke edebî dide nîşandan.

Ji xeynî peywira cûreyên edebiyata devkî ya herî girîng ev e ku çawa bingeha gelek keleh, sûr û perestgehên li ser bingeş û stûnê keleh, sûr û perestgehên kevnare bilind bûne, edebiyata devkî jî ji bo edebiyata nivîskî dibe bingeş û edebiyata nivîskî xwe li ser bingeş û stûnê edebiyata devkî bilind dike. Edebiyata nûdem jî bi vî awayî gelek sirûş û mînakên delal hilgirtine. Derbarê vê mijarê de Uzun (1993: 200-201) nêrînên xwe wiha anîne ziman: “Edebiyata devkî şêwe û awayê vegotina çandî ya xelkê ye... Ev edebiyata devkî ya dewlemend, bêguman, ji bo edebiyata nivîskî û pexşana (nesir) kurdî jî bingeş û hîmê esasî ye. Edebiyata nivîskî li ser vî hîmî ava bûye û şax daye.”

Derbarê vê babetê de Jiyan (2003: 7), nêrînên xwe wiha tîne ziman: “Zargotin, riknê zimanê gel e. Dewlemendiya çand, huner û wêjeya gel, girêdayî zargotina wî ye.” Ev nêrîn girîngiya edebiyata devkî nîşan dide. Ku îro gelek amûrên zargotinê bi vê hişmendiye derbasî nivîsê bûne. Ger di nava Edebiyata Kurdî de em mînakekê bidin, wek destanên Kurdan yê navdar Mem û Zîn, Zembîlfiroş, Kela Dimdimê ku gelek varyantên van di nav gel de belav bibûn bi destê zanyar û hunermendên mîna Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Erebe Şemo ji van amûrên zargotinî, berhemên nemir hatin afirandin. Ji bilî vê bi hezaran amûrên zargotinê bi destê hunermend û nivîskaran bi awayekî edebî derbasî nivîsê bûne. Bi vî teşeyî edebiyata gelan ya nivîskî dewlemend bû û gelek amûrên zargotinî ji jibîr kirin û tunebûnê rizgar bûne. Ev haydarî jî dide nîşandan ku dewlemendiya edebiyata nivîskî girêdayî bi edebiyata devkî ve ye û di navbera herduyan de têkiliyeke organîk heye, ev haydarî girîngiya edebiyata devkî jî diyar dike.

JI BO CIVAKÊ Û EDEBIYATA NÛJEN PEYWIRA EDEBIYATA DEVKÎ

“Zargotin, pergala bîr û baweriya gel e, jiyana gelan teşeyî dide û bi babetekê siruştî û li gorî hêmayên xwe bi rêdixe. Di demên modern de zargotin, êdî zanistek e û li bîr û bawerî, çand û keleşor, nîrx û kevneşopiyên gel û neteweyan hûr dibe. Zanista zargotinê, mirêkeke ku şewqa dil û hinavê gelan dide, mirov di wê mirêkê re dirûv û taybetiya wan gel û neteweyan dibîne, derbarê wan de dibe xwediyê zanîneke kûr. Di roja me de nasîna gelan bi zargotinê diyar dibe, lewma hewcetiyeke pirr mezin bi zanista zargotinê heye” (Öncü, 2014: 15).

“Bingeha zargotina zanistî, di destpêka sedsala 19an de, ji aliyê filologê (zimanzanê) Elman Jacob Grimm û birayê wî Wilhelm ve hatiye danîn. Jacob û Wilhelm herdu bira, dever bi dever digerin, bi salan çîrok, çîrvanok û xeberoşkên gel berhev dikin. Bi berhev kirina xwe re gelek zimanzan, civaknas û derûnînasên wî zemanî li dora xwe dicivînin. Bi xebateke wisa pevreyî re, hemî beşên zargotinê kom dikin û disenifînin. Piştî wan xebat û dahûrandinên wan ên zanistî, zargotin, bi hemî dewlemendiya xwe wek bingeha çeşn û cûreyên wêjeyê tê dîtin û pejirandin” (Jiyan, 2003:7).

Piştî xebata Birayên Grimm, rewşenbîr û nivîskaran bala xwe dane ser zargotin û folklorê gel. Mîna hemî rewşenbîr û nivîskaran, rewşenbîr û nivîskarên Kurd jî li ser zargotin û folklorê Kurdî xebitîne.

Bi vê armancê di sedsala 20an de di serî de li Stenbol, Qahîre, Şam, Êrîwan û gelek bajarên Ewrûpayê di bin sîwana kovar, rojname û weşanan de civiyên û xebatên xwe yên zargotinî û folklorê Kurdî weşandin. Bi van xebatan, rewşenbîr di navbera nîşan de bûne pir. Rewşenbîran bi van xebatên xwe, dewlemendiya zargotina Kurdî dane nîşandan. Rewşenbîrên biyanî mîna Kurdolog û Mîsyonerê Fransî Thomas Bois jî -ku ev yek ji bingehdarên Kurdolojiyê tê qebûl kirin - bi xwe bi dewlemendiya cûreyên zargotina Kurdî hesiyane, wî bi xwe jî dewlemendiya zargotina Kurdî diyar kiriye (Bois û Mînorsky, 2004: 169).

Ev dewlemendiya zargotina Kurdî, di nav rêzikên xwe de rengîniya çand û hunera Kurdan dide nîşandan. Sedema ku çanda nivîskî û edebiyata nivîskî li cem Kurdan bi pêş neketibû, gelê Kurd, hiş û ramanên xwe bi zargotinê diyar dikirin. Ji ber vê yekê di navbera zargotin û gelê Kurd de têkiliyeke qewîn pêk hatiye. Ev têkilî li ser hiş û ramanên Kurdan; ji ol, îdeoloji û erdnîgariyê zêdetir bandor lê kiriye. Derbarê vê mijarê de Ferho (2011: 23), nêrînên xwe wiha anîne ziman:

“Edebiyata devkî di nava Kurdan de bûye girêdana organîk. Mirovahî, di nava mercên dîroka jiyane de, çi qasî bûyer û serpehatî di nava sedemên van de fam kiribin, ewqasî guherîne. Di nava malbata mirovahiyê de bûyer û serpehatiyên ku li gorî demê gelekî zû diqewimin, bandoreke xurt nîşan didin jî dibin sedema

guherînên cuda. Her gel, li gorî mercên têkiliya bi bûyer û serpêhatiyên re dikeve nava guherînan. Bêguman, di nava gelê Kurd de ji ber duçarî, parçebûn, qirkirin û koçberiyên mezin, guherînên fîzîkî û ruhî jî pêk hatine. Lê pir balkêş e ku tu carî ew girêdanên organîk têk neçûne. Lewra mirov dikare bibêje, edebiyata devkî di nava Kurdan de bûye awazê herî dijwar ku di gelî û meslên dîrokê de olan vedane”.

Di vê vegotinê de nivîskar, ji bo Kurdan girîngiya zargotina Kurdî aniye ziman. Gelê Kurd di dîrokê de pir êşiyaye û ev gencîneya qedirbilind gelek caran hatiye talan kirin lê her carê ev çand û zimanê birûmet bi saya edebiyata xwe dîsa bilind bûne û ji nû ve xwe afirandine. Derbarê vê mijarê de vegotina Hemzayê Miksî gelek girîng e ku wî ev nêrîn wiha aniye ziman: “Ji bo her qewm û milletkî edebiyat û asarê edebî wek xîmê qewî ne ji bo serayêt alî xweyî edebiyat çî qas bikevît, Serayê selteneta wî yê maddî biharivit, dîsa bi hîmetekê tê ta’mîr kirin” (Miksî, 1919: 4-17). Ev vegotin bendava hişmendiye ye û peywira edebiyatê ji bo gelan jî dide diyarkirin ku ev vegotin ji bo gelekî wek gelê Kurd hêj bêhtir girîng e û xwedî wateye ku bitenê gel kêmasiyên xwe bi saya edebiyata xwe ya devkî temam bike. Ji ber vê yekê edebiyata devkî ji bo civaka Kurdan pir pêwîst e.

Divê neyê jibîr kirin ku zargotina Kurdî, bi qasî ku têkîliyeke organîk di navbera gel de pêk aniye ewqas jî ji bo edebiyata nivîskî bûye bîngeh û edebiyata nûjen li ser bîngeh û stûnê zargotina Kurdî bilind bûye. Mîna edebiyata Kurdî, “Dema ku edebiyata Kurdî hêdî hêdî kiras guherî û qalibê nivîskî berî her tiştî klasîkên folklorê Kurdî yê devkî mîna Memê Alan, Siyabend û Xecê, Dimdim, Zembîlfiroş, Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekarî hatin nivîsîn. Ku ev nimûne ji bo edebiyata nivîskî û pexşanê yê herî pêşîn in (Uzun, 1992: 39-40 ji Cîndî, 1962: 162 jêgir). Bi saya van amûrên zargotina Kurdî, çand û hunera Kurdî ji jibîr kirin û tunebûnê rizgar bûne. Ji wan her yek çêsnên zargotina Kurdî ji bo edebiyata nivîskî bûye nimûne. Ji ber ku nivîs di nav Kurdan de bi pêş ve neçûye van hemî çand, huner û dîroka xwe di nav rêzikên zargotinê de veşartine. Ji vê sedemê zargotina Kurdî bi her şêweyî arşîv û belgedanka Kurdan ya zindî ye. Pêwîst e ku Kurd vê arşîva xwe ya zargotinî li gorî şert û mercên cîhanê derbasî nivîsê bikin. Derbarê vê mijarê de Uzun (1993: 201), jî girîngiya zargotina Kurdî ji bo edebiyata nivîskî tîne ziman û dixwaze ku çêsnên edebiyata devkî bi hemî cûreyên xwe bi şêweyekê nûjen bîn nivîsîn û çap kirin.

Ev çêsnên edebiyata devkî ji bo nivîskarên zîrek gelek caran dibin jêderkên bêhempa ku berhemên xwe li ser bûyer û lehengên van amûran biafirînin. Di vê mijarê

de berhema nemir “Mem û Zîn” divê neyê jibîr kirin ku di esasê xwe de li ser destana “Memê Alan” hatibû afirandin. Wekî romannivîsê navdar Mehmet Uzun, eşkere kiriye ku wî ramanên xwe ji parçe û berhemên edebiyata devkî wergirtine û bi van parçeyên amûran, romanên xwe xemilandine (Uzun, 1993: 202). Ev mikurhatin jî dide nîşandan ku amûrên edebiyata devkî bi her şêweyî ji edebiyata nivîskî re dibe bingeş û gencîne û bi tenê nivîskarên nûjen bi saya cûreyên edebiyata devkî dikarin berhemên xwe bixemilînin û berhemên nû biafirînin.

Weke ku di van vegotinan de jî hatiye gotin, têkiliyeke organîk di navbera edebiyata nivîskî û devkî de heye. Bi vê şêweyê çeşnên edebiyata devkî ji bo edebiyata nivîskî dibin nimûne û ev çeşnên edebiyata devkî ji bo pêşveçûna edebiyata nivîskî dibin navgîn. Ji ber vê sedemê pêwîst e ku nivîskar ji bo pêşveçûna edebiyata nivîskî têkiliyeke xurt di navbera edebiyata devkî û nivîskî de pêk bînin.

JI BO CIVAKÊ Û EDEBIYATA KURDÎ PEYWIRA DENGÊJÎ Û ÇÎROKBÊJIYÊ

Di nav dîroka Edebiyata Devkî ya Kurdî de ji xeynî pîrsa afirandin û afirandina ji nû ve ya amûrên bedew peywîrên du saziyen Kurdan derdikevin pêş: A ewil saziya dengbêjiyê û ya duyem jî saziya çîrokbêjiyê ye. Ev herdu sazî rewşa gelê Kurd bi her awayî didin diyar kirin.

Niha em van saziyên edebiyata devkî û taybetmendiyên wan ên ji bo civak û edebiyata Kurdî bidin nîşandan:

Dengbêj Û Saziya Dengbêjiyê

Dengbêj, ew kesên ku bi zargotinî, carinan jî bi amûrên mîna bilûr, def û ribabê şahî û şîniyan ji kul û elemên gelê xwe yê rojane yan jî dîrokî bi awayekî levhatî tîne ziman. Li gorî pênaseya Uzun (2009: 13), Dengbêj: “Dengê ku bi nefesa xwe ji mirov û mirovatiyê re zimanek, nasnameyek, dîrokek û hişmendiyekê dide, ew kaniya ku bi hezaran salan mirov û mirovatiyê tîne ziman.” Li gorî pênaseyêke din “Dengbêj: Ew hunermend û hozanên gel in ku bê amûr bi rîtmeke muzîkî bi qasî mijarên dîrokî mijarên rojane, evînî û dijminatîyê jî tîne zîman.” (Aras, 2004: 7). Îro gel, ji bo binavkirina dengbêjan navên wek: Qesîdebêj, çîrokbêj, gewende, mitîrb, mitrib, mirtib, âşiq yan jî begzade tîne gotin.

Dengbêjî û saziya dengbêjiyê di nav gelê Kurd de gelekî kevn e. Dîroka vê saziyê ji dema Sûmeriyan dest pê dike û di nav dîrokê de bi Gutî, Qasît, Mîtanî û Medan heta roja me berdewam dike (Öncü, 2014: 17).

Neferên vê saziya dîrokî, rewşa gelê Kurd bi her awayî daye teswîr kirin û gelê xwe hişyar kiriye. Wan bi vê hewldana xwe gelek peywîrên civakî û edebî anîne cih. Di derbarê ehemiyeta dengbêjan de Çiyayî (2013: 20-23), nêrînên xwe wiha tîne ziman:

“Ji bona gelê Kurd, dengbêjî; kevneşopiyeye bingehîn ya çandî, civaknasî, zimannasî, wêjeya devkî, “Fîlozofî“ û her wiha mîsyoneke dîrokî û siyasî ye jî. Çanda Kurdan ji hêla klam (gotin), stran, çîrok, govend û cil û bergan ve gelekî zengîn e û xwedî hîmeke bihêz e. Kurdan ev hîm, bi saya dengbêjan da ser milê xwe û bi ihtîmameke mezin heya roja îro parast. Lewma jî tu hêzekê nekariye vê hêlê winda bike!”

Wekî din romannivîsê navdar Uzun (1992: 32), wan mîna “Homerosên Nûjên” dibîne. Dîsa nivîskar di romana xwe ya bi navê “Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê” de bi devê Evdalê Zeynikê mîsyona dengbêjan wiha tîne ziman:

“Şagirtino, dilgeşino... hûn dengê xelkê ne. Hûn bendewarê ruhê wî, qasidê hîs û canê wî ne. Bilivîne, bilezîne, mîna min, gotina do û pêr werbigirine, gotina xwe lê zedê bikine, li gorî xwe biguherîne û bi pêşerojê biguhezîne. Hûn bi xwe biafirîne, siûda merivan û halê bûyeran bikine klam û stranine. Bila kêmaniya hunermendiyê tê de nîn be û ew lihevhatî bine. Li xelkê guhdarî bikine, pê elaqedar bine, bala xwe bidine û wan seh bikine, bi gotina xwe, bi rabûn û rûniştina xwe nerm bibine, qedrê gotina xelkê bizanine, li zexelî, xeletî û cewtiyen xwe mukir werin, gotina xelkê mebirine, bîhnfireh û bisebr bine. Xêr, feyde û sûda welat, xelk û zimanê xwe li ser her tiştî re bigrine...” (Uzun, 1991: 95).

Ji xeynî vê mîsyonê em dikarin dengbêjan mîna nivîskarên dîroka devkî jî bidin nîşandan ku wan di nav stran û klamên xwe de qala şer, koç, tunebûn, talanbûna gelên xwe kir. Wan bi stran û klamên xwe hem gelê xwe haydar kiriye, hem jî mîr û rêberên Kurdan li hemberî serdestan hişyar kirine. Di stranê de ev hişyarkirin wiha anîne ziman: “Mîro, te xebera min nekir, min go meçe, Rom xayîn e. / Roma virek e, şaltek e, te dixapîne” (Gültekîn, 2013: 19). Dengbêj, bi van rêzikan pêşbînî û rewşenbiriya xwe jî nîşan daye. Ji bilî van xusûsiyetên dengbêjan, dewlemendiya repertuara wan jî gelek girîng e ku Kurdologê navdar ê Fransî Roger Lescot, di salên 1930î de dema ku li Sûrî bû, ji devê dengbêjê Eşîra Hesenan Sebrî, bi sedan çîrok û destan wergirtin û ew di du

cîldan de top kirin (Uzun, 1992: 34). Bi saya mîna wek van repertuarên dewlemend çand û hunera Kurdî di nav dîrokê de her tim hebûna xwe berdewam kiriye.

Saziyeke girîng ya duyemîn saziya çîrokbêjiyê ye.

Saziya Çîrokbêjiyê

“Çîrokzan, berhemên ku berê di dîrok û bîra gel de heyî, ji nîfşên berî xwe hiltîne, wan bi vegotîneke taybetî hunera xwe dixemilîne li gorî şert û mercên jiyana ku ew tê de çîroka xwe bi nûjenîyeke hunerî radigihîne nîfşên li pey xwe” (Öncü, 2014:17).

Dîroka saziya çîrokbêjiyê jî mîna dengbêjiyê ji dema Sûmerîyan dest pê dike û Gutî, Qasît, Mîtanî û heta dema me hatiye (Öncü, 2014: 17). Afirînerên vê saziyê bi giştî jin in. Amûrên vê saziyê awarte ne. Ev amûr bi zimanekî zelal û herikbar hatiye hûnandin.

Çîrokbêj, di nav rêzikên çîrokan de xwestek, armanc û fanteziyên gelê Kurd bi zimanekî temsîlî ya bi motîfan hûnandî diafirîne. Çîrokbêj di vegotinên xwe de folklorê Kurdan bi her awayî bikar tîne. Çîrokbêj her cara ku çîroka ku vedibêje kirasê vê çîrokê vediguherîne û ji nû ve bi şeweyekê hunerî diafirîne. Ji vê sedemê her çîrokeke Kurdî bi dehan varyantên wê hene. Ev varyant nîşanên dewlemendiya afirîneriya Kurdî ne.

Çand û dîroka Kurdan a ku nehatî nivîsîn, bi gelek kevneşopiyên xwe di nav stran û çîrokan de hatiye veşartin. Çîrokbêj û dengbêj vê gencîneya nenivîsandî bi vî şeweyî nîşanî guhdar û xwendevanên xwe dikin. Derbarê vê mijarê de Uzun(1992: 33), ramanên xwe wiha aniye ziman:

“Dengbêj û çîrokbêj dibin qasidên tarîxa rabirdûyê, şahidên roja xwe û niwênerê pêşerojê. Di esasa xwe de, ew gelek wezîfeyan, bi carekê, pêk tînin; behsa tarîxê dikin û wê vedijînin, kêfxweşiyê direşînin, bîr û zanîneke edebî, çandî diafirînin û di navbera do û îro de dibin pir.”

Di vê vegotinê de nivîskar mîsyona çîrokbêj û dengbêjan ya çandî û dîrokî diyar kiriye ku bi saya dengbêj û çîrokbêjan guhdar û xwendevanên xwe çand û dîroka xwe dinasin û dikin ku guhdar pêşerojê bi hêsanî bibînin û rewşa do û îro dahûrînin.

Peywira van herdu saziyên taybet yê dîrokî ya herî girîng peywira çand û zimanê Kurdî ye, dengbêj û çîrokbêjan bi awaz û amûrên xwe pêşengtî li edebiyata nivîskî kirine. Çand û zimanê Kurdî li ser herdu stûnên saziyên taybet bilind bûne. Amûrên van

herdu saziyan ji bo nivîskarên nûjen bûne mînak. Derbarê ehemiyeta van herdu saziyên taybet ên dîrokî de, Xelîl Duhokî di hevpeyvînekê de nêrînên xwe wisa pêşkêş dîke:

“Em weke millet li paş mane, bindest û neçar mane. Hemî medeniyetên me, hemî folklorên me, hemî destanên me, hemî serfîhildan û berxwedanên me, di stran û çîrokên me de ne. Ez bi xwe yek ji wan kesan im ku gelek qîmet didim stiranbêj û çîrokbêjên kurd. Mirov pirr tiştan di stran û çîrokên kurdî de dibîne. Bi baweriya min nivîskarên zîrek dikarin pirr tiştan ji stran, çîrok û destanên Kurdî hîn bibin. Ji ber ku bi rastî arşîva Kurdî ya nivîskî vala ye. Ji ber vê hindê divê em tiştên kevn bi yên nû ve girê bidin û pêşerojê rohnî jê derêxin” (Cewerî, 1996 :132).

Duhokî, bi vê nêrîna xwe ehemiyata van herdu sazî û amûrên wan ji bo edebiyata nivîskî û nivîskarên nûjen anîne ziman.

Sedema ku heta vêga lêkolînên birêkûpêk û têkûz li ser van herdu saziyên taybet ên dîrokî û amûrên wan nehatiye kirin qîmet û qedrê wan tam nehatiye girtin. Ger lêkolînên têkûz û birêkûpêk li ser van herdu saziyên taybet ên dîrokî bê kirin hingê dê bandora wan herdu saziyên birûmet li ser çand û hunera Kurdî bê dîtî ku çand û zimanê Kurdî li ser herdu stûnên saziyên taybet bilind bûne.

DI EDEBIYATA ROJHILATÎ DE TEMSÎL Î TEŞBÎHÊN LAWIRAN

Di nav jiyana mirovatîyê de edebiyat bi her awayî bandoreke mezin li ser hiş û ramanên gelan kiriye. Lê belê ev bandor di nav edebiyata rojava de bi felsefeyê, di nav edebiyata rojhilatê de jî bi terzê ‘emelî hîkmet xwe dide nîşandan.¹

Ji hîkmetê meqsed îbret e. Bi vê xwestekê ehlê hîkmet, nêrîn û xwestekên xwe bi zarê lawiran, bi teşbîh û întaqê anîne ziman. Armanca ehlî hîkmet û gotûbêjan ew bû ku bi vî terzê vegotinê bala guhdar û xwendevanan bidin vê vegotinê ku ji aliyekî ve demeke kêfxweş biborînin lê ji aliyekî ve jî bi awayekî şîrîn ‘emelî hîkmet bidin fêmkirin.² Ev terzê vegotinê di hemî berhemên zanyarên rojhilatî yên mîna Beydaba,

¹ Ji ‘Emelî Hîkmet meqsed bextewariya malbat û civakê ye. Ji vê sedemê di nav edebiyata rojhilat de ji bo ku ehlê tesewûf û zanyar Hîkmeta Îlahî bidin fêmkirin bi rêya teşbîh, îstîfere û çîrokên lawiran, ji bo vê armancê bi awayekî edebî bikar anîne û nêrînên xwe pêşkêşî gel kirine.

² ‘Emelî hîkmet, bingeha xwe ji olên semawî mîna Îslamê û pirtûka wê a muqades ji Qur’ana pîroz distîne wek tîn zanîn. Di Qur’ana pîroz de ji xeynî mijarên eqîdeya îmanê, dad, exlaq û tewhîdê hwd. bi teşbîh û direfşan an jî rasterast behsa lawiran jî tê kirin. Heta di Qur’anê de navê gelek sûreyên mîna Beqere (Çêlek), Nehl (Mêşa Hingiv/Moz), Neml (Morîk/Mîro), Enkebût (Kêzik), Fîl (fil) û En’amê (Dewar) bi navê lawiran hatine binavkirin û bi hin munasebetan ji bo teşbîh û temsîlan navên gelek lawirên wek kêzik, moz, qulî, şêr, ker, çêlek, mêşin, beraz, hesp, qantir(hêstir), deve(hêstir), teyr, teyrê ebabîl, qijik, sûsik û masî hatine îstimal kirin. Xweda (c.c) bi van sûre û ayetan bala mirovan dikişîne li

Ferîduddînê Ettâr, Molla Camî, Mevlana Celaleddînê Romî, Şeyhî, Bedîûzzaman Saîdê Nûrsî hwd. de heye. Bi saya vî terzî ev nêrînên van zanyaran bi awayekî hêsan dihat fêmkirin û belav dibû.

Sedema ku ev terzê vegotinê di nav gelên rojhilatî de hevpar bû, ji ber vê jî di nav rêzikên van zanyaran de hiş û ramanên gelên rojhilat ên hevpar û veşartî hatine pêşkêş kirin. Ji ber ku di nava demê de wateya vî zimanê ku bi teşbîh û mecazan hatibû hûnandin hatiye jibîr kirin. Gelek caran ev zimanê mecazî bi wateyên xelet tê şirove kirin. Ger lêkolîner li ser vê çanda qedirbilind xebatên xwe berfireh bikin dê gelek gencîneyên veşartî di nav van rêzikên veşartî de derxin ser rûyê erdê û dê bi şiroveyên rastîn meqsed û miradê van vegotinan bên fêmkirin.

ser lawiran û dixwaze hin nîmet û mezinahiya xwe bide nîşandan ku derbarê vê mijarê de Sûreya Nehl: 16/66an de Xweda wisa ferman dixe: (Gelî Mirovan!) Bêguman ji we re di terşan (deve, dewar û pêz) de ji îbret û ders hene ku em, we ji şîrekî safî û parzûnkirî didin vexwarin ku di zikên wan de ji navbera rîx û xwînê dertê ku di gewriya yê vedixwe re bi hesanî diçe.” Xweda (c.c) di vê ayetê de sen’et û hêza xwe nîşanî ehlê heqîqat û ehlê mumînan dide. Ji xeynî vê armancê di gelek ayetên Qur’anê de Xweda (c.c) bi temsîl û teşbîhên lawiran hin nebaşî û şaşiyên mirovan dide ber çavan da ku mirov xwe ji wan şaşî û nebaşîyan biparêze. Derbarê vê mijarê de di Sûreya Cum’e: 62/5an de Xweda (c.c) di van ayetên xwe de zanyarên Cihûyan ên ku bi ilmê xwe emel nakin dişibîne kerê pirtûk barkirî. Di vê ayetê de Xweda (c.c) bi teşbîha “kerê pirtûk barkirî” bi taybetî zanyarên Cihûyan û bi giştî jî hemî zanyaran hişyar dixe da ku bi ilmê xwe emel bikin û ji rêya rast dernekevin ji bo her dem mutteqî bin da ku bigihîjin rîya rizgarî û aramiyê.

Di Sûreya El-Beqera: 2/65-66an de biwêja meymûn’ê ji bo serxwercûnê bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“Bi rastî hûn dizanin ka me çi aniye serê wan ên ku di roja Şemiyê de (bi girtina masiyan) zêdegavî dikirin. Me ji wan re got: “Bibin meymûnên rezîl û riswa.”(Ew piştî sê rojan çûne helaqê)! / Vêca me ev rûdan ji bo wan ên di wê demê de û ji bo wan ên ku dê piştî wan bîn, kire îbret û me ji bo mutteqîyan jî xiste şîret.”*

Xweda(c.c), hişyariyên xwe di Sûreya El-Muheddesîr: 74/49-50-51ê de didomîne û mirovên ku piştî xwe dane Qur’anê û ji rastiyan direvin, dişibîne kerê kovî yê ku ji şêr direvin. Wek di van ayetan de tê dîtin Xweda di gelek ayetên Qur’anê de ji bo ku mirov ji ayetan hê bêhtir fêmkirin bi temsîl û teşbîhan mijar xemilandine. Di van teşbîh û temsîlan de ji lawiran îstîfadekirine. Derbarê vê mijarê de Nursî (1995a: 389-39), nêrînên xwe wiha anîne ziman: “Beyanatê Qur’aniye de heqîqetê kûr, ji âmiya(nezana) re bi şewazeke hêsan dide fêmkirin. Mirov, bi uslûba beyanatê Qur’aniyê, navêsta, ev beyanat li gorî meqama muhatabên xwe tabîratan îstîmal dixe. Bi vî awayî Esrarên Îlahiye bi temsîlat û teşbîhatê ji amîterînan (nezanterin herî nezan) re jî rave dixe” Mîna ku Nursî, jî aniye ziman, bi temsîla rastiyê nêzî eqil û fêmê dibe, meseleyên girîng û kûr bi saya temsîl û teşbîhan tên fêmkirin, bê çawa di Qur’anê de meseleyên kûr bi teşbîh û temsîlatan ders daye. Ehlê ilm ji bo ku heqîqatên Îslamê îspat bikin bi hikayet, temsîl û teşbîhan ew heqîqet dane fêmkirin. Bi vî terzî zanyarên mîna Bedîûzzaman Seîdê Nursî, Mewlana Celaleddînê Romî, Molla Camî, Ferîduddîn Ettâr û hwd. gelek zanyarên navdar, berhemên xwe bi temsîl û teşbîhan xemilandine û heqîqetên Îslamê bi vî awayî dane îspat kirin û fêmkirin.

* Bûyera veguherandina meymûnan: Li gorî hin mufesîran, Xweda (c.c) ji ber Cihûyên ku li gorî qedexeya roja şemiyê tev negerîne, ew mirovên gunehkar veguherandine meymûnan. Li gorî hin şirovekarên ew bûyer di dema Hz. Dawud Pêxember de qewimiye (Kasapoğlu, 2006: 47-57).

DI ÇANDA KURDÎ DE LAWIR

Wek her gelî, gelê Kurd jî qonaxên şaristaniyê gav bi gav li pey xwe hiştine û yek ji van merheleyan çanda gund û koçeriyê ye. Ji ber vê sedemê çanda Kurdî ji aliyekî bi çanda gundîtî û koçeriyê ve girêdayî ye. Îro di nav çanda Kurdî de bi her awayî ev bandora çanda gund û koçeriyê xwe dide nîşandan. Di nav vê çanda gund û koçeriyê de jî cihê lawiran cihêkî taybet digire ku ev taybetî di her awayê jiyana Kurdan de tê dîtin. Ev çanda ku bi lawiran ve girêdayî ye bi tenê li ser jiyana xwezayî nemaye, her wiha li ser hiş û ramanên wan jî bandoreke mezin kiriye ku navên zarokên xwe hin navên lawirên mîna Xezal, Şêrko, Werdekê, Kewê û hwd danîne yan jî navên wan mîna Şivan, Şîrvan, Bêrîvan, Lîsa, Hêlîn û hwd. danîne ku ev nav ji bo mirovên têkildarî kar û barên lawiran tên gotin. Ev bandora ramanî di nav stranên wan ên klasîk û yên nûjên de û di pêşgotin û biwêjên wan û di nav peyvên reng û binavkirina lawiran de bi hesanî tên dîtin. Bi vê sayê gelek peyvên rengên ên cuda di amûrên Kurmancî/Kurdî cih digirin.³

Ji xeynî van dibe ku bandora herî mezin li ser çîrokên Kurmancî kiriye û bi vî awayî gelek çîrokên lawiran ji aliyê gel ve hatine afirandin. Ev afirandin ji bo hiş û ramanên Kurdî bû navgîn û bi vê sayê dewlemendiya çand û zimanê wan gihîşt dema îro. Ev dewlemendiya wan ji gelek berhemên nûdem re bû pêşeng. Bi vê sayê gelek berhemên rengîn derketin.

Ev mînak ji me re dide nîşandan ku gel bi çî kar û xebatê re mijûl bin ev mijûlî li ser çand û zimanê wan û li ser jiyana wan bandoreke mezin dike, ev mijûlî bi her awayî di jiyana wan de xwe dide nîşandan.

³ Ji bo haydariyeke berfireh li Erîşen (2009: 43-44) bnr.

BEŞA YEKEM

JÎNENÎGARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ BERHEMÊN WÎ ŞÊWAZ Û ZIMANÊ WÎ Û TÊKARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ JI BO ÇAND Û ZIMANÊ KURDÎ

1.1. JÎNENÎGARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ

Rewşenbîr, zimanzan, nivîskar, vekolîner, çîroknivîs, wergêr û helbestvanê Kurd M. Emîn Bozarşan, di 15ê Îlona sala 1934an de li gundê Eqro hatiye dinê. Gundê wî girêdayî qeza Licê ya ku bi bajarê Amedê ve ye. Navê bavê wî Mele Mehmûd e û navê diya wî jî Eyşe ye.⁴

Bozarşan di salên 1940î û 1950î li gund û navçeyên Amedê li medreseyan dixwîne. Li medreseyan fêrî zimanê Erebî, Farişî û Kurdiya edebî dibe, ji xeynî van di xortaniya xwe de fêrî Tirkî bûye. Di sala 1951ê de bi helbestvana Kurd Fatma Bozarşan re dizewice û ji vê zewacê şeş zarokên wan tên dinê. Bozarşan, di sala 1956an de dibe mele. Beriya ku bûye muftî dîplomaya dibistana pêşîn jî standiye. Ji 1959an heta 1969an jî li Hênê, Qulp/Pasûr, Şarköy, Licê miftî û sipartedariya miftîtiya Meletiyê jî kiriye.

Di sala 1969an de ji miftîtiyê îstifa kir û dû re jî di cunteya leşkerî ya 27ê Gulana 1970î de piştî desthilatiya leşkerî demekê di “Girtîgeha Eskerî ya Amedê” de girtî dimîne. Pişt re bi malbatî koçî Stenbolê kir. Nêzikî deh salan li Stenbolê man. Li Stenbolê wek rojnameger xebitî û di nav wan salan de xebatên xwe yên edebî û nivîskariyê domandin.

Ji ber hin sedemên cuda, şert û mercên jiyana wî ne baş bûn, ji ber wan sedeman di meha Berfanbarê (meha dozdehan) ya sala 1979an de bi malbatî koçî Swêdê kirin.

⁴ Sedema ku derbarê jiyana M. Emîn Bozarşanî de biyografiyê têkûz tune bû, me ji hin berhemên cuda sîd wergirtiye. Ev berhemên ku me ji van sîd wergirtiye me li jêr rêz kiriye:

Zinar, Z. (1991). Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî. Stockholm: ISBN 91-830062-2-7, r. 215

Bozarşan, M. E. (1964). İslamiyet Açısından Şeyhlik-Ağalık. Ankara: Toplum Yayınevi (nivîsa devîkê paş)

Brunessen, M. V. (2013). “Ez û M. Emîn Bozarşan”. Kovara Nûbihar. C. 17, J. 123, r. 60-63

Yüksel, M. (2013). “Melakî Şiyar û Xebatên Wî”. Kovara Nûbihar. C. 17, J. 123, r. 48-52

Narozî, E., Mîzgîn, H., Kerîm, R. (1995). 300 Saliya Mem û Zînê (Hevpeyvînek bi M. Emîn Bozarşan re). Kovara Armanc. C. 4, r. 6-13

Temo, S. (2007). Kürt Şiir Antolojisi 2. Cilt. İstanbul: Agorakitaplığı, r. 1365

Bozarslan ji sala 1979an heta vêga li bajarê Uppsalaya ku girêdayî Swêdê ye dimîne û xebatên xwe yên Kurdolojiye jî didomîne.

1.2. ŞÊWAZ Û ZIMANÊ BOZARSLANÎ

Bozarslan, mirovekî rewşenbîr û piralî ye. Di hemî berhemên xwe de zimanekî zelal û herikbar bikar aniye. Peyvên ku di nivîsên xwe de bikar tîne hêsan in û ji xwendevanan re giran nayên. Wî ev qaîdeya xwe geh di berhemên xwe yên wergerê û geh berhemên xwe yên bitelîf de jî daye nîşandan.

Bozarslan bi tîpguhêzî û wergerê gelek berhemên kesên din li edebiyata me zêde kirine. Çawa naveroka berhemên tîpguhêziyê edebî ye, her wiha wergera Kurdî û Tirkî jî edebî ye. Wî ev hunermendiya xwe ya delal di tîpguhêziya wergera “Mem û Zîn”ê de jî bikar aniye.

Her wiha Bozarslan, mîna teorîsyenekî pêşeng ji bo rastnivîsa Kurdî gelek tiştên balkêş afirandine. Wî ev nêrînên xwe di berhemên xwe yên bi navê “Baxçê Zımên” de bi sê bingehên girîng pêşkêş kirine. Li gorî wî peyvên bi Kurdî pêwist e ku bi vî awayî bêne nivîsîn:

- 1-Awayê bikaranîna piraniya Kurdan
- 2-Edebiyata Kurdî ya klasîk
- 3-Folklorê Kurdî (Bozarslan, 2008: 9).

Bozarslan, ev sê bingeh ji xebatên xwe re jî kirine armanc û peyvên ku di berhemên xwe de bikartîne li gorî van bingehan dineqîne û dinivîse.

1.3. BERHEMÊN M. EMÎN BOZARSLANÎ

M. Emîn Bozarslan di sala 1960î de dest bi nivîskariyê kir. Herdu berhemên wî yên pêşî bi Tirkî ne. Berhema wî ya pêşî di sala 1964an de bi navê “İslamiyet Açısından Şeyhlik ve Ağalık” e. Dû re di sala 1966an de jî berhema xwe ya bi navê “Doğunun Sorunları” da çap kirin. Piştî vê berhema xwe di sala 1968an de xebatên xwe li ser ziman û edebiyata Kurmancî/Kurdî domandin. Cara pêşî li Bakur û Tirkîyê bi navê “Alfabe”yê alfabeyeke Latînî ya Kurdî afirand. Destana Kurdî ya herî navdar “Mem û Zîn” bi tîpguhêziyê bi alfabeya latînî nivîsî û wergerande Tirkî (Narozî, Mîzgîn û Kerîm, 2006: 6-13).

Bozarslan, hinek nusxeyên Şerefnameya Şerefxanê Bedlisî ya ku di sala 1576an de hatiye nivîsîn wergerande Tirkî û di sala 1971ê de da çap kirin.

Di 1974an de bi navê “Îçerdekiler ve Dışarıdakiler” kurteçîrokên bi Tirkî nivîsîn. Di van kurteçîrokan de qala Bakur û pergala leşkerî ya navbera sala 1971-1974an dike.

Di 1975an de jî pirtûka dîrokzanê Kurd Îbn-ul Ezreq El-Ferîqî ku bi navê “Tarixu Meyyafarqîn we Amed” (Dîroka Farqîn û Amedê)ya bi Erebi li Tirkî wergerand û bi navê “Mervani Kûrtleri Tarihi” (Dîroka Merwanîyan Kurd) da çap kirin.

Pirtûka ku ji aliyê William Aegleton Jr. ve di sala 1962an de bi navê “The Kurdish Republic of 1946” hatibû nivîsîn bi destê Kurdekî Başur bi navê Avukat Cercîs Fethullah li Beyrûdê di sala 1972an de bi Erebi tê çap kirin. Ev pirtûk jî di sala 1975an de bi destê M. Emîn Bozarslanî ji Erebi wergerand li Tirkî bi navê “Mahabat Kûrt Cumhuriyeti 1946” da çap kirin.

Ferhenga Yusuf Ziyaeddin Paşa ya bi navê “El-Hediyye El-Hamidiyye Fî'l Luxet'îl-Kurdiyye” di sala 1894an de li Stenbolê hatibû çap kirin. Ev ferhenga Kurdî û Erebi M. Emîn Bozarslan tîpên wê yê Erebi veguhastin tîpên latînî û Erebiya wê jî wergeran Tirkî û di sala 1978an de bi navê “Kürtçe-Türkçe Sözlük/Ferhenga Kurdî-Tirkî” ji nû ve da çap kirin.

Li Bakur û li Tirkiyeyê, kurteçîroka Kurmancî /Kurdî ya yekemîn di sala 1979an de bi navê “Meyro” tê çap kirin, ku ev pirtûk ji deh kurteçîrokan pêk tê.

Bozarslan, ji sala 1979an vir de xebatên xwe yê li ser folklor, çapemenî, ferheng û etîmolojîya Kurdî gelek amûrên nû afirandine. Di van salan de giraniya xebatên xwe da ser kovar û rojnameyên Kurdî yê ku di dema Osmanîyan de bi zimanê Kurdî (Kurmancî-Soranî) û Tirkiya Osmanî hatibûn çap kirin. Di van salan de di navbera salên 1985-1988an de bist û pênc hejmarên Kovara Jîn'ê (1918-1919), di sala 1991ê de jî sê û heft hejmarên rojnameya Kurdistan'ê (1898-1902), her wiha di sala 1998an de jî neh hejmarên kovara hefteyî ya Kurd Teavûn û Terakkî Gazetesî (1908-1909) tîpguhêzî kir û Tirkiya Osmanî wergerand Tirkiya nûjen.

Beşeke ji xebatên Bozarslanî li ser amûrên zargotina Kurdî ye. Ev berhemên wî dema ku li welêt dijî berhev kiribûn lê mecala nivîsandinê nedîtibû. Bozarslan li Swêdê ev amûrên zargotinê mîna meselokên lawiran, çîrokên gelêrî û pêkenokên Kurdî bi awayekî edebî ji nû ve nivîsandin û çap kirin (Bozarslan 2011:145). Bozarslan, bi van xebatên xwe amûrên zargotinê ji tunebûnê rizgar kirin û gihandin ber destê xwendevanan.

Bozarslan di sala 1992an de digel xebatên xwe yê zargotina Kurdî ji aliyekî din jî kurteçîroka duyemîn “Şerefa Ristem Keya” weşand. Ev kurteçîrok jî mîna “Meyro” derbarê jiyana Bakurê Kurdîstanê ya salên 1940-1950î de tiştinan vedibêje. Ji xeynî vê xebata wî di sala 1993an de meselokên siyasî yê bi Kurdî bi navê “Kemal Paşa Weledê Kê Ye?” da çap kirin (Bozarslan, 2006: 115).

Di sala 1995an de bi minasebeta salvegera afirîna Mem û Zîn’ê a sêsedemîn, ev berhema giranbûha ji nû ve tîpguhêzî kir. Zimanê vê berhemê ya xwerû wergerand li Kurmanciya nûjen.

Bozarslan, ji bo ferheng, rastnivîs û etîmolojiya Kurdî di sala 2011an de Ferhenga Kurdî (Cildê Pêşin A-D), herdu cildên “Baxçê Zimên” cildê yekem di 2008an de û cildê duwem di 2013an de hate çap kirin û xebatên li ser “Ferhenga Kurdî” û “Baxçê Zimên” hêjî didomin

1.3.1. Hin Pirtûkên Ku M. Emîn Bozarslanî Nivîsine An Jî Wergerandine Ev in: Berhemên Zargotina Kurdî (Meselokên Lawiran, Pêkenokên Kurdî, Çîrokên Gelfî):

Meselokên Lawiran:

- Mir Zoro. Stenbol: Weş. Deng, S. 1999.
- Gurê Bîlûrvan. Stenbol: Weş. Deng, S. 2000.
- Kêz Xatûn. Stenbol: Weş. Deng, S. 2002.
- Serketîna Mîşkan. Stenbol: Weş. Deng, S. 2005.
- Pepûk. Stenbol: Weş. Deng, S. 2006.

Pêkenokên Kurdî:

- Melayê Meşhûr. Upsalla: Weş. Deng, S. 1986.
- Masiyên Beji. Upsalla: Weş. Deng, S. 1987.
- Jî Dinan Dintir. Upsalla: Weş. Deng, S. 1988.
- Ilmê Tûrik. Upsalla: Weş. Deng, S. 1989.
- Bûka Gulsûn. Upsalla: Weş. Deng, S. 1990.
- Mela Kuli. Upsalla: Weş. Deng, S. 1991.

Çîrokên Gelfî:

- Guli Xatûn. Upsalla: Weş. Deng, S. 1997.
- Kurê Mirê Masiyan. Upsalla: Weş. Deng, S. 1998.

- Dîtinhezâr. Stenbol: Weş. Deng, S. 2000.
- Keçîka Darin. Stenbol: Weş. Deng, S. 1999.
- Keçîka Qırşîroş. Stenbol: Weş. Deng, S. 1999.
- Gul û Sino. Stenbol: Weş. Deng, S. 2002.

1.3.2. Berhemên Wergerî Yên Çapemaniya Kurdî:

- Jîn-Cildê Yekemîn (Kovara Kurdî-Tirkî / wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1985.)
- Jîn-Cildê Duyemîn (Kovara Kurdî-Tirkî / wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1985.)
- Jîn-Cildê Sêyemîn (Kovara Kurdî-Tirkî / wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1986.)
- Jîn-Cildê Çaremîn (Kovara Kurdî-Tirkî / wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1987.)
- Jîn-Cildê Pêncemîn (Kovara Kurdî-Tirkî / wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1988.)
- Kurdistan: Rojnama Kurdî ya Pêşîn-Cild 1 (wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1991.);
- Kurdistan: Rojnama Kurdî ya Pêşîn-Cild 2 (wergera ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1991.)
- Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi: Kovara Kurdî-Tirkî (wergera ji tîpên Erebî bo tîpên latînî: M. Emîn Bozarslan, Upsalla: Weş. Deng, S. 1998.)
- Kızıma Mektuplar: Toplumsal Devrimler Ulusal Savaşlar / Jawaharlal Nehru (Werger Mehmet Emîn Bozarslan. İstanbul: Doruk Yayınevi, S. 1970.)

1.3.3. Berhemên Wergerê Yên Di Derbarê Dîroka Kurdan:

- Şerefname – Kürt Tarihi / Şeref Han (Wergera Tirkî: M. Emîn Bozarslan, İstanbul: Ant Yayınları, S. 1971.)
- Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler, Şemseddîn Samî (Wergera ji zimanê Osmanî bo Tirkî: M. Emîn Bozarslan, Stenbol: Weş. Deng, S. 2001.)
- Mervani Kürtleri Tarihi / İbn-ül Ezrak El Fariki (wergera ji Erebî: M. Emîn Bozarslan, İstanbul: Koral Yayınları, S. 1975.)

- Mahabad Kürd Cumhuriyeti / William Aegleton (wergera ji nusxeya Erebî: M. Emîn Bozarlan, İstanbul: Koral Yayınları, S. 1976.)

1.3.4. Berhemên Olî-Civakî-Siyasî:

- İslamiyet Açısından Şeyhlik ve Ağalık: Ankara: Toplum Yayınları, S. 1964.
- Doğu'nun Sorunları. Ankara: Şafak Yayınevi, S. 1966.
- Hilafet ve Ümmetçilik Sorunları. İstanbul: Ant Yayınları, S. 1969.
- Arap Devriminin Yöntemleri/Cemal Abdunnasır (Wer. M. Emîn Bozarlan, Stenbol: Habora Kitabevi, S. 1970.)
- Filistin'de Halk Savaşı ve Ortadoğu / Nayif Havatme (Wer. M. Emîn Bozarlan, İstanbul: Ant Yayınları, S. 1970.)
- İçerdekiler ve Dışarıdakiler. İstanbul: Koral Yayınları, S. 1974.
- Savaşın Lübnan. İstanbul: Üçüncü Dünya Yayınları, S. 1976.
- Anarşistler. İstanbul: Üçüncü Dünya Yayınları, S. 1977.
- Gani BOZARSLAN "Kalemim Silahımdır". İstanbul: Çıra Yayınları, S. 1979,
- Kemal Paşa Weledê Kê Ye?. Upsalla: Weş. Deng, S. 1987.
- İsmail Beşikçi ile Uluslararası Dayanışmanın Belgeleri (Türkçeye Çeviren: Şirin BOZARSLAN). İstanbul: Deng Yayınları, S. 2010.

1.3.5. Berhemên Kurteçîrok:

- Meyro. İstanbul: Çıra Yayınları, S. 1979.
- Şerefa Ristem Keya. Upsalla: Weş. Deng, S. 1992.

1.3.6. Werger û Tîpguhêziya Berhemên Edebî:

- Mem û Zîn / Ehmedê Xanî (wergera tîpên Lafînî û Kurdiya xwerû: M. Emîn Bozarlan, Stenbol: Gün yayınları, S. 1968).

1.3.7. Berhemên Li Ser Alfabe, Ferheng û Etîmolojiya Kurdî:

- Alfabe. Stenbol: Sim Matbacılık, S. 1968.
- Kürtçe-Türkçe Sözlük / Yusuf Ziyaeddîn Paşa (Berhevkinên li wergerandina li Tirkî: M. Emîn Bozarlan, Stenbol: Weş. Çıra, S. 1978.)
- Baxçê Zimên (Cildê Yekemin A-G) Stenbol: Weş. Deng, S. 2008.
- Baxçê Zimên (Cildê Duwem H-R). Amed: Weş. Deng, S. 2013.

- Ferhenga Kurdi (Cildê Pêşin A - D). Amed: Weş. Deng, S. 2011.
- Ferhenga Kurdi (Cildê Diduyan E-K). Amed: Weş. Deng, S. 2016.

1.4. TÊKARIYA M. EMÎN BOZARSLANÎ JI BO ÇAND Û ZIMANÊ KURDÎ

Sedsala 20an ji bo çand û zimanê Kurdî ne bixêr bûye. Ji ber vê çand û zimanê Kurdî gelek qels ma. Di wê demê de rewşenbîr û nivîskarên mîna M. Emîn Bozarşan, bi nêrîn û berhemên xwe gelek pirsgerêk û aloziyên çand û zimanê kurdî çareser kirin.

Bozarşan, di sala 1964an de pirtûka bi navê “Îslamiyet Açıısından Şeyhlik ve Ağalık” (Ji Aliyê Îslamê ve Şextî û Axatî) ê dest bi nivîskariyê kir.⁵ Di sala 1968an de jî pirtûka bi navê “Doğunun Sorunları” (Pirsgerêkên Rojhilatê) nivîsî. Bozarşan, cara yekem ji bo zarokên Kurdan daxwaza perwerdeyiya zimanê dayikê kir. Bozarşan wekî din di van herdu pirtûkên xwe yê dawî de gelek pirsgerêkên Kurdan ên olî û civakî analiz kirine. Çareseriya van pirsgerêkan jî nîşan daye.

Piştî van herdu xebatên xwe Bozarşan xwe li ser çand û zimanê Kurdî pir êşand, wek ku tê zanîn çand û huner qutayiyê qebûl nake û her dem berdeyamî divê. Bozarşan bi vê hişmendiyê ji sala 1968an heta niha xebatên xwe ji bo berdeyamîya çanda Kurdî li ser bingeha dîrok, ziman, folklor û edebiyata Kurdî bilind dike. Bozarşan bi hin berhemên xwe li Tirkiye û Bakur de di van babetan de pêşengîya hin cureyan kiriye: Di sala 1968an de li Tirkiye û Bakur cara yekem alfabe ya Latînî amade kir û bi navê “Alfabe”yê weşand.⁶ Di heman salê de destana Kurdan ya herî navdar “Mem û Zîn” tîpguhêzî kir û wergerande Tirkî (Narozî, Mîzgîn û Kerîm, 1995: 6-13)

⁵ Bozarşan di vê berhema xwe de gelek rexneyan li ser saziya tesewûf, terîqetê û seyyîdiyê digire û van saziyan der-Îslamî dibîne. Bozarşan rexneyên xwe hê bêhtir li ser şexîtiyê dike û van mîna rûş û fêlbaz nîşan dide. Derbarê vê mijarê de Bayezîdî (2010: 101-102), di berhema xwe de ramanên cuda tîne ziman ku, Kurd bi baweriyekê cahîlane, baweriyê bi şêxan tînin, xwedêgiravî bav û bapîrên van, mirovên salih û welî ne. Lê belê niha nevî û lawên van kesan cahîl û nezan bin jî bawerîya xwe bi van tînin û hurmeteke zêde didin van. Wekî din Erîşen (2009: 16-17), balê dikîşîne ku Şêx, Seyyîd û mela bi piraniya xwe civak bi rêzikên ola rast serwest nekiriye û piraniya van, Şêx, Seyyîdan ne xwande van in lê gel her çi qas melakî duwanzdeh îlm xwendibin jî gotinên van hê bêhtir muteber dibîne. Ew tê wateya ku gel her çi qas oldar be jî dîsa di her warî de nezaniya van nîşan dide.

Di nêrînên Bozarşan, Bayezîdî û Erîşen de rexneyên neyînî gelemperî li şexsan hatiye girtin. Lê belê her çi qas di nav dîrokê de ev saziyên pîroz bi destê nezanên mîna mutesêx, muteseyyîd, mutederwêşan hatibe texrîpkirin jî esasê wê tesewûf, terîqet, kamilbûna însan û pêşveçûna jiyana Îslamî ye. Bi xeletîya wan nezan û rûşan kêmanî ji van saziyên pîroz re çênabe.

⁶ Bozarşan, balê dikîşîne ser alfabe ya Kurdî ya Latînî û her dem xebata C.Elî Bedirxan bi minnet tîne ziman û di vê alfabe ya Kurdî de ji dêvla tîpen (i-î) bikaranîna tîpen (ı-i) yê munasîb dibîne. Li gorî wî guhertina van her du tîpan ne guhartina alfabe ya Kurdî ye lê wek tîpêkirina alfabe ya Kurdî dibîne. Wî fikrên xwe di gelek axaftinên xwe de eşkere kirine û ev fikr jî bo xwe kirine armanc. Ji vê sedemê di berhemên xwe de tîpên (ı-i) bikar anîne.

Bozarslan bi van xebatan li Tirkiye û Bakur de ziman û edebiyata Kurdî bi nîfşên nû hisand. Bi vê sayê xwendin û nivîsîna Kurdî di nav Kurdên Tirkiye û Bakur de pêş ket.

Beşeke xebatên Bozarslan li ser dîroka Kurdî ye. Ji bo ku gelê Kurd ji dîroka xwe agahdar be kete nava tevgerê. Bi vê amancê hin nusxeyên “Şerefname”ya ku di sedsala 15an de ji aliyê Şerefhanê Bedlîsî ve hatibû nivîsandin ji Erebi wergerande Tirkî û di sala 1971ê de da çap kirin. Di sala 1975an de jî pirtûka ku di sedsala 11an ji aliyê dîrokanê Kurd Îbn-ul Ezreq El-Ferîqî ku bi navê “Tarîxu Meyyafarqîn we Amed” (Dîroka Farqînê û Amedê) ku bi Erebi nivîsîbû wergerande Tirkî û bi navê “Mervani Kürtleri Tarihi” (Dîroka Merwanîyên Kurd) da çap kirin. Dîsa pirtûka dîplomatê Amerîkî William Aegleton Jr. ya bi navê “The Kurdish Republic of 1946” di sala 1975an de jî nusxeyeke Erebi wergerande Tirkî û bi navê “Mahabat Kürt Cumhuriyeti 1946” da çap kirin. Bi saya van xebatan xwendevanên Tirkiyê, Bakur û nîfşên nû ji dîroka Kurdan agahdar bûn.

Bozarslan piştî koçî Swêdê kir, gelek amurên çapemeniya Kurdî yên ku dema Osmanîyan bi Kurdî (Kurmançî-Soranî) û Osmanî bi tîpên Erebi hatibûn nivîsandin. Bozarslan van berhemên dîrokî yên çapemeniya Kurdî di navbera salên 1985-1998an de, kovara Jîn’ê (1918-1919), rojnameya Kurdistan’ê (1898-1902), kovara hefteyî ya Kurd Teavûn û Terakkî Gazetesî (1908-1909) tîpguhêzî kir û Tirkiye Osmanî jî wergerande Tirkiye nûjen. Ji bo hin mijar qenc bîn fêmkirin bi gelek jêrenotan ev xebatên xwe xemilandine. Bi van berheman bergehê Dewleta Osmanî û gelê Kurd ya derbarê mijarên civakî, siyasî, aborî, felsefî û hwd de tê dîtin. Gelek mijarên dîrokî bi saya van xebatan tîpê kifş kirin.

Ji bilî van xebatên wî yên çapemenî û dîroka Kurdî, dema ku li welêt dijî gelek amûrên zargotinî berhev kiribûn. Lê mecal nedîbû ku van bide weşandin. Bozarslan ev berhevên zargotinî bi awayekî edebî ji nû ve afirandin. Ev amûrên xwe di bin navê rîzeçîrokên meselokên lawiran, pêkenokên gelêrî û çîrokên gelêrî de weşandin. Bi vê xebatê amûrên zargotina Kurdî ji tunebûnê rizgar kirin (Bozarslan, 2011: 145).

Bozarslan, ji bo pêşxistina çand û zimanê Kurdî bi tenê werger, tîpguhêzî û berhevkirina amûrên gelêrî nekiriye. Wî hunermendiya xwe bi afirandina berhemên xwe yên bitelîf jî daye nîşandan. Bi van berheman pêşengiya hin cureyan jî kiriye. Bi vê mebestê bi kurteçîroka ku di sala 1979an de bi navê “Meyro” weşandibû. Bi vê

berhemê Bozarslan, li Bakur û Tirkiyeyê pêşengiya kurteçîroka Kurdî kir, wekî din di sala 1992an de kurteçîroka duwem “Şerefa Ristem Keya” da çap kirin. Ev herdu kurteçîrok mijarên xwe ji bûyerên Kurdên Bakur ên di navbera salên 1940-1950î wergirtine. Bi van xebatan rewşa Kurdên wê demê hê baştir tê fêhm kirin û gelek mijarên siyasî jî tên kifş kirin (Bozarslan, 2006: 115).

Dema qala “Mem û Zîn”ê tê kirin keda Bozarslan nayê jibîr kirin ku ew demeke dirêj li ser vê berhema qedirbilind bi berfirehî xebitiye. Dîsa bi vê amancê di sala 1995an de li Swêdê bi minasebeta salvegera afirandina Mem û Zîn’ê a sêsedemîn, ew ji nû ve amade kir. Bozarslan di vê weşana nû de bi her awayî de hosteyiya xwe rapêş kir. Kurmanciya vê berhema hêja ya resen bi awayekî edebî wergerande Kurmanciya nûjen, ji bo ku ev berhema qedirbilind xweşik bê fêhm kirin pêşgotineke dirêj ku ji sed û pênc rûpelan pêk tê nivîsiye. Wekî din ji bo zelalkirina hin mijar û bûyeran heftsed û heştê û neh heb jêrenot danîne. Bi vê xebata giranbiha, ji bo fêhm kirina destana nemir “Mem û Zîn” ê Bozarslan, bûye pêlek, bi her awayî bedewiya vê destana neteweyî mîna neynikê daye nîşandan.

Ji bo rastnivîs û peyvnasiya Kurmancî/Kurdî xebatên Bozarslan gelekî girîng in. Di vî warî de berhemên wî yên bi navê “Ferhenga Kurdi (Cildê Pêşin A-D)” û di herdu cildên “Baxçê Zimên” de ji bo rastnivîs û peyvnasiya Kurmancî/Kurdî gelek raman û teoriyên delal tîne ziman. Bi van xebatên xwe Bozarslan, rastnivîsa Kurmancî/ Kurdî li ser esasê kevneşopiyê difesilîne.

Ev pêncî û şeş sal in ku Bozarslan, bi van berhem, werger û nêrînên xwe ji bo çand û zimanê Kurdî gelek xizmetên hêja dike. Bi saya vê xizmetê ew di nav nifşên nû û kevin de bûye pir. Bi vê pîrbûna xwe zargotin û berhemên dîrokî ji tunebûnê rizgar kirin û gihandin asta nemiriyê.

BEŞA DUYEM

ÇÎROK, TAYBETMENDIYÊN ÇÎROKAN (ÊN KURMANCÎ/ KURDÎ) Û DI DERBARÊ ÇÎROKAN DE HIN AGAHIYÊN GIRING

2.1. ÇÎROK

Çîrok, yek ji wan babetên zargotinê ye. Serpêhatî û bûyerên xeyalî bi awayekî fewqulade û mucîzewî tên vegotin. Li gorî danasîna Mazi (2014:353), çîrok: “Çîrçîrok: Bûyerên ku ji xeyalên gel derketine û ev bûyer di jiyana rastîn de nayên dîtin an bi temamî an jî hinekî ji jiyana rastîn dûr in. Gelek caran bi kesayetî û bûyerên nedîtî re neqîşkirî ne. Bi Tirkî masal, bi ‘Erebî mesel tê gotin.” Çîrok, di nav gel de wek çîrçîrok, çîrçîranok, çîrçîronek, xeberoşk, cîvanok, mesel yan jî wek hîkayeyê tê binav kirin. Kurdên Zaza jî ji bo çîrokê, peyvên sanike, estaneke û fistanike bikartînin.

Çîrok di nav edebiyata cîhanê de cureyekî navneteweyî ye. Di nav edebiyata cîhanê de yên ku mijar, sembol û motîfên herî hevpar çîrok in. Her çî qas welat, erdnîgarî, bîr û bawerî bê guhertin jî di çîrokê de sembol û têgihên hevpar nayên guhertin. Ev hevparî di nav neteweyan de hişmendiyeke navneteweyî û felsefî nîşanî mirovatiyê dide. Ev hevparî ji bo rave kirina hin mijarên olî û felsefî hêsaniyek dike. Di derbarê vê mijarê de Bilkan (2011: 28), nêrinên xwe wiha tîne ziman; Ekolên felsefî, olên beşerî û semavî ji bo ku peyamên van hê bêhtir bê fêmkirin ji çîrokan havil dikin. Bi vê sayê mijarên olî û felsefî yên neberbiçav, berbiçav dibe.

Bi vê armancê rewşenbîr, feylesof, zanyar û hunermendên edebiyata rojhilat û rojava, berhemên xwe li ser motîfan ava kirine ku nêrinên xwe hê bêhtir bidin fêmkirin. Di vî warî de gelek berhemên giranbuha mîna: “Kelîle û Dîmne, Tûtîname, Manzubanname, Baharistan, Gulistan, Bûstan, Mantiqul Teyr” çîrokên sipehî ji motîf û sembolan hatine afirandin. Bi vî awayî derbarê jiyane de rewşenbîr, feylesof, zanyar û hunermendan hest û ramanên xwe bi saya çîrokan hêsantir di nava gel de belav kirine.

Ji ber ku naveroka çîrokan bi gelek sembol û motîfan hatiye hûnandin, gelek rengên civatî di nav rêzikên xwe de vedîşere. Mirov bi saya van rengan hê bêhtir çand û hunera gelan nas dike. Wekî din çîrok her çî qas cureyeke navneteweyî be jî li kîjan erdnîgariyê bi devê kîjan çîrokbêjî bê vegotin jî reng û hişmendiya wî welatî hildigire û di nav awazên xwe de çîrok, biwêj, gotinên pêşiyar, zûgotinok, helbest, bîr û baweriya wê çandê di nav rêzikên xwe de distirîne û bi vî awayî formeke neteweyî hildigire. Bi

vê sayê çîrok mîna neynîkê taybetiyên gelan dide rapêş kirin. Derbarê vê mijarê de Alakom (1994: 7-8), nêrînên xwe wiha aniye ziman:

“Dema mirov bi çavekî zanistî, rexnevanî û lêkolînî li çîrokên Kurdî mêze dike û babetên wan analîz dike, mirov wê çaxê dibîne ku, ev berhem, efrandinên gelî, wek destanên kurdî, gotinên pêşiya û stran ji me re dewlemendiyeke jiyîna folklorîk pêşkêş dikin. Ev berhem li me şîretan dikin, rê nîşanî me didin û me di nav fantazyên rengîn de dihêlin. Fantazî, xewn, xewnerojên sedsalan di nav van çîrokan de her çûne dewlemend bûne. Beşek ji wan bi rastiyan jiyînê ve gihiştine hev, ji aliyê mirovan de têgihîştina jiyînê zêdetir hêsantir kirine. Di vî warî de çîrokên kurdî gelekê hînkari û şîretkar in”

Ev çîrokên hînkari û şîretkar bi giştî di dema zivistanê de ji aliyê jinan ve dihate gotin. Di nav rêzikên ve cureyê de gelek pêdiviyên jiyânê tên vegotin. Guhdar û xwendevanê vê cureyê bi saya peyamê çîrokê di derûniya wan de hest û ramanên erênî pêk tîne.

2.2. TAYBETIYÊN ÇÎROKÊN KURMANCÎ/ KURDÎ

1. Çîrokên gelêrî dûvdirêj in. Di nav vî cureyî de çîrokên muteselsîl wek dastanan hinekî dirêj in.
2. Çîrokên gelêrî her çi qas pexşan be jî hin beşên wan helbestî ne.
3. Çîrokên gelêrî jî destpêk, bûyer û encamê pêk tên.
4. Çîrokên gelêrî, ji gelek formelan pêk tên û di nav xwe de gelek motif û sembolan dihewîne.
5. Zimanê çîrokên gelêrî zelal û herikbar e.
6. Çîrokbêj kîjan çîrokê vebêje ev çîrok taybetiyên herêmî û devkî distîne.
7. Her çîrok di nav rêzikên xwe de dîtin û nerînên çîrokbêjên xwe vedişêre.
8. Lehengên çîrokan bi sêhr û du'ayan dibedilîn
9. Çîrokên gelêrî di nav rêzikên xwe de gelek taybetiyên folklara gel dihewîne.
10. Lehengên çîrokên gelêrî bi piranî ji padîşah, mîr, wezîr, mîrzade û keça wezîr pêk hatine.
11. Lehengên çîrokên gelêrî her çi qas mirov bin jî, carinan jî lehengên çîrokan wek perî, pîrebok, ifrît û cin in.
12. Di çîrokan de her dem sê keçik yan jî sê kurên padîşah hene û her dem biçûkên keç û kuran digihîjin miradê xwe û dibin padîşah û şahbanû.

13. Di çîrokên gelêrî de lehengên çîrokê keç û xort bi hevdiatina cara ewil dilketî dibin, hin çîrok jî bi nîfir û bihîstina navê leheng dildar dibin. (Ji bo haydariyeke berfireh Bozarslan,1999b: 51-116 bnr.)
14. Lehengên çîrokan ji bo xwe îspat bike ji aliyê padîşah ve tê azmûn kirin, bi gelemperî lehengên çîrokê di azmûnê de serkeftî dibin. Dawiya azmûnê leheng ya tê xelat kirin yan jî bi keça padîşah ango bi keça wezîr re dizewice.
15. Çîrokên gelêrî fewqulade ne û lehengên çîrokê xwedî-taybetiyên awarte ne, di van çîrokên awarte de lehengên çîrokan ejderhayekî dikujin, li ser piştê Teyrê Enqa diçe pişt çiyayê Qafê û hwd. (Ji bo haydariyeke berfireh “Bozarslan, 2002b: 5-207” bnr.)
16. Di çîrokên gelêrî yê fewqulade de lehengên çîrokan, bi alîkariya pîrekê yan jî rihspiyekî digihîjin armanca xwe.
17. Di çîrokên gelêrî de cihên ku bûyer lê diqewimin ne diyar in, lê belê di hin çîrokan de cihên ku bûyer lê diqewimin diyar in. Ev cihên diyar jî wek Çîn-Maçîn yan jî Amed, Cizîr, û hwd. in.
18. Hin çîrok ravekirina gotinên pêşiyên in. (Ji bo haydariyeke berfireh Bozarslan,1999b: 5-50 bnr.)
19. Hemî cûreyên çîrokan bi piranî ji aliyê dayik û dapîran ve ji zarokan re tên vegotin.
20. Dawiya çîrokan her dem bi şahiyên xelas dibe, xerab tên ceza kirin, qenc jî tên xelat kirin.

2.3. MESELOKÊN LAWIRAN

Çîrokên meselokên lawiran, bi bikaranîna sen’etên întaq û teşxîsê tên afirandin. Bûyera çîrokê di navbera lawiran an jî mirovan de diqewime. Di meselokên lawiran de peyva bi devê lawiran bi awayekî dîdaktîk tê rapêşkirin. Li gorî pênasiyeke dî: “Fabl cureyeke wêjeyî ya dîdaktîk e ango armanca vê cureyê fêrkirin û şîret dayîn e. Fabl alegorîk e ango tiştên ku bixwaze bide, pêşî dişibîne tişteke din û paşî dide” (Dîzman, 2015: 23-29).

Di nav edebiyata Kurdî de li ser têgiha meselokên lawiran, lihevkiyên tuneyê. Her çî qas M. Emîn Bozarslan, têgiha meselokên lawiran bikaranî be jî, Heciyê Cindî ji bo hemû cûreyên çîrokan peyva “Hikyat” bikaraniye. X. Sadinî navê “çîrokên gelêrî”

bikartine. Bêwer Diyadînî û hin kesên dî jî rasterast navê “fabl” ê bikartînin. Kurdên Soran jî navê “cefên” bikartînin (Dîzman, 2015: 23-29). Wekî din Ramazan Perteve jî ji bo nav kirina meselokên lawiran navê “meselokên ajalan” bikartîne (Perteve, 2009: 94).

Di edebiyata cîhanê de Beydaba wek pêşengê vê cureyê tê dîtin. Wî di pirtûka xwe ya navdar “Kelîle û Dîmne” de lawir bi sen’eta întaq û teşxîsê bikar anîne, û bi vî awayî derbarê gelek mijaran de nêrînên xwe rapêşî mirovan kirine.

Ev terzê kevneşopiyê ji “Kelîle û Dimne” heta fablên (meselokên lawiran) nûjen tê domandin. Di edebiyata rojava û rojhilat de gelek pirtûkên navdar bi vî terzî hatine nivîsîn. Di nav van pirtûkan de yê herî navdar: Tûtîname, Mantiqul Teyr, Baharistan, Gulistan, Bûstan e. Di edebiyata rojava de çîrokên Ezop û çîrokên La Fontaîne ne.

Di hêla meselokên lawiran de edebiyata Kurdî gelek rengîn û dewlemend e. Gelê Kurd, nêrîn û ramanên xwe bi saya meselokên lawiran rave kirine. Bi vê ravekirinê re nîfşên nû derbarê jiyanê de hay ji gelek bûyer û mijaran bûn.

Ji destpêka çapemeniya Kurdî heta îro kovar û rojnameyên Kurdî, bi vê cureyê dewlemend hatine xemilandin. Ev cureyê dewlemend bi saya merivên wek M. Emîn Bozarlan, Abbas Alkan, Mehmet Oncu, Zeynelabidîn Zinar, Nureddîn Zaza, Cegerxwîn, C. ‘Elî Bedirxan, Osman Sebrî, Heciyê Cindî û gelek nivîskarên dî bi berhev kirin û afirandinên van nivîskarên kedkar re renegekî nûjen girtine. Bi xebatên van kedkaran, gelek amûrên zargotina Kurdî ji tunebûnê rizgar bûn û gihîştin dema me.

2.3.1. Taybetiyên Meselokên Lawiran

1. Cûreyên meselokên lawiran, bi piranî cûreyên gelêrî ne. Hin çîrok bi destê hunermendan hatine afirandin.
2. Meselokên Lawiran pexşan in, lê belê hin çîrokên helbestkî jî hene ku ji aliyê hunermendan ve hatine nivîsîn.
3. Meselokên lawiran bi piranî kurteçîrok in.
4. Cûreyên meselokên lawiran, cûreyên dîdaktîk in.
5. Di nav edebiyata cîhanê de cûreyên meselokên lawiran cûreyên hevpar in.
6. Di meselokên lawiran de her lawir kesayetekê nîşan dikan.
7. Cûreyên meselokên lawiran, ji aliyê formelan ve zêde ne dewlemend in.
8. Hin çîrokên meselokên lawiran, xwediyên varyantên cuda ne.
9. Di nav rêzikên meselokên lawiran de gelek îdyom û gotinên pêşiyên hene.

10. Bûyerên meselokên lawiran, bi tevahî di navbera du lawiran yan jî di navbera lawir û mirovan de diqewimin.
11. Carînan nebat jî di meselokên lawiran de di bin lehengê çîrokê.
12. Li gorî baweriya Kurdan hin lawir bi du'a û nifiran veguherîne, bûne hirç, jûjî, legleg, pepûk û kûsî.
13. Zimanê meselokên lawiran zelal û herikbar in.
14. Meselokên lawiran bikaranîna sen'etê teşhis û întaqê hatine damezrandin.
15. Di nav meselokên lawiran de pênc hêmanên sereke hene. Ev hêman ji leheng, cîh, dem, bûyer û şîretê pêk tê.
16. Meselokên lawiran ji beşên destpêk, bûyer, encam û pendnameyan pêk tên.

2.3.2. Hêmanên Meselokên Lawiran

Di nav meselokên lawiran de pênc hêmanên sereke hene. Ev hêman ji leheng, cîh, dem, bûyer û şîretan pêk tên. Bi saya van hêmanên taybet, çîrok bi awayekî bedew tên hûnandin. Di nav çîrokeke t êkûz de gerek ev pênc hêmanên taybet cîh bigirin.

Leheng: Di nav meselokên lawiran de teqez lawir cî digirin û li gorî lehengên sereke bûyer diqewimin. Yan jî ev lawirên sereke bandorekê li ser bûyeran dikin.

Cîh: Di meselokên lawiran de bûyer bi giştî li xwezayê pêk tên. Ev ciyên xwezayê çol û çiya, deşt û zozan, qul û şikeft in yan jî di nav malan da û li kêleka gundan in. Dema ku bûyer li gund û malê biqewime hingê mirov jî dibin lehengên çîrokê.

Dem: Di çîrokên meselokên lawiran de dem dema borî ye û ne demeke diyar e. Ji vê sedemê bi giştî meselokên lawiran bi formelên destpêkê yê mîna “Rojek ji rojan”, “Demek ji deman”, “Rojekê”, “Zemanê berê” dest pê dikin.

Bûyer: Di meselokên lawiran de bûyer ji aliye motîfên sereke ve tên hunandin û teşe û reng dide çîrokê. Ji serî heta dawiya çîrokê guhdar û xwendevan di nav guman û meraqan de dimînin. Ji ber vê sedemê guhdar û xwendevan di nava vê de gelek şa dibin.

Şîret: Şîret, di meselokên lawiran de di dawiya çîrokê de diyar dibe. Li gorî mijara çîrokê, şîreta ku tê dayîn bi devê lawirê sereke yan jî bi devê lawirekî dî tê dayîn.

2.3.3. Beşên Meselokên Lawiran

Meselokên lawiran, her çi qas vegotinên kurte bin jî dîsa wekî nivîsarên edebî xwedî qalib in ku ev qalib tu car nayên guhertin.

Meselokên lawiran, li ser sê hîmên neguher tên damezirandin:

1-Destpêka çîrokê

2- Bingeha çîrokê

3-Dawiya çîrokê

1 - Destpêka Çîrokê: Di vê beşê de gotyar, ji bo ku bala guhdaran bikişîne ser çîrokê berî ku lehengên çîrokê bide nasîn, formelên destpêkê pêşkêşî guhdaran dike. Dû re taybetmendiyên lehengên çîrokê di de nasandin.

2 - Bingeha Çîrokê: Di vê beşê de bûyera çîrokê yekser tê vegotin. Bûyera ku diqewime bi awayekî xweşik bi zimanekî zelal û herikbar tê hûnandin. Çîrokbêj, di vê beşê de bi vegotina xwe guhdar û xwendevanan dixê nava guman û meraqan.

3 - Dawiya Çîrokê: Di nav beşên meselokên lawiran de beşa herî kurt e. Di vê beşê de çîrok tê bidawî kirin. Guhdar û xwendevan ji guman û meraqan tî rizgar kirin. Çîrokbêj, di vê beşê de bi devê lehengê çîrokê yê sereke yan jî bi devê lawirekî dî li gorî mijara bûyerê şîretan dide.

2.4. CÛREYÊN ÇÎROKÊ YÊN BI KURMANCÎ/ KURDÎ

Di nav lêkolîneran de nîqaşa dabeşkirina cûreyên çîrokan ji 140 salî zêdetir tî kirin. Derbarî dabeşkirina cûreyên çîrokan de xebatên yekemin di sedsala 19an de bi destê J. G. Van Hahn, H. F. Fîelder û J. Jakobs hatine kirin (Sakaoğlu, 1999: 10).

Di derbarê kategorîzê kirina cûreyên çîrokan de xebatên rêkûpêk di sedsala 20an de ji aliyê Antî Aarne, di sala 1910an de hatine amade kirin. Xebata herî navdar û şûmul bi destê şaqirdê Antî Aarne, Stîth Thompson di salê (1932-937) hatîye afirandin.

Her çî qas ev xebata wî bê rexnekirin jî ev dabeşkirin ji aliyê gelek lêkolîneran we tî pejirandin. Li gorî vê nêrînê cûreyên çîrokan di bin pênc serenavan de tî dabeş kirin:

1-Çîrokên Lawiran (Meselokên Lawiran),

2-Çîrokên Rastîqîn

3-Çîrokên Pêkenokî

4-Çîrokên Muteselsîl/ Zîncîreyî

5-Çîrokên Ku Nakevin Tu Dabeşkirina Çîrokan (Sakaoğlu, 1999: 13).

Bi bandora vê nêrîna navdar di edebiyata Kurdî de di derbarê dabeşkirina cûreyên çîrokên Kurmancî/ Kurdî de nîqaşên edebî hê jî tîne kirin. Di derbarê vê mijarê de ji

aliyê hin nivîskaran ve hin fikir avêtine holê, xwediye nêrînek ji van nêrînan Ramazan Pertev e. Pertev di berhema xwe a bi navê “Zarok û Çîrok” de çîrokên Kurmancî li gorî bûyer û lehengên çîrokan di bin çar beşên bi navê: Çîrokên Ajalan, Çîrokên Zîncîreyî, Çîrokên Rasteqîn, Çîrokên Neasayî dide rêz kirin (Pertev, 2009: 94-95). Lê belê dema ku em çîrokên pêkenokî ê lawiran jî di nav wan cureyan de bihêsibînin hinga cûreyên çîrokan di bin pênc serenavan de bi vî awayî tê kategorize kirin: Çîrokên Ajalan (Meselokên Lawiran), Çîrokên Muteselsîl/ Zîncîreyî, Çîrokên Rasteqîn, Çîrokên Fewqulade/ Neasayî, Çîrokên Pêkenokî ê Lawiran e. Niha em van cureyan bi dorê bidin danasin:

2.4.1. Çîrokên Lawiran

Ev cûreyên çîrokan, bi piranî kurteçîrok in. Bi karanîna sen’eta întaq û teşxîsê lawir taybetiya mirovan hildigirin û bi vî awayî hin bûyer û serpêhatî bi temsîla lawiran bi zimanekî alegorîk tînin vegotin.

2.4.2. Çîrokên Muteselsîl / Zîncîreyî

Di nav van çîrokan de lehengên çîrokê bi taybetî xwediye serpêhatiyekê ne û di nav vê serpêhatiyê de hin çîrokên cuda jî bi awayekî mantiqî cih digirin û bi vî awayî çîrok pêk tînin. Li gorî danasîna Pertev (2009: 95), “Di wan çîrokan de rist û pevgirêdaneke mantiqî heye. Bûyer û rûdanên çîrokê li dû hev tînin gotin. Her yek ji wan, hem berdeewama ya din e hem jî bi serê xwe çîrokek e.”

2.4.3. Çîrokên Rasteqîn

Ev, çîrokên adetî û mantiqî ne û bûyer û serpêhatiya van çîrokan di nav jiyana rojane de bi hêsanî tînin dîtin. Ev çîrok bi gîştî pend û şîretan didin guhdar/xwendevanan.

2.4.4. Çîrokên Fewqulade

Bûyera van çîrokan jî serî heta dawî bi bûyerên adetî û fewqulade tê damezirandin. Lehengên van çîrokan, dew, hût, pîrebok, îfrît, cin, perî û hwd in. Hin caran di nav van lehengên fewqulade û lehengên adetî yê mîna şivan, padîşah, şehzade û wezîr de tîkiliyek heye.

2.4.5. Çîrokên Pêkenokî Yên Lawiran

Ev kurteçîrok cureyekî dîdaktîk e. Di pêkenokên lawiran de bûyer bi tinaz û henekan tên çêkirin. Bi gelemperî ev kurteçîrok ji bo şîret lê kirinê tên afirandin.

2.5. FORMELÊN MESELOKÊN LAWIRAN

Çîrokbêj ji bo bala guhdaran bikişîne ser çîrokê yan jî ji bo bala guhdaran belav neke di destpêk, navber û dawiya çîrokê de formelan bikar tîne. Her yek ji van formelan zûgotinok/mamik in û xwedî wate ne û di nivîsara çîrokê de risteyekê girîng digirin. Her wiha di nav metnên çîrokê de formelên hejmaran û rengan jî tînin bikaranîn.⁷

2.5.1. Formelên Pêşrev Yên Zûgotinokî

Formelên pêşrev yê zûgotinokî bi giştî bi rehma dê û bavên dest pê dike û dawiyê lanet li şeytanê dibarînin:

“Carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran” (Fîdan, 2014: 39).

“Carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran, nelet li şeytanê ber dîwaran. Hebû tunebû ji Xwedê meztir ti kes nehebû” (Fîdan, 2014: 46).

“Carek ji caran, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, lê ji xeynî mar mişkên li qulên dîwaran” (Zinar, 2013b: 9).

“Hebû kes ji Xwedê meztir tunebû. Rehma Xwedê li dê û bavê min û li we bû” (Perteve, 2009: 139).

“Hebû carek ji cara, xêr û xweşî li hazir û guhdara” (Zinar, 1989: 202).

“Hebû tunebû carek ji caran rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, ji xeynî xêrnexwaz û neyaran” (Berbir, 2013b: 3).

“Hebû tunebû, carek ji caran, rehme li dê û bavên guhdaran, xeynî ji cendîrme û tehsîldaran” (Bozarslan, 1999a: 8).

“Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran...” (<http://wp.zimaneKurdi.ch>, 07.10.2016).

“Rojek ji rojan, rehmet li dê û bavên me guhdaran” (Berbir, 2012a: 1).

⁷ Kategorîze kirina formelên meselokên lawiran jî nêrînen Alptekin (2000: 157-182) û Yolcu (2011: 75-88) hatine îstîfâ kirin.

“Carek ji caran rehmet li hazirê miriyê guhdaran, lanet li şeytanê qulê dîwaran, sa (seg) mezinê derê fillan bû, fille seyê (segê) ber derê me bû”, “Carek ji caran, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, xeynê mişkê qulên dîwaran, se (seg) bavê simsaran”, “Hebû tune bû kes ji Xwedê mestir tune bû, mezinê fillan seyê ber derê me bû, şeytanê qûntesî, ser xaniya dimeşî lufkê g... ji qûna wî diweşî”, “Hebû tunebû ji Xwedê û pêxember mezintir kes tunebû, mezinê me Xwedê û pêxember bû, mezinê fillan şeytanê devê deriyê me bû”, “Kes hebû kes tunebû, mezinê fillan kûçikê ber derê me bê”, “Hebû tunebû mezinê fillan se (seg) bû, ji Xwedê û pêxember mezintir kes tune bû”, Carkê hebû ji caran rihmet li dê û bavê hazir û guhdaran, lanet bê şeytanê ber dîwaran”, “Hebû tunebû ji Xwedê mezintir kes tune bû, mezinê fillan ker bû, barê me tevê ser bû” (Bozkurt, 15.05.2013).

2.5.2. Formelên Destpêkê Yên Xwerû/ Sade

Di destpêka çîrokê de çîrokbêj, ji bo bala guhdaran bikişîne ser çîrokê, formelên destpêkê pêşkêşî guhdaran dike. Formelên destpêkê bi gelek cudatiyan derdikevin pêşiya xwendevan û guhdaran. Hin formelên destpêkê bi vî awayî ne:

2.5.3. Formelên Ku Bi Şêweyê “Hebû Tunebû” Dest Pê Dikin

“Hebû tunebû, kewek hebû” (Xamo, 2014: 49).

“Hebû tunebû rojek ji rojan pîrikek qutik hebû” (Berbir, 2013c: 3).

“Hebû tunebû pîrek hebû” (Berbir, 2013a: 3).

“Hebû tunebû, di demekê de roviyek hebû” (Amedî, 2012: 39).

“Hebû tunebû, kîvroşk hebû” (Alkan, 2003: 23).

“Hebû tunebû çivîkek hebû. Birîna çivîkê hebû” (Cindî, 2005: 216).

2.5.4. Formelên Ku Bi Şêweyê “Hebû ” Dest Pê Dikin

“Hebû pîreke feqîr” (Yıldırım, 2009a: 3).

“Hebû roviyek; ew û jîna xwe û zarokên xwe li cem hev bûn” (Yıldırım, 2009b: 3).

“Roviyekek hebû. Mîna hemî roviyan ew jî fenek û dekzan û xasûk bû” (Bozarslan, 1999a: 8).

“Li çiyayekî şirkakek (reşêleyek) hebû” (Dilsoz 2014: 2).

“Li gundeki kerekî beredayî hebû” (Amedî, 2012: 41).

“Ji gundeki kerekî bêdeng hebû” (Öncü, 2006: 38).

“Li gundekî Reşo û rovî hevalên hebû” (Amedî, 2012: 53).

“Gundeki xerabe hebû; tê de dîkek û tajik hebûn” (Bedirxan, 2014: 56).

Şêrek hebû. Carekê meyizand, gava, vaye rovîk ji wê ve hat. Şêr je re got, go rovî çima tu wilo belengaz bûyî û pirça dûvê te weşiyaye” (Bedirxan, 2014: 34).

“Axek hebû berxikekê wî hebû, xast ku berxikê xwe şêrjêke” (Celîl û Celîl, 1978: 216).

“Çiyayekî pirr pirr bilind û asê hebû” (Bozarşan, 2000a: 49).

“Di gûndekê de jinek pîr hebû” (Fîdan, 2014: 46).

“Ji berê de şivanek hebû” (Fîdan, 2014: 53).

“Roviyek û qulingek hebûn” Bozarşan, 1999a: 49).

“Li daristanekê roviyek û kîsoyek hebûn” (Berbir, 2012b: 1).

2.5.5. Formelên Ku Bi Şêweyê “Bûn” Ê Dest Pê Dikin

“Şêr, rovî û gur bûne, şîrîkê hev, bi şîrîkatî bi hev re çûne nêçîrê” (Öncü, 2006: 108).

“Kerek û devek jar bûn, xweyê wan ew hiştine sere çiyê lêdan hatin malê xwe” (Celîl û Celîl, 1978: 217).

“Deve û berf bûne bira” (Celîl û Celîl, 1978: 210).

“Gurekî û roviyekî bûne destbirakê hev” (Diyadînî, 2011: 77).

“Quling û rûvî dostên êkdu bûn” (Fîdan, 2014: 76).

“Rûvî û torî bûn destebirayên êkdû û çûn kunekê de man” (Fîdan, 2014: 84).

“Gur û Rûvî bûne birê hev, çûne serê çiyakî dîna xwe dane hespek va serê çiyê xwera diçêre” (Celîl û Celîl, 1978: 224).

“Bilbil teyrekî çûcîk bû. Mirîşkê çû qomsitiya wî kir” (Cindî, 2005: 203).

2.5.6. Formelên Ku Bi Şêweyê “Carekê” Dest Pê Dikin

“Carekê rovî daket nav zeviyekê ku tiştêkî bixwe, rastî qumilekî hat” (Alkan, 2003: 49).

“Carekê kêvirwîşk gelek bêxîret bû û nedîya çî karan bo xo biket û her di mal ve ya nivistî bû, wê cîranek hebû ew jî mişk bû hindî te dîtba dingên ji mala wî dihat” (Hisên, 2016:28-30).

“Carekê rezvanekî gazî darkukey kir” (Salih, 2016:7-10).

“Carekê dîk û kiso bûne şîrikên hev yê cot” (Bedirxan, 2014: 22).

“Carekê qulingek û roviyek bûn dostên hev” (Bedirxan, 2014: 65).

“Carekê êleke koçera bar kir. Mihek li şûna wara ma. Mihê jî rê girt û çû, rastî mêrgekê hat; mêrgeke pir xweş” (Bedirxan, 2014: 27).

“Carekê golikek şevder ma. Du gur lê rast halin. Golik ji tirsarî rihê xwe baz da” (Bedirxan, 2014: 36).

“Carekê bizinek ji nava pêz vediqete diçe çiyê, binê zinarekî xwera dikole, holikê ava dike, xwera dike gom, têda dizê: sê kara tîne”(Cindî, 2011: 5).

“Carekê bizin diçe çolê rastî gur tê”(Cindî, 2005: 214).

“Carekê teyrek hebû hêlîna xwe di nîvê zinarekî pir bilind de çêkirî bû” (Zinar, 1989: 105).

“Carekê rovî dîtîya ku her têjikeke hirçê sê caran bi qasî yên wê dixwin” (Sadinî, 2011: 29).

“Carekê dûpişkek hatiye ber devê çemekî û xwestiye ku derbas bibe aliye din” (Sadinî, 2011: 22).

2.5.7. Formelên Ku Bi Şêweyê “Rojekê” Dest Pê Dikin

“Rojekî rovîkî fenok birçî dibe derdikeve derve li nêçîrê digere” (Diyadînî, 2011: 76).

“Rojekê gur gilyê wana dihesê” (Cindî, 2011: 5).

“Rojekê hirç, gur û rûvî hatin cem hev sekinin” (Cindî, 2005: 217).

“Rojekê bişeveqa sibê re, kesuwêk û roviyek laqê hevdu dibin, li hev silavê dikin, pirsarî hal û ehwalên hev û dinê kirin û serpîhatiyên xwe ji hev dû re gotin” (Zinar, 1989: 169).

“Rojekê ker û kûçik gihane hevdu û pirsarî hal û rewşa hev kirin” (Zinar, 1989: 267).

“Rojekê ji gundeki di pînekê de du dîk ji bo malxêtiya pînekê digrin şêr” (Öncü, 2006: 32).

“Rojekê masîvanekî tora xwe avêt golê, gelek masî pêketin” (Öncü, 2006: 30).

“Rojekê dema ga li mêrgê diçêriya pê li çend çêlikên beqan kir û pelixand” (Xamo, 2014: 31).

“Rojekê rûvî, şêr û gurî bûn destbirayê ekdu” (Fîdan, 2014: 51).

“Rojekê şêr nexweş dikeve” (Fîdan, 2014: 65).

2.5.8. Formelên Ku Bi Dema Ne Diyar Dest Pê Dikin

“Demek ji deman di rêlek da şêrek hebû” (Bozarslan, 2002a: 14).

“Demek ji deman li welatek ji welatan kêzîkek hebû” (Bozarslan, 2002a: 62).

“Demek ji deman kerekî cedewî û deveyekî piştikul hebûn” (Bozarslan, 2000a: 21).

“Demek ji deman li welatek ji welatan çivîkek hebû” (Bozarslan, 2005: 7).

“Demek ji deman li ciyekî dinê bajarek hebû. Li qeraxê wî bajarî jî kavilek hebû” (Bozarslan, 2005: 56).

“Wextekê koçer dadigerin. Boxekî jar dewsa wara dimîne” (Cindî, 2011: 8).

“Wextekê hespekî rabû berê xwe da zozana” (Cindî, 2011: 10).

“Wextekê rûvî merva bûne dijminê hev” (Cindî, 2011: 15).

2.5.9. Formelên Rîwayetî Yên Destpêkê Yên Ku Bi Şêweyê “Dibêjin” Dest Pê Dikin

“Dibêjin carekê kerek, guriyek û mîhek ji kar ketî, dikevin pişt malên koçeran û ber zozanan vê diçin” (Fîdan, 2014: 46).

“Dibêjin carekê di nav daristanê de şêr, gur, hirç, kîvroşk, xezal, rovî û gelek teyrik û tûrên din dijiyan” (Alkan, 2003: 35).

“Dibêjin demek berê de, malan ji warekê barkirin û çûn” (Fîdan, 2014: 32).

“Dibêjin zemankî bere dûpişkek hebûye, hindî li warê xwe jiyaye pir bêhdeng bûye” (Sadînî, 2011: 23).

“Dibêjin ku pîrek hebû, çû ser tenûrê da ku nan tixê, pif kire agirê tenûrê, agir pê ne ket” (Bedirxan, 2014: 60).

“Dibêjin rojek havîna germ dîkilek çû li ser dara tirî û bang da” (Fîdan, 2014: 77).

“Dibêjin rojekê nêçîrvanan cih li gurekî teng kiribûn, dikira bikuştana” (Xamo, 2014: 14).

“Dibêjin hebû tunebû, roviyekî pir kone hebû” (Xamo, 2014: 31).

“Dibêjin carekê yekî ji xwe re tûtiyekî (papaxanekî) pir xweşik kirî û bir mal” (Xamo, 2014: 171).

“Dibêjin carekê rovî ji gur re qala hêz û zalimiya însên kir” (Xamo, 2014: 179).

“Dibêjin carekê li perê gûndeki gurek rastî kerekê hat” (Xamo, 2014: 182).

“Dibêjin rojekê kûçik rabû xwe ji ber mala xwediyê xwe vedizî û bi çolan ket, çû sere çiyân û nava daristanê” (Xamo, 2014: 252).

“Dibêjin rojekê mêrikê nêçîrvan wekî her tim rabû dîsan çû nêçîrê” (Xamo, 2014: 295).

“Dibêjin malan bar kiribûn, çûbûn zozanan kerekî pişturmî bi tenê li dewsa waran mabû” (Xamo, 2014: 205).

2.5.10. Formelên Rîwayetî Yên Destpêkê Yên Ku Bi Şêweyê “Digotin” Dest Pê Dikin

“Digotin carekê zilamek hebû. Di binduruyê mala wî de li nêv kewarê quleka marekî hebû û çî qas roj, wî marî ji xwediyê malê re zêrek ji bine erdê dianîder û dîsa vedigeriya qula xwe” (Zinar, 1989: 218).

2.5.11. Formelên Rîwayetî Yên Destpêkê Yên Ku Bi Şêweyê “Gotina Gotiyê” Dest Pê Dikin

“Gotina gotiyê gelek sala berê meriv û hirç dibine biraêd hev” (Cindî, 2005: 214).

2.5.12. Formelên Ku Bi Demê Diyar Dest Pê Dikin

“Di zemanê berê de li daristanekê şêrekî wisa bi saw û tirsonek hebûye ku tu sewalên daristanê nediwêriyan xwe nêzîk bikinê” (Sadinî, 2011: 31).

“Di zemanekî de têjikekî roviyekê hebûye” (Sadinî, 2011: 39).

“Di zemanekî pir kevn de, du werdek yeke nêr yeke mê di golekê pir xweş de dijiyane” (Sadinî, 2011: 79).

2.5.13. Formelên Ku Bi Şêweyê Dersalê Dest Pê Dikin

“Di demeke gelek berê de morîstanek hebû” (Çalıştıran, 2014: 1).

“Di mêj da, berêya pîrr berê, demek ji deman, malbateka koçer hebû” (Bozarslan, 2006: 7).

“Di mêj da, berêya pîrr berê, demek ji deman, li gundek ji gundan du zarûk hebûn” (Bozarslan, 2006: 54).

“Di wext û zemanekî pir kevn de li mêrgeke noxirek ga dijiyan” (Xamo, 2014: 43).

“Zemanekî berê eylo û roviyek di deverekê de nêzîkî hev bûne” (Sadinî, 2011: 15).

2.6. FORMELÊN HILBESTÎNÊ

Formelên hilbestînê, ji aliyê gotyarî ve di meselokên lawiran de ji bo ku bala guhdaran zêde bikişîne ser çîrokê, di cihê rewşa de tê bikartîne. Ev formelên hilbestînê bi gelemperî bi dema ne diyar û biwêjên mîna: “Dît ku, dibîne ku, mêze kir/nihêrî, dema çavê wî bi.....ket, çawa dît/ çawa dibîne, nihêrî ku / dinihêre ku û nişka ve” dest pê dike.

2.6.1. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şeweyê “Rojek Ji Rojan/ Rojekê/ Şevê Ji Şevan/ Salek Ji Salan” Dêst Pê Dikin

“Rojek ji rojan pisîkek birçî bûbû û ji xwe ra li tîştêkî xwarinê degeriya” (Bozarşan, 2005: 56).

“Rojek ji rojan Kêz Xatûnê biryar da ku rabe ji ciyê kêzikan derkeve, here ji xwe ra xortekî hevtayê peyda ke û pê ra bizewice” (Bozarşan, 2002a: 64).

“Rojek ji rojan, rovî birçî bû û derket nêçîrê” (Bozarşan, 1999a: 8).

“Rojek ji rojan hirç pir birçî bûye û dilê wê çûye şîrîniyê” (Sadinî, 2011: 34).

“Rojek ji rojan, Xwedê li terzî hat xişmê û cezayê wî da” (Bozarşan, 2006: 22).

“Lê belê rojek ji rojan, di serşokê da bala jinek ket nihêrtina xizmetkara serşokê” (Bozarşan, 2006: 35).

“Ji rojan rojekê mozqirtik rabûn fort dan xwe û dest bi quretiyê kirin” (Xamo, 2014: 65).

“Rojekê şêr ji xwe re di nav daristanê de digeriye” (Berbir, 2012a: 9).

“Rojekê şêr û rovî rastî hev tîn” (Benek, 2014: 45).

“Rojekî cardî rûvî çû ref û nêçîrê” (Fîdan, 2014: 84).

“Rojekê ev meriyê te radibe diçe deştê rastî hêlîna çivîkekî te” (Celîl û Celîl, 1978: 213).

“Rojekê teyr bitenê ye û li ser hêlînê ponijdayî e. Hema lingekî xwe datîne, ew bilind dike û yê di datîne” (Zinar, 1989: 105).

“Rojekê dîsa ga ji cot vegeyriyaye, pir westiyaye; li axo mexel hatiye û diponije, difikire, bê ka wê çawa ji vî halî xelas bibe, maye heyirî” (Yıldırım, 2009c: 3-4).

“Rojekê şêr xezaleke pir qelew girtiye û aniye şîrîkên xwe” (Sadinî, 2011: 20).

“Rojekê mî dîsan diçêriya bala xwe dayê ku wa ye gurek ji hember de tê” (Xamo,2014: 12).

“Rojekê barê kerê ji yê her tim gelekî girantir bû” (Xamo, 2014: 55).

“Rojekê mihê dît ku gurek bi ber wê ve tê” (Berbir, 2013d: 7).

“Demek wisa derbas bû, şevê ji şevan dilê roviyê bijiya goştê qeliyê” (Bozarslan, 2000a: 13).

“Şewek ji şevan, dîsa herdu jî birçî bûn û qure qure ji zikê wan dihat” (Bozarslan, 2000a: 21).

“Salek ji salan, malbat dîsa payizê ji zozanan dizivirî û ber bi beriye diçû” (Bozarslan, 2006: 9).

2.6.2. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şeweyê “Carekê ji caran/ Carekê” Dêst Pê Dikin

“Carekê ji caran (rovî) ji xwe re derket seyranê” (Alkan, 2003: 23).

“Carekê nêçîrvanek da pey rûvî, xwest rûvî bigre” (Celîl û Celîl, 1978: 204).

2.6.3. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şeweyê “Dît Ku” Dêst Pê Dikin

“Dema ku nêzîkî malê bû, dît ku pismamê wî ber pê tê” (Berbir, 2012c: 5).

“Wexta bi xwe hesiya, dît ku di deve roviyekî de ye” (Diyadîni, 2011: 75).

“Dîtin ku wa şêr di dehlê de, xwe li erdê vezelandiye û ji kêfa wî re payan nîne” (Çalıştiran, 2014: 7).

“Sitî li paş xwe fitilî dît ku kes tûne, xwe bi xwe got: Ew çi deng bû?” (Zinar, 2013b: 25).

“Bibilê Sorgevez, gava dît ku ew ber bi me ve tê, bilez firî û ji ber çavan wenda bû” (Elban, 2016: 8).

“Gelek tev geriyan, dema ku bû êvar, dîtin ku li daristanê ne” (Öncü, 2006: 39).

“Dema rovî çû ku sond bixwe, dît ku wa ye çavên kûçik di bin giya û pûş û pelaş de diçirisin” (Xamo, 2014: 13).

“Lê belê dît ku çi deng ji birayê wê nayê” (Bozarslan, 2006: 66).

“Dîkil jî serê xwe nifs kir, dît ku ew ê vê gotinê ji wî re diki rûvî ye” (Fîdan, 2014: 84).

“Hetanî ku şêr hat û li derxistina mejiyê kerê xebitî, dît ku mejî tune” (Berbir, 2013b: 15).

2.6.4. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dibîne Ku” Dêst Pê Dikin

“Dibîne ku qijikek kerîk (serîk) penêr di devê wî de ye, li ser darekî sekiniyê” (Diyadînî, 2011: 76).

“Dibîne ku rovî ber bi wî vê tê” (Berbir, 2012a: 9).

“Dibîne ku li ser çiqilê darekê çûka Reşîlê hêlîna xwe çêkiriye û hêk kiriye” (Fîdan, 2014: 27)

2.6.5. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Mêze Kir” Dêst Pê Dikin

“Ker mêze kir ku hatin êdî tewş e ker jî ji wan xeyîdî, ji mal derket û berê xwe da rêya çolê” (Amedî, 2012: 41).

“Mêze kir ku keweke wek wî, li baxçe êm dixwe” (Öğütçü, 2014b: 16).

“Kewê hew mêze kir ku wa ye di devê rovî de ye” (Xamo, 2014: 49).

2.6.6. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Niherî Ku / Dinihêre Ku” Dêst Pê Dikin

“Lê nihêrî ku kotirkek di şikeftê de ye” (Dilsoz, 2014: 4).

“Xwediyê malê hatin ku wî bibin cot, nihêrîn ga ji dest xwe çûye, êm nexwariye” (Yıldırım, 2009c: 7).

“Rûniştin ku bêhna xwe berdî, nihêrîn şêrek ji wir ve tê” (Yıldırım, 2009b: 6).

“Rovî dinihêre ku wê ji birçîna bikeve, nêçîr jî ji wî nayê ku here nêçîrê, tiştêkî bîne” (Berbir, 2013b: 4).

“Heta vedigeriya, dihat dinihêrî ku şîr tûneye” (Berbir, 2013a: 3).

2.6.7. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Bala Xwe Daye / Dîna Xwe Daneye” Dêst Pê Dikin

“Şêr bala xwe didê ku Apê Rovî digirî” (Berbir, 2012a: 11).

“Bala xwe daye ku bi rastî jî taqet di kerê de nemaye” (Xamo, 2014: 56).

“Dîna xwe dane kerî pez hat derbas bû” (Cindî, 2005: 217).

2.6.8. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Çawa Dît/ Çawa Dibîne ” Dêst Pê Dikin

“Aşvan jî çawa hirçê dibîne digire û “çi dixwî, nan û mast” gotiye û hestiyên wê nerm kiriye” (Sadîni, 2011: 27).

“Şêr çawa dîtiye ku rovî goşt hemî daye wî ji bo xwe tu goşt nehilgirtiye, ranek avêtiye ber” (Sadinî, 2011: 21).

“Rovî çawa dîtiye ku şêr bi wî ve eleqedar e, bi zimanekî nerm gotiye” (Sadinî, 2011: 31).

2.6.9. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dît Ku Çî Bibîne!” Dêst Pê Dikin

“Pîrê ber bi sindoqê çû, da ku devê wê veke û gustîla efsûnkirî jê derxê. Lê belê çawa çavê wê bi sindoqê ket dît ku çî bibîne!” (Bozarşan, 2005: 39).

“Hingê dît ku çî bibîne! Bala xwe dayê ku şêr û hirç û gur berî wî hatine şikeftê” (Bozarşan, 2000a: 52).

“Dema çivîk ji nêçîrê vegeriya hêlîna xwe dît ku çî bibîne! Bala xwe daye ku çêlên wê gişt berçiqîne, bûne mîna arderûnê û manê” (Bozarşan, 2005: 7).

2.6.10. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Dema Çavê Wî Bi....Ket” Dêst Pê Dikin

“Dema çavê wê bi gurek ket, bû kulpîna dilê wê” (Bozarşan, 2000a: 69).

“Dema rovî ji avê derket û çavê wî bi wê sopê û bi wan toran ket, bi qasê dinyayek kêfa wî hat” (Bozarşan, 2000a: 36).

“Dema çavê qijikê ji dûr ve bi kevokê ket, kêfa wê pirr pirr hat” (Bozarşan, 2002a: 8).

“Çawa çavê wê bi dinê ket, dît ku dinê pirr xweş û şîrîn û dilkêş e” (Bozarşan, 2002a: 7).

“Ku çavê wî bi wî şêrê di bîrê da ket, hema ji hêrsan ricifî, heta ku hêza wî hebû devê xwe vekir, didanên xwe yên tûj û dirêj gişt nîşan dan” (Bozarşan, 2002a: 20).

“Dema çavê wê jinikê bi Kêzika Kezîzer ket û bala wê ket şûna wê yên jêkirî, meraq kir ku Kêzika Kezîzer çima keziyên xwe wisa jêkirine” (Bozarşan, 2002a: 49).

2.6.11. Formelên Hilbestînê Yên Ku Bi Şêweyê “Nişka Ve” Dêst Pê Dikin

“Çawa ku ker gihate nêzîkî şêr, şêr jî nişkê ve xwe avête ser kerê” (Alkan, 2003: 34).

“Di wê keftelefa revê de ji nişka ve rastî cotkarekî hat” (Xamo, 2014: 15).

“Ji nişka ve çavên wî bi teyrê dikeve, lê dinêre û temaşe dike” (Zinar, 1989: 105).

“Ji nişka ve me dît ku mirovek hêdî hêdî li dora me digere” (Elban, 2016: 8).

“Ji nişka ve hinareka mezin got gurm û ji darê de ket erdê” (Xamo, 2014: 33).

“Tam di wê gavê da pisîk ji nişka vê hilfiriya, xwe avêt ser wan û ew kirin binê zikê we” (Bozarslan, 2005: 70).

“Qijika me dema ji xwe re wisa bi kêfa dilê xwe digeriya, li ciyekî ji nişka ve rastî kevokê hat” (Bozarslan, 2002a: 8).

“Paşê hêdî hêdî çû ber kewê û ji nişka ve devê xwe avêt binê qirika wê û ew girt” (Bozarslan, 1999a: 18).

“Lê ji nişka ve ferq kiriye ku ew çî dîke hirç jî wî teqlîd dîke” (Sadinî, 2011: 98).

2.7. FORMELÊN TÊPERÎ/NAVBERIYÊ

Çîrokvan bi xwesteka kurt kirina rê û demê û bi mebesta manendî van formelan bikartîne.

2.7.1. Formelên Derbasker Yên Ku Bi Zûgotinokî Dest Pê Dikin

Ev formelê derbasker ji bo kurt kirina rê û demê tên bikaranîn:

“Pir geriya hindik geriya, rastî çîniyeke goştê ku di darê de hatibû daliqandin hat” (Benek, 2014: 25).

“Pir û hindik diçin, tîndiyarê gundekî din” (Öncü, 2006: 64).

“Pirr çû hindik çû, li ser riya xwe giha perê gundek” (Bozarslan, 2000a: 69).

“Pir çûn hindik çûn, di navsera çiyayek da riya wan rastê geliyek haaat” (Bozarslan, 2000a: 31).

“Pir çû hindik çû, rastî nêçîrvanan hat” (Xamo, 2014: 15).

“Pir geriya, hindik geriya dawî dawî rastî rezekî hat” (Xamo, 2014: 48).

“Pirr geriyan, hindik geriyan li wan bû êvar” (Bozarslan, 1999a: 49).

“Pirr çû hindik çû, li ciyek rastê şivanek hat” (Bozarslan, 2002a: 65).

“Dem derbas dibe, zivistan diqede. Bihar xwe bi kulîlkan dexemilîne û havîn tê” (Berbir, 2012b: 2).

“Geh li vî alî meşîya, geh li wî alî firiya û ji kêfa dilê xwe ra geriyaaaa” (Bozarslan, 2002a: 7).

“Li vî alî geriya, li wî alî zivirî, tiştêkî nêçîrkirinê nedît” (Bozarslan, 1999a: 21).

“Ha li vê neqebê û ha li wê newalê, herdu çûn gihîştin ber wî tehtî” (Zinar, 2013b: 10).

“Ha ji vir ha ji wir, beran dibîne ku mizgeftê li wir e, ber bi mizgeftê ve direve” (Öncü, 2006: 35).

“Dem şev bû, şeverêş bû, dinya tarî bû, ha li vir ha li wir, çûn gihîştin ber wî tehtî” (Zinar, 2013b: 17).

“Rovî ha li vir û ha li wir geriya û çû nêzîkî gûndeki, dît ku wa ye kerek li kêleka gund diçêre” (Berbir, 2013b: 7).

“Vir de çûye, wir de çûye, dawiyê aqil kiriye ku sewaleke avî arîkariyê bixwaze” (Sadinî, 2011: 23).

“Roj li pey rojan çûn, şev li pey şevan herikîn û derbas bûn” (Bozarslan, 2000a: 55).

“Roj û şevan hev dajotin û diçûn, lê derê şikeftê hêj jî girtî bû” (Bozarslan, 2000a: 57).

“Roj li pey rojan çûn, hefte li pey hefteyên buhurîn û meh li pey mehan derbas bûn” (Bozarslan, 2006: 34).

“Bi wî awayî saledem û sal sal li pey hev hatin û derbas bûn çûn. Salek ji salan dîsa zivistan hat û berfê bêrê derî jî xelkê girt. Qeşa jî ket erde û erd cemidand” (Bozarslan, 2006: 44).

“Bi wî awayî roj û şevên wan li pey hev derbas dibûn” (Bozarslan, 2006: 58).

“Roj û şev li pey hev wek avê herikîn û çûn, hefte û meh jî li pey hev hatin û derbas bû. Bi derbasbûna wan ra havîn qediya, payiz hat, payiz jî çû, zivistan jî bi serma û berfa xwe ve derbas bû çû, veca buhar haaaaat” (Bozarslan, 2002a: 44).

“Rovî ha li vir ha li wir geriya çû nêzîkî gûndeki, dît ku vaye kerek li kêleka gund diçêre” (Alkan, 2003: 33).

“Rojekê serê sibe bi rê ket. Gelek rê çû. Deşt û zozanan derbas kir û gihîşt ser çiyayekî gelek bilind” (Ögütçü, 2014b: 6).

“Dan dû hev û meşiyên, çûn çûn çûn rastî dûpişkekê hatin” (Yıldırım, 2009a: 9).

“Dan dû hev û meşiyên, çûn çûn çûn rastî tepika rêxê hatin” (Yıldırım, 2009a: 11).

“Meşiya meşiya rastî gûnderekî hat” (Yıldırım, 2009a: 5).

“Fîl bi wê hêviyê bil ez û bez çû çûûû, heta ku gihîşt qeraxê kendêêêl” (Bozarslan, 20012).

“Geriya geriya, tiştêk bi destan nexist” (Bozarslan, 1999a: 8).

“Herdu çûn çûn, heta ku gîhîştin ber girekî bilind” (Bozarslan, 1999a: 17).

“Li ser vê daxwaza leglegê reşole xatirê xwe ji wê xwestiye û bere xwe daye oxirê, pişta xwe daye felekê û hatiye Kurdistanê” (Sadinî, 2011: 100).

“Vî zelumî pezê xwe da pêşiya xwe berê xwe da oxirê, pişta xwe da felekê ber zozanan veçû” (Fîdan, 2014: 27).

2.7.2. Hin Diyalog Jî Mîna Formelên Têperî Tên Bikaranîn

“Devê vêca dest bi lavan kir û got: Birakê ker, ez ji te tika dikim tu nezirî, ez di bextê te da me tu nezirî. Malxirab, ma nayê bîra te ku em di çî halî da bûn! Eger tu dînîtî bikî û bizirî, hingê yan xwediyê me yan jî hin kesên dî dê bi me bihisin û bèn me ji vir bibin, dîsa têxin binê bar û bi çovan li qorikên me xin.

Kerê got: Raste rast. Lê ez ker im; dema zira min bê, divê ez bizirim. Ez bê zir nikarim bitebitim. Eger ez nezirim ez’ê dîn bibim.” (Bozarslan, 2000a: 26).

“Çivîk ketibû tirs û lerzeka wisa ku, dilê wê yê biçûk digot: “kulp kulp kulp” û diperpitî. Paşê dilê xwe qayim kir, bi çavên lavakar li nêçîrvên nihêrt û deng lê kir. je ra got:

— Lo lo nêçîrvanê dilovan, te çima weha anî serê min û ez xistîm davika xwe?

Nêçîrvên kenîya û got:

— Lê lê Çivîka reben, tu şaşî ku tu ji min ra dibêjî dilovan. Tu dibînî ku ez nêçîrvan im. Nêçîrvan ne dîlovan in, çu car jî nabin dilovan. Dîlê nêçîrvanan req e û divê ku req be. Kesê ku dilê wî req nebe, nikare nêçîrvanî bike” (Bozarslan, 2005: 25).

“Rovî ji wê yekê tirs û pirsî, got: Erê tu çî dikî, birakê mar?

Mar bersîv da û got: Ez dikim te gez bikim, birakê rovî.

Rovî ji wê peyva mar hem şaş bû, hem jî tirs û wî zêde bû. Bi wê şaşbûne û tîrsê pirsî, got: Çawa tu bêbextiyeka wisa bi min ra dikî! Nê qaşo em bûbûn destebirak, ma te ji bîr kir!

Mar got: Na, min ji bîr nekiriye. Lê tu ji bîr dikî ku ez mar im. Erê ez bûm destebirakê te. Lê digel wê yekê jî ez marek ji maran im. Xwiyê min ê marîtiyê ew e ku ez kesên dî gez bikim” (Bozarslan, 1999a: 57).

2.7.3. Formelên Derbasker Di Rewşên Dirûznêz De

Di van formelan de bi sen’eta teşbih û îstîfeyê rindbûna keç û jinan dişibînin heyva çardehî, roja asîmên, horiya bihiştê û hwd. Ev formel di çîrokan de bi vî awayî tên bikaranîn:

“Kesên ku ew didîtin, digotin qey du qulatên zêr in” (Bozarslan, 1999a: 61).

“Bi qasê ku mirov çavê xwe bigire û veke ji ber çavan winda bû û çû hey çûûû” (Bozarslan, 2002a: 36).

2.8. FORMELÊN DAWÎ

Piştî ku çîrok bi dawî dibe çîrokbêj li gorî hiş û ramana xwe bi zûgotineke şîrîn çîrokê dawî dike. Mînakên formelên dawî bi vî awayî ne:

2.8.1. Formelên Dawî Yên Bi Şêweyê Zûgotinokî

“Çîroka me çû nav deviyar, rehmet li dê û bavê me hemûyan” (Berbir, 2012b: 16).

“Çîroka me çû diyaran, rehme li dê û bavên guhdaran” (Öncü, 2006: 97).

“Çîroka me li di diyaran, rehme li dê û bavê guhdaran” (Berbir, 2013c: 16).

“Çîroka me li diyaran, rehmet li dê û bavê me we guhdaran” (Berbir, 2012c: 16).

“Çîroka me ya deştî, anî nanê genimî, me her yekî pariyek jê xwar, ji bilî pîs û nezanê vî welatî” (Berbir, 2013d: 16).

“Çîroka min jî çû nava dar û deviyar. Xêr û xweşî bibarin li mirî û zindiyan” (Zinar, 2013b: 64).

“Çîroka min li diyaran, rehmet li dê û bavê guhdaran, ji bilî fesadên ber diwaran” (Berbir, 2013e: 16).

“Mamê Rovî jî hewayê ket û mîr/ Legleg Xatûnê fira xwe kir/ Çîroka me jî bi xwe re bir” (Alkan, 2003: 13).

“Çîroka me çû deştê dê û bavên me çûn bihuştê” (Bedirxan, 2014: 27).

“Çîroka me çû diyara/ Nava dara û beyara/ Rehmet li dê û bavê guhdaran/ Ji xeynî pîs û neyaran” (Alkan, 2003: 70).

“Tajiyê tol xwe naskir/ Kîvroşka me xwe xelas kir/ Çîroka me xelas kir” (Alkan, 2003: 75).

“Rovî jî piştî ku leglegê dixwe bere xwe dide gelaciyan. Çîroka me diçe bi pey gelaciyên rovî dikeve” (Alkan, 2003: 54).

“Çîroka me qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya” (<http://wp.zimanekurdi.ch>, 07.10.2016).

2.8.2. Formelên Dawî Yên Xwerû/ Sade

“Şev çû nivê şevê û dinya li ser wan bû sayî. Ava golê bi dûvên wan cemedi û qeşa girt. Çaxê ko bû sibe şivan û gavan bi ser wan de hatin. Hem ji tirsê rihê xwe, roviya xwe li wê qeşayê da. Dûvên temama di nivî re qut bûn” (Bedirxan, 2014: 36).

“Hevaltiya rovî û Reşo ji vê bûyerê şûnda diqede û rovî dide rêya xwe, Reşo jî tê mala xwe. Hevaltiya wan jî ev bû” (Amedî, 2012:54).

“Herdu bi hev re ji teyrê nêçîrvan re dibin xwarinek baş” (Öncü, 2006: 36).

“Ji wî bûyerê bi şunda ev çûka Keko Peko li çiyay, li çolan û li ser daran dibêje û dixwîne” (Amedî, 2012: 30).

“Ji wê rojê virde, şer bi sîûsitarê morîstanê neket” (Çalıştıran, 2014: 23).

“Ji wê rojê pê ve Zelala delal her roj qût û av da bilbil û bi dû re jî ava guldankê guhert” (Elban, 2016: 18).

“Lê ji wê rojê û vir de ye kûsiyekî din tu carî hewil nedaye ku bifire” (Xamo, 2014: 101).

“ Nêçîrvan jî ji wê rojê û şûn de dîk, mirîşk û kew hînî xwe kirin. Û loma jî ev hersê heywan man li ba însanan û kedî bûn” (Xamo, 2014: 25).

“Û bi vî awayî mî jî ji bela gur û deynê bavê xwe xelas bû” (Xamo, 2014: 14).

“Û ji wê rojê gur êdî bawarya xwe kesî nanî. Çi rast tê davêje ser, wekî bixwe” (Cindî, 2011: 9).

“Û ji wê rojê şûnda hirç û merî dûrî hev dikevin” (Cindî, 2005: 215).

“A ji wê rojê rûvî, gur, hirç bûne heywanê beyanî, lê kûçik ma cem mêriv” (Cindî, 2011: 25).

2.8.3. Formelên Dawî Yên Bi Şêweyê Kurt

“Aha meymûn bi wî awayî hat afirandin û ket dinêêêê. Semedê ku meymûn tim û tim qeşmerî dike û mirov jî tim tim pê dikenin ew e ku jinên serşokê da li mêrik wisa nifir kiribûn û Xwedê nifiran wan qebûl kiribûûûû” (Bozarlan, 2006: 37).

“Aha kûsî bi wî awayî hat afirandin û ket rûyê dinêêêê. Edî heta ju dine hebe, ew dê wisa di navbera wan herdu qalîkan da be, di wî ciyê teng û tal da bijî û wisa di erde da kaş kaş bibe, bigevize û wî eziyetî, wê azarê bikişînêêêê” (Bozarlan, 2006: 29).

“Aha pepûk bi wî awayî hat afirandin û ket rûye dinêêêê. Ji ber ku tim û tim derdê birayê wê tê bîra wê û bi wî derdî xemgîn dibe û dilê wê dişewite, tim û tim diqîre û dibêje: Kekûûûû pepûûûûk! Kekûûûû, pepûûûûk! Kekûûûû, pepûûûûk! Kekûûûû, pepûûûûk! “ (Bozarlan, 2006: 67).

“Bi wî awayî hirça reben kuştin. Paşê termê wê kişandin birin şikeftê û ketin ser wê, bi kêfa dile xwe xwariiiiin” (Bozarlan, 2000a: 20).

“Bi vî awayî ji hev vebûne û her yek bi rêya xwe ve çûye” (Sadinî, 2011: 24).

“Bi vî awayî ji rovî tola xwe stendiye û dilê xwe rehet kiriye” (Sadinî, 2011: 17).

2.8.4. Formelên Dawî Yên Bi Şêweyê Rîwayetiyê

“A dibêjin ji wê rojê û vir de ye hirç wer qole û qol ma û tu carî jî dêla wê dirêj nabû” (Xamo, 2014: 152).

“A dibêjin ji wê rojê û vir de ye keftar ji keran pir ditirsin û newêrin xwe nêzî wan bikin” (Xamo, 2014: 20).

“Dibêjin ji wê rojê û vir de ye ku mozqirtik hew diwêrin pesnên xwe bidin û li pêtagên mêşên hingiv xwedî derkevin” (Xamo, 2014: 66).

2.8.5. Formelên Dawiyê Yên Ku Ji Nişka Ve Xelas Dibin

“Me çîroka xwe got, ji vê çîrokê jî aqil girtin bara we ye” (Fîdan, 2014: 86).

“Rovî zîvirî mala xwe, nêçîrvan bi dû nêçîreke din ket, em jî hatin...” (Sadinî, 2014: 110).

2.8.6. Formelên Dawiyê Yên Ku Bi Bextewarî Bi Dawî Dibin

“Di nav çend rojan de qertel baş bû. Xezala Çavreş û Qertel li Çiyayê Sîpanê bi hev re din av bextewariyê de jiyana xwe domandin” (Öğütçü, 2014a: 25).

“Xweyiyê gayan gava zîviriye, çi bibîne... Zaniye ka çi hatiye serê wî. Lê mixabin ga êdî ji dest çûye... Gur jî heyamekê kêf kiriye...” (Sadinî, 2014: 53).

“Li esman dîsa kêf û şahiya kotiran bûye...” (Sadinî, 2014: 69).

“Û ew peritandiye. Çend rojan wî û wawik û roviyên hawirdorê kêf kirine” (Sadinî, 2014: 91).

2.9. FORMELÊN CIHAN

Formelên cihan di çîrokên meselokên lawiran de di beşa destpêk, navber û dawiyê de tên bikaranîn. Formelên cihan ên hatine tesbît kirin ev in:

“Deve ketin rê û çûn. Gihane ber çemê Cizîra Botan, dîtin ku rûviyek jî ketiye pê wan û bi wan re tê” (Fîdan, 2014: 20).

“Dibêjine xelkê Botanê ji berê de barên xwe bê cil û bê ben deveyan dikir” (Fîdan, 2014: 20).

“Ji kevin de dibêjine li herêma Botan zivistanek kê m berf derbas bû” (Fîdan, 2014: 27).

“Rovî û kosî li çiyayekî wekî çiyayên Omeriyan gihîştin hevdu” (Alkan, 2003: 29).

“Li ser Çiyayê Sîpanê, xezalak û qertelek cîrantiya hev dikirin” (Öğüt, 2014a: 1).

“Li deşta Mûşê, du kewên gozel di nav gul û kulîlkan de ji xwe re hêlîneke rind çêkiribûn” (Öğüt, 2014b: 2).

“Îjar berf hate ser çiyayê Begokê” (Celîl û Celîl, 1978: 210).

2.10. FORMELÊN HEJMARAN

Formelên hejmaran mîna hejmarên sê, heft û çilî di çand û baweriya Kurdan de pir tîn bikaranîn. Ev bikaranîn ne bêwate ne. Her formela hejmaran, di nav xwe de wateyên simbolîk vedişêre. Jixwe ev hejmar di her warê çand û zimanê Kurdî de tîn dîtin. Bikaranîna formelên hejmaran ji xeynî çand û zimanê Kurdî di nava gelek çand, şaristanî, bîr û baweriyên de hevpar in. Ev hevparî jî di nav mirovatîyê de binbîra hevparîyê nîşan dide. Ku ev hevparî di nava hêmanên mîtolojîk û di nava bîr û baweriyên de hatine hecinandin.

“Wek tîn dîtin ku hejmara sê, heft û çilî di gelek pirtûkên olên pîroz, ekolên felsefî û tesewûfî de wateyên simbolîk hildigirin. Îro her çî qas ew hejmar di çîrokên de bîn bikaranîn jî sedema ku ji nîfşekê derbasî nîfşên dî bûne wateyên wan ên simbolîk ên pêşî hatine jibîrkirin. Hê jî ev hejmar bi meqsedêke simbolîk tîn bikaranîn (Bilkan, 2001: 60).⁸

Ji vê hevparîyê formelên hejmaran, hejmarên sê, heft û çilî di nava çîrokên Kurmancî/ Kurdî gelek caran derdikevin pêşîya me, ku her hejmarek di nav xwe de wateyên mecazî dihewîne. Niha ev hejmarên ku di nav çîrokên derbas dibin bi vî awayî dorê karin bêne rave kirin:

2.10.1. Formela Hejmara Sisêyan

Di çîrokên de hejmara sisêyan, nîşana merhele (gihanek), siûd, asteng, şert û ezmûnê ye. Di olên pîroz mîna Îslam û Îsayî de jî hejmara sisêyan bi hin awayên cihêreng tîne bikaranîn. Di ola Îslamê de ev formel bi vî awayî diyar dibin: Têlaqê

⁸ Di şîroveya batîni ya gelek olan de, hewla biservebûna şîfreyên kaînatê ya bi riya pêwendîya tîp û hejmaran (ku pirtûkên pîroz bi wan hatine nivîsîn) heye. Îlmên wek kabala, geometrî, ebced û cîfir mînakên herî zelal in ji bo vê hewlê (Yücel, 2013: 18). Her wiha gelek vegotinên ku bi hêmanên mîtolojîk û baweriyên olî vejiyane di çîrokên de bi awayekî cuda tîn vegotin an nivîsîn

selase (sê telaq), sê mehên pîroz (Receb, Şaban, Remezan), di tesewûfe de jî ji bo gihandina murîdan sê gihanekên bi navê terîqet, heqîqet û merîfet hene. Di ola Îsayîtiyê de baweriya teslîsê (bav, kur, rûhê pîroz) heye. Ev mînak di de diyar kirin ku hejmara sisêyan di olên pîroz de jî cihekî balkêş digire.

Wek me di serî de jî diyar kiribû hejmara sisêyan di çîrokan de ji bo gihanek, siûd, asteng, şert û ezmûnê hatine bikaranîn. Di çîrokan de ev formelên hejmara sisêyan bi vî awayî hatiye bikaranîn:

Dî çîrokên meselokên lawiran de kêf, şahî û tengasî jî sê roj û sê şevan berdevam dike:

“Sê roj û sê şev bi govend û dîlan, bi kêf û şayî, bi stran û tilîlî rizgariya xwe ji wî şêrê zalim û zordest pîroz kirin. Di wê dema pîrozkirinê da hemî pêk ve gelek caran qiriyên û gotin: Bijî azadîmî, bijî rizgarîmî, bijî birakê rovîmî” (Bozarslan, 2002a: 24).

“Bi wî awayî mişkan pisîk kuşt û li erdê dirrrrêj kir. Paşê termê pisîkê li wir hîştin û zivirîn çûn kavila xwe. Li wir sê roj û sê şev kêf û şayî kirin, heng û şênayî çêkirin û govend girtin, azadiya xwe û rizgariya xwe ji pisîkê pîroz kiriiiiin” (Bozarslan, 2005: 75).

“Roviyê jar got: Roş baş birako. Bi Xwedê ji rûyê birçîtiyê weha hatiye serê min. Ev bû sê roj û sê şev ku çênîyek jî goşt bi devê min nebûye” (Bozarslan, 2005: 19).

Lehengên çîrokê ji bo bigihîjin armanca xwe pêwîste ku sê şertan bi cih bînin, yan jî sê xwestekên xwe tînin ziman:

“Min bi sê tiştan ev mîrîtî û mezinatî bi destê xwe xist û ez bûm mîrê vî rêlî, min lawirên vî rêlî jî ji xwe ra bindest kirin” (Bozarslan, 1999a: 90).

“Şêr ji wan re got: Ez ji mor kirina peymana aşîtiyê re hazir û nazir im. Xwestinên min jî ji we ev in. Heger hûn rojê sê caran xwarinên ji goşt ji min re bînin ez ê jî êrîşên xwe bisekinînim” (Alkan, 2003: 35).

“Çivîkê li gora deka xwe, vêca jê ra got: Binêre, ku tu min serjê kî, du sê pirûş goştê ku bi hestiyên min ên biçûk ve heye, tu'yê bavêjî devê xwe û dê biqede here. Lê belê eger tu min beradî, ez'ê sê şîretên wisa girîng li te bikim ku, heta tu li vê dinê sax bî dê ji te ra lazim bibin û tu'yê jî wan mefadar bibî” (Bozarslan, 2005: 26).

Bûyer di çîrokên meselokên lawiran de piranî di navbera sê lehengan de diqewime:

“Şêr, rovî û gur bûne, şîrîkê hev, bi şîrîkatî bi hev re çûne nêçîrê” (öncü, 2006: 49).

“Rovî û jina xwe dan dû şêr û meşîyan” (Yıldırım, 2009b: 9).

“Dibêjin carekê kerek, guriyek û mihek ji kar ketî, dikevin pişt malên koçeran û ber zozan ve diçin” (Fîdan, 2014: 39).

“Rojekê rûvî, şêr û gurî bûn destebirayê êkdu. Ji xwe re çûn ref û nêçîrê” (Fîdan, 2014: 51).

“Hebû ker, rovî û bet. Her sêya di nava hev û din de şikarte danîn” (Sewîm, 2016: 91-93).

Dî çîrokên meselkoên lawiran de lehengên çîrokê ji bo ku aloziyan di navbera xwe çareser bikin diçin cem sê kesan:

“Gur û cotkar ji bo pîrsgirêkên nav xwe çareser bikin çareser bikin biryar didin ku herin cem sê kesên ku naqokiya wan çareser bikin (Xamo, 2014: 16).

2.10.2. Formela Hejmara Heftan

Di nav formelên hejmaran de formeleke balkêş bêguman formela hejmara heftan e ku ev formel di nav gelek çand û şaristaniyan de wek hejmareke efsûnî tê dîtin. Nexasim di pirtûkên pîroz ên mîna Qur'an û Tewratê de hejmara heftan wateya yekparî, demdiyarî û astengê dihewîne ku ev hejmar di ayetên Qur'anê de bi wateyên cuda bi vî awayî hatiye dubare kirin: “Heft tebeqe asîman, heft simbîl, heft çêlekên çîqal/qels, heft çêlekên qelew, heft sal, heft salên xelayê, heft derî, heft kes, heft rê, heft behr, heft şev”. Ev hejmar ji xeynî Misilmanan li gorî baweriya Cihûyan jî wek hejmareke pîroz tê dîtin. Ji ber ku li gorî baweriya wan ev hejmar dema afirandina cîhanê bi bîr dixê. Ji xeynî vê baweriya Cihûyan, di Tewratê de mîna Qur'anê ji bo rewşên cur bi cur hejmara heftan hatiye bikaranîn. Ev biwêja hejmara heftan, di Tewratê de mîna ku Yücel (2011:19-20), di xebata xwe de daye nîşandan bi vî awayî cî digire: Heft tol, heft car, heft cot ajal/heywan, heft cot teyr, heft roj, heft berxên mê, heft sal, heft simbîl, heft çêlekên çîqal/qels, heft çêlekên qelew, heft salên zêdeyî, heft salên xelayê, heft qendîl û hwd.

Ev formel di hin rîtûelên îbadetên Îslamê de cihekî balkêş digire ku namzedên hecîtiyê, Kabê heft caran tewaf dikin, di navbeyna girê Safa û Merwe'yê de heft caran diçin û tên. Şeytan, heft caran tê kevirkirin. Li gorî Mezhebê Şaftiyê, nimêja îdê/cejnê rikata yekemîn, bi heft tekbîran dest pê dike û her wekî dî di rîtûelên manend de hejmara heftan tê bikaranîn.

Di çîrokên Kurmancî de formela hejmara heftan, bi bandora bîr û baweriyên olî û mîtolojîk di çîrokan de bi awayekî cihêreng xuya dike ku ev hejmar di çîrokan de bi peywira astengî, poşmanî û tengasiyê tê bikaranîn:

“Temam mîrê min, te zora min bir. Ez’ê heft salan xulamiya te bikim” Bi vî awayî gur heft sal xulamiya Mîr Zoro, qebûl dike (Bozarslan, 1999a: 74).

“Rovî bi kirina duan re, lepên xwe avête dîwarê koncalê, hilpêrikî, bi zor û heft belayî ji çalê derket” (Alkan, 2003: 68).

“Ew mişkê ku ji pisîkê xilas bû, reva rev reviya û çû. Dema giha kaviê, xebera bêbextiya pisîkê û nêçîr kirina hevalên xwe da mişkan. Li ser wê xeberê, mişkan dest bi şînê û qîrînê kir. Di mişkistanê da bû qirin û qîrîneka wisa ku, deng diçû asimanê heftaaan” (Bozarslan, 2005: 70).

“Lê belê ew zilamê tenefiroş bi qasê ku dewlemend bû, heft ew qas jî bêwijdan û kêmfersend bû” (Bozarslan, 2006: 24).

“Lê belê ew axa bi qasê ku dewlemend bû, heft ew qas jî nekes û nemirov bû” (Bozarslan, 2006: 39).

Carinan jî ev formela hejmara heftan, ji bo dema şînê tê emilandin:

“Mirina Mîr Mûrî dilê hemî mûriyên Mûristanê xist derd û xem û kedereka pîrr mezin. Li her derê mûristanê ji Mîr Mûrî ra hefteyek şîn danîn, rêş girêdan û şîn kirin. Piştî heft rojan ku şîn qediya” (Bozarslan, 2002a: 46).

Formela hejmara heftan di çîrokan de carinan mîna sembola têkeriyê tê bikaranîn:

“Îskender qeherî û got: Çawa ez jî yê te me? Mûriyê reben, dema ez sê mehan li ser te bikim şilî û şepelî û baran, tu yê di qulika xwe da jî birçîna bimirî.

Mûrî dîsan kenîya û got: Rebenê Xwedê, ez dikarim bi libek genim heft salan debara xwe bikim û qet li qulika xwe jî dernekevim. Tu yê çawa bikaribî min ji birçîna bikujî?” (Xamo, 2014: 38).

“Şêr qasek goşt xwar, rovî hat bira’y. Deng lê kir û got: Rovî, de were lawo were, heta ji te re lazim e goşt bixwe. Ev goşt têra te û heft roviyên mina te dike” (Bozarslan, 2005: 18).

“Rûvî got: Mîrê min, ez heft memleketan geriyam ji bona dermanê te. Min paşiyê, ji te re dermanek baş dît û niha ew derman li dîwana te de rûniştuye” (Fîdan, 2014: 66).

Formela hejmara heftan di çîrokan de carinan jî wek sembola asta kêfxweşî û şadiyê tê bikaranîn:

“Kêfa kerê jî ya devê pirtir hat. Ji devê ra got: Wey mala te û heft bavên te ava be, Birakê deve. Ez jî bi xêra te û saya te xilas bûm. Eger ne bi alîkariya te û rêbiriya te bûya, min çu car nedîkarî ez bi vê kerîtiya xwe birevim û bêm bigîjim van deran” (Bozarslan, 2000a: 24).

“Çûk rahişte bilûrê û çû serê latekê sekini û go: “Çiri, wirt, min stirik da bi heft nan, û qurseki da bi heft beran û berxeki, û min heft beran û berxek da bi bûkekê, û min bûk da bi bilûrekê û lait ez li ser latekê û kes nîne serê min hûr kê” (Bedirxan, 2014: 60).

2.10.3. Formela Hejmara Çilî

Hejmara çilî di nava gelek çand, şaristanî, bîr û baweriyên de gelek wateyên mecazî hilgirtine. Ev hejmar bi taybetî di nav edebiyata rojhilat û rojava de û di nav pirtûkên olên pîroz mîna Îslamiyet, Cihûtî û Filahiyan de wek hejmareke sembolîk tê dîtin. Hejmara çilî, di van pirtûkên pîroz mîna Qur'anê de bi wateya sebr, çîle, demdiyarî û kemilînê hatiye diyar kirin. Ji ber vê sedemê alema Îslamiyetê taybetiyeke cuda didin hejmara çilî. Sedema ku Hz. Pêxember, di çil saliya wî de jê re wehî hatiye ev hejmar di nav ehlê tesewûfê de bûye mîheng ku di tesewûfê de çil gihanek hene û derwêş ji bo perwerdekirina nefsa xwe çil rojî di xelwetê de dimînin. Di nav Misilman û ehlê tesewûfê de ji ber vê taybetiya hejmara çilî, jiberkirina çil hedîsên Hz. Pêxember bûye kevneşopî. Çil sehabeyên ewil ku di destpêka Îslamê de bawerî bi Hz. Pêxamber anîbûn di nav Misilmanan de gelek qedirbilind in.

Di baweriyên gel de hejmara çilî wateyên cuda dihewîne ku lohosatî (di nav gel de çilîn tê binav kirin) ku ev dem wek dema paqijiyê tê dîtin. Li gorî baweriyekê ji dema lohosatiyê heta çil rojî gora dayika ku Xwedê zarok dayê vekiriye lê piştî çil rojî devê gorê tê girtin û dayik di vê dema xeternak re bi xweşî derbas dibe. Li gorî baweriyekê di jî xwediyê miriyan, piştî mirina miriyê xwe, biqasî çil rojî şîna wan e. Heta çil rojî sibh û êvarî diçin serdana gora wan (Ekinci, 30.04.2015).

Di çîrokên Kurmancî de hejmara çilî ji bo rewşên rengîn tê bikaranîn. Her çî qas di çîrokan de wek nîşana asteng, qedexe, bendewarî, sebr, fikar, kêf, şahiyên û demdiyariyê bê dîtin jî mîna formelên meselokên lawiran ev hejmar çilî zêdebûn û sîtemkariyê jî sembolize dibe:

Xwedê di carekê de çil lawik yan jî çil keçik dide Şahbanûyê, û padîşah di carekê de dibe xwediyê çil lawik yan jî çil keçî yan jî çil qîz û çil kur, xwişk û birayên hev in:

“Qîza Paşê got: Na, em çil qîz in û tev xwişkên hevûdu ne.

Zilamekî din got: Wele em her çil jî birayên hevûdu ne. Ma niha çênabe ku hûn ji me re û em jî ji xwe re bin” (Zinar, 2013b: 44).

Formela hejmara çilî wek nîşana zordarî û sîtemkariya guran hatiye dîtin:

“Ên bere gotine, bavê guran wextê wesiyet li wan kiriye gotine: Wextê we avêt ser pez, heta çilî wesiyeta min’e, çilî jortir jî mêraniya we ye” (Baran, 2016: 71-73).

2.11. FORMELÊN RENGAN

Di xwezayê de rengên cur bi cur hene. Li gorî çand, bawerî û derûniya mirovan reng xwedî wateyeke taybet in. Bi rastî ev biwate kirin ne ji xwe de heye, mirovan ev wate li rengan bar kirine. Ji vê yekê reng, di nav çand û erdnîgariyan de cuda tên biwatekirin. Li ser vê mijarê Rayman (2012: 10-15), nêrîna xwe wiha aniye ziman:

“Reng, bi hezar salan in ku di nav jiyana, adet û rûhsatnameyan de wateyên cuda îfade dikin. Ji ber vê yekê, ji bo Efrîkayîyan rengê reş rihê qenc, rengê spî jî rihê ne baş îfade dîke. Ji bo Ewrûpayîyan rengê reş rengê şînê ye. Ji bo Japonan jî rengê spî û reş rengê şîn û xerabiyê ye. Rengê kesk ji bo Ewrûpayîyan rengê çavsoyîyê ye, ji bo Asyayîyan jî çavkaniya şahî û şadiyê ye. Rengê zer ji bo Ewrûpayîyan tirs û çavsoyîyê, lê ji bo Asyayîyan paqijiyê îfade dîke.”

Di Qur’ana Pîroz de di derbarê rengan de di Sûreya En-Nehl: 16/13an de Xweda (c.c), wiha dibêje: “Ew tiştên ku Xwedê ji bo we rengareng afirandine; bi rastî di wan rengan de ji bo civateke şîretwergir nîşan û belgenome hene.” Xweda, di vê ayetê de bi saya rengan dixwaze bala mirovan bikişîne ser ayetên xwe û wan nîşanî mirovên xwedî-tefekur bide û di wan rengan de ezamet, qudret û cemala xwe nîşanî me bide.

Di tesewûfê de derheqê rengan de nêrînên cuda hene; li gorî hin nêrînan hin reng, sifetên Xwedê nîşan didin. Li gorî vê nêrînê, rengê spî, sifeta Cemal, rengê sor sifeta Celal, rengê reş jî sifeta Xwedê ya Kemâlê (Zâtê Ehediyyetê) îfade dîke (Yıldırım, 2006: 129-141). Sedema ku sê alayên ku Hz. Resulullah bikar anî bûn rengê wan spî, kesk û reş bûn. Di nav alema Îslamê de rengê spî û kesk pîroz tê dîtin.

Reng di çand, bîr û baweriya Kurdan de wek sembolên neteweyî û olî hatine bikaranîn. Di heman demê de jî bi hin peyvan re “reng” bûne rengdêr û bi vî awayî hin

navên taybet mîna zikreş, rûreş, rûspî û hwd. derketine holê. Bi saya van navan gelek taybetmendiyên mirovan bi vî awayî hatine îfade kirin.

Her rengê ku di nav çîrokên Kurmancî de hene mîna rengê reş, spî, zer, sor, şîn, kesk wateyên cur bi cur îfade dikin. Ev reng bi vî awayî karin bîr rave kirin.

2.11.1. Rengê Reş

Rengê reş di çand û baweriya Kurdan de wateyên cuda fînê ziman. Carinan ji bo xweşikbûna çav, birh û porê jinan bi rengê reş tê teswîr kirin. Carinan jî ev reng dibe sembola şev, şînî û xerabiyê. Carinan jî di hin peyv û biwêjên mîna “rûreş, çavreş, zikreş û bextreş” de bi wateyên neerênî tê bikaranîn.

Di Qur’ana Pîroz de di Sûreya ‘Elî Îmran: 3/106 de rengê reş ji bo kafir û gunehkaran hatiye bikaranîn: “Ew roj (Roja qiyametê) hin ser û çav spî dibin, hin jî reş dibin. Herçî ewên ku rûyên wan reş in (ji wan re tê gotin) “Ma piştî we îman anî, hûn kafir bûn. De ji ber kafiriya xwe ezabê tahm bikin.” Ev jî dide nîşandan ku biwate kirina hin rangan bingeha xwe ji pirtûkên pîroz werdigire.

Rengê reş, di nava çand û zimanê Kurdî de bi awayekî rengîn tê bikaranîn. Di heman demê de di çîrokên Kurmancî de jî bi cihêrengî hatiye bikaranîn.

Carinan jî rengê reş, roja şînî, nebaş û xerabiyê simbolîze dike:

“Mirina Mîr Mûrî dilê hemî mûriyên Mûristanê xist derd û xem û kedereka pîrr mezin. Li her derê mûristanê ji Mîr Mûrî ra hefteyek şîn danîn, rêş girêdan û şîn kirin. Piştî heft rojan ku şîn qediya” (Bozarslan, 2002a: 46).

“Dema ku mişik jî ev gotinên evîndarî ji beqê bihîstin kêfa wî hêj xweştîr bûji vê bextewarî û seadeta mezin bû ku demildest fikreke baş hate aqilê wî û got: Ax cana min...em bi roj ve, li cem hev çend bextiyar in û emê bi şev bexreş û kêfnexweş bibin” (Sadinî, 2011: 51).

“Mihê jî, ji erdê ku xwe ji guriyan veşartîye serê xwe derxist, seyra halê kerî kir û got: Mamê ker, ma min ji te re negot, zira te ya nexweş yê ji te re bibe roja reş” (Fîdan, 2014: 33).

“Divê ez pêşiyê ligel fil bi axifim. Eger wî gotina heq qebûl kir, ji xwe karê me pê nîne. Lê eger rastiye qebûl neke em ê dinyaya wî reş bikin” (Sadinî, 2011: 12).

Hin caran jî rengê reş ji bo xerabî û nebaşiyê tê bikaranîn:

Rengê reş, di çîroka “Biratiya Rovî û Mar” de pêşnavê mar e. Ev pêşnav taybetiya kesayeta lehengên xirab û xayîn nîşan dide. Ji bilî vê ev pêşnava rengê reş, gelek wateyên ne erênî di nav xwe de dihevwîne (Bozarslan, 1999a: 54-60).

“Na bi Xwedê, min pisîk tenê nehişt û ez neçûm min di ava çê m da avjenî nekir. Eger pisîkê ji we ra wisa gotibe, derew kiriye û rûyê xwe reş kiriye” (Bozarslan, 2005: 53).

Rengê reş, di çîroka “Şikefta Lawiran” de bi sembola fenekî û xerabiyê hatiye emilandin: “Ez Rovî me, roviyê reş im./ Dixum goştê gur û hirçan/ Bi dekên xwe ez keleş im” (Bozarslan, 2000a: 66).

Carinan jî rengê reş, ji bo birînên xedar û bêçare tê bikaranîn. Di çîroka “Hirç û Rovî” de rengê reş, bi vê wateyê hatiye bikaranîn:

“ Qederekê paş ve bi ser xwe ve tê. Bi birînên reş û jan, bêhal û perîşan rabûye û çûye cem rovî” (Sadî, 2011: 26).

Carinan jî rengê reş wek ku di çîroka “Mîr Mûrî” de hatiye vegotin ji bo bêhêvîtiyê hatiye bikaranîn “Wey li min bextreşê, wey li min bêkesê, wey li min dêranê, wey li min porkurê!” (Bozarslan, 2002a: 47).

Sedema ku çavên reş di nav Kurdan de hê bêhtir hêja tên dîtîn di zargotina Kurdan de “çav û birûyên” yarê bir rengê reş tên teswîr kirin. Di çîroka “Xezal û Qertel” de çavên xezalê bi rengê reş hatine teswîr kirin:

“Xezala çavreş serê sibê zû ji çiyê berjêr dadiket, li berwarên çiya di nav daristanê de digeriya, li ser kaniyan ava sar vedixwar”(Öğütçü, 2014a: 5).

2.11.2. Rengê Spî

Di çand û binbîra mirovên rojhilata navîn de rengê spî, paqijî, aramî, heq, heqîqet û rastiyê îfade dike. Ev nêrîn di çand û baweriyaya wan de bi hêsanî tê dîtîn. Wekî di pirtûkên pîroz mîna Qur’an û Încîlê de rengê spî, ji bo paqijî û ehlê bihiştê hatiye bikaranîn. Di Qur’ana pîroz de di Sûreya ‘Elî-îmran: 3/107 de ji bo ehlê bihiştê biwêja “Rûspî” hatiye bikaranîn. Dîsa di Încîlê (Yûhenna 20: 14, r. 91) de tê gotin ku herdu milyaketên ku li gora Hz. Îsa (a.s) rûniştine, kincên wan herdu milyaketan spî bûne. Di vî babetê de (Yûhenna 20: 14- r. 91) jî meqseda ji kincên spî bêgunehî û paqijiyaya milyaketan bûye.

Rengê spî di çîrokan de nîşana qencî û rêberiyê ye. Ji ber vê yekê di çîrokan de ji bo kalê zana biwêja ‘Rîspî’ tê bikaranîn. Biwêja ‘Rîspî’ zanabûna kalo nîşan dide. Di çîrokan de rengê spî, qencî û rêberiyê simbolîze dike:

“Çar pênc rîspî ji aliye xelkê ve hatin hilbijartin, da ku biçin bi tenefiroş ra bipeyivin û daxwaza xelkê jê ra bejin” (Bozarlan, 2006: 26).

“Bizina rihspî jî hevalên xwe berhev kiriye û gotiye: Hevalino, welleh çol xweş e lê koviyên çolê zêde wehşî ne. Ya baş ew e, em bizîvirin mala xwediyên xwe. Naxwe em dê li van deran telef bibin” (Sadinî, 2011: 47).

Rengê spî, carinan wek nîşana pîroz, bêgunehî û ewlehiyê hatiye bikaranîn:

Rengê spî di çîroka “Hirça Birçî û Deka Rovî” de wek nîşana pîroz û bêgunehiyê hatiye bikaranîn:

“Hirçê nêt li hevalên xwe xera kir, ji rovî re got: Bira, ez birçî me çareyekê bibine.

Rovî got: Ez rovî me, suwarê çîlspî me, nayême xwarin” (Xamo, 2014: 21).

Rengê spî di çîroka “Gurê Bilurvan” de bi wateya bêgunehî, bêzerer û ewlahiyê hatiye emilandin: Gurê fenek, melesa spî mîna şaşika heciyan li serê xwe pêça û berê xwe berjêr kir û da ser riya hecê, her lawirê ku li rastî wî dihat ditirsiya lê wî ewlehî û bêzereriya xwe bi şaşika spî dida nîşandan û lawirên tirsîyayî amoş dikir (Bozarlan, 2000a: 69-72).

Di hin çîrokan de rengê spî nîşana xetereye:

“Serê sibê berfê girte ser piştê devê. Devê serê xu bilind kir, go: Ka biratiya te?” Berfê jî go: Qeyi tu kor bûyi? Te serê xu bilind kira, te çiya dît spî dikir, tu bi birêviyayî xilas bûyayî” (Celîl û Celîl, 1978: 210).

Rengê spî carinan wek simbola mirinê û xemgîniyê tê bikaranîn:

“Mar, bi dûvê xweyê qut ve ji kunê de derket û got: No şivano no, nabe heta bîra dûvê qut li bîra min e û heta bîra kêla spî di bîra te de ye, ez û tu nabin dostê êkdu” (Fîdan, 2014: 54).

2.11.3. Rengê Sor

Îro rengê sor, di gelek çandan de wek nîşana evîndarî, tirs, xetere û erotîzmê tê bikaranîn. Wekî din ev reng, li ser alayan jî nîşana xwîna leşkerê ku ji bo azadkirina welêt hatiya rijandin temsîl dike. Geh jî şanîkera qudret û ezametê ye. Derbarê vê mijarê de Özkaynak (2013: 166-167 ji Ersoy, 1990: 55 jêgir) wiha dibêje: Rengê sor, di hin

civakan de sembola serwerî û desthilatdariyê ye. Sedema ku di Şehînsahiya Romayê de rengê sor nîşana serwerî û desthilatdariyê dihat dîtin nehiştine ku tu kes ji xeynî şehînsahan kincên sor li xwe bikin. Hetta firotina qûmaşên sor li gor zagonên Şehînsah Justiyen hatiye qedexekirin.

Ev reng di çîrokên Kurmancî de bi wateyên cihêreng hatiye bikaranîn. Di çîrokan de bûye nîşana bedewî, daxwaz, jîndarî û janê.⁹

Di çîroka “Kewê Çîrokbêj” de “rengê sor” ji bo xwestekan hatiye bikaranîn. Di heman demê de ev reng evîndariya xwestekê jî diyar dike: “Dibêjin, zemanên berê kevirên sor di nava mala maqûl û malmezinan de hebûne. Kî gava biçûya xwezgîniyê, diçû li ser wan keviran rûdinişt. Êdî ji xwe diyar dibû ku ew kes hatiye çî” (Zinar, 2013b: 27).

Rengê sor bi wateya çavnebarî û nerazîbûnê hatiye bikaranîn:

“Kewa gozel bi çavên melûl lê nêrî (û got): Belê, ez nikarim tiştêkî bikim, tu û bextê te, Xwedê carê tu çavsor kirî, dixwazî goşt bigire bila ji te re nosîcan be” (Benek, 2014: 53).

Rengê sor, di hin çîrokann de mîna di çîroka “Legleg” ê de bûye nîşana acizî, şerm û xîretê:

“Axê li wir ravesta, destê xwe bi aliyê wê nêrdevanê ve direj kir û deng li jinikê kir, jê ra weha got:

- Min divê ku tu hevalkirasê xwe derxî û başewala bi vê nêrdewanê de hilkişî, biçî ser banê koşka min. Hingê ez’ê tene mift bidim te û havînê çu tiştêk ji te nexwazim. Lê ku tu vê daxwaza min qebûl nekî, ez yek dendikek jî tene nadim te û zarûkên te dê birçî bimînin.

Li ser wê peyva axê, rûyê jinika reben ji şerman sor û sorçikî bû. Ji aliyekî di ve jî hêvîşikestî bû, li ber xwe nihêrt û ji axê ra got:

- Tu axayekî binav û dengî tu çawa tiştêk weha ji min dixwazî! Ma qet pozê te naşewite, qet pêjna namûsê bi te ra tune ku tu daxwazeka weha dikî!

Axê bê şerm û fedî keniya û got:

- Tu bi kêfa xwe yî. Eger tu dixwazî ez tene bidim te û zarûken te ji birçîtiye xilas bikim, divê ku tu vî şertê mîn bînî cî. Eger tu şertê min neynî cî, zarûken te dê yeka yek li berçavên te ji birçîtiyê bimirin.

Dema ew peyv ji devê axê derket, xiyala zarûkên jinikê yeka yek hat ber çavên wê. Wek ku kozirek agir li ser dilê wê hatibe danîn, dile wê bi wê xiyalê şewitî” (Bozarşlan, 2006: 50).

Carinan jî rengê sor, jîn û jêderka şifayê temsîl dike. Di çîroka “Zira Kerê û Lota Devê” de kera kêmhêz û pişt cedewî, pîrî ku li ser mêrgê nefela

⁹ “Ji berê de tê gotin ku Kurd di nav rengan de herî bêtir ji rengê sor hes dikin. Ev xwestina mehrûmbûna ji vî rengî di nifirên wan de jî dibinin. Bo mînak nifirek e wiha heye: Tu derpiyê sor li ber serê xwe nebîni” (Yıldırım, 2012: 315).

sor xwaribû û ava sar vexwaribû, qelew bûbû û denge wî jî girr bûbû (Bozarslan, 2000a: 29).

Rengê sor carinan dibe nîşana hêrsbûn û qehirînê:

“Rovî çawa qala şêrek kir, şêr hema di wê gavê da bû xwey û ket agir. Herdu çavên wî di serê wî di serê wî de sor bûn, bijiyên wî ji bere pirrtir gij bûn û bi carek tîk bûn. Helkehekeka wisa ji bi serê ket ku, mirov digot dê ji hêrsan wexta bêje teq û biteqe, parçe parçe bibe. Hema ji ciyê xwe hilfiriya û qiriya” (Bozarslan, 2002a: 19).

“Qasek paşê bala xwe danê ku karwanek ji hevber ve derket. şêr hema di cî da rabû ser lingan û xwe jî şer ra amade kir. Hingê bala rovî ket çavên şêr. Dît ku herdu çavên wî mîna du sotikên agir, bijiyên wî jî gişt mîna şûjînan tîk bûne û mane” (Bozarslan, 2005: 16).

“Şêr çawa dîtiye ku gur para mezin daniye ber xwe, zivêlek daye rovî û hinek jî daniye ber wî, çav lê sor dibin ji nişka ve destê xwe avêtiye patka gur û wî serûser di wê newalê re werdike” (Sadinî, 2011: 21).

“Wextê xwarininê jî têra xwe dereng ketibû. Bêhna şêr teng, çavên wî sor bibûn. Ji qehera çavên wî li rê ya rovî ku xwarina wî bîne” (Alkan, 2003: 36).

2.11.4. Rengê Zer

Di nav rengan de rengê herî geş rengê zer e. Ev reng, bi geşbûna xwe aramiyekê dide derûniya mirovan. Di nav xwezayê de jî rengê herî germ ev reng e. Wekî din rengê zer di nav xwe de dijîtiyê diparêze ku ew reng carinan wateyên nexweşî, acizî û aramiyê dihewîne. Carinan jî ev reng ji bo teswîr kirina bedewî û rindiya jinan tê bikaranîn. Di wan teswîran de bi giştî xweşikbûna dev, por, guliyên jinê bi rengê zer tê teswîr kirin. Ev teswîr kirin bi tevahî di nav stran û klaman de wek gulîzer, devzer, por zer û hwd. cî digirin.

Rengê zer di çîrokên meselokên lawiran de carinan wek sembola qehremaniyê hatiye bikaranîn:

Di çîroka “Gayê Zer” de rengê zer mîna nîşan wêrekî, şervanî û jêhatîbûnê tê dîtin: “Bi xêra vê mêranî û cengaweriya Gayê Zer, gayên din jî cesûr bûbûn û wan jî bi mêranî êrîş dibirin ser koma şêran” (Xamo, 2014: 43).

2.11.5. Rengê Şîn:

Di nav gel de rengê şîn wek rengê bêdawî û rengê bihiştê jî tê dîtin. Ev reng di nav xwezayê de hisiyateke bêdawî dide mirov. Mirov di nava wî rengî de aramî û bêdengiyê peyda dike.

Di çîrokên Kurmancî/ Kurdî yên gelerî de rengê şîn, mîna rengê bêdengî û aramiyê tê dîtin. Ku di hin çîrokên mîna “Abidê Şikeftê” de teswîra “Bajarê Şînê” weke cihê aram û sukunetê hatiye şayesandin¹⁰: “Lê hemû tiştên bajêr şîn in; xanî şîn, rê şîn, mirov şîn, heywan şîn, erd şîn û her tişt şîn. Li wî bajarî çek, şûr, qame, kêr û tiştin jî wisa nîn in û xelk nizane ku ew çî tişt in...” (Zinar, 2013a: 43).

Di çîrokên Kurmancî/ Kurdî de yên meselokên lawiran de rengê şîn, rengê xwezayê ye:

“Dîtin ku wa ye li jêra wan mêrgek heye, di nav de hespek diçêre. Dora wî hemû şînkayî ye, tavê li wê dere xistiye, berfa wê helandiye. Ew jî di nav wê mêrgê de ye” (Yıldırım, 2009b: 10).

“Rovî dest ji kevokê berdide û diçe ba leglegê ku vaye di nava zewiyeka hêşîn de diçêre” (Alkan, 2003: 53).

2.11.6. Rengê Kesk

Di xwezayê de rengê herî zindî bêguman rengê kesk e, sedema ku ev reng sembola jîn û zindîtiyê tê hesibandin, ji aliye mirovan pir tê ecibandin.

Rengê bihiştê di hemî olan de bi rengê kesk tê teswîr kirin (Ergün, 2006: 1). Ji bona vê li cem bawermendan rengê kesk pîroz tê dîtin.

Di bîr û baweriyên Kurdan de rengê kesk wek nîşana jîn, xwaza û ola Îslamê tê qebûl kirin. Di çîrokên Kurdî de ev reng, wek rengê xwezayê û renekî pîroz tê pejirandin.

Di çîroka “Rovî Bû Hecî, Dîk Bû Mele” de rengê kesk, wek nîşana bêgunehî, ewlehî û pîroziyê hatiye bikaranîn:

¹⁰ Di nav Kurmancan de xeletî-meşhur e ku, gel ji keskê dar û giyayan re di cihê rengê kesk de “rengê şîn” bi kar tîne. Heye ku çîrokbêj jî, di cihê “kesk” de rengê şîn bi kar anîbe ku ev çîrok bi telmîhî di ayetên sûreyên El-Rehman: 55/76, Nîsa: 4/21, Kehf: 18/31an bi bîr dixê ku di wan ayetan de ji bo alavên bihiştê biwêjên wek: Kincên kesk, hevrişimên kesk, balgehên kesk, darên kesk, giyayên kesk.... hwd. hatine bikaranîn. Wekî din di sûreya El-Rehman: 55/64an de jî her du bihişt du bihişt rengê kesketarî hatine teswîr kirin.

“Ordekê got: Apê rovî, tu pê dizanê ku esîl û fêslên me digihêje seyîdan û heçî em seyidin. Em kesên bê zîrar in. Tu dibînî keska serê min ku ez wê tim paqij digirim. Ji bo ku her kes xwe paqij bigre” (Alkan, 2003: 17).

2.12. ÇAVKANIYÊN ÇÎROKAN

Pêşengê teoriya çavkaniya çîrokan lêkolînerê Elman Wilhem Grîmm e. Wî teoriyên xwe di pêşgotina pirtûka bi navê “Kinder und Hausmarchen” aniye ziman. Li gorî nêrina vî du çavkaniyên çîrokan hene:

1-Çîrok, mîrateya dîrokî yê ku ji famîlya Hind-Ewrûpayê.

2- Çîrok, hêmanên mîtolojiyên kevnar in. (Arıcı, 2004: 159-169 ji Günay, 1992: 321-322 jêgir).

Piştî W. Grîm, gelek nêrîn hatine gotin û derbarê vê mijarê de gelek gengeşî jî hatine kirin. Di navbeyna lêkolîneran de pîrsa “Çavkaniyên Çîrokan” bala gelek lêkolîneran kişandiye ev du sed sal in ku bi zindî tê gengeşî kirin. Li gorî dîtina Gedeon Huet, ew bi sê nêrînan tê kategorize kirin:

1-Nêrîna Mîtolojîk

2- Nêrîna Hîndolojîk

3- Nêrîna Etnografîk (Sakaoğlu, 1999: 5).

A- Nêrîna Mîtolojîk

Nêrîna mîtolojîk, çavkaniya çîrokê di mîtolojiya Hindistanê de dibîne. Pêşengê vê nerîne Max Muller e. (1820-1900). Ew li ser mîtolojiyan xebitiye û çavkaniya mîtolojiyan bi Hindistanê ve girêdaye. G. W. Cox, ev nêrîn pêş ve biriye û ev nêrîn li ser çîrokan sepaniye (Artun, 2012: 126).

B- Nêrîna Hîndolojîk

Li gorî vê nêrîne çavkaniya çîrokê ya herî kevnar Hindistan e peyre ji Hindistanê hêdî hêdî li cîhanê belav bûye. Ev raman cara yekem di sala 1838an de L.Deslongehanûs aniye ziman ku çavkaniya çîrokên Ewrûpayê wek Hindistan nîşan daye (Artun, 2012: 125).

Bi nêrîna Theodor Benfay çîrokên Hindistanê bi sê rîyan derbasî Ewrûpayê bûne:

1- Di sedsala 10an de bi zargotinî derbas bûye.

2- Di sedsala 10an de bi bandora ola Îslamê li ser Bîzans, Îtalya û Îspanyayê derbasî Ewrûpayê bûne.

3- Bi navgîniya Moxolan, berhemên Bûdîzmê derbasî Ewrûpayê bûne (Sakaoğlu, 1999:8).

Nûnerên vê nêrînê yên herî navdar ev in: Sylvestre de Scay, Theodor Benfey, Henry Gaïdoz, Josep Bedîler.

C- Nêrina Etnografîk

Nêrina Hîndolojiyê raserî gelek rexneyan hatiye. Di pêşengiya Edward Taylor (1832-1917) de Andrew Lang, M. Lennan “Nêrina Etnografîk” avêtine holê. Li gorî vê ramanê: Çîrok bingeha xwe ne ji mîtolojiyê lê ji berhemên şaristaniyê digirin. Çîrok jêderka xwe ji bermayiyê çanda kevnare û hêmanên jiyana rojane werdigirin. Pîştî ku ev nêrîn di nav zanyaran de hate gengeşî kirin hinek zanyaran ev nêrîn pejirandin. Pîştgirî vê nêrînê kirine. Li gorî vê nêrînê zanyaran ramanên xwe avêtine holê yek ji wan zanyaran jî Saîm Sakaoğluyê. Sakaoğlu (1999: 9), di derbarê vê mijarê de ramanên xwe wiha tîne ziman ku: “Çavkaniya çîrokan tu car erdnigariyek, yan bi çandek û yan jî bi olekê nayê dîtîn.” Wek ku di nêrina Sakaoğlu de jî tê dîtîn ev nêrîn jêderka çîrokan bi folklorê gelan ve girêdide. Çîrok, rasterast bi çandekê ve nayên girêdan.

2.13. DI EDEBIYATA CÎHANÊ DE PIRTÛKÊN GIRÎNG ÊN ÇÎROKAN

Gelek çîrokên navdar yên cîhanê yan bi navê neteweyên xwe mîna Hind, Ereb, Kurd, Grek û hwd. yan jî bi navê afirîner û derhenêrên xwe tên nasîn wek çîrokên Ezop, Anderson, Birayên Grîmm û La Fontaine ne.

Çîrokên navdar ên cîhanê em dikarin bi vî awayî bidin rêz kirin:

2.13.1. Çîrokên Hindan

Li gorî hin lêkolîneran Hindistan çavkaniya çîrokan a yekem tê hesibandin. Sedema ku cara yekem pirtûka çîroka “Kelîle û Dîmne” ya Beydaba li vî welatî hatiye afirandin. Ev pirtûk di nav lêkolîneran de pêşenga çîrokan tê qebûl kirin.¹¹ Ji xeynê vê pirtûka navdar bi navê Pançatanra, Hîtopadeça, Çakasaptatî/Sukasaptatî (Tûtîname), Ummana Nehra Çîrokan û çar pirtûkên hêja jî hatine nivîsîn.

¹¹ Bigumanî ev berhema navdar (p.z) di salên sedsala 3an de bi Sanskrîtî hatiye nivîsandin. Hetanî dema me ev berhem li ser wergera Pehlevîti, wergerî gelek zimanê biyanî bûye. Wekî din Mûsteşrîk Hertel û Mûsteşrîk Kosegarten jî her yekî ji wan berhemên resen yên vê berhemê peyde dikin û dawî wan berhemên resen diweşînin (Beyda, 1958: 3-4).

2.13.2. Çîrokên Ereban

Di nav edebiyata Ereban de pirtûkên bi navê “Ferec Ba’de’ş-Şidde û pirtûka “Elf Leyle Ve’l-Leyl/ Çîrokên Hezar û Yek Şevê” gelek navdar in.

Di nav herdu pirtûkan de ya herî navdar pirtûka “Elf Leyle Ve’l-Leyl/ Çîrokên Hezar û Yek Şevê” ye ku çîrok li ser bêbextiya jinan hatiye afirandin. Ev çîrok ji aliyê edebiyatnasan ve gelek girîng tê dîtin.

2.13.3. Çîrokên Îraniyan

Di nav edebiyata Îraniyan de çîroka bi navê “El Fûn-Nehar Ve’n- Nehar / Çîrokên Hezar û Yek Rojê” mîna nazîreyeke “Çîroka Hezar û Yek Şevê” ye. Ev pirtûk li ser bêbextiya mêran hatiye afirandin (Sakaoglu, 2007: 18). Wekî din Mantiqul Teyr’a Ferîddun Etar (1136-1221) , Bûstan û Gulistan’a Sadî Şîrazî (1193-1292) û Baharistana Molla Camî (1414-1492) jî gelek bi navûdeng in.

2.13.4. Çîrokên Ewrûpiyan

Çîrokên Ewrûpiyan bi du awayan pêk hatin. An bi destê helbestkar û nivîskaran hatine nivîsîn an jî çîrokên ku di nav zargotina gel de hebûn, ji aliyê folklorzanan ve hatin berhev kirin û bi awayekî edebî ji nû ve hatine nivîsîn.

Di edebiyata rojava de ji hêla cûreyên çîrokê ve ya herî kevnar edebiyata Grek/ Yewnan’an de Ezop/Aîsopos (b.z. 620-560) tê hesibandin.¹²

Li Fransayê Jean La Fontaine (1621-1695) û Charles Perrault (1628-1703) e. Berhemên Charles Perrault ên bi navê La Belle au bois dormant (Rinda Razayî), Le Petit Chaperon Rouge (Keçika Kumsor), Le Chat botté (Pisîka Biqîzma), Cendrillon (Pisîka Xwelî) gelek navdar in.

¹² Derbarê jiyana çîrokvanê navdar Aîsopos (Ezop) de haydariyên zelal zêde tune ne. Haydariyên ku hene jî ji hin rîvayetan (gotegotan) îbaret in ku li gorî van rîvayetan Aîsopos (Ezop), b.z di sedsala 6an yan jî di sedsala 14an de jiyaye. Demekê xulamtiya feylozof Xantos yan jî Ladmonê Samosî kiriye. Piştî ku Aîsopos azadiya xwe bi dest xist li gelek welatên cihanê mîna Babil, Misir û welatên rojhilat yê mezîni geriyaye.

Keşeyê Grek Planudes û di sedsala 15an de Demetriôsê Phalerosî, Derbarê jiyana û berhemên çîrokvanê navdar Aîsopos, gelek pelik civandin. Demetriôsê Phalerosî ev xebata xwe di dema xwe de weşand. Gelek çîrokvanên navdar wek Babrîas, Phaerus û çîrokvanê bi nav û deng La Fontaine jî ji vê berhema qedirbilind ya weşandî havil girtiye (Ezop, 1976: 7-8). Nivîsarên çîrokê Aîsopos kurte ne. Sedema ku çavkaniyên xwe ji bingeha Grek/Yewnan’an distîne hêmanên mîtolojîk zêde ne. Lêhengên çîrokê xeyn ji lawir û mirovan ji Xwedayên mîtolojîk jî pêk tên.

Li Elmanyayê berhema bi navê “Kînder-Und Hausmarchen I-II” ji aliyê Birayên Grîmm (Jakob Ludwîng Karl Grîmm (1785-1863) û Wîlhem Grîmm (1786-1859) ve hate weşandin ku ev berhem ji çîrokên gelêrî yên Elmanan hatine berhev kirin.

Nivîskar û rewşenbîrê Danîmarkî Hans Chrîstîon Anderson di warê çîrokan de gelek navdar e. Wî çîrok berhev kirine û va çîrokan bi terzekî nû afirandine (Sakaoğlu, 2007: 18-19).



BEŞA SIYEM

TÊGEHA MOTÎFÊ Û MOTÎFÊN LAWIRAN ÊN KU DI RÊZEÇÎROKÊN “MESELOKÊN LAWIRAN” DE CIH DIGRIN

3.1. TÊGEHA MOTÎFÊ

Koka peyva motîfê ji “motivum”a lafînî ye. Herî zêde di hunerên xweşik de lê di warê mîmarî, hunerên destan û berhemên wêjeya gelêrî de jî tîn bikaranîn. Lê di warê wêjeya gelî de bi wateyên cuda tîn bikaranîn. Pênaseya motîfê gelemperî wiha tê pênasandin ku motîf: Ew hêmanên ji demên berê hetanî dema îro di çîrokan de unsûrên ku nayên guherandin. Lê belê di warê wêjeyê de heta niha li ser vê peyvê gelek pênase hene. Em dikarin pênaseyên cuda wiha rêz bikin:

Max Luthî wiha pênase dike: “Motîf hêmana herî biçûk a çîrokê ye û dikare xwe di kevneşopiyê de biparêze”. Li gorî Arthur Christensen: “Motîf ew hêman in ku xwe bi zindîtiya xwe didin qebûl kirin, li gorî rêgeza psîkolojîk a tarîfe-zor tesîreke mezin li guhdaran dikin, û ji silsileyên fikrî ya îbtîdaî ji bo ku bikevin terkîbên nû dikarin bîn parçe kirin” (Sakaoğlu, 1999: 99-100). Vesselovskî wiha pênase dike: “Parçeya herî biçûk a çîrokan e” (Bakırcı, 2010: 301).

Heta niha xebata herî bi rêkûpêk ji aliyê Stîth Thompsonê Amerikî ve hatiye kirin. Ew wiha pênase dike: “Ji berê ve dijî, û hêmana herî biçûk a çîrokan e. Ji bo ku xweya vê hêzê be divê xweya wesfên balkêş û derasayî be” (Sakaoğlu: 1999: 15).

Rabîa Kocaaslan Uçkan jî bi xêra wan pênaseyan motîfê wiha pênase dike: “Motîf hêmaneke vegotinê ye ku ji çanda devkî dizê, li zeman û mekanên cografîk yê cuda belav dibe, duh jî hebû û îro jî heye, xwe di kevneşopiyê de diparêze û dikare parçe bibe” (Uçkun: 2003: 113).

Em jî bi xêra van pênaseyan dikarin wiha bibêjin. Ji bo ku hêmanek wek motîf bê qebûl kirin, divê ev hêman di zeman, mekan û kesan de xwediyê taybetiyên derasayî be. Wek mînak; tasika ku av pê tê vexwarin, hêmaneke normal e, lê eger kesê ku bi vê tasikê avê vedixwe bikeve şiklekî dî û hestên cuda li me peyda bike, ev tas dibe hêmaneke ku çîrokê ava dike. Ji bilî vê divê motîf bandorê li xwendevan û guhdaran bike. Divê neyê jibîr kirin ku motîf di xwe de hem taybetiyeke navneteweyî hem jî taybetiyên herêmî dihewînin.

3.2. MOTÎFÊN ÇÎROKAN Û KATALOGÊN GIRÎNG ÊN MOTÎFAN

Heta niha gelek katalogên motîfan yên cihê hatine amadekirin. Lê bêguman navdartirîna wan ji aliyê profesorê Amerikî Stîth Thompson ve hatiye amade kirin. Ev katalog di salên 1932-1936an de wek şeş cîldî di bin 23 seranavan de hatiye amade kirin. Ev katalog di salên 1955-1958an de bi awayekî berfirehtir hatiye çap kirin. Navê vê katalogê Motif index of Folk-Literature/ Indexsa Motîfên Edebiyata Gelerî ye. (Sakaoğlu, 1999: 5).

Cîldê dawî ya îndeksê tenê fihristê dihewîne. Di pênc cîldên din de jî her tîpek teqabulî motîfekê dike û ji A'yê heta Z'yê hatiye senifandin.

Li gorî vê:

Cîldê I. :

- A. Motîfên mîtolojîk
- B. Lawir
- C. Qedexe

Cîldê II. :

- D. Sêhr
- E. Mirin

Cîldê III. :

- F. Tiştên derasayî
- G. Dêw / Hût
- H. Azmûn / Îmtihan

Cîldê IV. :

- J. Biaqilî û safîtî
- K. Xapandin

Cîldê V. :

- L. Berevajîbûna qederê
- M. Tayîna pêşerojê/ dahatûyê
- N. Şens û siûd
- P. Cemiyet
- Q. Xelatkirin û ceza
- R. Dîl (hêsîr) û qaçax

S. Zilmên derasa (anormal)

T. Zayend

U. Tebîeta jiyanê

V. Dîn

W. Taybetiyên karakteran

X. Mîzah

Z. Komên cuda yên motîfan (Thompson, 1955: 29-35; Bakırcı, 2010 : 302-303; Şimşek; 2001: 187,188). Bi vî awayî hatiye senifandin û her motîfek di xwe de bin serenavan dihewînin.

Me divê ku li ser koma “ B. Lawir” bisekinin. Ji ber ku têkildarî mijara me ye me jiber vê yekê rave kirina koma Lawiran munasîb dît.

B. LAWIR/ AJAL/ HEYWAN/ SEWAL

B₀-B₉₉: Lawirên mîtolojîk

B₁₀₀-B₁₉₉: Lawirên sêhrdar

B₁₀₀-B₁₁₉: Xezîneyên lawiran

B₁₂₀-B₁₆₉: Lawirên xwedî-sêhr

B₁₇₀-B₁₈₉: Lawirên sêhrdar yên din

B₂₀₀-B₂₉₉: Lawirên ku xwediyên taybetiyên mirovan in

B₃₀₀-B₅₉₉: Dostaniya lawiran

B₃₀₀-B₃₄₉: Lawirên alîkar/ Giştî

B₃₅₀-B₃₉₉: Lawirên muteşekkîr

B₄₀₀-B₄₉₀: Cûreyên lawirên alîkar

B₅₀₀-B₅₉₉: Xizmetên Lawirên alîkar

B₆₀₀-B₆₉₉: Zewaca lawir û mirovan

B₇₀₀-B₇₉₉: Taybetiyên komîk yên lawiran

B₈₀₀-B₈₉₉: Taybetiyên cur bi cur di derbarê lawiran de (Alptekin: 2009: 291).

Motîfên din jî bi vî awayî hatine rêz kirin.

3.3. MOTÎFÊN LAWIRAN ÊN KU DI RÊZEÇÎROKÊN “MESELOKÊN LAWIRAN” DE CIH DIGIRIN

Ji berê de di çîrokên rojhilat û rojavayê de motîfên lawiran cihekî girîng digirin. Bi hezar salanin ku gotyaran, hin tevgerên mirovan ên neerênî bi teşbîhî li ser motîfên

lawiran rexne kirine û şîretên xwe bi devê lawiran eşkere kirine. Mînak: Şêr, hêz û quretiyê; gur, fenekî û zordestiyê; mar, xerabî û pinîtiyê; kund, bêuxuriyê...hwd. temsîl dike. Ev xebata ku li ser rêzeçîrokên Meselokên Lawiran hatiye kirin, gelek motîfên lawiran derdikevin pêş. Ev motîfen sereke ev in: Dîk, gur, hirç, jûjî/ jîjo, ker, kêzik, kûsî, mar, meymûn, mişk, mûrî, pisîk, qijik, rovî, şêr, teyr (çivîk), legleg, kevok, kund û pepûk in. Bi saya van motîfan derbarê civak û hişmendiya Kurdan de gelek agahiyên girîng meriv dikare bibîne.

3.3.1. Dîk/ Dîkil/ Keleşêr/ Kelebab/ Heke

Dîk di mîtolojiya Îraniyan ya qedîm de pîroz tê qebûl kirin. Di vê mîtolojiyê de dîk nûçevan û notirvanê rojê ye (Eskigün, 2006: 84) ji Çoruhlu, 2002: 148-149 jêgir).

Dîk, di nav gel de wateyên cuda dihewîne: Di nav Elewiyên Bakurê de dîk pîroz tê qebûl kirin û bi navê “Cebraîl” tê bi nav kirin. Di hin baweriyên tesawûfî û gelêrî de jî dîk sembola şehwet û quretiyê ye. Dîk di çîrokên kurmancî de bi qasî nîşana ku zîrekî û aqil e ewqas jî sembola temahkariyê ye.

Di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de “Motîfa Dîk” bi zîrekî û temahkarî hatiye vegotin. Di çîroka “Rovî û Dîk” de dîk wek sembola zîrekî û dekzaniyê hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê: Roviyeke dekzan û fenek ji bo têrkirina zikê xwe derketibû nêçîrê, lê tu lawireke qels nedît ku nêçîr bike. Biryar da ku here gundekî mirîşkekê yan ji dîkekî qelew ji xwe re nêçîr bike. Bi wê armancê bi dizî hat heta ber gundekî. Dît ku dîkekî qoqo li ser dara tûyê ji xwe re “qîqeçîqa” wî ye. Bi dîtina dîk av bi devê rovî ket, lê fikirî ku gelo ez ê çawa wî dîkî bixapînim. Bi wê armancê çû binê darê û deng li dîk kir û got:

— “Xoce, gelo nîvro bûye ku te bang da”

Lê dîk jî di fenekî û dekzaniyê de ne kêmi rovî bû. Dît ku rewş xerab e, wiha bersiva rovî da:

—“Belê birakê rovî, nîvro bûye.”

Rovî dîsa xwe li nezaniyê danî û got:

—“De kerem bike dakeve, bide pêşiya min îmamiyê bike, em jî ji xwe re bi cema’et nimêj bikin”

Dîk lê fikirî ku rewş xerab e, ku dakeve xwarê ew ê bibe xwarina rovî, wî jî rovî re got:

—“Birakê rovî, tu dizanî ku cemaet çi qas pir be, xêra wê jî ewqas zêde ye. Ez ji ser darê dibînim ku du tajî wa ne ji jor ve tên. Bila ew jî bîn, hêj ez ê dakevim û em ê tev bi hev ra nimêja xwe bikin”

Dema qala tajiyan bû, ew bû ku ziravê rovî kir ku biqete. Pê dizanî ku ger tajî werin ew ê bibe nêçîra tajiyan.

Wî jî bi mahna destnimêjê destûr ji dîk xwest û dûvê xwe xiste navbera lingên xwe û reviya çû. Dîk bi reva rovî gelek kêfxweş bû û bi dengê bilind ji dil û can bang da (Bozarlan, 1999a: 8-11).

Wek ku di vê çîrokê de jî tê dîtin “motîfa dîk” wek nîşana zîrekî û dekzaniyê hatiye bikaranîn. Dîk bi zîrekî û dekzanî xwe ji lepên rovî rizgar kiriye. Dîk bi deke, rovî xistiye xefkê û wî tirsandiyê. Ev deka wî ya dawî ku ji rovî re vegotiye: “Birakê rovî, tu dizanî ku cemaet çi qas pir be, xêra wê jî ewqas zêde ye. Ez ji ser darê dibînim ku du tajî wa ne ji jor ve tên. Bila ew jî bîn, hêj ez ê dakevim û em ê tev bi hev ra nimêja xwe bikin” (Bozarlan, 1999a: 11).

Ev vegotin rovî gelekî ditirsine ku rovî dixê telaşa canê wî yê şêrîn. Ev peyvên wî yên dawî zîrekî û hişyariya dîk nîşanî me dide ku mirov xwe ji nav dekan bi tenê bi dekzanî û zîrekî dikare rizgar bike.

Mîna çîroka “Rovî û Dîk” motîfa dîk her dem bi metafora zîrekî û dekzaniyê nayê bikaranîn, carinan jî motîfa dîk, bi metafora timahiyê jî tê bikaranîn. Mesela di çîroka “Pîrê û Dîk” de ku di nav gel de gelek varyantên vê yên cuda hene. Di vê çîroka navdar de bûyera trajîk a dîkê bînefs hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê: Rojekê pîrê dema mala xwe paqij dikir, seriyekî çortan dîtiye, ev çortan daniye li ser tifikê, dîk jî nikilê xwe li çortan dixê û çortan dixwe.

Pîrê jî li ser vê tevgera dîk sivnik li qorika dîk xistiye. Dîk hilfiriya û nikilek li çavê pîrê xistiye û kor kiriye. Paşî herdu çûne cem qazî û pîrê serpehatiya xwe jî qazî re vegotiye û giliya dîk kiriye.

Qazî jî biryara xwe wiha daye:

—“Here dîkê xwe ser jê bike, lingên wî bike stûn, pûrtê wî bike kepîr, goştê wî jî ji min ra bîne da ez bixum.”

Pîrê piştî ku çû malê, qazî jê re çi gotibe wisa kir. Goştê dîk jî ji qazî re bir. Piştî ku goştê dîk ji qazî re bir û vegeriya malê pîrê ji aliyekî ve li pûrtê wî temaşa dikir û ji

aliyekî ve jî diponijî. Dû re hişê wê hate serê wê ku bêaqiliya wê ev bûyerên nebaş anînê serê wê (Bozarslan,1999: 12-16).

Wekî ku di vê çîrokê de tê dîtin ji ber timahî û bênefsiya dîk bûyereke ne baş hatiye serê wî û dawiyê jî ji canê xwe bûye. Di vê çîrokê de bi motîfa dîk, nebaşî û xerabiya bênefsiyê bi metafora dîk hatiyê vegotin.

3.3.2. Gur/ Gurg/ Verg/ Ganawir/ Cinawir

Di baweriya Romiyan de gur sembola cesaret û biserketinê ye. Di baweriya Xerbiyan de wateya fêlbazî, zalimî û qûnekiyê lê hatiye barkirin (www.gizlimabet.com, 13.01.2015). Wekî din di Încîla Muqedes babeta Lûqa 6: 43-45an û di Qur'ana Pîroz de di sûreya Êsif 12: 13-14-17an de motîfa gur mîna nîşana xerabiyê hatiye bi kar anîn.

Îro jî “gur” ji bo hin neteweyên rojhilata navîn jî wek nîşana wêrekiyê tê bikaranîn lê gur di baweriya gelê Kurd de sembola xerabî, barbarî û tirsê yê.

Tesîra vê rewşê xwe di çîrokên Kurmancî de bi awayekî cuda nîşan dide. Di van çîrokên Kurmancî/Kurdî de gur ji bo mirovên nezan, fêlbaz, tamahkâr û xodbîn tê bikaranîn.

Di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de motîfa gur ji bo kesên nezan, tamahkar û dekzan hatiye bikaranîn.

Di çîroka “Hedlîlk û Bedlîlk” de Gurê dekzan ji bo du karên bi navê Hedlîlk û Bedlîlk bixapîne dek û dolab gerandine lê çî karê xwe nebiriye serî, lê cara paşî gur çûye xwe di nav avreşikê de gevizandiye, pirça xwe reş kiriye û berê xwe daye koza Hedlîlk û Bedlîlkê û lingê xwe di binê derê kozê re direjî hundir kiriye, dengê xwe wek bizinê nerm kiriye û deng li herdu karan kiriye:

“Hedlîlikaaa ‘m Bedlîlikaaa’ m!

Derî vekî j’ dayîka xwe raaaa.

Çêra şînaaaa l’ber didanaaaan.

Şîrê terêêê li guhanaaaan”

Herdu kar li lingên reş nihêrîn û bi rengê reş û bi dengê nerm hatin xapandin, dawiyê derî li gur vekirin. Çawa derî hate vekirin gur xwe avête ser herdu karan û ew qurpandin (Bozarslan, 1999a: 61-67).¹³

¹³ Ev çîroka navdar li heremên cihêreng bi navê “Şengê û Pengê”, “Hedlîlk û Bedlîlk”, “Hedlîsik û Bedlîsik” jî tê zanîn.

Wekî ku di vê çîrokê de tê dîtîn, bi motîfa gur rewşa miroven tamahkâr, fêlbaz û zalim hatiye nîşandan. Sitemkarî û fêlbaziya wî hem ji tevgerên wî hem jî ji peyvên wî yên şîrîn ku ji herdu karan re gotibû:

“Hedlîlikaaa ‘m Bedlîlikaaa’ m!

Derî vekîin j’dayîka xwe raaaa.

Çêra şînaaaa l’ber didanaaaan.

Şîrê terêêê li guhanaaaan” (Bozarslan, 1999a: 67).

Bi van gotinan berxan dixapîne, ev jî nîşanî me dide ku gur ji bo ku bigihîje armanca xwe dikare her tiştî bike.

Her dem gur bi fêlbaziyê dernakeve pêş, carinan jî bi destê fêlbazekî mîna rovî gur dibe piyon. Di “Kûpa Qelîyê” de ev rewşa wî bî hêsanî tê dîtîn. Li gorî vê çîrokê Rovî bi dek û dolaban Gur dixapîne û Hirçê bi destê Gur dide kuştin (Bozarslan, 2000a: 18-20).

Di çîroka “Gurê Bilûrvan” de serguzešta di navbera hêstir, hesp û miyê de bi awakî alegorîk hatiye nîşandan. Di vê çîrokê de fenekiya gur mijara sereke ya çîrokê ye. Li gorî vê çîrokê: Gurekî gelek pîr û jihêzketî hebûye. Rojekê ev gur li ser mêjedema xwe fikirî û gelek xemgîn bû ku wî gelek lawirên kêmhêz kuştine û goştê wan xwariye. Ji ber vê yekê gelek xemgîn bû.

Gur biryar da ku tobê bike û here hecê û êdî li ser toba xwe danîşe. Li ser vê biryarê tebdîlî kiyafet kir û xwe xista şiklê heciyekî û bi wî şiklî bi rê ket.

Demekê li ser riya hecê meşîya bi dorê rastî miyê, hêstir û hespê hat her yek lawir dema ku çav li gur dikirin ji tirsan direviyan. Lê belê gur bi gotinên şîrîn sawa xwe li ser wan dişikand û ji her yekî re wiha digot:

— “Ma tu şaşîka serê min nabînî! Min tobe kiriye, ez êdî qet çu heywanekî nakujim û naxum. Ez nuha jî li ser riya hecê me. Ez ê biçim Mala Xwedê bibim hecê û li ser toba xwe bisekinim.” Bi vî awayî ew ji endîşê dûr dixistin û dua ji wan distand.

Gur piştî ku ji cem hespê çû, du sê seatan meşîya, piştî demekê birçî ket, ji ber birçîtiyê jî gelek westiyabû, loma li ber darekê rûnişt, lê birçîtiyê lê da zorê, ji nişkê ve gurtiya wî hat bîra wî û ji çûna hecê û ji tobê poşman bû, biryara xwe guherand û vegeriya da ku here sê lawiran bixwe.

Lê hesp û hêstirê ji niyeta gur zû fam kirin, û wan herdu lawiran bi fenekî xwe ji bela gur rizgar kir.

Gur fam kir ku herdu lawiran nikare nêçîr bike, rabû çu mêrga ku mî lê diçêriya, dema miyê gur dît deng lê kir û xêrhatin lê da û heca wî pîroz kir. Gur qiriya ser miyê û got:

— “Hecî mecî tune. Ez gur im û hatime ku te bixwim.”

Mî bi gotinên gur hem tirsîya hem jî şaş bû her çî qas li gur lava kir jî tewş bû. Miyê dît ku niyeta gur xerab e wê jî dekek amade kir û ji gur re got ku berî ku wê bikuje jê xwest ku gur mîna şivanan li bilûrê bixe û ew jî li ber bilûrê bireqise.

Gur daxwaza miyê qebûl kir û dest bi lêdana bilûrê kir mîna şivanan. Mî bi dengê bilûrê direqîsî û ji aliyekî jî ber bi gund ve dihat.

Zarokên gundiyan li dengê bilûrê şaş bûn. Paşî meraq kirin û dîtî ku wa ye gurek li bilûrê dixê. Dema ew dîtî “horya horya” û “kişkişa” kirin, dema dengê zarokan çû kûçikan, îcar bu ewt ewta wan û êrîşî gur kir. Gur nihotî kirin. Gur bi zorê xwe ji nav lepên kûçikan xelas kir. Hema çû nava newalekê, xwe vezeland û paqij kir. Dû re pojînî û sedema ku ji bûyerên çûyî tecrîbe û ders nestand gelek poşman bû û xwe suçdar dît û wiha deng li xwe kir:

— “Kuro, ma bavê te bilûrvan bû, kalê te bilûrvan bû ku tu ji wan mayî bilûrvan! Ew tiştên ku hespê û hêstirê anîn serê te, ji bo ku te ders û tecrîbe bîstanda bes bûn û zede bûn jî. Lê belê tu wisa bêhiş û bêaqil bûyî ku te ji wan bûyeran çu ders û tecrîbeyek nestand. Vêca jî tu hatî bi gotina miyê xapiyayî û jê ra bûyî bilûrvan. Ev ne gurîfî bû te kir, ev kerîfî bû. Ji ber vê nezanî û kerîtiya te jixwe goştê miyê bi devê te nebû, bi ser da jî kûçik li te rabûn û weha anîn serê te. Nuha jî zikê te ji birçîtiyê “qure-qur” dike û diêşe, laşê te jî ji ber birînan diçize. Kese ku ji bûyeran ders û tecrîbe nestîne û her carek bi peyva kesek bixape, rewşa wî dê weha be. Zikê wî jî dê birçî bimîne, serê wî jî dê bişikêeee ” (Bozarlan, 2000a: 68-87).

Wekî ku di benda dawî de tê dîtî bi motîfa gur, rewşa wan kesên temahkar ên ku ji tecrûbeyên xwe aqil nagirin û halê wan ê xerab hatiye vegotin.

Wek k udi vê çîrokê de tê dîtî, gur ji bo ku bigihîje armanca xwe her tiştî lidardixê, bi tebdîlî kiyafet bi hesasiyete lawiran dileyize û wan ji gumanan dûr dixê:

“Lê lê miya reben, tu çima wisa ji min direvî? Tu dibêjî qey ez ê bêm te bixwim, ne wisa! Ma tu şaşika serê min nabînî! Min tobe kiriye, ez êdî qet çî heywanekî nakujim û naxum. Ez niha jî li ser riya hecê me. Ez ê biçim Mala Xwedê bibim hecî û li ser toba xwe bisekinim” (Bozarlan, 2000a: 70).

Ev gotin fêlbaziya gur nîşanî me dide ku gur dikare her tiştî ji bo armanca xwe pêk binê.

3.3.3. Hirç/ Heş

Bi mecazî bi wateya zirteboz, çors tê bikaranîn an jî ji bo kesên bi adabi-muaşerat, nizanin tê gotin. Ev nêrîn di biwêjan de bi hesanî tê dîtin. (wek /mîna hirçan û hwd.)

Di baweriya gel de “Hirç” berê bûkeke ducanî bû, sedema ku hin tiştên ne baş kiribûn, ji şerm û fihêtiya xwe, dua kir ku heta dawiya dinê bibe lawireke kovî. Xweda duaya wê qêbûl kir û ew guherand û kir lawireke kovî.

Di çîrokên Kurmancî / Kurdî de hirç, her tim nîşana şexsên ehmeq û nezan e. Di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de di sê çîrokan da “motîfa hirçê” heye. Ev metafor ji bo mirovên bi zanebûn nafikirin simbolîze dike.

Di çîrokên “Şikefta Lawiran” û “Kûpê Qeliyê” de rewşa şexsên ku ji hevalên xerab xisarê dibînin û encama wan a trajîk bi metafora “hirçê” aniye ziman.

Di çîroka “Şikefta Lawiran” de rovî, bi fen û fûtan şer muqabilî hirçê hêrs dike û şer pencên xwe yên giran mîna mîrkut lê dide û hirçê bi wî awayî dide kuştin (Bozarslan, 200: 57-59).

Di “Kûpê Qeliyê” de encama hirçê ya ku xwuyê hevalê xwe nizane û jê zarar dîtiye hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê: Gur, hirç û roviya fenek bûbûn hevalên hev û bi şîrkatî ji xwe re kûpekî qeliyê çekiribû û biryar dabû ku heta sersalê devê kûpê qeliyê neyê vekirin.

Lê roviyê bi fen û fûtan kûpê qeliyê qedand. Dema ku sersal hat her sê heval çûne ser kûpe qeliyê, dema ku gur ji ser qeliyê çekûr hilanî lê mêze kir ku qelî hatiye xwarin.

Gur bi hêrs qîriya û got:

—“Kê ji we, ew bêbextî kiriye û goşt xwariye?” Bi vê gotina xwe xwest ku kesên bêbext derxe holê.”

Roviya fenek, fersend neda hirçê û deka ku li serê xwe amade kiribû anî ziman:

—“Rojeke bitav em her sê bi hev ra rabin biçin berojekê û xwe bidin ber tavê. Kê ji me goştê qeliyê xwaribe, ew ê laşê wê bibiriqe. Hingê em ê herduyên dî, em ê ceza bidinê.”

Ev peyva roviyê ji aliyê gur û hirçê ve hate qebûl kirin. Sibêtirê dema ku hişyar bûn dîtin ku taveke biriqok û germ daye rûyê erdê. Her sê çûn pêşberî tavê vezeliyan.

Ji bo ku hirç qelew bû, qaseke paşî pirça wê bi tesîra germê don da û hin bi hin biriqî. Wê demê rovî çav li gurê şikand û bala wî kişand ser pirça hirçê.

Hema gur û roviya fenek bi hev re êrîşî hirça reben kirin û rebenê bi awayekî hovane kuştin û herduyan hirç bi kêfa dilên xwe xwar (Bozarslan, 2000a: 7-20).

Bêguman çîrokeke mîtolojîkwarî ya “Hirç” ê jî heye. Di vê çîrokê de tengasiya jinika koçer ya ducanî ku ya mewranî bûbû hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê: Jinika Koçer ya ducanî ku dilê wê çûye kebabê lê sedema ku jinik şermokî bûye ew daxwaza xwe ji kesî re negotiye. Jinik ji bo ku wê daxwaza xwe pêk bîne ji hêstireka wan ya cehimî çêniyeke goştê sor jê kiriye û daye ser tifikê û kiriye kebab û bi kêfê kebaba xwe xwariye.

Lê belê hêj li ser kebabê bûye, xezûrê wê lê rast hatiye. Jinika ducanî ji şerman di ciyê xwe de wisa maye, ji şerman nekariye li xezûrê xwe jî binêre.

Bûkê paşî, ji bo ku rûye xwe ji xezûrê xwe veşêre herdu destên xwe dane ber rûyê xwe û rûyê xwe daye asîmên û ji dil û can dua kiriye û gotiye:

— “Xwedê, tu bidî xatirê mezinatiya xwe û navê xwe yê mezin, tu min veguherînî û bikî lawirekî kûvî, da ku ez ji nuha pê ve ji xwe ra li çiya û çolan bijîm û mirov êdî rûyê min nebînin. Ew hal çêtir e ji jiyaneke wisa ku ez heta dûwayiya umrê xwe li pêşberî malbata xwe û mirovên dî weha fedîkar û şermî bijîm û navê min bi nefsekî û çilekî di nava mirovan da belav bibe”

Xweda jî ev duaya ku ji dil û can kiribû qebûl kiriye ew ê veguherandiye û kiriye hirç (Bozarslan, 2006: 7-15). Di vê çîrokê de bi motîfa hirçê, rewşa mirovên neçar û belengaz tîne ziman.

3.3.4. Jûjî/ Jîjo / Jûje/ Dije

Dî çîrokan de jûjî bi hîlekarî û xodbînî/xweperestî tê pêşberî me. Hîlekarî û xodbîniya wî jî ji ber hirsê wî ye. Ev hirs gelek caran dibe sebeba xisareta wî.

Di baweriya Filehiyan de jûjî sembola xerbiyê tê dîtin (www.gizlimabet.com, 13.01.2015).

Di mîtolojiya Kurdî de jî jûjî demeke berê mirov bû lê ji ber hin kirinên wî yên xerab ji aliyê Xwedê Teala ve hatiye ceza kirin.

Di rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de çîrokeke mîtolojîkwarî jî çîroka “Jûjî” ye. Di vê çîrokê de afirandina jûjî hatiye vegotin. Di vê çîrokê de gelek taybetmendiyên motîfa jûjî hatine bikaranîn. Mîna hîlekarî, xodbînî, xerabî û hwd. Li gorî vê çîroka navdar:

Terziyekî navûdeng pir mahir hebûye. Lê belê ew bi qasî mahirbûna xwe ewqas jî ji mişteriyên xwe re ne durist bûye. Mişterî diçûne cem wî ku ji xwe re cilan bidin dirûtin. Qeysa wan cil digirtin û bi qasî qeysa wan qumaşê zêde ji wan dixwest. Ji wî qumaşê zedê ji xwe re jê dikir û cilên cuda didirûtin û difirotin, bi wî awayî gelek pere qezenç dikirin. Bi wan pereyan gelek mal û milkên wî bûbûn.

Bi wî awayî bûbû yek ji dewlemendtirînê bajarê xwe. Ew û malbata xwe mîna mîran dijîn.

Wek her mirovê sîtemkar rojekê cezayê zilm, neheqî û heramxwariya ku dikir hat dayîn.

Rojekê ji rojan, Xwedê li terzî hat xezebê û cezayê wî da ji ber hîlê û neheqiya ku li xelkê dikir. Xwedê ew veguherand û ji miroviyê derxist û kir jûjî. Xwedê qumaşên mişteriyên wî yên ku wî ew qat dikirin û jê dikirin bi giştî kirin qalikekî teng û ew jûjî xist nava qalikekî teng û tal, ew derziyên ku wî di qumaşên mişteriyên xwe da dişelandin, ew jî bi fermana Xwedê, bûn striyên tûj û di qalikekî wî da çikiyan.

Xwedê piştî ku ew ceza dayê, jê ra got:

—“Heta ku dinê hebe, tu yê tim û tim di nava wî qalikekî teng û tal da bijî û erdê da kaş kaş bibî.”

Aha jûjî bi wî awayî hat afirandin û heta dinê hebe ew ê bi wî awayî jiyana xwe bidomîne (Bozarslan, 2006: 16-22).

Encama mirovên heramxwar û nedurist bi “ motîfa jûjî” hatiye pêşkêşkirin. Bi saya vê çîrokê tê xwestin ku dawiya xerabî, neheqî û heramiyê tune ye. Her wiha jûjî bûyê sembola hirs û temahê, ev ji nîşanî me dide ku encama hirs û temahê xesaret e.

Di derbarê vê mijarê de dibejin ku: Sedema jûjî bi şev ji hêlîna xwe derdikeve dervê û dema raserî mirovan tê, serê xwe dixwe nav qalikekî xwe û xwe dike mîna tepik. Ev hal nîşaneyê fihêtkirina jûjî ye û ji poşmaniya kirina wî ya xerab tê (Ekinci, 30.05.2015).

Bi “motîfa jûjî” tê xwestin ku divê mirov jiyana xwe bi helalî û bi duristî bimeşîne û xwe her dem ji heramiyê dûr bike. Ev gotina pêşiyên ku li ser duristbûn û rastiyê hatiye gotin: “Rast be ji qeza û belan xelas be”. Ev mînak bi tenê jî nîşanî me dide ku civak çî qas ehemiyetê dide rastiyê. Ev jî ehemiyata rastiyê nîşanî me dide.

3.3.5. Ker/ Merkeb/ Her/ Çarpê

Di bîr û baweriya Kurdan de motîfa kerê di gelek biwêj û pêşgotinan de ji bo rexnegirtina li mirovên nezan, teral, bêhiş, şehwetperest, bêraman hatiye bikaranîn.

Ev nêrîn di Qur'ana pîroz de jî heye. Lê belê di Qur'anê de ji bo fêmkirina hin heqîqetan bi temsîlî, metafora kerê hatiye bikaranîn. Di Sûreya Cuma 62/5an de Xwedê Teala, alimên Cihûyan ên ku bi ilmê xwe emel nedikirin dişibîne kerên pirtûk hilgirtî. Dîsa di Qur'ana pîroz de di Sûreya El-Muddessîr: 74/ 49-51ê de Xwedê Teala kesên ku xwe ji Qur'ana pîroz dane alî dişibîne kerê kovî ku ji ber şêran direvin.

Motîfa kerê di çîrokên rojhilat û Kurmancî/Kurdî de bi gelemperî kesên ehmeq, nezan, nefsperestan simbolîze dike.

Nadîren, hin çîrokên mîna çîroka “Gayê Cot” de motîfa kerê wek nîşana heşyariyê hatiye bi kar anîn (bnr. Yıldırım, 2009: 3-16).

Di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de bi motîfa kerê rewşa mirovên nezan û pêşnebînî ku dawîya wan ya trajîk hatiye nîşandan. Di vê rêzeçîrokan de “motîfa kerê” bi tenê di çîroka “Zira Kerê û Lota Devê” de heye. Di vê çîrokê de serpêhatiya ker û devê ku ji ber bar, zehmetî û zilmê reviyabûn tê vegotin.

Li gorî vê çîrokê: Ker soz û bext dide devê ji bo nezire. Ger ker bizire belkî dîsa bikevin rewşa xerab. Piştî demekê ker soz û bextê ku ji devê re dabû negirt û daxwaza xwe ya zirînê ji devê re dibêje. Her çi qas devê lava kir û rewşa berê anî bîra wî jî tewş bû. Kerê got:

—“Rast e rast. Lê ez ker im; dema zira min bê divê ez bizirim. Ez bê zir nikarim bitebitim. Eger ez nezirim ez ê dîn bibim. Ne ku ez dixwazim em dîsa têkevin wî halî. Lê ez çi bikim zira min hatiye. Çi dibê bila bibe, divê ez bizirim”

Axir, çi qas devê lava û şîret kir jî, ker ji îrada xwe daneket û bi awazekî gurr zirî, bi dengê zirîna kerê, karwanekî ku di wan deran re derbas dibûn zira kerê bihîst û bi dengê kerê, cihê wan herdu heywanan kifş kirin û herdu heywan dîsa xistin bin bar. Li ser vê bûyerê devê ji kerê re got:

—“Kero, tu dibînî te çi anî serê me ne wisa! Pîrî min ji te re got “mezire” mû bi zimanê min hat. Lê tiştek neket serê te yê kerîn. Axir, te bi kerîtiya xwe em careka dî jî xistin binê bar” (Bozarslan, 2000a: 21-34).

Di vê çîrokê de “motîfa kerê” bi metaforî hatiye bikar anîn. Bi vê metaforê rewşa mirovê soz û bextên xwe li erdê dixin û li encama kirinên xwe nafikirin, yan jî xesarê

bi ehmeqî qebûl dikin dide nîşandan. Ev ramana kerê xwe di gotinên kerê de nîşan dide: “Rast e rast. Lê ez ker im, dema zira min bê divê ez bizirim. Ez bê zir nikarim bitebitim. Eger ez nezirim ez ê dîn bibim. Ne ku ez dixwazim em dîsa têkevin wî halî. Lê ez çi bikim zira min hatiye. Çi dibe bila bibe, divê ez bizirim” (Bozarlan, 2000a: 27).

Di vê çîrokê de bi “motîfa kerê” rexne li mirovên nezan tê girtin. Ev jî dide nîşandan ku miroven bêhiş û serhişk tenê zîrê nadin xwe didin der û dor û hevalên xwe jî.

3.3.6. Kêzik/ Hûrmêş/ Mêşlok/ Bûxik/ Buhik/ Heşare

Kêzik ji famîlyaya kurm û kêzan e. Perikên wan gelekî nazenîn in, qalikên wan pir hişk û rengin in. Bi vê rengînî û qeşengiya xwe di bîr û baweriyên gelan de cihekî taybet digirin.

Kêzîk, di mîtolojiyan de jî bi awayekî rengîn derdikeve pêş. Kêzik di mîtolojiyan de bi tene wek afirînerê cîhanê nayê dîtin. Wekî din wek nûçevanê Xwedê, nûnerê Xwedê jî tê hesibandin. Hin kêzik wek gosan, gûgerînk/ moza rêxê nîşana bêdawîtiyê tînin. Di mîtolojiya Japonan de jî kêzik sembola şeytên in (Saruhan, Tuncer, 2010: 21-27 jî Waîde, 1987: 255-256 jêgirtine).

Di Qur’ana pîroz de navên hin sûreyan wek Enkebût (Kêzîk), Neml (mûrî), Nehl (mêşa hingivê) bi navê kêzikan hatine bi nav kirin. Wekî din ji bo temsîl û teşbîhan di hin ayetan de navên kêzik, moz û qulî hene.

Kêzik, di cûreyên edebiyata Kurmancî/ Kurdî û cîhanê de bi awayekî cihêreng tînin bikaranîn. Di edebiyata Kurmancî/ Kurdî de çîroka Kêz Xatûn, mîna sembola pozbilindî û quretiyê, di edebiyata cîhanê de di çîroka “Circirîkê û Mûrî” yê de sembola teraliyê, di çîroka “Mûriya Atom” de jî kêzik wek sembola jîrekiyê tê dîtin.

Lê belê di rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de di çîroka “Mîr Mûrî û Kêz Xatûn”ê de bi motîfa kêzikê; êş, jan, wefa û pirsgerêken jinan bi zimanekî edebî hatinê îfade kirin.

Wekî din di van çîrokan de di çîroka Mîr Mûrî de xanima Mîr Mûrî Kêzîka Kezîzer di kesayeta xwe de wefadariya jinan nîşan dide (Bozarlan, 2002a: 39-50).

Di çîroka Kêz Xatûn’ê de her çi qas serpêhatiya Kêz Xatûn’ê, bi pirsgerêken jinan hatibe vegotin jî di vê çîrokê de di kesayeta Kêz Xatûn’ê de dawiya pozbilindî û qureyan a trajîk hatiyê nîşandan. Li gorî vê çîroka navdar: Kêz Xatûn, kêzikeke pir rengîn û

xweşik bû lê biqasî xweşik û rengîn bû evqas jî pozbilind û qure bû ji vê sedemê ji bo zewacê bi kêzikê nêr qaîl nedibû û herdem bibozbilindî wiha digot:

“Ez Kêz Xatûn im, qalik rengî nim.

Pirr xweşik im, pirr şîrîn im.

Bi çavdîtin ez kêzik im.

Lê bi rastî ez zêrîn im.”

ji ber vê quretî û bozbilindiya wê demeke dirêj ji xwe re mêrekî ku bizewice geriya. Dawiyê bi Mişko Axa re zewicî. Paşî ji ber vê pozbilindî û quretiya Kêz Xatûnê, Mişko Axa hêrs kir û ew kuşt (Bozarlan, 2002a: 62-87).

3.3.7. Kûsî/ Kîso/ Kîsî/ Kesa/ Kese

Motîfa kûsî di çîrokan de sembola hewldan, sebat, xebat û fenekiyê ye. Di hin çîrokan de jî kûsî bi motîfa lawirê alîkar tê bikaranîn.

Kûsî di mîtolojiya Kurdan de lawirekî mîtolojîk e. Li gorî vê baweriyê kûsî, demên berê mirov bû, sedema ku di pîvanê de bêdadî kiriye Xwedayê Teala ew veguherandiye û kiriye kûsî. Lewra di çîrokên mîtolojîk de motîfa kûsî nîşana bêdadî û bêwijdaniyê ye.

Di çîroka mîtolojîk ya “Kûsî” de sedema afirandina “Kûsî” tê vegotin. Li gorî vê çîrokê: Demekê mirovekî tenefiroşekî pir dewlemend hebû karê wî kirîn û firotina tenê bû. Lê bêlê bi qasî dewlemendiya xwe ewqas jî bêwijdan û kêmfersend bû. Hin bêwijdaniya wî ev bûn: Tene bi çapa/ ilba mezin dipîva û dikirî bi çapa /ilba biçûk jî difiroto yan jî dema tene erzan dibû, wî gelek tene dikirî û di enbaran de dicivand û dema tene buha dibû hingî wî tene ji enbarê derdixist û bi nerxeka zêde difiroto. Bi vî awayî hê bêhtir dewlemend dibû. Ji vê sedemê di wî bajarî de kesekî nedikarî pê ra hevberiyê bike û dikaneke tenefiroşiyê veke û bi duristî tenê bifiroşe.

Li ser vê bêwijdaniya wî tenefiroşî, xelkê gelek gazin dikirin. Vêca çar pênc rîsîpi ku ji aliyê xelkê ve hatibûn hilbijartin ku biçin bi tenefiroş re bipeyivin û daxwaz û gazinca gel jê re bibêjin. Ew rîspî çûn û şîret li tenefiroş kirin, gazin û rewşa gel jê re vegotin. Lê tenefiroş guh neda gazincên wan. Bê şerm û fedî keniya û ji wan re got :

—“Awayê min ê kirîn û firotina tenê ev e. Li hesabê kê tê teneyên xwe bifiroşe min û tenê ji min bikire, li hesabê kê nayê bila teneyên xwe ji min nekire çû zaroka min li kesekî tune.”

Li ser vê bersiva wî rîsîpiyan hêviyên xwe jê birîn û nifir lê kirin û ji dikana wî derketin çûn, piştî kû rîspî vegeyriyan û gotinên tenefiroş bi xelkê dan zanîn, xelkê dest bi nifiran kir.

Hingî xelkê nifir lê dikirin Xwedê nifirên wan qebûl kirin û cezayekî giran da wî tenefiroşî. Xwedê çapa wî ya mezîn kir qalikekî kod, çapa wî ya biçûk jî kir qalikekî dûz û pan, ew jî kir lawirekî hûr û xist navbera wan herdu qalikan, navê wî “kûsî” danî û bi vî awayî “kûsî” hate afirandin (Bozarslan, 2006: 23-37).

Mîna ku di vê çîroka “Kûsî” de rewş û axaftinên tenefiroş tê nîşandan “motîfa Kûsî” bûye sembola mirovê bêdadmend û bêwîjdan ê ku bi malê dinyayê temah dike. Bi encama wî mirovê bêwîjdan tê xwestin ku mirovên bêdadmend di dawiyê de ew ê her tim bîna ceza kirin. Ji ber vê sedemê dad û wîjdan tê telkîn kirin.

Her çî qas ev çîrok mîtolojîk bê qebûlkirin jî di derbarê vê mijarê de di Sûreya El-En’am: 6/152, Hûd: 11/84-85, El-Îsra: 17/35, Rehman: 55/9 û El-Mutaffifîn: 83/1-2-3an de Xwedê Teâla, ferman dike ku di pîvan û weznê de bi dadmendî tev bigerin û bêdadmendiyê nekin, di Sûreya El-Mutaffifîn: 83/16an de tê gotin ku mirovên bêdadmend ew ê herin dogehê. Ev rewş, dişibe encama mirovê tenefiroş, ev jî nîşanî me dide ku her çî qas çîroka “kûsî” fantezi bê hesibandin jî di nav rêzikên xwe de heqîqatê vedişêre.

Di nav rîzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de çîrokeke ku di nav de motîfa kûsî heye, çîroka “Beza Keroşkê û Kûsiyê” ye. Ev çîroka navdar di nav çîrokên Ezop de jî heye. Îro di nav edebiyata gelêrî ya Kurdî de gelek varyantên vê çîrokê hene. Di vê çîroka navdar de “motîfa kûsî” bûye sembola hewldan, sebat û xebata berdewam. Li gorî vê çîroka “Beza Keroşkê û Kûsiyê”: Kûsî û Keroşkê li ser koma genim li hev nekirin û di navbera wan de gelacî derket, ji bo aloziya di navbera xwe de çareser bikin çûn rîlê/daristanê nav lawiran, lawirên daristanê gihîştin hev û gelacî kirin. Dawî bîryar dan ku kûsî û keroşkê ji cem wan hatanî loda genim bezê bikin ger kî di pêşbaziyê de pêşî bigîhîje loda genim bila loda genim jê re be.

Kûsî û Keroşkê jî dest bi pêşbaziyê kir. Di rê de keroşk rastî siyeke xweş hatiye û xwestiye ku ji xwe re demeke kurt rakeve. Keroşkê çawa çavê xwe girtiye ketiye xeweke şîrîn. Dema Kûsî, keroşk di xewê de dît kêfa wî hat û wisa got:

—“Hêj ku keroşka teral ji xewê hişyar nebûye, divê ez bilezim û xwe bigihînim ber koma genim”

Lê kûsî bi meşa xwe ya giran ji bo armanca xwe meşiya, hetanî keroşk hişyar bû kûsî giha armanca xwe û bû xwediyê loda genim (Bozarlan, 1999a: 34-41).

Di vê çîrokê de, di motîfa kûsî de hatiye nîşandan ku mirov çî qas giran be jî lê di giranbûna xwe de ji bo armanca xwe berdewam be, sebat û xebatê pêk bîne ew ê di dawiyê de bigihîje xwesteka xwe.

3.3.8. Mar/ Ma'r / Maar/ Mahr/ Me'r/ Merre

Li ser rûyê erdê bi qasî mar ku di nav lawiran de wateya sembolîk girtibe tune ye. Carinan bi şiklê Xwedaiyan derdikeve pêşiya mirovan, geh jî dibe sedema derxistina mirovan ji bihiştê. (Kaval, 2015: 14)

Mar geh jî di mîtolojiyan de dibe nîşana xerabiyê. Wek ku di “Destana Kawayê Hesinkar” de du marên ku di milê Dehaq re derketibûn dibûn aferîdên xerabiyê (Şerefxan, 2009: 18). Di mîtolojiyên Sûmeriyên de mar dibe nîşana tolhildana li hember bêbextiyê (Petîşka, 1993: 40-44).

Motîfa mar xwe di amûrên maddî de jî bi awayekî cuda nîşanî me dide ku di wan motîfan de mar dibe sembola nemirî, bêdawîtî, hêz û tirsê. Îro li Bakur, di merşên bajarê Wan, Colemêrgê û goreyên Bêdlîsê de “motîfên mar” bi wateyên cuda tên neqîş kirin.

Sedema “mar” di baweriya wan de her dem dijminayî, xerabî û pintîtiye tîne bîra mirovan. Ji ber vê yeke mar wateyeke erênî hilnagire.

Di çîrokên Kurmancî de “motîfa mar “ mîna di baweriya Kurdan de bi wateya neêrenî tê bikaranîn. Di çîrokan de dibe nîşana nefis, xapandin, bêbextî, nerastî û dijminatîyê.

Motîfa mar di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de bi tenê di çîroka “ Biratiya Rovî û Mar” de heye. Di vê çîrokê de “motîfa mar” bi wateya neêrenî hatiye bikar anîn. Li gorî vê çîrokê:

Rojekê roviyek û marekî reş bûbûn destbirakên hev. Bi vî awayî di nava daristanan de ji bo nêçîrê digeriyan da ku ji xwe re lawirekî nêçîr bikin. Bi meşê xwe gihandin ber çemekî. Sedema ku marê reş bi avjeniyê nedizanî rovî xwe mexel kir û mar çû ser piştê wî û xwe kilor kir. Paşî rovî rabû û di nava avê de dest bi avjeniyê kir. Dema gihan nîvê çêm dît ku mar xwe li gewriya wî pêçaye. Rovî ji tirsan sedema pêçana li gewriya wî ji mar pirsî. Mar bersiv da rovî û got:

—“Ez dikim te gez bikim, birakê rovî”

Rovî bi bersiva wî gelek şaş bû, destbirakiya wan anî bîra mar. Lê Mar bi wî awayi bersiv da rovî û got:

—“Na min ji bîr nekiriye. Lê tu ji bîr dikî ku ez mar im. Erê ez bûm destbirakê te. Lê digel vê yekê jî ez marekî ji maran im. Xuyê min ê marîtiyê ev e ku ez kesên dî gez bikim.”

Her çi qasî rovî şîret li mar kir jî mar ji daxwaziya xwe nehat xwarê, rovî êdî hêviya xwe ji mar birî û dizanî ku destbirakiya maran pûç e, hingê dest bi rovîtiya xwe kir. Xwest ji mar xatir bixwazê.

Mar jê pirsî:

—“Tu yê çawa xatir ji min bixwazî?”

Rovî got:

—“Kêfa min pir ji gewriya te ya xweşik ra tê. Min divê ez gewriya te maç kim û bi vî awayî xatir ji te bixwazim. Paşê jî tu yê min gez bikî û ez ê bimirim”

Mar daxwaza rovî qebûl kir û gewriya xwe li ber devê rovî dirêj kir. Gewriya mar çawa hate ber devê rovî, bi dijwarî bi binê çena wî girt û gez kir. Heta ku hêza wî hebû şidand. Bi vî awayî mar kuşt (Bozarslan, 1999a: 54-60).

Di vê çîrokê de rewşa mirovê pintî û bêbext bi “motîfa mar” hatiye nîşandan. “Motîfa mar” di vê çîrokê de bûye nîşana, bêbextî, bextreşî û pintîtiyê. Ger di vê çîrokê de em gotinên mar bînin ber çavan hingê pintîtiyê û dijwariya neyariya mar qenc tê fêhm kirin. Ji bo ku dijwariya wî bê nîşandan paşnavê “reş” hatiye lê kirin ku ev paşnav xerabiya wî simbolîze dike. Ji bilî vê di gotinên mar de bi eşkereyî pelîtiya wî xwe nîşan dide : “Na min ji bîr nekiriye. Lê tu ji bîr dikî ku ez mar im. Erê ez bûm destbirakê te. Lê digel vê yekê jî ez marekî ji maran im. Xuyê min ê marîtiyê ew e ku ez kesên dî gez bikim ” (Bozarslan, 1999a: 57).

3.3.9. Meymûn/ Maymun/ Meymun/ Meymîn/ Meymwîn/ Mêmûn/ Mêmwîn

Meymûn di bîr û baweriya Kurdî de dema berê mirov bû, sedema nebaşî û xerabiya wî Xwedê ew ji mirovatiyê derxist veguherand û kir meymûn. Her çi qas ev çîrok mîtolojîk be jî bîngeha xwe ji Qur’anê distîne. Dema em li erdnîgarî, bîr û baweriya Kurdan dinêrin ku ekserî tabiyê ola Îslamê ne. Hin heqîqatên pirtûka pîroz li ser edebiyata Kurdî bandoreke gelek mezin kiriye ku qiseyên Qur’anê, edebiyata wan xemilandiye. Derbarê vê mijarê de di Sûreya Beqera: 2/65-66an de: “Bi rastî hûn

dizanin me çi aniyê serê wan ên ku di roja şemiyê de (bi girtina masiyan) zêdegavî dikirin. Me ji wan re got: “Bibin meymûnên rezîl û riswa (ew pîştî sê rojan çûne helaqê)!”

Vêca me ev rûdan ji bo wan ên di wê demê de û ji bo wan ên ku dê piştî wan bîn, kire îbret û me ji bo mutteqiyên jî xiste şîret”.

Mîna di van ayetên pîroz de jî tê dîtin ku ew mirovên ku zedêgavî avêtin û Xwedê ji ber vê sedemê ew veguherandine û kirine meymûn ku bibê îbret hem ji bo mirovên wê demê û hem jî yên piştî wan. Di vê çîroka “Meymûn” de ev nêrîn derdikeve pêş. Li gorî vê çîroka mîtolojîkwarî ya “Meymûn”:

Mirovekî pir dewlemend hebû lê ew mirovê dewlemend bi qasî dewlemendiya xwe ewqas jî mirovekî bêexlaq bû, bêexlaqiya wî jî ev bû ku “Li jinikên tazî temaşê dikir”. Mirovê bêexlaq ji bo vê armanca xwe pêk bînê di bajarê xwe de serşokek/hemameke mezin da çêkirin.

Bi avakirina serşokê re mêrik dest bi pêkanîna bêexlaqiya xwe kir. Wî bi dizî cilên jinan werdigirtin û mîna xizmetkareke di nav serşokê de karê xwe dimeşand û ji aliyekî jî li jinan temaşê dikir. Di dilê xwe de wisa digot:

—“Kêf kêfa min e, ez bi saya diravên xwe û bi saya dewlemendiya xwe vê zewq û sefayê dibînim. Eger diravê min tunebûna û ez zilamekî xizan bûma, min ê nekariya ev serşok ava bikira û tê da bi sedan jin bi tazîfî bidîtina û li wan temaşê bikira.”

Carinan jî kîsê diravan hembez dikir û wê demê wiha digot:

—“Diravên min en xweşdivî, bi hezaran spas ji we ra ku we ew îmkan daye min. Ez kole û xulamê we me. Ez bi saya we gihame daxwaza xwe û miradê dilê xwe, ji bo min hûn her tişt in.”

Lê belê rojekê ji rojan di hemamê de rewşa mêrik bala jinikekê kişand, gumana xwe ji jinikên derdora xwe re eşkere kir. Jinikan bi vê gumanê li dora mêrik gihan hev û qiriyên serê û hema rahiştin ew şêlandin. Dîtin ku xwediyê serşokê ye. Li ser vê rewşa xerab hingî jinikan bi dil û can destên xwe li asîmên vekirin û li mêrik nifir kirin û gotin:

—“Em ji Xwedê hêvî dikin ku ceza bide te û te bike lawirekî qeşmer, heta ku dinê hebe tu bibî qeşmer û pêtinazikê mirovan û wisa bimînî, da ku her kes qeşmeriyê bi te bike û bi te bikene!”

Xwedê duaya wan jinikan qebûl kir û li mirovê bêexlaq hate xezebê û ew veguherand û kire meymûn (Bozarlan, 2006: 30-37).

Mîna ku di vê çîrokê de jî tê dîtin, bi motîfa meymûn, encama mirovê nefspereşt û bêexlaq hatiye nîşandan. Ji ber vê yekê motîfa meymûn bûye sembola nefspereştî, bêexlaqî û serxweçûnê. Ev bergeha xwe di van rêzikan de nîşanî me dide: “Kêf kêfa min e, ez bi saya diravên xwe û bi saya dewlemendiya xwe vê zewq û sefayê dibînim. Eger diravê min tune bibûna û ez zilamekî xizan bûma, min ê nekariya ev serşok ava bikira û tê da bi sedan jin bi tazîfî bidîtina û li wan temaşe bikira” (Bozarlan, 2006: 34).

3.3.10. Mişk/ Merre

Li gorî gelek kesan taybetiyeke sereke ya mişkan şermokî ye. Lê di baweriya Xiristiyaniyê de mişk wek şeytanê ku koka dara jiyanê dikûje, tê dîtin. Lê di hin çandên dî de mişk wek heywanên qitût tê hesabandin (www.gizlimabet.com, 13.01.2015).

Di baweriya Îslamê de mişk lawirekî necis tê hesabandin. Ji ber vê yekê di tesewûfê de peyva mişk wateyeke neêrenî îfade dike. Ev nêrin di mesneviya Mewlana de bi hêsani tê dîtin. Di vê pirtûka qedîm de mişk wek sembola nezanî, hîlekari, çavbirçîti û tirsê hatiye bikaranîn (Nur, 2013: 18-30).

Lê di çîrokên Kurmancî/ Kurdî de motîfa mişk wateyeke erênî hildigire. Her çî qas mişk biçûk û kêmhêz be jî gelek aloziyan çareser dike û di van şolan de serkeftî dibe. Ji ber vê di çîrokan de mîna lawirekî xwedî hêz û şîrîn tê dîtin.

Di rêzeçîrokên “Meselokên lawiran” de motîfa mişk wek sembola hevgirtî, yekîti û têkoşînê hatiye bikaranîn. Di hin çîrokan de jî mişk, bi motîfa lawirê alîkar tê nîşandan. Di çîroka “Serketina Mişkan” de motîfa mişkê wek sembola aqil, hevgirtin û yekîtiyê hatiye bikaranîn. Ev çîrok serpêhatiya di navbera pisîka bînefs û mişkên mişkistanê de vedibêje. Li gorî vê çîrokê:

Komeke mişkên rîspî, ji terefê pisîka ku li mişkistanê musalet bûbû bi bêbêxtî hatin xapandin û pisîkê ewan yeko yeko kuştibûn. Ji wê komê hew yekî xwe ji xezaba pisîkê xelas kiribû.

Dema xebera bêbextiya pisîkê li mişkistanê belav bû dîsa tirs û sawa pisîkê kete dilê mişkan.

Mişkan ji bo çareseriyê gelek tişt gotin. Cara paşî rêya berxwedanê hate pejirandin. Mişkan ji bo parastina xwe bi awayekî zanayî rêbaza xwe bi kar anî. Li gorî vê rêbazê mişkan êvarê xwe li der û dora kaviîlê veşart.

Sibêtirê dema ku roj hilat, pisîkê disa çû ber devê kavila mişkan rawestiya ku mişkan nêçîr bike. Tam di vê demê de du sê mişk bi “viçeviçê” di ber pisîkê re derbas bûn. Hema vê gavê pisîkê xwe avetê ser wan. Tam di vî çaxî de bi hezaran mişk bi hev re erîşî pisîkê kirin. Laşê pisîkê dan ber gezan û pisîk bi vî awayî kuştin.

Mişkan termê pisîkê li holê hiştin û çûn kaviîlên xwe sê roj û sê şevan azadiya xwe pîroz kir. Di dûwayiya kêf û şahiyê de mişkekî navsal rabû û wiha got:

—“Gelf hevalan, em êdî ji pisîkê azad û rizgar bûn. Ev ji bo me serketineka pîrr mezin û girîng e. Lê divê em ji bîr nekin ku me ev serketin bi saya hevgirtin û yekîtiya xwe qezenc kir. Pisîkê em yeko yeko nêçîr dikirin, dikuştin û dixwarin. Lê dema em gihan hev û me hêza xwe kir yek û em bi tevahî çûn pisîkê, me ev zorbirî kir û kuşt. Bi wî awayî, me îspat kir ku bi rastî jî piranî dikarê berde mêraniyê. Lê belê divê em ji nuha pê ve jî vê hevgirtin û yekîtiya xwe biparêzin û bidomînin. Eger di pêşedemê da jî hin pisîk bîn ser kavila me û bixwazin me nêçîr bikin, divê ku em li dijê wan jî weha hevgirtî bin û yek bin, hevgirtin û yekîtiya xwe weha biparêzin û bidomînin, êdî çu pisîkek nikare me zorbirî û bindest bikeeee (Bozarlan, 2005: 56-76).

Di vê çîrokê de encama berxwedan û yekîtiyê di motîfa mişk de hatiye nîşandan. Mîna ku di vegotinên mişkên navsal de tê dîtin ku ger yekîfî û hevgirtin di nav civatan de pêk were ev civat gelek pîrsgirêkên xwe bi hêsanî çareser dikin. Ev peyam di vegotinên mişkên navsal de hatiye ragihandin. Di vê peyamê de girîngiya hevgirtin û yekîtiyê daye nîşandan.

Di çîroka “Gustîla Efsûnî” de bi alîkariya mişk hatiye îspat kirin ku ger mirov çî qas biçûk û bêhêz bê dîtin jî ev nayê wateya ku bêberjewendî ye. Di vê çîrokê de bi motîfa mişk ev raman derdikeve holê.

Wek ku di vê çîrokê de tê vegotin: Dêw gustîla efsûnî dizîbû û ev gustîl jî xistibû nava sindoqa ku bi miftê qufat bû. Lawirên xênî demekê li ser pîrsgirêka vekirina sindoqê fikirîn. Paşî sê ji bo çareseriyê ve şolê alîkarî ji mişk xwest. Mişk bi dilxweşî got:

—“Baş e, ez ji hatinê ra amade me. Lewra ez jî birçî me û ez jî heta niha wek we bi xêra gustîla efsûnî xwedî bûme.”

Dawiyê ji bo rizgarkirina gustîla efsûnî; Se, mişk, pisîk û kevok ketin rê û çûn mala dêw.

Kevok li ser darê, se û pisîkê jî li ber derî nobet girtin. Mişk jî bi lez û bez di qulika diwarê xênî ra derbasî hundir bû û bi didanê xwe yê tûj sindoq kurisand û gustîla efsûnî xiste devê xwe û bi lez û bez çû cem se û pisîkê. Bi vî awayî mişkê gustîla efsûnî ji dêw rizgar kir (Bozarlan; 2005: 35-45).

3.3.11. Mûrî/ Muri / Morî/ Gêrik/ Gele/ Gêle/ Morcela/ Morcele

Mûrî di nav lawiran de bi jîrbûna xwe navdar e. Di nav komên mûriyan de ji xeyn jîrbûna wan girsegira karparî jî heye (www.bilgiustam.com, 24.03.2015).

Mûrî ji bo temînkirina rizqên xwe her dem di nava kar û baran de ye. Mûrî di baweriya gel de sembola bereketê ye. Ji ber vê yekê duaya bereketê ku bi navê duaya mûrî jî tê bi nav kirin.

Di çîrokan de “Motîfa mûrî” bi sembola zîrekî û jîrbûnê tê bi kar anîn. Derbarê vê mijarê de çîroka “Çîrçîrok û Mûrî” gelek bi navûdeng in. Motîfa Mûrî di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de wek sembola dadmendî û dilovaniyê tê emilandin. Ehemiyeta dadmendî û dilovaniyê di kesayeta “Mûrî” yê de hatiye nîşandan.

Dî rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de di çîroka “Mîr Mûrî “ de ehemiyeta dadmendiyê di kesayeta “Mîr Mûrî” de weha hatiye vegotin:

Mûriyek hebû ku ew mîrê mûriyan bû, ji xeyn Moristanê li welatê der û dorê jî bi dadmendî û dilovaniya xwe hatibû nasîn.

Mîr Mûrî ewqas nefsbîçûk bû ku karê xwe yê şexsî tu carî bi mûriyan nedida kirin. Her çî qas mûriyan dî ji ber vê rewşê îfraz dikirin û dixwestin karê wî bikin jî Mîr Mûrî tu car destûr nedida wan û ji wan re digot:

—“Naaaa, heqê min tune ku ez karê xwe yê şexsî yan karê mala xwe bi we bidim kirin. Karê welêt li ser milên me hemiyana wezîfe ye û pêwist e ku em wê wezîfê pêk bînin. Lê herçî karê şexsî divê ku her kes karê xwe bi xwe bike. Mûristan welatekî azad e, di navbera hemî mûriyan da jî wekhevî heye. Li vî welatî çu kesek ne xulamê kesekî dî ye.”

Di despêka meha gulanê de rojekê ji rojan li moristanê şiliyeke dijwar dest pê kir. Ji ber wê baranê gelek xaniyan dilop dikir. Di wê baranê de xaniyê Mîr Mûrî jî dilop dikir.

Mîr Mûrî ji bo ku dilopan bisekinîne çû ser xênî û qeys girt û bangeran li ser xênî bir û anî. Kêliyekê hevsenga wî xera bû û şemîti ket erdê, piştî kû ket bangeran jî di ser ra derbas bû û ew pelixand.

Bi qîrîna Mîr Mûrî, xêzana wî Kêzika Kezîzer ji xênî derket ku çî bibîne termê şûyê xwe li erdê bê can dît. Hema bê hemdê xwe kir qîrîn. Bi qîrîna wê hemî mûristan bi mirina Mîr Mûrî haydar bûn.

Mirina Mîr Mûrî hemû Moristan xiste nav şînê. Xêzana wî ji ber şîna şûyê xwe herdu guliyên xwe kur kir.

Piştî mirina Mîr Mûrî, Kezîzerê biryar da ku ji Morîstanê koç bike, her çî qas mûriyan lava kirin jî tewş bû.

Kezîzer li ser biryara xwe ji gund derket, piştî ku ji Morîstanê derket rastî gundekî hat ku bûkekê li ber tifikê nan dipeht. Dema çavê wê bi Kezîzerê ket ku herdu keziyên wê jê kirine, meraq kir û ji kezîzerê pirsî.

Kêzika Kezîzer giriya û bersiv da bûkê:

—“Li min kezî jêkirê, li mina kezî jêkirê. Mîr Mûrî di binê bangerên da mirî.”

Wê jinikê jî nav û dengê Mîr Mûrî bihîstibû. Dema xebera mirina wî bihîst gelek xemgîn bû. Wê jî bi xem û derdê Mîr Mûrî, teniya sêlê di cilên xwe û rûyê xwe da. Bi vî awayî ji bo Mîr Mûrî şîn kir û reş girê da.

Piştî reşgirêdana bûkê, xebera mirina Mîr Mûrî di nav daristanê de belav bû. Kesên ku Mîr Mûrî nas dikir, her yekî şîna xwe bi awayekî cuda kir (Bozarlan, 2002a: 37-61).

Wek ku di vê çîrokê de di gotinên Mîr Mûrî de ku ji mûriyan re vegotiye:

“Naaaa, heqê min tune ku ez karê xwe yê şexsî yan karê mala xwe bi we bidin kirin. Karê welêt li ser milên me hemiyan wezîfe ye û pêwîst e ku em wê wezîfê pêk bînin. Lê herçî karê şexsî divê ku her kes karê xwe bi xwe bikin. Mûristan welatekî azad e, di navbera hemî mûriyan da jî wekhevî heye. Li vî welatî çu kesek ne xulamê kesekî dî ye” (Bozarlan; 2002: 39).

Di van gotin û tevgeran de dadmendî û dilovaniya Mîr Mûrî hatiye nîşandan. Di kesayeta Mîr Mûrî de girîngiya dadê derdikeve holê û Mîr Mûrî jî dibe sembola dadê. Jana ku daye dilê mirovan jî ji dadnasî, heqnasî, xêrxwazî û dilovaniya wî ye.

3.3.12. Pisîk/ Pisîng/ Pising/ Kitik

Di nav dîroka mirovahiyê de li pisîkê gelek wateyên cuda bar bûne: Di baweriyaya Misiriyana de pisîk sembola xweşîkbûna Xwedawend, musîkî, evîn û qeşengiyê ye. Di qewmên Cermen ên qedîm de sembola fihuş û serbestiyê ye (Aysoy, 27.03.2015).

Di binhişa rojhilatanvanan de pisîk bi sifeta “nankor” wekhev e. Lê belê di nav gelê Misilman de sedema ku pisîkê Hz. Pêxember li hemberî mar parastiye pîroz tê dîtin.

Di çîrokên Kurmancî/ Kurdî de motîfa pisîkê gelek rengîn e. Di van çîrokan de pisîk şibandine mirovên diz, hîlekar, nankor, bêbext, nerast, ehmeq û şelaq.

Ev rengînî di çîroka rêzeçîrokên “Meselokên Lawir” de bi awayekî baş hatiye pêşkêşkirin: Di çîroka “Gustîla Efsûnî” de bêbextî û nerastî di kesayeta pisîkê de hatiye nîşandan. Li gorî vê çîrokê: Gustîla efsûnî ya kalo û pîrê ji aliyê dêw ve hatibû dizîn. Ev gustîl ji aliyê pisîk, mişk û alîkariya kevokê ve ji mala dêw tê revandin.

Lê belê pisîk li hevalên xwe bêbextiyê dikê û gustîlê ji wan distîne û bi tena serê xwe ji kalo û pîrê re tîne.

Dema ku kalo û pîrê dîsa gihan gustîla efsûnî gelek kêfxweş bûn û malavayiya pisîkê kir û pîrsa mişk û sê kir.

Pisîkê jî ji bo ku mişk û sê li ber çavê kalo û pîrê reş bike, di derheqê her duyan de derew kirin û got:

—“Mişk li mala dêw hin xurekên xweş dîtin û dilê wî bijiya wan xurekan. Ji bo ku wan xurekên xweş bixwe, ji me qetiya û terka me kir, digel me nehat. Wî xwarina kartolên dêw di ser hevaliya me ra girt.”

Di heqê sê da jî wisa derew kir:

—“Dema ku em gihan ber çemê ser rê, sê jî xwe avêt nav ava çem û tê da dest bi avjeniyê kir. Wî jî terka min kir û ez bi tenê hiştim. Min dizanî ku hûn birçî bûne. Ez bi tenê ketim rê, bi çi kul û halî ez hatim giham malê û min gustîla efsûnî bi selametî ji we ra anî” (Bozarşan, 2005: 32-52).

Di çîrokan de ji xeynê bêbextî û nerastiya pisîkê, dekzaniya wan jî navdar e. Pisîk ji bo bigihîje armanca xwe her rêyê ji xwe re mubah dibîne û dekên xwe jî bi zanebûn dimeşîne, bi wî awayî digihîje xwesteka xwe.

Di çîroka “Serketina Mişkan” de pisîk bi dekzaniya xwe hemî mişkan dixapîne û wan digire û dixwe. Li gorî vê çîroka Serketina Mişkan: Pisîkeke dekzan, li kavila mişkan musalet bûbû û gelek mişk nêçîr dikirin û dixwarin.

Li ser biryara mişkên, rîsîpiyên mişkan ji bo vê şolê çareser bikin çûn xwe di qulên diwarê li ser riya pisîkê de veşartin.

Dema pisîk di ber wan ew derbas sibû deng li pisîkê kirin û lava û tikayên xwe ji pisîkê re gotin.

Pisîkê nedizanî ku ev deng ji ku tê lê dîsa fêhm kir ku rewşeke nû re rû bi rû maye. Ji bo wê pîrsgirêkê çareser bike dest bi dekan kir û ji mişkan re got:

—“Bi Xwedê hûn rast dibêjin. Ev ne karê lawiran e ku ez li dijî we dikim. Heta nuha min qet bîr bi vê yekê nebîrbû. Kesekî jî tiştêki weha ji min ra negotibû. Min digot qey awayê jîyanê wisa ye ku hem kî bi kê bikare heqê wî heye ku wî bikuje û bixwe. Lê nuha ku min ev peyvên we bihîstin, ji nişkê ve ez li xwe varqilîm û min fam kir ku bi rastî ez li we neheq im”

Mişkan bi gotinên pisîkê gelek kêfxweş bûn lê pisîkê berî ku here xwest ku xatir ji wan bixwaze. Xwesteka pisîkê, mişkan xiste nav nîqaşan hê jî mişkan ji bêbextiya pisîkê ditirsiyan. Piştî ku pisîk soz û bext dan wan. Mişkan ji kaviîlê xwe derketin û yek bi yek destê pisîkê girtin û hev hembêz kirin. Mişkan qanih bûbûn ku pisîk tu zirarê nade wan.

Tam vê gavê pisîkê xwe avêt ser wan, ew kirin binê zikê xwe û yeko yeko ew xwarin, bi tenê yek mişkî xwe ji xezeba pisîkê rizgar kir (Bozarslan, 2005: 56-70).

Mîna ku di vê çîroka “Serketina Mişkan” de tê xwuyan pêwîst e ku mirov tu car bi neyarên xwe bawer neke, lewra ew neyar tu caran ji daxwaz û xwestekên xwe nayên xwarê û ji bo xapandina dijminên xwe her rêyê ji xwe re mubah dibînin, di vê çîrokê de jî bi “motîfa pisîk” taybetmandiya mirovê dijmin hatiye nîşandan.

Di çîroka bi navê “Pisîka Dûvjêkirî” de serpehatiya pisîka dûvjêkirî ya bênefs û çavbirçî bi awayekî zelal û herikbar hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê: Pisîka bênefs û ziyarok rojekê keysa xwe li şîrê pîrê anîbû, bi kêfxweşî şîr bi çelpeçelp vedixwar. Pîre bi çelpeçelpa pisîkê hisiya û bihêrs bû ji nîşkê ve pîrê çû pey pisîkê û destê xwe avêt dûvê wê û bi kêrê ji korikê ve jê kir.

Pisîkê dest bi lavayan kir û got:

—“Pîrê pîrê, guneh im, nikarim bê qemçiyê bijîm, qemça min bide min, ez biçim ser hal û hemdê xwe. Tobe be, ez careke dî nayêm şîrê te venaxum.”

Lê belê pîrê bi lava û tikayan nerm nebû û jê re got:

—“Here ji min ra bi qasî şîrê min ê ku te vexwar şîr bîne, hingê ez ê qemça te bidim te”

Pisîkê ji bo ku şîrê pîrê tedarîk bike û dîsa bigihîje dûvê xwe dest bixe bi dorê çû cem bizin, dar, hesinkar, mirîşk, kewar û kaniyekê. Li ber her yekî geriya lê belê her yekî daxwazek jê kirin. Dawî jî li ser xwesteka kaniyê çû cem keçan û ji wan lava kir:

—“Keçno keçno werin li ser kaniyê bireqîsin, kanî avê bide, bibim heriyê çêkim û pê kewarê biseyînim, kewar lext bide, bibim bidim tûtûyê, tûtû hêkê bide, bibim bidim hesinkêr, hesinker dasêbide, bibim bidim darê, darê çilo bide, bibim bidim bizê biz şîr bide, bibim bidim pîrê, pîrê qemçê bide biçim ser hal û hemdê xwe”

Dû re keçik çûn ser kaniyê reqîsîn. Kaniyê av da pisîkê û bi vî awayî xwestekên kewar, mirîşk, hesinkar, dar û bizinê bi cî anîn. Dû re bizinê şîr da pisîkê û pisîkê şîrê bizinê da pîrê dawî ji pîrê dûvê wê dayê, pisîkê jî dûvê xwe wek berê bi xwe ve zeliqand.

Pisîkê ji wê rojê pê ve tobe kir ku êdî tu car qet zerarekê nede tu kesî. (Bozarslan, 1999a: 27-34).

Di vê çîrokê de bi motîfa pisîkê rewşa mirovê bînefs û ehmeq bi vê motîfa pisîkê hatiye nîşandan ku ger mirov, neheqî û zilmê li xelkê bikê, bêguman rojekê ew ê jî rastî bûyerên xerab bê.

Di çîroka “Mîr Zoro” de zîrekî û hişmendî hatiye pesinandin. Di vê çîrokê de dide nîşandan ku aqil mifteya hemî pîrsgirêk û aloziyan e. Ger ku mirov, bi aqilê xwe emel bike ew ê her dem bi ser bikeve. Di çîroka Mîr Zoro de ev serpehatiya pisîkê wisa hatiye peşkeş kirin: Pisîka konê ku navê xwe wek Mîr Zoro dabû nasîn hebû bi zanebûn roviyekî fenek xapand û wî ji xwe re kir xulamêkî sadîq.

Rojêke ji rojan rovî ji Mîr Zoro re goşt dibir. Lê li ser rê bi dorê raserî gur, hirç û keftarekî hat. Her yekî ji lawiran dawa goştê ji rovî kir. Lê rovî digot ku goştê ku di destê wî de ye yê Mîr Zoro ye. Dû re jî behsa hêz û qudreta wî ji wan re digot. Bi vî awayî sawa Mîr Zoro ket dilê wan lawiran jî.

Her sê lawiran ziyafetek amade kir û hirç jî çû bangî Mîr Zoro kir.

Mîr Zoro banga wan bi kêfxweşî qebûl kir. Mîr Zoro li pêş, hirç û rovî li paş diçûn ciyê ziyafetê.

Qasekê meşiyar ji nişkê vê Mîr Zoro xwe avête çûkê ku li ser guliyê darê veniştîbû, çawa çûk girt, avête devê xwe û xwar.

Dema hirç ev hunera Mîr Zoro dît, sawa wî zêdetir bû. Hirç destûr ji Mîr Zoro xwest ku berî wan herê ciyê ziyafetê da ku xeberê bide gur û keftêr.

Hirç hate ciyê ziyafetê û qala Mîr Zoro û hunera wî bi fişalî ji keftar û gur re vegot ku bi vî awayî sawa Mîr Zoro, li ser gur û keftêr zêdetir bû. Her sê lawiran ji bo ku xwe ji Mîr Zoro biparêzin biryar dan ku xwe veşêrin.

Dema ku Mîr Zoro û rovî hatin ciyê ziyafetê dît ku ji sitîla goşt pê ve tu tişt nedît. Piştê Mîr Zoro ciyê keftar, hirç û gur kifş kir. Dema ku Mîr Zoro dît in her sê lawir ji tirsê wî reviyar û çûn.

Bi vî awayî sitîla goşt ji Mîr Zoro û rovî re ma. Dema ku goşt dixwarin Mîr Zoro di binê çavan re li rovî mêze kir û di dile xwe de wisa got:

—“Ku ev rovî niha binase û bizane kî me û çî me, kî dizane dê çî bîne serê min û li dijî min çawa serî hilde. Belkî jî di cî da min bifetisîne yan jî parçe parçe bike. Lê ku gur û hirç û keftêr jî bizanîna ez kî me û çî qas kêmhêz im, ma dê çî neanîna serê min! Digel ku wan ez nenasîm jî, eger her siyan milên xwe bidana hev û li hemberî min rawestiyana, ma min ê bikariya çî bikira bi wan! Qet. Lê belê min hem rovî ji xwe ra kiriye xulam, hem jî digel vê kêmhêziya xwe, min bera wan her sê lawirên xurt û laşçirîn da. Çima? Ez ji der hatim vî rêlî. Rêl rêlê wan bû, ji bav û kalên xwe ve ew di vî rêlî da dijîyan, dixwarin û vedixwarin û bi kêfa dilê xwe digeriyan. Lê belê, digel ku ez ne ji lawirên vî rêlî bûn, biyanî bûm û ji ciyekî dî hatibûm vir, min ev rêl xist binê destê xwe û min lawirên vî rêlî ji xwe ra bindest kirin.”

Sedema ku Mîr Zoro deka xwe bi zanebûn bi kar anî û sawa xwe xiste dilê lawiran bi ser ket û bû mîrê daristanê (Bozarslan, 1999a: 70-91).

3.3.13. Qijik/ Qirrik/ Qijike/ Qela/ Qirawile/ Qerpelase

Dîroka qijikê di hemî pirtûkên pîroz de bi serpêhatiya Habîl û Qabîl cî girtiye û di vê serpêhatiyê de qijikê ji bo defînkirina Habîl, ji Qabîl re rêberî kiriye. Ev xizmeta wî ya xeyrî-şuûr dîsa jî qijik ji wateya neêrenî xelas nekiriye (Kavak, 2013: 118).

Îro mîna edebiyata Kurdî di edebiyata Ereb, Tirk, Fars, Yewnan û hwd. de qijik bi gelemperî bi gelek taybetmendiyên xwe yê xwezayî wek deng, meş, reng û hwd. bi wateya neerênî hatiye nasîn.

Di çîrokên Kurmancî de bi wateya bêyom/bêoxir tê emilandin û mirovên li pey hewesan simbolîze dike. Di rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de çîrokên ku me lêkolane motîfa Qijikê bi tenê di çîroka “Meşa Qijikê” de heye. Di vê çîrokê de serpêhatiya qijika ku hewesî meşa kevokê dikir hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê qijikê meşa xwe nedieciband û xweziya xwe bi meşa kevokê dianî. Xwesteka xwe ji kevokê re got. Kevokê şîret lê kir û got:

—“Xuşka qijik, eger tu bi peyva min dikî, dev ji vê xwezî û hewesê berde. Tu qijik î, bi qijikiya xwe razî be. Eger tu bi çavê min yan bi çavê teyrekî dî li xwe binêrî ez ditirsim ku tu xwe şaş maş bikî, ji xwiyê xwe yê berê jî derkevî û yekcar berbat bibî.”

Her çi qasî kevokê lava kir jî tewş bû. Qijikê ji daxwaza xwe nehat xwarê û ji kevokê re got ku:

—“Na xuşka kevok, ez meşa xwe naecibînim. Çi dibe bila bibe, divê ku ez xwe hînî wê meşa te ya xweş bikim”

Qijik vêca rabû dest bi teqlîda meşa kevokê kir. Çi qas xebitî û xîret kir jî nikarîbû wek kevokê bimeşe. Ji vê sedemê pir xemgîn bû, êdî hêviya xwe ji hînbûna meşa kevokê birî û têgihîşt ku nikare mîna kevokê bimeşe.

Piştî ku qijikê hêviya xwe birî û poşman bû xwest ku vegere ser meşa berê. Bi vê daxwazê dest bi meşê kir û xebitî, lê belê meşa xwe ya berê jibîr kiribû. Her cara ku lingên xwe dilivandin, çindik dida xwe û xwe bilind dikir lê li erdê diket.

Wê rewşê bala kevokê kişand û bi çindika qijikê kenîya û tinaz pê kir. Her çi qas qijikê dawiyê xeletiya xwe fam kiribe jî, êdî nedikarî mîna berê bimeşe (Bozarslan, 2002a: 7-13).

Di vê çîrokê de bi motîfa qijikê, encama wan kesên ku bêhiş û ehmaq in ku li pey hewesata xwe dimeşin ku rewşa xwe ya xwezayî neecibînin û bi hewes û xweziyan rewş û kirinên hevalên xwe bi bêaqilî diecibînin û dawiyê jî ji wan tevgerên xwe poşman dibin hatiye vegotin. Bi vê motîfê rewşa mirovê ehmaq ku biryara şaş dide û bi şaşbûn tev digere, di encamê de dixisire tê nîşandan ku xwediyê biryarê, ji ber sedema bêhişiya xwe dixisire û cefayê dikişîne. Ev rewş di kesayeta qijikê de hatiye diyar kirin.

3.3.14. Rovî/ Rûvî/ Rwîvî/ Rîvî/ Luwî/ Luye

Rovî di mîtoloji û folklorê gelan de bi fenekiya xwe navdar e. Sedema ku di her parzemîn û erdnîgariyê de dijî, bi vê taybetmendiya xwe di folklor û mîtolojiya gelan de gelek navdar e.

Di nav lawirên kovî de ji lawirên herî zeîf û newêrek yek jî bêguman rovî ye, lê rovî bi çalakî û fenekiya xwe gelek lawirên hêzdar nêçîr dike û dixwe, ev taybetmendiya wî navdariyekê dide wî.

Di çîrokên Kurmancî/Kurdî de motîfa herî navdar motîfa rovî ye. Bi vê motîfê rewşa mirovên fenek, pinîti, bêbext, newêrek û bîndar tê nîşandan. Bi vî awayî gelek çîrokên rengîn derdikevin holê.

Di rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de motîfa rovî cihekî girîng digire. Di van çîrokan de rovî, bi awayekî cuda derdikeve pêş. Rovî dema ku pêjna rewşeke xeternak dike yan jî bi rewşeke xeternak re rû bi rû dimîne ya dekekê amade dike yan jî mîna ku di çîroka “Dîk û Rovî” de hatiye vegotin, rovî dema ku bi rewşa xerab re rû bi rû dimîne ji bo rizgariya xwe direve. Ev rewşa rovî di çîroka “Dîk û Rovî” de wiha hatiye vegotin:

Roviyê fenek bi mahna nimêjê dixwest ku dîkê ku li ser darê bang dida bixapîne û wî ji darê daxe xwarê, paşî wî nêçîr bike. Bi vê armancê ji dîk re got:

—“De kerem bikê dakeve, bide pêşiya min îmamiyê bike, em ji xwe ra bi cemaat nimêj bikin”

Lê dîk jî bi qasî rovî fenek û xasûk bû, fam kir ku niyeta rovî xerab e, wî jî dekek amade kir û ji rovî re got:

—“Bîrakê rovî, tu dizanî ku cemaet çî qas pirr be, xêra wê ji ewqas zêde ye. Ez ji ser darê dibînim ku du tajî wa ne ji jor ve tên. Bila ew jî bîn, hêj ez ê dakevim û em ê tev bi hev ra nimêja xwe bikin”

Dema qala tajîyan bû, ziravê rovî kir ku biqete. Dizanî ku ger tajî werin ev ê bibe firavîna tajîyan. Wî jî bi mahna destnimêjê ji dîk ra wiha got:

— “De baş e, nexu heta ew bîn ez ê jî biçim devê newalo ha, li wir desmêja xwe teze bikim û vegerim”. Bi vê peyva xwe, dûvê xwe xista navbera lingê xwe û reviya û çû (Bozarlan, 1999a: 8-11).

Wek ku me di serî de jî gotibû, rovî gelek caran li hemberî hêzê serê xwe ditewine û di bindariya şêr de ye. Rovi ji bo ku xwe ji xezeba şêr, rizgar bike jê re her şalûsiyê dike. Ev rewşa rovî di çîroka “Şêrê Di Bîre Da” wiha hatiye teswîr kirin:

“Mîrê min, Xwedê umrê te dirêj bike û te ji serê me kême neke. Ez hêvî û tîka dikim ku tu ji kerema xwe min bibexşînî. Min dîzanî ku îro dora min a xulamîyê ye. Xulamîya te ji bo min şerefeke mezin e. Lê belê, mîrê min ê hêzdar, ez bi serê te kim ne sûcê min bû ku ez dereng mam”(Bozarslan, 2002a: 18).

Rovî weke ku di bindariya şêr de ye ewqas jî ji heybeta wî ditirse. Ev rewş jî newêrekiya rovî nîşan dide. Di çîroka “Rovî Nikarin Bibin Şêr” de ev rewş wiha hatiye nîşandan: Dema ku bala rovî kete çave şêr, ji ber sorbûna çavên şêr, rovî ricifî û ji tirsan çokên wî lerîzîn. Şêr, li sedema ricifîna rovî jê pîrsî. Rovî got: “Mîrê min, ez ji heybeta te ditirsim û diricifim. Herdu çavên te sor bûne, bûne mîna du sotikên agir. Bi serê te, ji tirsan ziravê min dike biqete (Bozarslan, 2005: 16-17).

Rovî di rewşên xeternak de jî dekan amade dike û xwe ji rewşa xeternak azad dike. Çîroka “Biratiya Mar û Rovî” mîna keke delal e. Di vê çîrokê de destbirakiya marê xayîn û roviyê fenek hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê marê xayîn û roviyê fenek bûbûn destbirakê hev. Rojekê bi hev re derketibûn nêçîrê. Dema li nêçîrê digeriyan rastî çemekî hatin. Sedema mar bi avjeniyê nedizanî, mar xwe li pişta rovî pêça û rovî dest bi avjeniyê kir. Dema ku hate nîvê çem, mar xwe li gewriya rovî pêça û şidand. Rovî ji wê yekê tirsîya û ji mar pîrsî:

—“Êrê tu çi dikî, birakê mar?”

Mar bersiv da û got:

—“Ez dikim te gez bikim, birakê rovî”

Rovî her çi qas lava û tîka kir jî qaşo fêde nekir. Rovî dît ku rewş xerab e û mar jî ji lava û şîretan nerm nabe, wî jî di serê xwe de dekek amade kir û ji mar xwest ku berî wî bikuje jê xatir bixwaze. Mar pîrsî:

—“Tu yê çawa xatir ji min bixwazî?”

Rovî got:

—“Kêfa min pîr ji gewriya te ya xweşik ra tê. Min divê ez gewriya te maç bikim û bi wî awayî xatir ji te bixwazim. Paşê jixwe tu yê min gez bikî û ez ê bimirim”

Mar daxwaza rovî qebûl kir û gewriya xwe ber bi devê rovî ve bir. Çawa gewriya mar gihîşt ber devê rovî, rovî jî hema ji nişkê ve bi binê çena wî girt û bi dijwarî gez kir. Heta ku hêza wî hebû şidand, her çi qas mar hewl da jî tewş bû, fêde nekir. Mar hêdî hêdî ji hêzê ket û bi şidandina rovî, mar mir. Bi vî awayî rovî rizgar bû (Bozarslan, 1999a: 54-60).

Di vê çîrokê de tevgera rovî zîrekiya wî nîşan dide, rovî bi van gotinan mar xapandibû: “Kêfa min pîrr ji gewriya te ya xweşik ra tê. Min divê ez gewriya te maç kim û bi vî awayî xatir ji te bixwazim. Paşî jixwe tu yê min gez bikî û ez ê bimirim” (Bozarslan, 1999a: 60). Nîşana pinîti û fenekiya wî nîşanî me dide.

Di nav lawiran de yê herî fenek û dekzan bêguman rovî ye. Bi saya çalakî û fenekiya xwe gelek dekan amade dike. Bi vê taybetmendiya xwe dijberên xwe binketî dike. Di çîroka “Şikefta Lawiran” de bûyer li ser wê taybetmendiya wî hatiye afirandin. Di vê çîrokê de dek û dolabên rovî ku li lawirên dî gerandine hatine vegotin. Ev serpêhatî di vê çîrokê de wisa hatiye vegotin: Di rojên zivistanê yên biberf de lawirên kovî di şikeftê de dihêwirîn. Rovî ji bo ku zikê xwe yê birçî têt bike bi bêbextî û xasûkî bi dorê kew, hirç û gur bi şêr dide kuştin.

Dema paşî rovî ji bo ku ji şêr jî xelas bibe û goştê wî bixwe, dekek amade kir, li gorî wê dekê rabû çû hestiyekî gir ê hirçê xiste destê xwe ji aliyê dî wek ku tiştêkî dixwe bi zimanê xwe li dora devê xwe dialast.

Çaxê ku dengê mirçînê çû şêr, şêr meraq kir û ji rovî pirsî:

—“Kuro rovî, ew çi ye tu dixwî?”

Ji ber ku tarî bû û di tariyê de şêr tiştêk nedidît. Bi hêsanî rovî derew kir û got:

—“Mîrê min, hingî ez birçî bûbûm û tiştêk jî tune bû ku ez bixwum, min çavekî xwe derxist. Ez niha wî çavê xwe yê derxistî dixwum.”

Şêr, ji ber bersiva rovî gelek şaş bû dîsa ji rovî pirsî:

—“Ma mirov dikare çavê xwe derxe û bixwe?”

Rovî got:

—“Belê mîrê min, çima mirov nikare! Mirov çawa dikare goşt bixwe, wisa dikare çav jî bixwe. Tewr tama çav pîrr xweş e.”

Rovî bi awakî wisa xweş got ku şêr qanih kir ku şêr çavekî xwe derxe da ku zikê xwe têt bikê. Bi vê biryarê, pençeyê xwe yê giran û neynûkên xwe yên tûj bi lez û bez li çavê xwe ye rastê çikand û heta ku hêza wî hebû kişand. Bi vî awayî çavê xwe hilkişand. Lê êşekê wisa ketê serê wî û bû “ay ay û oy oy” ya wî.

Tam di demeke wisa de roviyê fenek li pey şêr rawestiyabû, hema heta ku hêza wî hebû bi hestiyê hirçê nava serê şêr xist û şêr kuşt (Bozarslan, 2000a: 49-60).

3.3.15. Şêr

Mîna Edebiyata Kurdî di edebiyata rojava û rojhilatê de şêr her dem wek sembola wêrekiyê tê dîtin. Ev nêrîn di binbîra gelan de di her warî de diyar dibe.

Dema derbarê vê mijarê de li folklorê Kurdî em binêrin, tê dîtin ku motîfa şêr di gelek warî de cihekî balkêş digire. Di gotina pêşiyên a herî navdar ya: “Şêr şêr e çi jin e çi mêr e” yan jî di biwêjan de bi şibandina: “Şêrê mêr, şêra jin” xwe nîşan dide. Ji bilî van Kurd navên zarokên xwe bi pêşnavê şêr dixemilînin, mîna: Alîşêr û Şêrko. Yan jî bi peyvên xwedî wateya “şêr” wek: “Murtaza, Esad ” navan li zarokan dikin.

Di çîrokên Kurmancî/ Kurdî de şêr, mîrê daristan û lawiran e. Bi wêrekiya xwe di nav lawirên daristanê de bi navûdeng e. Lê belê sedema ku bi hisiyata xwe tev digere ji xefkan xelas nabe û li hember neyarên xwe binkefî dibe.

Di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de motîfa şêr, her çi qas bihêz û mîrê lawiran hatibe nîşandan jî “şêr” kesayetên pozbilind, qure, nefsmezin, zilm û zilmkariyê simbolîze dika:

Di çîroka “Nêçîra Masiyan” de serpehatiya şêrê zalim û çavbirçî hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê:

Şêrekî zordest û zalim li roviyekî musallat bûbû. Rovî ji bo ku xwe ji şêr rizgar bike rahişte selika masiyan û çû cem şêr. Dema ku şêr, rovi bi selika masiyan dît gelek şaş bû jê pirsî ku ew masî ji kû anîne.

Rovî pirsî şêr bersivand ku, wî ew masî bi dûvê xwe girtine. Li ser vê bersivê, şêr bi dilekî xweş kete ser selika masiyan û masî xwarin.

Dema paşî spasî li rovi kir û lêborîn jê xwest û ji rovi pirsî:

—“Gelo em nikarin hin masiyên dî jî bigirin?”

Rovî jî li ser pirsî şêr wiha bersivand û got:

—“Belê mîrê min, heger tu kerem bikî bi min ra bêyî ber çêm û dûvê xwe di avê da nûq bikî, dê gelek masî bên bi dûvê te bigirin. Hingê tu yê bi wê hêza xwe ya bêdûwayî bikarî wan hemiyan ji avê derxî”

Şêr bi gotinên rovi kêfxweş bû. Biryar dan ku ber êvarê herin çêm, li ser biryara xwe ber evarê çûn ber çêm ku av qeşagirti bû, rovi kevirek anî û pê qeşa şikand û şêr hat li devê kunê rûnişt û dûvê xwe nûqî avê kir û bi wî awayî demeke dirêj ma.

Her çi qas diçû dinê sartir dibû. Pir nema av cemidî û dûvê şêr hew hat, dûvê wî hin bi hin şidand.

Sedema ku cemed, dûvê şêr şîdandibû şêr gelek zarezar dikir û xwest ku dûvê xwe ji avê bikişîne. Lê rovî şêr pîroz dikir û wê rewşa wî bi zêdebûna nêçîra masiyan rave dikir. Bi vî awayî serî lê mezin dikir û dixapand. Lê belê tewş bû her çi qas şêr pertaw dida xwe jî xwe ji wê rewşê xelas nekir. Dû re bi tevayî ji hêzê ket û li erdê dirêj bû.

Tam di vê demê de rovî kevirekî gir ji erdê bilind kir û li serê şêr xist û ew kuşt. Tola xwe ji şêrê zordar û çavbirçî hilanî (Bozarslan, 2000a: 35-48).

Hirs û timakarî gelek caran kesan ji rastiyê dûr dixê û dawiyê jî kesên wisa bi wan kirinên xwe dixisirin. Di vê çîrokê de bi motîfa şêr, rewşa mirovên xwedî-hêrs û timakar raxistine ber çavan ku hêzdarekî mîna şêr jî ji ber timakariya xwe bi gotinên roviyê hîlekar xapiyaye. Dawiyê jî hêrs û timakariya wî dibe sedema mirina wî. Bi vê motîfê xerabiya çavbirçîbûn û timakariyê di motîfa şêr de hatiye nîşandan.

Çîrokekî di ya ku motîfa şêr tê de heye çîroka “Şêrê Di Bîrê De” ye. Di vê çîrokê de rewşa mirovên xodbîn û zilmkar hatiye vegotin. Wek tê zanîn ku xodbîn û zilmkarî gelek caran nahelê ku mirov bi ser heqîqatê ve be û mirovan bi encamên neerênî re rû bi rû dihêle. Di çîroka “Şêrê Di Bîrê De” encama mirovên xodbîn û zilmkar di motîfa şêr de tê vegotin. Mîna ku di vê çîrokê de tê vegotin:

Şêreki xwedî hêz mîrê daristanê û lawiran bû. Ew şêr ji ber mîrîtiya xwe gelek qure û pozbilind bûbû. Ji ber quretî û pozbilindiya xwe gelek caran rastî nedidît û aqilê wî jî nedigihîşt gelek tiştan.

Lawirên daristanê hemî di bin femandariya wî de bûn. Lawiran bi dorê karên şêr dimeşandin.

Rovî jî mîna hemî lawiran xulamîya şêr dikir. Rojekê rovî ji bo ku xwe ji vî halî rizgar bike fikirî û dekek amade kir. Li gorî deka xwe ew ê wî bibe li ser bîra ku eqsa kesan tê xwiyar, paşî li gorî vê dekekê ew ê xwe ji şêr xelas bike.

Roja ku dora rovî ya xulamîyê hat mexsûs dereng ma, dema ku çû cem şêr, şêr gelek hêrs bû li ser serê rovî qîriya û kir barebar. Dû re li sedema derengmayîna wî pirsî. Rovî bi dengê lertzok bersiva wî da û got ku: Ji ber şêrekî xerîb ez dereng mam.

Rovî, dema ku qala şêrekî di kir. Şêr hê bêhtir hêrs bû û ji rovî xwest ku wî bibe cem wî şêrê xerîb da wî parçe bike.

Rovî li pêş, şêr li paş meşiyar da ku şêrê xerîb parçe bike, rovî ew rasterast bire ser wê bîra ku eqsa mirovan xuya dibû, dema hatin rovî bîr nîşan da û ji şêr re got:

— “Aha ew şêr va ye di vê bîrê da ye, mîrê min.”

Şêr bi xişm çû ser bîrê dît ku erê wa ye şêrekî bijîgij û heşmed di nava bîrê de ye. Lê wî nizanî ku şêrê di navê bîrê de eqsa wî ye.

Çawa çavê şêr bi şêrê binê bîrê ket ricifî û bihêz devê xwe vekir heta ku dengê wî hebû qiriya û got:

— “Tu kî yî û li çi digerî di vî rêlî da loooo?”

Şêrê binê bîrê jî eynî wek wî qiriya û gotinên wî lê vegerandin. Ew dengê ku di bîrê de lê dihata vegerandin jî dengê wî bû, lê belê wî digot ku qey ev şêrekî dî ye.

Şêr her çi digot eynî gotinê lê dihata vegerandin, li ser van peyvên şêrê binê bîrê hê bêhtir hêrs bû û got:

— “Ez dibêjim bi lez ji vir biteqize here. Yan na ez ê bêm wir te parçe parçe bikim û bişînim bihiştê keran, haaaa!”

Piştî ku şêrê binê bîrê jî eynî gotinê lê vegerand şêr hêrs bû, hew dikarî xwe bigire hema bixişt û rik erîşt şêrê binê bîrê kir. Şêr bi vê êrîşê di nava ava bîrê da nûq bû û xeniqî (Bozarslan, 2002a: 14-13).

Xodbînî halekî wisa xerab e ku mîna perdeyekê tê ber çavê mirovan û wan ker û kor dike, mirovan ji rastiye dûr dixê, mîna ku di vê çîrokê de di tevgera şêr de rewşa mirovên xodbînî daye nîşandan.

3.3.16. Teyr/ Çûk/ Çivîk/ Balinde/ Firrinde/ Mîlçik/ Çûçik

Di çanda Kurdî de jî lawirekên rengîn û sembolîk bêguman teyr in. Sedema ku teyr gelek hest û ramanên mirovahiyê tîne ziman carinan şah û şadiyê carinan jî qûdret û aşiyê îfade dike.

Teyr di ramanên Kurdî de cihekî taybet digire. Vê taybetmendiya xwe jî bîr û baweriya Kurdî hildigire. Mînakên van em dikarin wisa pêşkêş bikin:

Hin teyr li gorî baweriyên pîroz û pak tîne qebûl kirin, ji ber vê kuştin û nêçîra van baş nayê dîtin. Mîsal li hêla Xarpêt û Dîlokê nêçîr û kuştina kevokan, li herêma Dêrsimê nêçîr û kuştina qulingê, li herêma Torê nêçîr û kuştina çûkê Hehecîk (Hacîreşk/ Dûmeqesk/ Meqesok) guneh tîte qebûl kirin.¹⁴ Mehmet Oncu, di derbarê pîroz dîtinê hin teyrên hehecîk de, nêrînên xwe wiha tîne ziman: “Li Kurdîstanê balindeyên koçber mîna hehecîk mîna mîzgîniya biharê tê dîtin, ji wê ye ku xelkê

¹⁴ Di pêşgotinekê Kurdî de ji bo rexnekirina kuştina çûkan biwejeke wiha heye: “Beytik dibêje: Goştê min pariyek e gunehê min xaniyek e” (Oncu, 2009: 50).

Kurdîstanê balindeyên koçber pîroz dibinin û rumet mezin li wan dikan” (Oncu, 2015: 25). Ji ber vê sedemê li van herêman mirov destûrê didin ku kevok, hehecîk hêlîna xwe di binê hêwanê mal û mizgeftan de ava bikin.

Di çîrokên Kurdî de teyr bi motîfên cuda derdikevin pêş. Carinan bi dua û nifirên mirovan, mirov vediguherin û dibin pepûk, legleg û hwd. Yan jî teyr bi motîfa lawirê alîkar hatiye bikaranîn. Wek mînak di çîroka “Gul û Sîno” de Teyrê Enqa alîkariyê dide Dilêr û wî Çiyayê Qafê û ji her aloziyê diparêze, bi saya Teyrê Enqa, Dilêr fêrî çîroka “Gul û Sîno” dibe (Bozarlan, 2002b: 114-118). Di çîroka “ Kewê Çîrokbêj ” de Kewê Çîrokbêj, xanima Şêx Ehmed ji hin rewşên xeternak diparêze. (Zinar 2013b: 23-64). Wek di van herdu çîrokan tê dîtîn teyr bi “motîfa lawirê alîkar ” derdikeve pêşberî me.

Di rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de motîfa teyr bi awayekî cuda hatiye bikaranîn. Di çîroka “Çivîka Jîr û Nêçîrvanê Kêmaqîl” de motîfa çivîkê bi sembola zîrekiyê hatiye nîşandan. Di vê çîrokê de bûyer di navbera çivîkê û nêçîrvanê kêmaqîl de diqewime, li gorî vê çîrokê: Çivîka ku di destê nêçîrvên de hatibû qefaltin, çivîkê li gorî deka ku amede kiribû jê ra wiha got:

—“Binêre, ku tu min serjê kî, du sê pirûş goştê ku bi hestiyên min ên biçûk ve heye, tu’yê bavêjî devê xwe û dê biqede here. Lê belê eger tu min beradî, ez’ê sê şîretên wisa giring li te bikim ku, heta tu li vê dinê sax bî dê ji te ra lazim bibin û tu’yê jî wan mefadar bibî.”

Nêçîrvên dîsa kenîya û ji çivîkê re wiha got:

—“Lê lê Çivîka reben, ez mirov im, tu jî Çivîk î. Tu’yê çawa bikarî bi wî serê xwe yê Çivîkî şîret li min bikî!”

Çivîkê got:

—“Naaaa, wisa mefikire û wisa mebêje. Şîretin hene ku di eslê xwe da hêja ne û rûmetbilind in. Ew şîret bî devê Çivîkek ji bên gotin, tişteki ji rûmeta wan kêma nabe.”

Nêçîrvên, fam kir ku serê çivîkê ne vala ye, bi gotinên çivîkê hêbêhtir dile vî nerm bûbû xwest soz jî çivîkê bistîne. Daxwaza xwe bi çivîkê re parvekir.

Çivîkê got:

—“Belê, bi soz u bext, ez’ê sê şîretên wisa giranbuha li te bikim ku, heta tu li vê dinê bijî dê ji te ra lazim bibin û fêde bidin te.”

Dema ku Nêçîrvên, peyva giranbuha bihîst, dile vî bêhtir nerm bû hedî hedî mista xwe sist kir, çivîk jî firek da xwe û çû ser guliya darê danî.

Piştî azadbûna xwe wek qewlê ku ji nêçîrvên re gotibû her sê şîretên xwe ji nêçîrvên re eşkere dike. Çivîk piştî vegotina şîretên xwe, nêçîrvan ceriband ku ji şîretên wî fêm kiriye yan na, piştî wê xwestekê serencama wan bi herikbarî berdewam dike û bi şikestina piyê nêçîrvanê kêmaqil bi dawî dibe (Bozarlan, 2005: 23-31).

Di vê çîrokê de “Motîfa Çivîk” bûye sembola hiş û aqil. Wek tê vegotin li hember her rewşa xerab mirov dikare xwe bi aqilê xwe ji fen û fût û dafîkan biparêze. Mîna bav û kalan gotiye:

Teyr bi per û baskê xwe,

Teba bi qîl û diranê xwe,

Însan bi hiş û fahmê xwe,

Digihîjin mirad û meqseda xwe (Aslan, 2006: 1).

Mîna ku di vê pêşgotinê de hatiye gotin “aqil” her dem hatiye pesinandin. Di vê çîrokê de bilindbûn û ehemiyeta aqil û hişmendiyê bi motîfa çivîkê hatiye nîşandan.

Ji xeynî vê di çîroka “Şerê Çivîkê û Fil” de: Fîla sîtemkar, çêlên çivîka reben di bin lingên xwe de diperçiqîne û bi vî awayî çêlên çivîkê dikuje. Çivîka reben dema ku sedema kuştina çêlên xwe ji filê kir, fîla hêzdar û bi girbûna xwe bawer, erza çivîkê dişikîne û gotinên çors ji çivîkê re dibêje.¹⁵

Li ser van peyvên çors, çivîkê hê bêhtir hêrs dibe, ji bo ku tola xwe hilde çû cem çivîkên dî û alîkarî ji wan xwest. Çivîkên dî bi daxwaziya çivîka reben kenîyan û kêmhêziya xwe anî zîman.

Çivîkê ji wan re got:

—“Na na wisa mebejin. Erê em çivîk in û bêhêz in, lê ku em xwe bikin yek, em ê jî hêzdar bibin. Ku em hemî bi tevahî herin, em ê bikarin bi nikulên xwe herdu çavên wî jî derxin û wî kor bikin”

Çivîkê bi gotinên xwe çivîkên dî qanî kirin. Hemî bi hev re firiyan û çûn ser fil û çawa çûn ser fil hemîyan li ser serê wê veniştin û herdu çavên wê dan ber nikulan hetanî ku kor kirin.

Lê belê çivîkê dixwest ku filê bikuje, çivîk firiya çû cem beqan, deng li wan kir. Bûyera xwe bi xemgînî got û alîkarî ji beqan xwest. Çivîkê ew beq jî qanî kirin. Wê beq anîn binê kendalekî û ji wan xwest ku “qireqir”ê bikin. Beqan li ser daxwaza çivîkê qireqir kirin û qireqira wan li derdorê belav dibû.

¹⁵ Ev çîroka navdar di berhema Beydaba(1958: 19-20) de bi navê “Toygar Kuşu ve Fil” cih digre.

Fîl jî di wê demê de hingî tî bûbû dixwest ku avê vexwe û xwe hênik bike. Bi dengê beqan û ji kendalê bilind bêxeber bi hêz û lez dimeşîya, çawa hate ber kendêl lingê xwe yê pêş avêt qeraxê kendêl û gindirî hetanî binê kendal, di binê kendêl de fîl mir (Bozarslan, 2005: 7-12).

Mîna ku di vê çîroke de hatiye vegotin motîfa çivîkê, bûye sembola yekîtî û zîrekîyê. Çivîk, zîrekî û hişmendiya xwe di nav van rêzikan de nîşan dide:

“Na na wisa mebêjin. Erê em çivîk in û bêhêz in, lê ku em xwe bikin yek, em ê jî hêzdar bibin. Ku em hemî bi tevahî herin, em ê bikarin bi nikulên xwe herdu çavên wî jî derxin û wî kor bikin” (Bozarslan, 2005: 9).

Wek ku di axaftinên çivîkê de jî hatiye vegotin, mirov çî qas belengaz û bêhêz bin jî bi yekîtîyê ew ê her dem serketî bibin. Çawa çivîkên bêhêz bi yekîtîyê hêzeke mezin ava kirin û çavên filê bihêz kor kirin. Bi alîkariya beqan fîl di kendêl re wer kirin û kuştin. Ev bûyer dide nîşandan ku hêz û qewet di yekîtîyê de ye. Bi metafora filê tê xwestin ku mirov çî qas hêzdar û gir be jî tu car zilmê li belengaz û bêhêzan neke, ger ew belengaz û bêhêz, hêzên xwe bikin yek ev hêz wê bibe sedema mirina mirovê hêzdar û sîtemkar.

Mîna ku di vê çîrokê de hatiye vegotin “Motîfa Çivîkê” bûyê nîşana yekîtî û tolhildanê li hember zalimê zordar û qure. Bi “motîfa Çivîkê” bala mirovan dikişîne ser ehemiyeta yekîtîyê û hêza yekîtîyê nîşanî me dide.

3.3.16.1. Kevok/ Kevot/ Kevoke/ Gogerçîne/ Borane/ Kurkurike

Kevok, li her derên cîhanê di her warê jîyanê de mîna sembola aşî, rizgarî û aramiyê tê dîtin.

Kevok, cara yekem di Tewratê de di beşa Afirin 8: 8-12an de wek sembola rizgarî û aramiyê hatiye bikaranîn.

Di baweriya Filehan û Misilmanan de kevok wek nîşana aşî, evîn û bêgunehiyê tê pejirandin (BL, 1986: 4878). Ji vê sedemê li hin bajarên Bakur wek Xarpêt û Dîlokê kuştina wan guneh tê qebûl kirin. Bi bandora vê nêrînê gelek avahiyên bajarên Kurdan ji bo xwespartina kevokan di dîwarên avahiyan de cihên taybet dihatin çêkirin.

Di çîrokên Kurmancî/ Kurdî de motîfa kevokê bi awayekî rengîn tê bikaranîn. Di gelek çîrokan de kevok mîna sembola zîrekî û pêşbîniyê ye.

Carinan jî motîfa kevokê mîna di çîroka zewaca “Qijik û Kevokê” de êş û zordestiya ku li ser jinan tê kirin bi zimanekî bedew îfade dike (Alakom, 2002: 29).

Di rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” de, di çîroka “Meşa Qijikê” de motîfa kevokê mîna sembola pêşbînî û zanatiyê hatiye bikaranîn. Di vê çîrokê de serpêhatiya qijika ku hewesî meşa kevokê dikir hatiye vegotin. Li gorî vê çîrokê: Qijikekê, meşa xwe nedeciband ji vê sedemê xweziya xwe bi meşa kevokê dianî. Xwesteka xwe ji kevokê re got. Kevokê her çi qas ji qijikê re got ku divê her lawir bi meşa xwe qaîl bibe jî tewş bû, qijikê ji daxwaza xwe nehat xwarê. Dawiyê Kevokê wiha şîret lê kir:

— “Xuşka qijik, eger tu bi peyva min dikî, dev ji vê xwezî û hewesê berde. Tu qijik î, bi qijikiya xwe razî be. Eger tu bi çavê min yan bi çavê teyrekî dî li xwe binêrî ez ditirsim ku tu xwe şaş maş bikî, ji xwiyê xwe yê berê jî derkevî û yekcar berbat bibî.” Lê belê şîreta kevokê neket sere qijikê.

Qijikê vêca rabû dest bi teqlîda meşa kevokê kir. Çi qas xebitî û xîret kir jî nekarî wek kevokê bimeşe. Ji vê sedemê pir xemgîn bû, êdî hêviya xwe ji hînbûna meşa kevokê birî û tê gihîşt ku nikare mîna kevokê bimeşe.

Piştî ku qijikê hêviya xwe birrî û poşman bû xwest ku vegere ser meşa berê. Bi vê daxwazê dest bi meşê kir û xebitî, lê belê meşa xwe ya berê ji bîr kiribû. Her cara ku lingên xwe dilivandin, çindik dida xwe û xwe bilind dikir lê li erdê diket.

Êv rewş bala kevokê kişand, bi dilekî xemgin jê re got:

— “Xuşka qijik, ne min berê ji te re got ku dev ji vê xweziyê û hewesê berde û bi qijikiya xwe, bi meşa xwe ya qijikî razî be. Lê belê te guh neda peyva min.”

Her çi qas qijikê dawiyê xeletiya xwe fam kiribe jî, êdî nedikarî mîna berê bimeşe (Bozarslan, 2002a: 7-13). Di vê çîrokê de mîna van gotinên ku kevokê ji qijikê re gotine, pêşbînî û zanatiya vê nîşan dide. Di van gotinan de tê xwestin ku divê mirov rewşa siruştî bicîbîne û tu car rewşa xwe ya siruştî neşibîne kesekî din.

Di hin çîrokan de kevok mîna lawirên alîkar hatiye bikaranîn. Di çîroka “Gustîla Efsûnî” de “Kevok” bi motîfa lawirê alîkar hatiye bikaranîn. Bi vê sayê kevokê, gustîla efsûnî ya ku ji aliyê dêw hatibû dizîn bi alîkariya kevokê ji aliyê se, mişk, pisîke disa tê stendin. Her wiha li hemberî bêbextiya pisîkê; kevokê, alîkariya se û mişkê kiriye. Bi xêra kevokê; sê û mişk xwe ji xezeba kalo û pîrê xelas kirine (Bozarslan, 2005: 32-55).

3.3.16.2. Kund/ Bum/ Bûm/ Pepûk/ Kundê Kûr/ Kundê Kor/ Puyo Kor

Kund di bîr û baweriya gel de bêyom tê qebûl kirin. Sedema ku kund li warên wêran dijîn di helbestên gelêrî de wek sembola mirinê tê dîtin (Eskigün, 2006: 55 ji BL, 1986: C3, 1418 jêgir). Ji ber van nêrînan di baweriya gelê Kurd de jî wateyên neerênî îfade dike. Ji vê sedemê dema ku Kurd nifiran lihev dikin, dibejîn: “Hevara min ji Xwedê ku kundê kor li ser mala te bixwînin.” Yan jî wiha dibejin: “Kund li warê bavê te bixwînin.”

Lê di çîroka “ Kund Çima Li Çiya Dijî” de motîfa kund, bi awayekî cuda hatiye bikaranîn û “kund” di vê çîrokê de bûyê nîşana mirovên zana, hişyar û dûrbîn. Bi vê metaforê hatiye xwestin ku xeletî û çewtiyên mirovan bi devê Kund pêşkeşî guhdar/ xwendevanan bê kirin ku mirov xwe ji wan çewtî û xeletiyên biparezê û jiyana xwe bipergal bidomîne.

Ev çîroka “ Kund Çima Li Çiya Dijî” serguzêsta di navbera Kund û êzingvên de ye. Li gorî vê serpêhatiyê kundê ku ji mirov û avahiyan dûr dima, dema ku raketîbû ji nişkê ve êzingvan kundê raketî girt û sedema dûrbûna wî ji mirov û avahiyan bi israr pirsî, kund li ser vê israrê bersiva êzingvên da, wî jî sedema dûrbûna xwe ya ji mirovan kêmaqilî, bêbextî, çewtî û xerabiya mirovan nîşan da.

Li ser bersiva kund, êzingvên vegot ku êdî rewş guheriye, ew miroven xerab êdî nînin. Êzingvên bi van gotinan kund qanî kir ku dîsa vegere û li derûdora avahiyan bijî. Bi wî awayî çûn gihîştin ber kaniya gundê êzingvên, dît ku jineke gundî ku cerê xwe dadigire. Kund bala xwe da jinikê ku fîstaneke hevrişmî ê gulgulî yê pir xweş lê ye. Lê belê jinik xwas û başewala bû.

Kund ji jinikê sedema vê rewşa wê pirsî. Jinikê jî sedema vê rewşê bi xizaniya şûyê xwe nîşan da. Li ser vê bersivê Kund berê xwe da êzingvên û got ku:

— “Rewşa wê jinikê tu derewçîn derxistî”.

Êzingvên sedema vî halî pirsî. Kundê jî wiha got:

—“Eger ev jinik bêawa û bêrê û bêsexbîr, kêmaqil û kêmjimêr nebûya, dê di şuna wî fistanê xwe yê hevrişmîn da ji xwe ra fistanekî kitan bikiriya. Diravên ku ji ber wî fistanê kitan bimana jî dê bi wan diravan ji xwe ra cotek sol û hevalkirasek bikirîna.”

Vêca dengê xwe bilind kir û qiriya, dawiyê jî got:

—“Ma ev ne bêawatî û bêrîtî ye, bêsexbîrî û kêmaqilî û kêmjîmêrî ye! Nexu dinya dinya berê ye, mirov jî mirovên berê ne. Ma ez ê çawa bişêm li derdora avayîyan bijîm û nêzîkî mirovan bibim û her roj bê awatîyên waha ji mirovan bibînîm! Jiyana di nava çîyan da xweştir e wek ku ez tim bêawatîyên waha ji mirovên waha bibînîm û xemgîn bibim.”

Piştî van peyvên kund firek da xwe û bi ber çîyan de firî (Bozarslan, 2002a: 25-36).

3.3.16.3. Legleg/ Leklek/ Leglege

Di çîrokên Kurmancî/Kurdî de “motîfa leglegê” ehmeqî û hişvîkiyê îfade dike. Li gorî mîtolojiya Kurdî, tê gotin ku legleg berê mirov bû, sedema ku wê xerabî kiriye, Xwedê ew veguherandiye û kiriye legleg.

Motîfa leglegê bi tenê di rêzeçîrokên “meselokên lawiran” di çîroka “legleg”ê de heye. Di vê çîrokê de sedema afirandina “legleg” ê hatiye ravekirin. Li gorî vê çîrokê: Demekê axayekî pir dewlemend hebû le ev axa bi qasî dewlemendiya xwe heft qat jî bêwijdan, kêmfersend, bêexlaq û bêfedî bû. Ji malbatên xizan û belangaz re bifayîz û bi şertê suxra wî ya havînê qût dida.

Jinên gundiyan di zeviyên xwe de dixebitandin û dema xebatê dêlingên wan heta çokan bi wan dida şemirandin û bi wî awayî li wan temaşe dikir. Ji ber bêwijdanî û bêexlaqiya wî gundiyan digot “el eman” .

Salekê, zivistanê jineke bî ya xwediyê çar pênc zaroka, sedema ku qûtê wan nemabû ji neçarî çû ber deriyê axê. Sebeba hatina xwe ji axê re rave kir. Ji bona ku jinik bedew bû axê soz da ku qût bidê. Roja din wî ew jinika bî bir ber merdîwana ku diwarekî wê sipartî dîwarê koşkê bû, deng li jinikê kir:

—“Min divê tu hevalkirasê xwe ji xwe bikî û başewala di vê merdewanê ra hilkişî, biçî ser banê koşka min. Hingê ez ê tenê mift bidim te û havînê çu tiştêkî ji te nexwazim. Lê ku tu vê daxwaza min qebûl nekî, ez yek dendikekê jî tenê nadim te û zarûkên te birçî bimînîm.”

Her çi qas jinikê lava kir jî axayê bêwijdan û bêexlaq nerm nebû, ji neçarî daxwaza axê qebûl kir û di merdîwanê re hilkişîya ser banê koşkê. Dema gihîşt ser banê herdu destên xwe ber jor vegirtin û li axayê bêexlaq nifir kir.

Jinikê hingî ku ji dil nifir kir, Xwedê di wê gavê da nifira wê qebûl kir û axayê bêexlaq ji miroviyê derxist veguherand û kir legleg. (Bozarslan, 2006: 38-53).

Di nav dîroka mirovatîyê de bêexlaqî û bêwijdanî tu car nehatiye pejirandin. Mirovên wisa di nav gel de bi bêrûmetîyê tê nasîn.

Wek ku di gotinên legleg ku ji jinika bî re gotibû:

—“Min divê tu hevalkirasê xwe ji xwe bikî û başewala di vê merdîwanê da hilkişî, biçî ser banê koşka min. Hingê ez ê tenê mift bidim te û havînê çu tiştekî ji te nexwazim. Lê ku tu vê daxwaza min qebûl nekî, ez yek dendikekê jî tenê nadim te û zarûkên te birçî bimînin ” (Bozarslan, 2006: 50).

Di van gotinan de bêexlaqî û bêwijdaniya leglekê tê xuyan. Ji ber vê sedemê “motîfa legleg’ê” bûye nîşana mirovê bêwijdan û bêexlaq.

Bi veguherîna legleg’ê, tê xwestin ku dawîya xerabî, bêexlaqî û bêwijdaniyê tune ye. Bi vê motîfê rewşa bêexlaqî û bêwijdaniya trajîk nîşanî mirovan dide ku mirov xwe ji van kirinên ne erênî dûr bixe û jiyana xwe li ser rastiye bidomîne.

3.3.16.4. Pepûk/ Bakir/ Goyîn/ Kekû

Pepûk di baweriya Kurdan de wek teyrekî mîtolojîk tê hesabandin. Îro li gelek bajarên Bakurê, di derbarê pepûkan de gelek çîrok tînin gotin. Li hin herêman teyrê pepûk bi navê teyrê kekû jî tê nasîn.

Ev çîroka ku bi navê pepûk tê gotin di van çîrokan de motîfa pepûkê bûye sembola mazlûm û bindestan. Di vê serpêhatîyê de serencama xwişk û birayên sêwî ya trajîk hatiye gotin. Di rêzeçîrokên Meselokên Lawiran de ev çîrok wisa ye: Damariya zalim û zordar herdu zarokên sêwî bi bahaneya berhevkirina kerengan tûrê kunkirî û kêrê dixê destê xwişk û bira û wan dişîne çolê.

Kêr di destê keçikê de, tûr li ser milê kurik herdu zarok li çolê dest bi berhevkirina kerengan kir. Keçikê kerenga pêşî paqij kir û da birayê xwe da ku bixwe û xwest ku ji xeynê vê kerenga pêşî, kerengên dî nexwe û wan bixe tûrik. Kurik xwest ku xwişka wî firiyet be û qet meraqan meke ku ji xeynê kerenga pêşî kerengan naxwe.

Zarokan ji tûrê kunkirî ne haydar heta ber êvarê kereng berhev kirin. Lê kurik her kerenga ku dixista tûr kereng di kunê re dikete erdê. Dema çûna malê keçikê xwest li kerengên berhevkirî binêre. Lê dinêre ku tu kereng di tûr de nîne û binê tûr ji kunkirî ye, keçik ji birayê xwe kete gumanê û li dijî wê rewşê lê hêrs bû. Kurik her çî qas sond xwar jî xwişka xwe qanîh nekir.

Kurik li ser wê rewşê ji bo xwişka xwe dilbicî bike jê re wiha got:

—“Madem ku tu ji peyva min û ji sonda min bawer nakî zikê min bi kêrê biqelêşe û lê binêre. Eger ji yekê zêde kereng di zikê min da hebin tu yê bizanî ku min ew bi dizî xwarine û ji te ra bi derew sond xwariye”

Xwîşka wî ew pêşniyaz qebûl kir û birayê xwe li ser piştê vezeland û zikê wî qelaşt, keçikê dît ku ji yek kerengê pêvtir kereng di zikê wî de nîne.

Keçikê lêborîn ji birayê xwe xwest lê dît ku deng ji birayê wê nayê û laşê wî jî sar bûye, tê ghişt ku birayê wê miriye.

Keçikê dest bi qîrîn û girî kir. Piştî demekê bi girî amoş nebû ji derd û kedera birayê xwe, destê xwe ji Xwedayê xwe re vekir û wiha dua kir:

—“Xwedayê mezin ez ê êdî çawa bikarim li rûyê dinê bijîm û vî derdê giran di dilê xwe da bigerînim. Ez ê bi kîjan rû bişem li rûyên mirovan, xasma li rûyê bavê xwe binêrim!” Ez bibim teyrek û ji xwe re tim ber bi asûyên fire bifirim, çêtir e wek ku ez wiha mirov bimînim û di nava mirovan de bijîm. Xwedayê mezin ez ji te hêvî û tika dikim ku di vê gavê da min bikî teyrek û bi wî awayî min ji vî halî xilas bikî!”

Xwedê duaya wê qebûl kir û di wê gavê de ew kir teyrê pepûk (Bozarslan, 2006: 54-67).

Wek ku di rêzikên dawiyê de tê dîtin motîfa pepûkê bûye kezebşewitîna xwîşk û birayan û bûye sembola belengazî, bindestî û bêçareyi yê. Ji ber vê motîfê pepûk di gelek şibandin, zêmar û gotinan de tê bikar anîn.

ENCAM

Ji bo naskirina neteweyekê tişta herî girîng naskirina çand û zimanê wî gelî ye. Bi saya çand û ziman gelek dewlemendiyên wê neteweyê derdikevin holê. Ger Kurd jî bixwazin çand û zimanê xwe fêr bibin divê cûreyên edebiyata devkî yên mîna stran, klam, pêşgotin, biwêj, destan, zûgotinok, mamik û çîrokên xwe bi pisporî analîz bikin. Dema ku ev xebat hate meşandin bi rastî dê kevneşopiyên hezarsalan derkevin ser rûyê erdê. Ya rastîn di nav van cûreyên edebiyata devkî de çîrok hele babetên meselokên lawiran, vê fersendê bi her awayî dide lêkolîneran, ji ber ku meselokên lawiran, gelek rengên cûreyên edebiyata devkî di nav rêzikên xwe de didin nîşandan.

Dema ku ev xebat li ser çîrokan hate meşandin, hele ku li ser babetên meselokên lawiran be, gerek tu carî neyê jibîr kirin ku meselokên lawiran ne di carekê de hatine afirandin. Meselokên lawiran jî êş, elem, zordarî û hişmendiya hezar salan hatine parzûnandin. Çîroka “Mîr Zoro”, “Gurê Bilûrvan”, “Kêz Xatûn”, “Serketina Mişkan”, “Dîk û Pîrê”, “Hedlîlik û Bedlîlik”, “Dîk û Rovî”, “Şêrê Di Bîrê Da” ne bi tenê ji bo ku di şevên bi berf û bahoz de zarok bêne ewiqandin yan jî bi van çîrokan kêfxweş bibin hatine afirandin, sedema vegotin û afirandina van çîrokan ev bû ku, çîrokbêj; bi van çîrokan zordariya mirovên sitemkar û fenek bi her awayî dida diyar kirin ku gel li hemberî wana her tim hişyar be.

Ji ber ku di vî cureyî de mijar rasterast nedihate gotin, çîrokbêj bi zimanekî mecazî, peyamên xwe li ser motîfên lawiran ên mîna rovî, gur, keftar, tajî, şêr, ker, deve, dûpişk, hirç û hwd. bikaranîna sen’etên teşbîh û întaqê peşkeş dikirin. Her motîf bi tena serê xwe rewîştêkê sembolîze dike. Bi van motîfên lawiran, başî û qencî dihatin pejirandin. Xerabî, zordarî û zikreşî dihatin rexnekirin.

Ji xeynî vê armanca hişyar kirin û perwerde kirinê, di nav rêzikên “Meselokên Lawiran” de gelek nimûneyên kevneşopiyên çand û zimanê Kurdî bi her awayî xuya dibin. Di nav rêzeçîrokên “Meselokên lawiran” de motîfên ku hatine tespît kirin bi berfirehî hatine dahûrîn û çîrokên lawiran li gorî van dahûrîna hatine şirove kirin û nirxandin. Di van çîrokan de ya herî girîng ev e ku li hemberî bûyer û pergala de çareserîya hiş û ramana Kurdî bi her şîwazî tê dîtin.

Ji bo ku ev xebat baş bê fêm kirin, di binê serenavan de ev mijar bi awayekî berfireh hatiye pêşkêş kirin.

Bi vê xebata ku me li ser rîzeçîrokên a bi navê “Meselokên Lawiran” da meşandin bi analîzkirina motîfên lawiran gelek kevneşopiyên çanda Kurmancan/Kurdan bi awayekî dewlemend hat nîşandan. Di vî cureyê vegotinê de rengîniya çîrokên Kurmancî, bi teşeyekî dewlemend hate diyar kirin ku ev rengîniya dewlemendiya çîrokên Kurmancî û nîşaneyê pêşketina çand û zimanê Kurdî ye.



ÇAVKANÎ

- Akyol, H. (Amd). (2006). Çîrokên Mala Zalê. Diyarbakır: Weş. Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Alakom, R. (1994). Di Folklorê Kurdî De Serdestiyeke Jinan. Petersburg: Weş. Nûdem.
- Alakom, R. (2002). Folklor û Jinên Kurd. Stockholm: Weş. Nefel.
- Alkan, A. (2003). Çîroka Rovî û Gur, Stenbol: Weşanên Elma.
- Alkan, A. (2004). Çîrok û Jiyan. İstanbul: Komal Yayınları.
- Alkan, A. (2006). Çîroka Rovî û Gur. İstanbul: Weş. Elma.
- Alptekin, A. B. (2009). Halk Hikayelerinin Motif Yapısı. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Alptekin, A. B. (2000). “Hayvan Masallarının Formel Yapısı” Selçuk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Dergisi, Hj. 7, r. 75-88.
- Amedî, P. (2012) Çûka Keko Peko, İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- ARAS, A. (2004). Evdalê Zeynîkê. (Wer. Fehim Işık). İstanbul: Evrensel Yayıncılık.
- Arıcı, A. F. (2004). “Tür Özellikleri ve Tarihlerine Göre Türk ve Dünya Masalları. Erzurum: A.Ü Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Hj. 26, r. 159-169.
- Artun, E. (2012). Anonim Türk Halk Edebiyatı Nesri. Adana: Karahan Kitabevi.
- Aslan, Ş. (2006), Ferhenga Gotinên Peşiyân. Amed: Söz Gazetecilik.
- Aysoy, S. (27.03.2015). Değişik Milletler Tarihlerinde Kedi, Osmanlı Ve Fransız Edebiyatında Kedi, Türkler'de Kedi Hakkında Mevcut İnanışlar, Hurafeler, Hikâyeler, Kedi Dostlar I, Kedi Düşmanları, Kedi Ve Ahlâk. <http://dergiler.ankara.edu.tr/dergiler/11/1133/13312.pdf> (ragihanî, 27.03.2015).
- Bakırcı, N. (2010). Türk Dünyası Coğrafyasında Tespit Edilmiş Hayvan Masalları Üzerine Bir İnceleme. Elazığ: Manas Yayıncılık.
- Baran, B. (2016). “Mebêje Heywan E, Bêzar Ê Ziman E”. Kovara Folkora Kurdan, Hj. 6, r. 71-73.
- Bayezîdî, M. M. (2010), Adat û Rusûmatnameê Ekradiye (Lêkolîn, tîpgûhezi û Wer. Kurmanciya nûjen: Jan Dost). İstanbul: Weş. Nûbihar.
- Bedirxan, C. A. (2014). Çîrokbêj-Çîrokên Kurdmancî, İstanbul: Avesta Yayıncılık.
- Benek, A. (2014). Gotinên Pêşiyân Çîrokên Dawiyân. Stenbol: Weş. Nûbihar.
- Berbir, H. (2013a). Roviye Bêdûvik, Stenbol: Weş. Şaredariya Kayapinarê.
- Berbir, H. (2013b). Ker û Şêr û Rovî, Stenbol: Weş. Şaredariya Kayapinarê.

- Berbir, H. (2013c). Pîrê û Dîk, Stenbol: Weş. Şaredariya Kayapinarê.
- Berbir, H. (2013d). Şêr û Gur û Mî, Stenbol: Weş. Şaredariya Kayapinarê.
- Berbir, H. (2013e). Qertel û Kîso, Stenbol: Weşan. Şaredariya Kayapinarê.
- Berbir, H. (2012a). Rovî û Şêr, Stenbol: Weş. Aram.
- Berbir, H. (2012b). Rovi û Kûsî, Stenbol: Weş. Aram.
- Berbir, H. (2012c). Mişkê Deştê, Stenbol: Weş. Aram
- Beydaba, Hind Filozofu (1958). Kelile ve Dimne. (Wer. Ömer Rıza Doğrul). İstanbul: Ahmet Halit Yaşaroğlu Kitapçılık ve Kağıtçılık T.L.Ş.
- Bilkan, A. F. (2001). Masal Estetiği. İstanbul: Masal Timaş Yayınları.
- Boîs, T., Mînorsky, V., Mac Kenzie, (D.N). (2004). Kürtler ve Kürdistan. (Ç. II). İstanbul: Doz Yayınları.
- Bozarlan, M. E. (1999a). Mir Zoro. İstanbul: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (1999b). Keçika Qırşfiroş. İstanbul: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2000a). Gurê Bîlûrvan. Stenbol: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2002a). Kêz Xatûn. İstanbul: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2002b). Gulê û Sino. İstanbul: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2005). Serketina Mişkan. Stenbol: Weş. Deng .
- Bozarlan, M. E. (2005). Serketina Mişkan. Stenbol: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2006). Pepûk, Diyarbakir: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2008). Baxçê Zımên (Cildê 1.). Amed: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E. (2011). İlmê Tûrik. İstanbul: Weş. Deng.
- Bozarlan, M. E.(2000b). Ditinhezhar. İstanbul: Weş. Deng.
- Bozkurt, K. (15.05.2013). Kürt Masallarının Yapısal Özellikleri. <http://www.ufkumuz.com/kurt-masallarinin-yapisal-ozellikleri-23110h.htm>. (ragihanî: 15.05.2015).
- Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedisi-C. 6, (1986). İstanbul: Gelişim Yayınları.
- Celîl, O., Celîl, C. (1978). Zargotina Kurda II, Moskova: Naşîrxana Naûka.
- Cewerî, F. (1996). Kultur, Huner û Edebiyat. Stockholm: Weş. Nûdem.
- Cindî, H. (2005). Hikyatêd Cimeta Kurda VI, Yêrevan: Weşanxana Asoxîk.
- Cindî, H. (2011). Hikyaten Cimeta Kurda, Yerevan: Weşanxana Lîmuş.
- Cizîrî, Ş. (2007). “Zimanê Edebiyata Zargotinî”. Kovara Nûbûn, Hj. 88, r. 68-74.
- Çalıştıran, R. (2014). Welatê Moriyan, D.bakır: Weşanên Hîva.

- Çiyayî, F. M. (2013). Dengbêjî, Kovara Kelhaamed, Hj. 16, r. 20-23.
- Dilsoz, O. (2014). Kundê Dadger, D.bakır: Weşanên Hîva.
- Diyadîni, B. (2011). Çîrçîrokên Gelerî, İstanbul: Weşanên Ajans J&J.
- Dîzman, R. (2015). “Di Fablên Kurdî De Rovi”. Kovara Folklorê Kurdan, Hj. 3, r. 23-29.
- Ekinci, A. (Karker). 30.05.2015, Hevpeyvînek Di Derbarê “Di Baweriya Gel De Jûjî” Batman.
- Ekinci, B. (Kevanî). 30.04.2015, Hevpeyvînek Di Derbarê “Di Baweriya Gel De Hejmarê Çilî” Batman.
- Elban, Y. (2006). Asmîn û Bilbil, D. Bakır: Weşanên Hîva.
- Ergün, C. (2006). Kur’an’ın Cennet Anlayışının Diğer Dinlerle Karşılaştırılması. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çap kirin). K.Maraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Erîşen, H. (2009). Koçerî. İstanbul: Ravza Yayıncılık.
- Êsî, H. M., Girdarî, S. M., Bêrkevanî, M. M., (2008). Wergera Qur’ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî. İstanbul: Weş. Bang.
- Eskigün, K. (2006). Klasik Türk Şiirinde Efsanevi Kuşlar. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çap kirin). K. Maraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü T.D.E Anabilim Dalı.
- Ezop. (1976). Ezop Masalları (Wer. Orhan Vedat Sevinçli). İstanbul: Toker Yayınları.
- Ferho, M. (2012). Rewşa Romana Kurdî. İstanbul: Do Yayınevi.
- Fırat. Ş., M. (2013). Doğu İlleri ve Varto Tarihi. İzmir: Yayın-B- Basın yayın Dağıtım.
- Fîdan, M. (2014). Çîrokên Gelerî Ji Herêma Botan, Stenbol: Weşanên Berbang.
- Gültekin, M. (2013). Zargotina Kurdên Serhedê. Stênbol: Weş. Awesta.
- Hîsen, A. (2016). “Kêvirwîşk û Mişik” Dihok: Kovara Sivore, Hj. 205, r. 28-30.
<http://wp.zimanekurdi.ch/wrdp/wp-content/uploads/2014/08/GUR-%C3%9B-HEFT-KARIK.pdf> (ragihanî: 07.10.2016).
- Jiyan, A. (2003). Seyrê. Stênbol: Weş. Elma.
- Kasapoğlu, A. (2006). “Kur’anda Hayvan Davranışlarına Benzetilen İnsan Karakterleri. F.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi, Hj. 11-1, r. 47-57.
- Kaval, F. (2013). “Klasik Arab Edebiyatı Kaynaklarında Karga Motifi”.Uludağ Üniv. İlahiyat Fak. Dergisi, C. 22, r.117-142.

- Kaval, Y. (2015). “Yılan Motifi”. Hakkâri Kîlîmlerî. (Semînera Lîsansa Bilind a Nehatî Çap kirin). Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü (Elazığ: 29.01.2015).
- Mazi, Ç. (2014). Baxek Ji Folklorê Kurdî. İstanbul: Berbang Yayınları.
- Miksî, H. (1919). “Dîbace - Mem û Zîn”. Kovara Jîn, C. IV, Hj. 19, r. 14-17.
- Narozî, E., Mîzgîn, H., Kerîm, R. (1995). 300 Saliya Mem û Zînê. (Hevpeyvînek bi M. Emîn Bozarlan re) Kovara Armanca, Hj. 4, r. 6-13.
- Nur, İ. H. (2013). Mesnevi’de Hayvan Karakterleri (Metaforları). AVKAE Dergisi, Hj. 3(1), r. 18-30.
- Nursî, B. S. (1995). Sözlük. İstanbul: Envar Neşriyat.
- Oncu, M. (2009). Gotinên Pêşiyên. Stenbol: Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Oncu, M. (2015). 101 Biwêj 101 Çîrok. Stenbol: Weş. Avesta.
- Öğütçü, A. B. (2014a). Xezal û Qertel, D.bakır: Weşanên Hîva.
- Öğütçü, A. B. (2014b). Kewên Gozel, D.bakır: Weşanên Hîva.
- Öncü, M. (2006). Çîrokên Kurdan. İstanbul: Doz yayıncılık.
- Öncü, M. (2014). Çîrokên Efsaneyî Yê Kurda. Stenbol: Weş. Nûbihar.
- Özkaynak, M. E. (2013). Masal Formellerinin Sembolik Çözümlemesi. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çap kirin). Elazığ: Fırat Üniversitesi SBE.
- Pertev, R. (2009). Zarok û Çîrok (Destpêka Pedagojiya Kurdî). İstanbul: Doz Yayıncılık.
- Petîşka, E. (1993). Mîtolojîyên Mezopotamya (Wer. ji Bulgarî Cemal Batun). Spânga-Swenden: Weş. APEC.
- Rayman, H. (2002). “Nevruz ve Türk Kültüründe Renkler”. Milli Folklor Dergisi, Hj. 53, S.14, R. 10-15.
- Sadinî, M. X. (2011). Çîrokên Gelerî. İstanbul: Weş. Nûbihar.
- Sakaoğlu, S. (1999). Masal Araştırmaları. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Sakaoğlu, S. (2007). Masal Araştırmaları (3. Baskı). Ankara: Akçağ Yayınları.
- Salih, M. S. (2016). “Harîkariya Darkukey”, Dihok: Kovara Zeng û Beng, Hj. 150, r. 7-10.
- Saruhan, İ., Tuncer, C. (2010). Kültürel Entomoloji. Anadolu Tarım Bilim Dergisi, C. 25(1), r. 21-27.
- Sewîm, W. (2016). “Rovî, Bet û Ker”. Amed: Kovara Folklorê Kurdan, Hj. 6, r. 91-93.
- Şerefxan. (2009). Şerefname. (Wer. ji Erebî M. Emîn Bozarlan) İstanbul: Weş. Deng.

- Uçkun Kocaaslan, R. (2003). Gagauz Masallarının Tip ve Motif Yapısı Bakımından İncelenmesi. (Teza Doktora a Nehatî Çap kirin). İzmir: Ege Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü .
- Uzun, M. (1991). Rojek ji Rojen Evdalê Zeynikê. Stockholm: Weş. Welat.
- Uzun, M. (1992). Destpêka Edebiyata Kurdî. Ankara: Weş. Beybûnê.
- Uzun, M. (1993). Hêz û Bedewiya Pênûsê. ISBN: 91-88592-02-2: Weş. Nûdem.
- Uzun, M. (2009). Dengbêjlerim. İstanbul: İthaki Yayıncılık.
- [www.bilgiustam.com/karincalarin-hayati-ve-muhtesem-yasam-sekilleri/\(ragihanî:24.03.2015\)](http://www.bilgiustam.com/karincalarin-hayati-ve-muhtesem-yasam-sekilleri/(ragihanî:24.03.2015)).
- www.gizlimabet.com/showthread.php?+=16310 (ragihanî: 13.01.2015).
- Xamo, Z. (2014). Hebû Tunebû Antolojiya Çîrokên Zaroka. Stenbol: Weşanên Rupel.
- Yıldırım, A. (2006). “Renk Simgeçiliği ve Şeyh Gâlib’in Üç Rengi”, Millî Folklor, C. 9, Hj.72, r. 129-141.
- Yıldırım, E. (2009a). Pîrû û Dîk, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Yıldırım, E. (2009b). Rovî û Şêr, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Yıldırım, E. (2009c). Gayê Cot, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Yıldırım, K. (2012). Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
- Yolcu, M. A. (2011). “Azerbaycan Masallarında Formeller ve Formel Unsurlar”. Nevşehir Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi. Hj. 1, r. 75-88.
- Yûhenna (20:14). (Wer. Kurmancî). (1997). İstanbul: Kitabı Mukaddes Şirketi/ Zafer Matbası.
- Yücel, Ü. (2011). Türk Halk İnanışlarında Sayılar. (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çap kirin). Ankara: Ankara Üniv. S.B.E Felsefe Ve Din Bilimleri (Dinler Tarihi) Anabilim Dalı.
- Zinar, Z. (1989). Xwençe Cild I, Stockholm: Weşanxana Çanda Kurdî.
- Zinar, Z. (2013a). Kerkerokê Bayê. Wan: Weş. Sîtav.
- Zinar, Z. (2013b). Kewê Çîrokbêj. Wan: Weş. Sîtav.
- Zinar, Z. (2013c). Abidê Şikeftê. Wan: Weş. Sîtav.

PÊVEK 1: Ji Rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran” Çend Nimûne

BIRATIYA ROVÎ Û MAR

Hebû tunebû carek jî caran, rehme lî dê û bavên guhdaran, xeynî jî cendirme û tehsildaran.

Roviyekî pîrr fenek hebû. Bî fen û fûtan, bî dek û dolaban çu kesek pê ra nedîçû seri.

Rojek jî rojan, rovi pîrr bîrçî bû. Wîsa bîrçî bû ku, "qure qur" jî zîkê wî dîhat. Rabû bî çolê ket û jî xwe ra lî xurekek geriya. Dîxwest ku lawîreki jî xwe bîçûktir û qelstir neçir bîke û bîxwe. Lê qîsmetê wî derneket. Lî vî ali geriya, lî wî ali çerixî; tewş bû; tîşteki ku zîkê xwe pê têr bîke, peyda nekîr. Hîngî ku geriya, têra xwe betlî jî. Jî ber bîrçîbûnê û betlînê, jî hêz ket. Êdî bî zorê dimeşîya.

Paşê lî qeraxê rêlek jî bînê deviyek xîştînek bîhist. Kêfa wî hat. Got qey kew mewek ê di binê wê deviyê da xwe veşartîye.

Bî wê hêviyê hêdi hêdi, dîzîka ber bî deviyê meşîya. Lê hêj negîhabû ber deviyê, hew dit ku mareki reş ê mîna qîr jî nava deviyê derket. Ku çavê wî bî mar ket, rawesta û qasek lî mar nihêrt, paşê sîlav lê da û got:

— Roj baş bîrakê mar. Tu bî kêderê ve dîçî weha?

Mar serê xwe bîlînd kîr, berê derziya xwe lî vî ali û lî wî ali hejand, paşê bersîv da û got:

— Roj baş bîrakê rovi. Ez bîrçî bûme û lî tîşteki xwarnê dîgerim.

Rovi got:

— Bî Xwedê ez jî lî tîşteki xwarnê dîgerim. Le mîn heta nuha tîşteki bî destê xwe nexîstîye.

Mar qasek fikîrî, paşê got:

— Bîrakê rovi, ka ez û tu bîbîn destebîrak û bî hev ra lî xurek bîgerîn. Bî wî awayî, em'ê jî hev ra bîbîn alîkar û bîkarîn hesantîr hem lawîrên dî nêçîr bîkîn û bîxun.”

Rovi fikîrî, dit ku peyva mar rast e; yekê tenê nîkare pîrr tîştan bîke; lê ku çend kes destên xwe bîdîn hev, dîkarîn gelek tîştan bîkîn. Peyva pêşîyan dîbêje "Pîrani mêranîyê betal dîke". Rovi bî wê fikîrê pêşînyaza mar qebûl kîr. Bî wî awayî herdu bûn destebîrak û bî rê ketîn, bî hev ra lî xurek geriyan. Hem dimeşîyan, hem jî qala nêçîrê û tîştên xwarnê dîkîrîn. Pîrr çûn, hîndîk çûn, hew ditîn ku rîya wan rastê çemek haaat. Rawestan û lî hev nihertîn. Paşê mar pîrsî, got:

— Em'ê nuha çî bîkîn, bîrakê rovi?

Rovi bersiv da û got:

— Divê em avjeni bîkîn, derbasê wi ali bîbîn û lî wi ceberê çêm lî tîştên xwarinê bîgerîn.

Lê mar nedîkari avjeni bîke. Stûyê xwe xwar kîr û bî çavên lavakar lî rovi nihêrt, paşê got:

— Bîrakê rovi, tu dîzani ku ez nîkarîm avjeni bîkîm.

Rovi got:

— Belê ez dîzanîm.

Mar disa bi çavên lavakar lî rovi nihêrt û got:

— Bîrakê rovi, gelo tu destûr nadi mîn ku ez bê mî pîştî te û tu jî kerema xwe mî derbasê wi ceberê çêm bîkî?

Rovi daxwaza mar bê gengeşe qebûl kîr û got:

— Belê, çîma na! Ma em ne destebîrakên hev î nî! Kerem bîke were pîştî mî nî.

Rovi bî wê peyva xwe ra mexel ket. Mar çû lî ser pîştî wi xwe kîlor kîr. Paşê rovi rabû, ket nava avê û dest bî avjeniyê kîr, ber bî wi ceberê çêm pêş ve çû. Dema giha nivêka çêm, hew dît ku mar dest pê kîr xwe lî gewriya wi pêça Rovi jî wê yekê tîrsa û pîrsî, got:

— Erê tu çî dîki, bîrakê mar?

Mar bersiv da û got:

— Ez dîkîm te gez bîkîm, bîrakê rovi.

Rovi jî wê peyva mar hem şaş bû, hem jî tîrsa wi zêde bû. Bî wê şaşbûne û tîrsê pîrsî, got:

— Çawa tu bêbextiyeka wîsa bî mî nî ra dîki! Nê qaşo em bûbûn destebîrak, ma te jî bir kîr!

Mar got:

— Na, mî nî jî bir nekîriye. Lê tu jî bir dîki ku ez mar î mî. Erê ez bûm destebîrakê te. Lê dîgel wê yekê jî ez marek jî maran î mî. Xwiyê mî nî maritîyê ew e ku ez kesên dî gez bîkîm.

Rovi dît ku rewş xîrab e, vêca dest bî lavan kîr û got:

— Eman yeman, bırakê mar, wisa meke! Çu zırareka mın negihaye te. Bı ser da ji mın tu kırı pışta xwe, da ku ez te di ava çêm ra derbas bıkım. Ma heqê vê qenciya mın ev e!

Lê dilê mar bi wan lavan nerm nebû. Xwiyê wi yê maritiyê carek hatibû. Nedikari dev jı wi xwiyê xwe berde. Lı rovi vegerand û got:

— Ez mar ım, neyar ım. Ez'ê te gez bıkım û bıkujım.

Rovi vêca dest bı şiretan kır û got:

— Bınêre, bırakê mar, Eger tu mın gez bıki, erê ez'ê bımırım, lê tu ji dê di avê da bîfetisi. Ma tu diki bibi sebebê mırına xwe ji!

Lê belê şiretan ji çu karek lı mar nekır. Wi carek bıryar dabû ku rovi gez bıke. Keysa wi ji hingê di nava avê da lê hatibû. Êdi jı wê bıryarê nedızıviri. Jı rovi ra got:

— Çı dibe bila bibe, ez mar ım û divê ez wek marek tevgerım. Karê maran ji gezkırın e.

Rovi êdi hêviya xwe birri. Zani ku destebırakiya maran pûç e. Hingê wi ji dest bi roviya xwe kır. Hema tavıl dekek di serê xwe da çêkır û jı mar ra got:

— De baş e, bırakê mar. Madem te bıryara xwe daye, tu'yê mın gezbıki û bıkujı. Lê digel wê yekê ji ez lı ser destebırakiya xwe me. Ez'ê heta mırınê ji lı ser sozê xwe bımınım. Lê belê daxwazeka mın ji te heye.

Mar got:

— Daxwaza te çı ye? Ka bêje.

Rovi got:

— Hingi ez te dievinım, mın divê ez beri mırına xwe xatır jı te bıxwazım.

Mar pırsi, got:

— Tu'yê çawa xatır jı mın bıxwazi?

Rovi got:

— Kêfa min pırr ji gewriya te ya xweşik ra tê. Mın divê ez gewriya te maç kım û bı wi awayi xatır jı te bıxwazım. Paşê jı xwe tu'yê mın gez bıki û ez'ê bımırım.

Mar daxwaza rovi qebûl kır û gewriya xwe ber bi devê wi dirêj kır. Gewriya mar çawa giha ber devê rovi, rovi hema jı nişka ve bı binê çena wi girt û bi dijwari gez kır, heta ku hêza wi hebû şıdand. Mar xwe bı vi ali ve avêt, bı wi ali ve lı ba xıst. Lê belê tewş bû; nekari xwe jı devê rovi rızgar bıke. Hêdi hêdi jı hêz ket û tevgerên wi sist bûn.

Paşê rovi gihişt wi ceberê çem. Lı wır jı avê derket û mar jı stûyê xwe avêt ser silikê. Heta hingê mar mırıbû ji. Rovi qasek lê temaşe kır, paşê deng lê kır û xwe bı xwe got:

— Bırati xweş e rasta rast, ne weha bı fetl û fitûl (Bozarlan, 1999a: 54-60).

HEDLİLİK Û BEDLİLİK

Hebû tunebû carek jı caran, rehme lı dê û bavên guhdaran, xeyn jı cendirme û tehsildaran.

Bızınek û du karên wê hebûn. Navê yekê jı wan herdu karan "Hedlilik" bû, nave ya di ji "Bedlilik" bû. Bızınê herdu karên xwe ji pırr û pırr diwandın. Karık ji, yek jı yekê xweşıktır û şirintır bûn. Dema tav derdiket, herdu dıçûn ser mêrga hemberê koza xwe û bı hev ra dıleystın. Geh çındık dıdan xwe û lı ser mêrgê dıbeziyan, geh ji bı serıyan lı hev dıxıstın. Kesen ku ew dıdıtın, dıgotın qey du qulatên zêr in.

Diya wan rojê sê çar car dıçû lı ser mêrgan dıçêriya, guhanê wê tıji şır dıbû, paşê vedıgeriya kozê. Hedlilik û Bedlilikê ku çav dıdan diya xwe, jı kêfan lotık dıdan xwe û xwe bılınd dıkırdın lı erdê dıxıstın. Paşê ji bı dılbıjoki guhanê diya xwe dımetın, heta ku têra xwe şır dıxwarın.

Rojek jı rojan, diya wan disa çû çêrê. Mina hemi caran, beri ku jı kozê derkeve şıret lı Hedlilik û Bedlilikê kır û got:

— Karên mın ên xweşdıvi, heta ez neyê hun derê kozê jı kesek ra venekın haaaa! Hın kes bên jı we ra bêjın "Deri vekın" ji, dıvê hun bı wan nexapın û deri venekın. Dema ez bê m, ez'ê wek hemi caran lıngê xwe dı bınê deri ra dırêjê hundır bıkı m. Ku we lıngê mın dıt, bızanın ku ez ım û deri vekın. Yan na, hun deri jı keseki di ra venekın haaaa!

Hedlilikê û Bedlilikê guhdariya diya xwe kırın û şıreta wê dı hışê xwe da gırtın. Diya wan xatır ji wan xwest û çû. Wan ji derê kozê lı pey wê gırt. Paşê herdu ji razan.

Ewxu dı wê demê da gurek ji lı wan doran dıgeriya. Qasek paşê çavê gur bı koza Hedlilik û Bedlilikê ket. Tavıl bêhn gırt ku herdu karık dı hundır da ne. Çû ber derê kozê, dıt ku deri gırtıye. Xwest ku Hedlilik û Bedlilikê bıxapine. Dengê xwe kır mina dengê bıızınek û mein kır, got: "Meeeeee".

Hedlilik û Bedlilik bı dengê wi jı xewa xwe hışyar bûn. Paşê gur disa dengê xwe kır wek dengê bıızınek û deng lı wan kır, got:

— Karıkno, diya we lı kêderê ye?

Hedlîlık û Bedlîlıkê nedızanin ku ew gur e deng lı wan dıke. Gotın qey bızıneka di ye lı karên xwe dıgere. Bı devek bersiv dan û gotın:

— Diya me çûye çêrê, jı me ra şır tine.

Gur disa dengê xwe kır wek dengê bızınək û pırsi, got:

— Navê we çı ye, karıkên xweşik?

Karıkan got:

— Navê me Hedlîlık û Bedlîlık e.

Gur xatır jı wan xwest û jı ber kozê çû. Nedıxwest ku Hedlîlık û Bedlîlıkê têxe gumanan. Dıxwest wan xafil bıke û bı xapê derê kozê bı wan bıde vekırın.

Qasek geriya, disa çû ber derê kozê, wek cara berê dengê xwe kır wek dengê bızınək û deng lı wan kır, got:

— Hedlîlıkaaaa'm, Bedlîlıkaaaa'm!

Deri vekııın j'ı dayıka xwe raaaa.

Çêra şınaaaa l'ber dıdanaaaan.

Şırê terêêêê lı guhanaaaan.

Hedlîlık û Bedlîlıkê lı hev nıhêrtın. Bawer nekırın ku ew diya wan e hatiye ber deri. Lewra şireta ku diya wan lı wan kırıbû û gotıbû "Ez'ê wek hemi caran lıngê xwe dı bıne deri ra dirêjê hundır bıkıım", ew şiret dı bira wan da bû. Gotın:

— Tu derew diki, tu ne diya me yi.

Gur dest bı fenan kır û got:

— Eman yeman, çawa ez ne diya we me! Ku ez ne diya we bûma, çıma mın' ê bıgota " Jı mın ra deri vekın !

Herdu karıkan got :

— Ka lıngê xwe nişanâ me bıde, em bıbınin. Hıngê em'ê bızanın ku tu diya me yi, yan na.

Gur lıngê xwe dı bıne derê kozê ra dirêjê hundır kır. Hedlîlıkê û Bedlîlıkê ditın ku rengê lıngê wi gewr e. Lê belê rengê lıngê diya wan reş bû. Wan jı xwest ku gur bıxapınin. Gotın:

— Rengê lıngê diya me sor bû. Tu ne diya me yi. Em jı te ra deri venakın.

Gur hedika lıngê xwe bı paş ve kışand. Tegıhişt ku karık xasûk ın. Dı dılê xwe da got "Gelo ez çawa bıkıım ku keys lı van karıkan bıkıım û wan bıxum?" Jı aliyek ve jı

zımanê xwe lı dora devê xwe dıxıst û tama devê xwe xweş dıkır. Paşê çû, lı axdanek xwe dı nava soringê da gevızand, heta ku pırça wi bı carek sor bû. Hinge xwe bı xwe got "Temam, vêca ez'ê bıkarım wan herdu karıkan bıxapınım û bıxum". Jı kefan dûvê xwe hejand û disa ber bı koze çû. Dema giha ber deri, disa dengê xwe kır mina dengê bızınek û deng lı herdu karıkan kır, got:

—Hedlilıkaaaam, Bedlilıkaaaa'm!

Deri vekııın j'ı dayıka xwe raaaa.

Çera şınaaaa l'ber dıdanaaaan.

Şire tereeee lı guhanaaaan.

Karıkan disa bawer nekır ku ew diya wan e. Gotın:

— Tu derew diki, tu ne diya me yi.

Gur disa dest bı dek û dolaben xwe kır û got:

— Ma hun din bûne, çawa ez ne diya we me! Ma ku diya we nebe, ki tê jı we ra dıbêje "Ka jı mın ra deri vekın"! Welle ez diya we me, bılle ez diya we me.

Hedlilıkê û Bedlilıkê gotın:

— Madem tu diya me yi, ka lingê xwe dı bınê deri ra dirêjê hundır bıke, em bıbının.

Gur lingê xwe dı bınê deri ra dirêjê hundır kır. Karıkan dit ku rengê wi sor e. Zanin ku ne diya wan e. Jê ra gotın:

— Tu derew diki, tu dıxwazi me bıxapını. Tu ne diya me yi. Lingê diya me reş bû, lingê te sor e. Em jı te ra deri venakın.

Gur disa lingê xwe bı paş ve kışand û kor poşman vegeriya. Disa tışte bı devê wi neket. Xwe bı xwe got "Gelo ez çawa bıkıım ku van herdu karıkên mızawır bavêjım devê xwe û bı noşıcani bıxum?"

Paşê rabû çû ciyeki reşık û xwe dı reşıkê da gevızand, heta ku laşê wi û pırça wi gışt reş bûn. Paşê xwe da ber tave zıwa kır û disa berê xwe da koza Hedlilıkê û Bedlilıkê. Lingê xwe dı bınê derê kozê ra direjê hundır kır, dengê xwe kır wek dengê bızınek û mina berê deng lı herdu karıkan kır, got:

— Hedlilıkaaaam, Bedlilıkaaaa'm!

Deri vekııın j'ı dayıka xwe raaaa.

Çera şınaaaa l'ber dıdanaaaan.

Şirê terêêêê lı guhanaaaan.

Hedlîlik û Bedlîlikê vêca ku lî lingê wi nihêrtin, ditin ku erê, lingê wi wek lingê diya wan reş e. Lî ser wê yekê jê bawer kîrîn û gotin qey diya wan e jî çêrê vegeyriyaye û dîxwaze wan bî guhanê xwe bîmjîne. Kêfa wan hat û bî wê kêfê rabûn derî vekîrîn. Derî çawa vebû, gur hema jî nişka ve qavz da û xwe avet ser wan. Berê Hedlîlik, paşê jî Bedlîlik avêt devê xwe, herdu jî daqurtandin û xwarîn. Paşê çû ser kaniyeka nêzê kozê û tera xwe av vexwar. Zîkê wi bî herdu karîkan û bî ave nepixî, bû mina dawîlek û ma. Vêca çû, lî siya darekê nêzê kaniye vezeliya û raket.

Qasek paşê diya Hedlîlik û Bedlîlikê jî çêrê vegeyriya. Dema giha ber derê kozê, dit ku çî bibîne! Bala xwe daye ku derî vekîri ye, herdu karîk jî ne lî hundîrîn. Dî dilê xwe da got "Heywax û heywax, hemîniştêk hatiye serê Hedlîlik û Bedlîlika mîni".

Paşê dest pê kîr lî wan gerîya. Ha lî vîr, ha lî wîr, hew dit ku gurek wa ye lî siya darek raketî ye, zîkê wi jî mina dawîlek nepixî ye. Dî dilê xwe da got "Hebe tunebe vî guri herdu karîkên mîni xwarîne".

Paşê rabû çû ber kevîreki mezîni, herdu qîloçên xwe dî kevîr da heşîkandin, heta ku serên wan tûj bûn, bûn mina serên du nişteran. Vêca berê xwe da bîne wê dara: ku gur dî siya wê da raketî bû. Dîzîka, hêdî hêdî çû û xwe gîhand ber gur. Dit ku erêêêê, gur dî xeweka kûrda ye û "pîxxxxîn" a wî ye. Bîzîne hema jî nişka ve serê qîloçeki xwe ye tûj, heta ku hêza wê hebû lî zîkê gur xîst û zîkê wî qelaşt.

Çawa zîkê gur qelîşî, Hedlîlik û Bedlîlikê hema lotîk dan xwe û jî zîkê wî derketîni der, bî lez û bez xwe avêtîni ber diya xwe. Kêfa wan hat ku gîhiştîni diya xwe, ew û diya xwe bî hev şa bûn. Paşê diya wan guhanê xwe yê tîjî şîr avêt devên wan û ew mîjandin. Jî aliyek ve jî dest pê kîr şîret lî wan kîr û got:

— Karên mîni en xweşdîvî, gur lî dîne pîrî mîni. Dîvê mîrov çavvekîrî be, da ku bîkîrî be xwe jî guran bîparêze. Eger mîrov dîlsaf be, bûdela û xêt be, hîngê mîrov dîkevê devê guran û dîbe xurekê wan. Jî bo ku mîrov bî guran nexape û nebe xurekê wan, dîvê mîrov jî wek wan şût be, fenek û dekzan be. Yek jî awa û bîngêhokên jîyanê jî ev e (Bozarslan, 1999a: 61-69).

ŞÊRÊ DI BÎRÊ DA

Hebû tunebû carek jî caran, rehme lî dê û bavên guhdaran, xeyn jî cendîrme û tehsildaran.

Demek jî deman dî rêlek da şêrek hebû? Ew şêr jî mina hemî şêrên di, mirê rêlê xwe bû û destê wi bî ser destên hemî lawîran ra bû. Çend lawîr dî wi rêlî da hebûn, gîşt dî binê fermana wi şêri da bûn. Fermana şêr lî her derê rêl û dî nava hemî lawîran da dîbuhuri. Jî keroşkan heta guran, jî roviyan heta keftaran, hemî lawîran lî ber fermana wi serên xwe xwar dîkîrî û stûyên xwe dîtewandin.

Ew şêr bî miritiya xwe gelek qure bûbû, gelek pozbîlînd û nefsmezîna bûbû. Pozê wi tum bîlînd bû, bijiyên wi jî her dem gîj bûn. Jî ber qureti û nefsmezîniya wi, gelek caran ronayi dî çavên wi da nedîma, hîşê xwe jî hêrsnedîda tîştan. Axîr, dî dilê xwe da dîgot. "Ez îm ku ez îm".

Lawîrên di ne ku tenê dî binê emr û fermana şêr da bûn; lê her weha, hemîyan jê ra xulamî û xîzmetkari jî dîkîr. Şêr karên mala xwe jî hemî bî wan lawîran dîdan kîrî. Lawîrên rêlê xwe gîşt xîstîbûn dorê. Rojê dora yekê jî wan bû. Dora kijan lawîr bîhata, wê rojê wi mala şêr dîmalîşt, xurekê wi daniya û çî karên wi hebûna dîkîrî.

Lawîran gîşt miriti û serokiya şêr qebûl kîrîbû û serên xwe lî ber fermana wi tewandîbûn. Lê belê xulamî û xîzmetkariya şêr, karên wek malîştîna mala wi û hazîrkîrîna xurekê wi, ne bî dilê wan bûn.

Wan lawîran wîsa dîzani û bawer dîkîr ku jî bo lêkanîna dûzena rêlê wan, jî bo pêkanîna û meşandîna karên wan ên gîştî, jî wan ra mirek, serokek lazîm e. Eger mireki wan, serokeki wan tunebûya û her yek jî wan bî kêfa xwe bûya, hingê dê tîkîlhevî û berdi berdîna tîketa rêlê wan û her tîşt dê sero bîno bîbûya, Lî gorî baweriya wan, miriti û serokiya wan jî heqê şêr bû. Lewra şêr dî nava wan da lawîrê xurtîrîna bû.

Jî wi alî ve û jî bo dûzena gîştî, çu kesek lî dijê miriti û serokiya şêr dernedîket. Lê belê wan wîsa dîzani û bawer dîkîr ku heqê şêr tune ku karê xwe ye taybetî û xîzmeta xwe ya şexsî bî wan bîde kîrî. Wan wîsa bawer dîkîr ku her kes, mir jî kîzîr jî, dîvê ku karê mala xwe û xîzmeta xwe ya kesanî bî xwe bîke, ne ku bî zorê bî hîna kesên di bîde kîrî. Hemîyan dî dilê xwe da dîgot: "Êrê, jî bo ahenga jîyana gîştî em miriti û serokiya şêr qebûl dîkîn û fermana me bî destê wi ye. Lê em ne xulamên wi û bavê wi ne ku karên wi yê şexsî bîkîn. Ev suxre ye ku şêr bî me dîde kîrî û neheqîyekê mezîna e ku lî me dîke. Dîvê ku em havîlek bîbin û dûwayî lî vê neheqîya wi binî".

Lê belê, dîgel ku lawîr hemî wîsa dîfîkîrî, jî xulamî û xîzmetkariya şêr qet razî nebûn jî, nedîkarîna û nedîwerîna lî dijê wi rabî. Tewr nedîkarîna îtiraz jî bîkî. Bî wi awayî, jî neçarî xulamîya wi dîkîrî û xîzmetkariya wi dîdomandî.

Rovi ji mina hemi lawîrên di xulamî û xîzmetkariya şêr dîkir. Roja ku dora xulamîyê dîhat ser wi, ew ji wek lawîrên di sibê zû radîbû dîçû mala şêr û heta êvarê hemi karên wi dîkirin. Lê belê ew ji jî wê xulamîyê bêhteng û bêzar bûbû û pêsir dîweşand. Gelek caran lî ser wê rewşê dîfikîrî û xwe bî xwe dîgot: “Ev çî êsîrî ye em tê da ne! Dîvê em havîlek bîbinin ku pe xwe ji vi hali xîlas bîkin. Êrê, em bî dest û lepên xwe bî şêr nîkarin. Lê ma em nîkarin dekek ji lî serê wi şêrê zalîm û zordest çêkin! Belê bî Xwedê, çîma em nîkarin! Eger lawîrên di nekarin ji, ez dîkarim dekek çêkim. Navê min rovi ye, dek û dolabên min ji pîrr in. Dîvê ez bî xwe dekek çêkim, xwe û lawîrên di gîştan ji xulamîya şêr rîzgar bîkim, bîgîhinim azadî û serbestîyê.”

Rovi paşê fikîrî û da hîşê xwe ku dekeka çawa lî serê şêr çêke. Jî bo ku bîkare bî sereki seqîrî bîfikîre, rabû bî rê ket û dest pê kîr dî nava rêl da gerîya. Lî vi alî gerîya û da hîşê xwe, lî wi alî zîvîrî û da hîşê xwe. Hîngê jî nişka ve hat bîra wi ku lî qeraxê rêl bîrek heyê. Ku ew bî hat bîra wi, hema berê xwe rast da ser wê birê û çû, da ku lî qeraxê birê mexel keve û jî jor ve lî ava birê binêre, bî wi awayî bîkare baştir lî ser dekek bîfikîre.

Dema gîhişt ser birê û lî qeraxê wê mexel ket û jî jor ve lî ava birê nihert, jî jor ve ayîna xwe dî ava birêda dît. Çawa ayîna xwe dî ava birê da dît, hema kêfa wi xweş bû, çepîkên xwe lî hev xîstî û dî dilê xwe da got: “Temam, min deka xwe dît. Ez’ê vêca bî hêsanî bîkarim jî heqê şêr derkevîm, xwe û hemi lawîrên di jî zordestîya wi rîzgar bîkim”.

Paşê rabû jî wîr çû kuna xwe, lî wîr ji fikîrî û deka xwe dî serê xwe da tam hazîr kîr û roja dora xwe ya xulamîye paaaaa.

Dora xulamîya şêr bîhata ser kijan lawîr, dîvîya ku sibê zû rabûya û berê xwe bîda mala şêr û dest bî karên wi bîkîra. Lê belê rovi, roja dora xwe wîsa nekîr. We rojê sibê rabû Jî bo ku dî heqê deka xwe da tam dîlbîcî bîbe, dîsa çû ser we bîra lî qeraxê rêl û jî jor ve lî ava wê nihêrt. Dît ku erêêêê, ava birê tam lî gora deka wi ye. Pîştê ku wîsa dîlbîcî bû, dîsa lî gora wê deka xwe, çû nava rêl û qasek jî xwe ra gerîya, bî wi awayî xwe sewîxand û mexsûs dereng ma. Paşê jî wîr bî rê ket, berê xwe da mala şêr û çûûû.

Jî alîyekî dî ve, şêr ku dît rovi dereng ma, ecêb hêrsa wi hat, bîjîyên wi gîjtîr bûn, qîrîn û gurîneka wîsa bî ser’ê ket ku, mîrov dîgot qey hewrê buhare dîgure. Dî dilê xwe da gef lî rovi xwar û got: “Gîdî roviye dûvrêsi, tu lî hevberê min weha bêedebî dîkî, ne wîsa! Kero, de tu bîsekîne, ku tu bî destê min kevi ez dîzanîm ez’ê çî binîm serê te. Eger

ez cezayeki giran nedim te, bila navê min ne şêr be û bila miritiya vi rêli ji lî min heram be.”

Dema ku şêr dî wê hêrsê da bû, hew dit ku rovi wa ye jî jêr ve tê. Ku çavê wi bî rovi ket, heta ku dengê wi derket qiriya ser’ê û got:

— Gîdî bênamûs, tu lî kêderê geber bûyi heta nuha? Ma te nedizani ku iro dora te ya xulamiyê ye?

Rovi xwe çingîzand, serê xwe berjêr kîr, şêleka tîrsê û fedikariyê da xwe û bî dengê lî zok bersiv da, got:

— Mirê min, Xwedê umrê te dirêj bike û te jî serê me kêr neke. Ez hêvi û tîka dîkim ku tu jî kerema xwe min bibexşini. Min dizani ku iro dora min a xulamiyê ye. Xulamiya te jî bo min şêrefeka mezî e. Ez dizanim ku ez dereng mame. Lê belê, mirê min ê hêzdar, ez bî serê te kîm ne sîcê min bû ku ez dereng mam.

Şêr disa qiriya û pîrsi, got:

— Lê sîcê Kê bû?

Rovi got:

— Mirê min, ez sîbê zû rabûm, bî kêf û hewes bî rê ketim, da ku lîngêk zûtir xwe bigihînim huzûra te û têkevîm xîzmeta te. Lê belê dî rê da şêrek hat pêşiya min û xwest ku jî hatina min ra bibe rêgîr û nehêle ez bêrî koşka te. Heta ku min xwe jî lepê wi şêri filitand, ez weha dereng mam. Jî ber vê yekê, ez hêvidar im ku mirê min qusûra min bibexşine.

Rovi çawa qala “şêrek” kîr, şêr hema dî wê gavê da bû xwey û ket agir. Herdu çavên wi dî serê wi da sor bûn, bijiyên wi jî berê pîrtîr gîj bûn û bî carek tik bûn. “Helkehelk” eka wîsa jî bî ser’ê ket ku, mîrov dîgot dê jî hêrsan wexta bêje “teq” û bîteqe, parçe parçe bibe. Hema jî ciyê xwe hîlfîriya û qiriya, got:

— Tu çî dibêji rovi! Dî vi rêli da tenê yek şêrek heye, ew jî ez im. Jî min pê ve çu şêr lî vîr tunin. Dî vi rêli da şêr jî ez im, mir jî ez im, serokê hemî lawîran jî ez im.

Rovi serê xwe lî ber lîngên şêr dani, bî şalûzi dûvê xwe hejand û bî dengê lî nîzîm lê vegerand, got:

— Belê mirê min, mirê me hemîyan jî, serokê me hemîyan jî tu yi. Em hemî bî saya Xwedê, bî saya serê te lî vîr dijîn. Xwedê te jî serê me kêr neke.

Disa bû “îrre îrîr” a şêr û got:

— Ew şêrê ku hat pêşiya te û xwest bibe rêgrê hatina te, nuha lî kêderê ye? Ka zû bêje. Bêje, da ku ez herim wi parçe parçe bıkım.

Rovi got:

— Lî jêrê rêl e, mirê mın.

Şêr got:

— De were bide pêşiya mın û ciyê wi şêri nişanê mın bide. Ez'ê wisa bıkım ku dınê lî serê wi teng bibe, bibe mina tarê bêjıngê. Ez'ê wisa binım serê wi ku şırê diya wi dı kunên pozê wi ra derkeve.

Rovi got:

— Fermana te lî ser serê mın, lî ser çavê mın.

Paşê rovi ket peşiya şêr, ew rast bır ser wê bira ku lî qeraxê rêl bû û jê ra got:

— Aha ew şêr va ye dı vê birê da ye, mirê mın.

Rovi wisa got û xwe da paş. Şêr hema bı gef û gurr, bı hêrs û xışım çû ser birê û jı jor ve lî nava birê nihêrt. Çawa lî nava birê nihêrt, dit ku erêêêê, bı rasti ji şêreki bijigij û pozçiqiri wa ye dı nava birê da ye. Ew şêr, bı rasti ayına wi bı xwe bû ku dıxuya, ne şêreki di bû. Lê belê wi nedızani ku ew ayına wi ye; got qey bı rasti ji şêreki di ye.

Ku çavê wi bı wi şêrê dı birê da ket, hema ji hêrsan rıcfı, heta ku hêza wi hebû devê xwe vekır, dıdanên xwe yên tûj û dırêj gışt nişan dan û heta ku dengê wi derket qiriya, got:

— Tu ki yi û lı çı dıgeri di vi rêli da loooo?

Şêrê dı birê da ji eyn wek wi devê xwe vekır, dıdanên xwe nişan dan û ew ji qiriya ser wi, jê ra got:

— Tu ki yi û lı çı dıgeri dı vi rêli da loooo?

Ew deng ji dengê şêr bû ku di nava birê da dangan da û lê vegeriya. Lê wi got qey şêrê di birê da jê ra wisa got. Jı ber wê yekê, dema ku ew. deng bihist, êdi hış dı serê wi da nema. Jı berê pırrtır hêrs bû û qiriya, got:

— Ez mir û serokê vi rêli me. Ev rêl rêlê mın e. Lê tu çı dıki lı vır?

Şêrê di birê da disa qet paxava wi nekir. Wi ji eynê peyv lê vegerand û got:

— Ez mir û serokê vi rêli me. Ev rêl rêlê mın e. Lê tu çı dıki lı vır?

Lı ser wê peyvya şêrê dı birê da, şêrê me êdi bû xwey û ket agrı. Mina hewrê meha nisanê guriya û got:

— Ez te nanasım û qebûl nakım ku tu lı vır bımını. Hema dı vê gavê da jı vi rêli derkeve û here. Yan na, ez'ê bêm te bıdım bınê lıngên xwe û nava pencên xwe, mina kêzıkek te bıpelêxım û mejiyê te dı kunên pozê te ra derxım, haaaaa!

Lê belê şêrê di birê da vêca jı qet paxava wi nekır, tewr ne xema wi bû ji. Ew ji qiriya û eynê peyv wısa bı gef û gur lê vegerand, got:

— Ez te nanasım û qebûl nakım ku tu lı vır bımını. Hema di vê gavê da jı vi rêli derkeve û here. Yan na, ez'ê bêm te bıdım bınê lıngên xwe û nava pencên xwe, mina kêzıkek te bıpelêxım û mejiyê te dı kunên pozê te ra derxım, haaaaa!

Bermayiya hışê ku dı serê şêrê me da mabû, ew ji bı vê peyva şêrê dı birê da jı serê wi derket û çû. Qirineka wısa jê çû ku, mirov dıgot qey zınarek gındırı. Vêca xwe ranegirt, çêrê şêrê dı birê da kır û got:

— Hela bala xwe bıdın vi kurê kerê hah! Hat jı newalê, bû xwedyê malê. Kesek nızane ji ber kijan kûçık reviyaye hatiye vır, vêca dıke lı vır doza miritiyê bıke.

Şêrê dı birê da ji eynê peyv lê vegerand û got:

— Hela bala xwe bıdın vi kurê kerê hah! Hat jı newalê, bû xwedyê malê. Kesek nızane jı ber kijan kûçık reviyaye hatiye vır, vêca dıke lı vır doza miritiyê bıke.

Lı ser wê peyva şêrê dı birê da, çav dı serê şêrê me da jı berê sortır bûn. Disa qiriya û got:

— Ez dıbêjım bı lez jı vır biteqize here. Yan na, ez'ê bêm wır te parçe parçe bıkıım û bışınım bıhıştı keran, haaaa!

Şêrê dı birê da ji lê vegerand û got:

— Ez dıbêjım bı lez jı vır biteqize here. Yan na, ez'ê bêm wır te parçe parçe bıkıım û bışınım bıhıştı keran, haaaa!

Lı ser wê peyva şêrê di birê da, şêrê me êdi hew kari xwe ragıre. Hema bı gef û gurr, bı xışım û rık êrişê şêrê di birê da kır, got “gurrrr” û xwe jı jor ve avêt nava birê. Tebii, bı wê avêtinê ra ji dı ava birê da nûq bû û fetisiiii.

Rovi heta wê demê li pey şêr rawestayı bû û dı bınê lêvan da jı xwe ra dıkeniya. Pıştê ku şêr xwe avêt birê, rovi çû ser devê birê û ji jor ve lê nihêrt. Lê belê heta ku ew giha ser devê birê, şêr dı avê da nûq bû û wında ji bû çû. Rovi paşê jı wır vegeiriya, bı ken û kêf dûvê xwe hejand û hêdi hêdi meşiya, çû nava rêêêêl.

Bı wi awayı rovi ji, lawırên di ji gışt gihiştın azadiyê, jı zulm û zordestiya şêr rızgar bûn, ji xulami û xızmetkariya wi ji xılas bûn.

Dema xeber dı nava rêl da belav bû ku ew şêrê zalım bı deka rovi mırıye û lawır gışt jê xılas bûne, kêf û şayiyeka mezın ket nava lawıran. Çend lawır dı nava rêl da hebûn, hemi jı her derê rêl bı rê ketın, dı nava rêl da lı ser mêrgek lı hev cıviyan û dest pê kırın hengeka mezın pêkanin. Sê roj û sê şev bı govend û dilan, bı kêf û şayi, bı stran û “tılıli” rızgariya xwe jı wi şêrê zalım û zordest piroz kırın. Dı wê dema pirozkırınê da hemi pêkve gelek caran qiriyan û gotın:

— Biji azadiiii, biji rızgariiii, biji bırakê roviiii (Bozarıslan, 2002a: 14-24).

PEPÛK

Hebû tunebû carek jı caran, rehme lı dê û bavên guhdaran, xeyn ji cendirme û tehsildaran.

Dı mêj da, berêya pırr berê, demek jı deman, lı gundek jı gundan du zarûk hebûn. Yek jı wan herdu zarûkan keç bû, yek ji kur bû. Ew keçık û kurık, xwîşk û bırayên hev bûn. Keçık neh deh sali bû. Kurık ji heft heşt sali bû. Diya wan mırıbû û bave wan jı nûve zewıcıbû, jı xwe ra jıneka di anıbû. Bı wi awayi, ew herdu zarûk ketıbûn ber deste damariyêêêê.

Damariya wan ji wek hemi damariyan jı wan ra xırab bû. Damariyê, tímû tím lı keçılıya xwe û kurhılıye xwe zordesti dıkır, lı wan dıda û gelek karên gıran bı wan dıdan kırın. Jı bı lı wan xırabı û zordestiyan, damariyê roje çend car berê nıfıran ji dı da wan, tera xwe nıfırên xırab û dijwar lı wan dıkırın. Dema ku xeta û şayiyeka bıçûk ji jı herdu zarûkan yan jı yekê jı wan peyda dıbû, hema dı wê gavê da nıfırên damariya wan wek xışkê û teyrıkê lı wan dıbariyan. Tewr carna ku damari jı tışteki di ji behnteng dıbû, dıxwest ku hêrsa xwe dı sere wan da derxe; bê ku sûc û xetayeki wan rebenan hebe, hema nıfırên xwe yen wek jehrê lı wan dıreşandın. Yek jı nıfırên damariye weha bû:

—Bı raya Xwedê hun'ê lı pê bın, goştê we dê lı erdê be!

Nıfıreka wê ya di ji ev bû:

— Hêviya mın jı Xwedê ev e ku dı roja we ya xweş da dılê we bêşe!

Carna ji bı vi awayi nıfır lı wan dıkır:

— Uûûwıwi, bı raya Xwedê hun qet mezın nebın, goştê we bıbe xwarına gur û hırçan, teyr û tılûr ji çavên we derxın!

Hın caran ji berê vê nıfıra xwe dıda wan:

— Ez jî Xwedê hevi dîkîm ku umre we kîn be, bextê we reş be, hun qet bî miradê xwe şa nebin, stûyê we bîşîke, gerdana we bîxele, goştê we jî bîbe qîsmetê mîşk û maran!

Dema ku damariyê berê nîfîran xwe yênan weha dijwar dîda wan, herdu zarûk di ciyên xwe da dîçîngîzin, stuyên xwe davetînan aliyek û melûl dîbûn. Lê belê tîştêk jî destên wan nedîhat.

Damariyê têr xurek jî nedîda herdu zarûkan. Rojna jî sibê heta êvarê pariyek nan jî bî devê kurîk û keçîkê nedîbû. Çavê herduyan jî li êvaran bû. Lewra êvaran bavê wan jî karê xwe dîhat malê. Hîngê hemîyan bî hev ra şîv dîxwar. Damariyê jî tîrsa bavê wan nedîwêri ew bêşîv bîhiştîna. Lê belê her êvar, berî ku bavê wan dîgîhişt malê, damariyê têr gef lî wan dîxwar û bala wan dîkîşand ku qala tada û zordestiya wê jî bavê xwe ra nekîn, nebêjîn ku damariyê ew bîrçî jî hiştîne. Damariyê weha gef lî wan dîxwar û dîgot:

—Lî mînan bînerînan û baş guhên xwe bîdînan peyva mînan. Zînar hun jî bavê xwe ra nebêjîn ku mînan lî we daye yan mînan karekî gîran bî we daye kîrînan yan mînan nîfîr lî we kîrîye yan jî mînan hun bîrçî hiştîne, haaaa! Eger hun jê ra qala tîştêkî wîsa bîkînan, bî Xwedê ez'ê sibê wîsa bînînan serê we ku, hun'ê heft xwezîyên xwe bî halê xwe ye îroyînan bînînan. Hun dîzanînan ku bavê we bî roj lî malê nasekîne û hun bî roj dîkevînan ber destê mînan. Eger hun jî bavê xwe ra qala xîrabi û zordestiyên mînan bîkînan, ez'ê her rojek jî roja berê xîrabitînan bînînan serê we.

Pîştê gefan, vêca weha tenbî lî wan dîkîr û dîgot:

— Dema ku bavê we jî we bîpîrse ku ez jî we ra baş înan yan na, dîvê ku hun jê ra bêjînan ku ez jî we ra pîrî baş înan, we pîrî dîevînanînan, têr xurek dîdînan we û qet tada lî we nakînan.

Herdu zarûkan jî tîrsan dîgot:

— Bîla, em'ê jî bavê xwe ra bêjînan ku tu jî me ra pîrî baş î, tu me pîrî dîevînanî, têr xurek dîdî me û qet tada lî me nakî.

Bavê wan êvaran dema jî karê xwe dîhat malê, herdu zarûk dîkîrînan hembêza xwe, maç dîkîrînan, her yek jî wan lî tenîştêka xwe dîda rûnîştandînan û kêfa xwe jî wan ra daniya. Carna jî jî wan dîpîrîsi, dîgot:

— Eeeeyyy, navbera we û damariya we çawa ye? Gelo damariya we jî we ra baş e yan na? Gelo hun jê razî ne yan na?

Wê demê gefên damariyê peyvîk bî peyvîk dihatin bira zarûkan. Jî tîrsa wê, bî devek bersiva pîrsa bavê xwe didan û jê ra dîgotin:

— Belê bavo, damariya me jî me ra pîrr baş e, me pîrr dievine, xurekên gelek xweş dîde me û qet tada lî me nake. Em jî damariya xwe pîrr razî ne. Ew bî çavê zarûkên xwe lî me dînêre, em jî bî çavê diya xwe lê dînêrin û jê ra dibêjin "dayê".

Bî rasti jî jî tîrsan jê ra dîgotin "dayê". Bî wi awayî roj û şevân wan lî pey hev derbas dibûn. Lê belê bavê wan nedîzani û nedîbihist ku ew jî destê damariya xwe çî carr û cefa dîkîşînin û bî rasti dî çî hali da ne. Carn ku herdu tenê dîman, jî ber derdê damariya xwe dîgîriyan. Jî ber ku kurik biçûktir bû, pîrrtir ew dîgîriya û dîgot:

— Xuşkê, em'ê heta kengê dî vê tengayi û zorayiyê da bîminin, dî binê vê tada û zordestiyê da bîjin! Em'ê kengê jî destê vê damariya xwe ya bêbav bîfîlîtin û rîzgar bîbin!

Keçîk, jî ber ku jî kurik mezintir bû, hez dîda xwe ku dîl bîde bîraye xwe û jê ra weha dîgot:

— Qet xem mexwe, bîrayê mîn ê delal. Xwedê mezîn e. Bînêre, em roj bî roj mezîn dibîm. Penc şeş sal paşê em'ê tam mezîn bîbin; ez'ê bîbîm keçeka xama, tu jî de bîbî xorteki egîr û fêris. Hîngê damariya me de neşê tada lî me bîke û me bêşîne. Dîvê ku em sebrî bîkîm, heta ku em mezîn dibîm.

Kurîk disa dîgîriya û dîgot:

—Ez nîzanim ew çîma ewqas jî me ra xîrab e û ewqas me dêşîne. Ma ew ne mîrov e, yan dîlê we kevîr e çî ye!

Keçîkê hîngê axîn dîkîşand û dîgot:

—Bîrayê mîn ê xweşdîvî, ma tu nîzani ku mana damariye çî ye! Damari yani "diya mari". Mar çawa dîjîmînê mîrovan e, damari jî wîsa dîjîmînê keçîlî û kurhîliyen xwe ne. Dîlê damariyan dî heqê keçîlî û kurhîliyên wan da jî kevîr jî hîşkîr e.

Carna kurîk dîxwest ku qala xîrabiya damariya xwe jî bave xwe ra bîke. Lê belê xuşka wî nedîhîşt û jê ra weha dîgot:

—Na, bîrayê mîn ê ezîz. Dîvê ku em sebrî bîkîm û jî bavo ra qala xîrabiyan wê nekîm. Eger tu jî bavo ra bêjî, hîngê damariya me dê jî nuha xîrabtîr bîne serê me û dê heft qasê nuhayîn tada lî me bîke. Şîreta mîn lî te ev e ku tu xwe ragîrî û jî bavo ra çu tîşteq nebêjî. Dîvê ku em sebrî bîkîm û qet deng jî xwe neynîm, heta ku em mezîn dibîm.

Şireta keçikê dîket serê kurîk. Wi ji heq dîda xuşka xwe ku dîvê sebîr bîkî û dîdanên xwe bîşîdînin, heta ku mezîn dîbî. Bî wi awayî, wi ji wek xuşka xwe devê xwe dîgîrt û sebîr dîkîr, qala xîrabî û zordestiyên damariyê jî bavê xwe ra nedîkîmîr.

Salek, dema ku zîvîstanê qedîya û buhar hat û dînê germ bû, damariyê viya ku herdu zarûkan jî bo deranîna kerengan bîşîne çolê. Lê belê niyeta wê ya rastî ew bû ku dekek lî serê wan çêke û behaneyek jî wan ra bîbine, bî wê behaneyê têr lî wan xe. Rabû çû jî kilerê tûrek û kêrek anî. Bî nê tûr bî kêrê kun kîr û xwe bî xwe got: “Ez’ê vi tûrê Kunkîri bîdîm wan û wan bîşînim kerengan. Ew çî qas kereng jî erdê derxî û bavêjî tûr, kereng dê jî tûr bîkevî û ew’ê êvarê bî tûrê vala bî ser mî da vegerî. Hîngê Xwedê dîzane û ez dîzamî ku ew’ê jî destê mî çî bîbîmî. Ez’ê jî wan ra bêjîm we kereng hemî xwarîne û tîşteki naniye malê. Bî wê behaneyê ez’ê wan bavêjîm sûka çovan û jî wan ra bêjîm de derb bîxun ku we nexwariye. Ez’ê têra xwe lî wan xîm û dilê xwe hêsa bîkîm”.

Damariyê paşê bî xîşm û hêrs deng lî wan kîr û got:

—Belqîtinî, bî lez werî vîr.

Herdu zarûk jî tîrsan hîlfîriyan, bî lez û bez çûn û lî pêşberê wê rawestan. Damariyê kêr û tûr dîrêjê wan kîrî û got:

— Vê kêrê û vi tûrî bîgîrî û herî çolê, kerengan derxî. Dîvê ku hun tûr tîji bîkî, haaaa! Heta ku tûr tîji nebe, zîhar bîla lîngê we neyê malê. Eger hun bî tûrê nivçe werî malê, ez’ê wîsabîkîm lî dînê lî serê we teng bîbe, bîbe mîna tarê bêjîngê.

Herdu zarûkan bî hev ra got:

— Na dayê, fîriqet be. Heta ku em tûrê xwe tîji kereng nekî, em venagerî nayên malê.

Paşê keçikê kêr gîrt destê xwe, kurîk jî tûr avêt ser mîlê. Xwe bî wi awayî berê xwe dan çolê û çûûûn. Dema gîhan çolê, keçikê deng lî bîrayê xwe kîr û jê ra weha got:

— Bîrayê mî ê xweşdivî, bîla tûr wîsa lî ser mîlê te be. Ez’ê kerengan bî kêrê jî erdê derxî û bîdîm te, tu jî dê wan bavêjî tûr.

Kurîk got:

— Bîla.

Vêca dest pê kîrîna lî kerengan gerîyan. Cara pêşîn ku rastê kerengek hatin, keçîkê ew kereng jî erdê derxist, striyên wê bî kêrê qeşartin, ew dirêjê birayê xwe kîr û jê ra got:

—Ev kerenga pêşîn bîla jî te ra be; wê bigire û bixwe. Lê belê kerengên di yên ku ez'ê jî nuha pê ve jî erdê derxim û bîdim te, divê ku tu wan hemîyan bavêjî tûr. Zîhar, tu wan nexwi, haaaa!

Kurîk kereng jî destê xuşka xwe stand û got:

— Na na, xuşka min a dêlal, ez xeynî jî vê kerengê, kerengên di naxum. Fîrîqet be û qet meraq meke.

Paşê lî kerengan gerîyan. Her cara ku rastê kerengek dihatin, keçîkê ew jî erdê derdixist û bî kêrê diqeşart û dida birayê xwe. Birayê wê jî kereng digirt davêt tûr. Lê belê jî ber ku binê tûr Kurîkîrî bû, kerengên ku kurîk davêtin'ê tavil jê diketin xwarê. Kurîk jî, keçîk jî jî ketina kerengan haydar nedibûn û nedîzanin ku jî tûr dikevîn; digotin qey kereng di tûr da dicivîn.

Bî wi awayî gerîyan û kereng derxistin, gerîyan û kereng derxistin, heta ku êvar nêzik bû û Roj ber bî avabûnê çûûû. Hingê keçîk bî aliyê birayê xwe ve zivirî û jê pîrsî, got:

— Êra tûr tîjî nebûye? Jî sibeya Xwedê ve ez kerengan derdixim didim te, tu jî wan davêjî tûr. Divê ku tûr nuha tîjî bûbe. Ka em lê binêrin.

Kurîk tûr jî milê xwe daxist û ber xuşka xwe dani. Xuşkê devê tûr vekir, da ku binêre ka çî qas kereng tê da civiyane. Lê belê dema devê tûr vekir, dit ku çî bibîne! Bala xwe dayê ku heyloooo, yek kerengek jî di tûr da tune, binê tûr jî Kurîkîrî ye. Jî ber wê yekê, ew û Kurîk her du jî şaş bûn; bî çavên şaşbûyî lî hev nihêrtin; jî şaşbûnê devê herduyan jî vekirî maaaa. Hingê keçîkê jî birayê xwe guman kîr ku wi kereng hemî xwarîne û jî bo ku sûcê xwe bîpoşe, binê tûr kun kirîye. Bî wê gumanê lî kurîk hêrs bû û qirîya ser'ê, got:

— Gîdî nefsekê nefsker, ma te şerm û fedî nekîr ku te kereng gişt xwarî! Nê te qaşo soz dabû ku tu'yê nexwi! Te çîma wîsa nefskeri kîr û hemî xwarî!”

Kurîk lî pêşbere xuşka xwe gelek fedîkar bû. Jî fedîyan, rengê rûyê wî wîsa sor bû ku, mîrov digot qey temeziyeka sor avêtine ser rûyê wî. Bî çavên fedîkar û lavakar lî xuşka xwe nihêrt û got:

— Na xuşka mın a xweşdivi, na. Mın kereng nexwarine. Ew kerenga pêşin a ku te da mın, mın tenê ew xwar. Jı bıl wê mın çu kereng nexwarine. Tu şaşi ku tu mın sûcdar diki.

Lê xuşkê jı peyva bırayê xwe bawer nekır; jê ra got:

— Tu derew diki û rûyê xwe reş diki. Te kereng hemi xwarine. Em'ê nuha çawa bıçın malê û jı damariya xwe ra çı bêjin! Nê tu dızani ku ew çiqas zalım e. Ku em bê kereng bıçın malê, ew'ê postê me bıgurê û zol bıke, zol.

Kurık vêca sond xwar, got:

— Xuşka mın a delal, bı Xwedê, ew kerenga ku dı despêkê da te da mın, mın tenê ew xwariye; jı bıl wê mın qet yek kerengek jı nexwariye. Tu dızani ku ez jı her kesi pırrtır te dıevinım. Ma ez'ê çawa bı te ra bêbextiyeka wısa bıkim û bê xebera te kerengan bıxum!

Gumana keçikê bı sonda bırayê wê jı ranebû; got:

— Ez jı sonda te jı bawer nakım. Xeyn jı mın û jı te çu keseki di lı vır tune. Tu dızani ku mın kereng nexwarine; heye tune te ew xwarine. Yan na, ma kereng bûn çivik û jı tûr firin çûn!

Kurık dit ku naaaa, xuşka wi bı çu awayek jê bawer nake. Jı bo ku wê dilbıcı bıke, vêca jê ra weha got:

— Madem ku tu jı peyva mın û jı sonda mın bawer naki, ka zıkê mın bıqelêşe û lê bınêre. Eger jı yekê zêde kereng dı zıkê mın da hebın, tu'yê bızani ku mın ew bı dızı xwarine û mın jı te ra bı derew sond xwariye.

Xuşkê ew pêşniyaza bırayê xwe qebûl kır û got:

— De haydê, lı pêşberê mın lı ser piştê vezele; ez'ê zıkê te bı kêre bıqelêşım û bınêrım ka kereng tê da ne yan na.

Kurık jı navikê berjor şeliya û lı pêşberê xuşka xwe ser piştê vezeliya. Xuşka wi kêr girt û da zıkê wı, qelaaaaşt. Dema ku lı hundirê zıkê bırayeê xwe nihêrt, dit ku bı rasti jı yek kerengek tenê dı zıkê wi da heye. Ew ji ew kereng bû ku dı despêkê da wê bı destê xwe dabû'ye. Aha jı bıl wê kerengê çu tişteş dı zıkê kurık da tunebû. Lı ser ditina wê rastiye, keçikê deng lı bıraye xwe kır û uzır jê xwest, got:

— Bıraye mın e xweşdivi, rast e ku te kereng nexwarine û jı bıl wê kerenga ku mın dabû te, tişteş dı zıkê te da tune. Ez lı te neheq bûm ku mın tu sûcdar kırı û mın tu

bı; xwarına kerengan berguman kırı. Ez poşman im û jı te uzır dıxwazım û tıka dıkım ku tu jı kerema xwe mın bıbexşını.

Le belê dit ku çu dengê jı bırayê wê nayê. Bala xwe da rûyê kurık, dit ku rûyê wi çil sıpi bûye, bûye mina melesek û maye. Keçık jı wê rewşê ket tatêlê û bı we tatêlê deng lı bıraye xwe kır, got:

— Bırawo, êra çı lı te qewımı? Tu çıma deng jı xwe nayni? Te çıma wısa reng avet?

Disa deng jı kurık nehat. Keçık veca tırsa û deste xwe da eniya bırayê xwe. Dit ku eniya kurık sar bûye. Hıngê têgıhişt ku bıraye wê mıriye. Hema bı xem û keder lı çoken xwe xıst û dest bı qırın û gırınê kır, got:

— Bıra, mın çı ani serê te! Heywax hey, mın mala xwe şewıtand, mın bırayê xwe bı destê xwe kuşt! Wey lı mın pepûkê, wey lı mın porkurê, wey lı mın rebenê!”

Paşê desteki xwe bı aliyê bırayê xwe ve dirêj kır û got “kekû”, desteki xwe ji da singê xwe û jı xwe ra got “pepûk”. Wê, ew herdu peyvık kırın wek stranek û bı gırın qırıya û got:

— Kekûûû pepûûûk! Kekûûû, pepûûûk! Kekûûû, pepûûûk! Kekûûû, pepûûûk!

Dıgel ku bırayê wê jı wê bıçûktır bû jı, wê bı pêjna evınê û şefqetê, wek ku jı wê mezınır be, jê ra got: “kekû”.

Lê belê dilê wê bı wê qırın û gırınê amoş nebû; xem û derd û kederên mırina bırayê wê jı dilê wê derneketın. Bı te’sıra wan xem û derd û kederan, herdu destên xwe berjor vegırtın û deng lı Xwedê kır, weha dua kır û got:

— Xwedaye mezın, ez’ê êdi çawa bıkarım lı rûyê dınê bıjim û vi derdê gırın dı dilê xwe da bıgerınım! Ez’ê bı kıjan rû bışêm lı rûyên mırovan, xasma lı rûyê bavê xwe bınerım! Ez bıbım teyrek û jı xwe ra tım ber bı asûyên fıre bıfırım, çêtır e wek ku ez weha mırov bıminım û dı nava mırovan da bıjim. Xwedayê mezın, ez jı te hevi û tıka dıkım ku tu dı ve gave da mın bıki teyrek û bı wi awayı mın jı vi hali xılas bıki”

Keçıkê hıngı ku jı dil û gıyan dua kır, gırıya û zarıya, Xwede duaya wê qebûl kır û dı wê gavê da ew kır pepûûûk.

Aha pepûk bı wi awayı hat afırandıın û ket rûye dınêêêê. Jı ber ku tım û tım derdê bırayê wê tê bıra wê û bı wi derdı xemgın dıbe û dilê wê dışewıte, tım û tım dıqıre û

dîbêje: ““ Kekûûûû pepûûûûk! Kekûûûû, pepûûûûk! Kekûûûû, pepûûûûk! Kekûûûû, pepûûûûk! ” (Bozarslan, 2006: 54-67).

ÇIVİKA JİR Û NÊÇİRVANÊ KÊMAQIL

Hebû tunebû carek ji caran, rehme li dê û bavên guhdaran, xeyn ji cendirme û tehsildaran.

Demek jî deman lî gundekî nêçirvanek hebû. Karê wî nêçirvani, her roj jî sîbê heta êvarê nêçir bû. Carna dîçû kozîka xwe, lî dora kozîka lîxt dîreşand û dî hundîrê kozîkê da lî kewan dîpa. Dema kew dîhatin ser lîxt û dest bî xwarîne dîkîrin, nêçirvên bere lula tîfînga xwe dî da wan û dîgot "gumînmîn", tîfînga xwe dîteqand. Kew gîşt lî erdê radîxîstî. Carna jî dîçû çolê û lî wîr davîk lî teyrân û lî lawîrên dî vedîgîrt, tamîk jî dîda ser davîka xwe. Dema hîm teyrân yan hîm lawîrên dî bêhna tamîk dîgîrtî, dîçûn da ku wî tamîkî bîxun. Lê belê çawa dest bî xwarîna tamîk dîkîrin, dî wê gave da lîngên wan dîgotî "xîrç" û dîketî davîkê. Nêçirvên jî dîçû û bî kêfa dîlê xwe ew dîgîrtî.

Jî aliyekî dî ve, ew nêçirvan zîlamekî kêmaqîl bû. Erê, dîzani û dîkari teyrân û hîm lawîrên dî nêçir bîke; lê belê wekî dî serê wî pîrr nedîşîxulî, hîşê wî pîrr bî şolan nedîgîhişt.

Rojek jî rojan, nêçirvên dîsa rabû çû çolê û lî ber darek davîk vegîrt. Paşê çu nava devîyên nêzîkê we darê û lî wîr xwe veşart. Hêvî dîkîr ku keroşkek yan teyreki têrgoşt bê û têkeve davîka wî. Dî dîlê xwe da dîgot:

— Nuha dê keroşkek yan teyreki têrgoşt werê û têkeve davîka mîn; ez'ê bîgîrîm bîbîm malê û serjê kîm, jî xwe ra bîkîm şîv û bî kêfa dîlê xwe bîxum. tê da kêf bîkîm.

Lê belê şol wek hêviya wî nemeşîya. Hew dît ku hêêêêr û Çivîkek hat û lî ser davîkê venîşt û dest bî xwarîna tamîk kîr. Çivîkê du sê car nîkula xwe lî tamîk xîst yan nexîst, jî nişka ve lîngeki wê got "xîrç" û ket davîkê. Hînge hema bu "çîve çîv" a wê û baskên xwe weşandî, da ku xwe jî davîkê derxe. Lê tewş bû. Kîr nekîr nekari xwe jî davîke derxe û bîfîre herê.

Hîngê nêçirvên jî cîyê xwe rabû çû û çivîk gîrt, ew kîr nava destê xwe, mîsta xwe lê da hev, serê wê tenê lî der hîşt. Çivîk ketîbû tîrs û lîrzeka wîsa ku, dîlê wê yê bîçûk dîgot: "kulp kulp kulp" û dîperptî. Paşê dîlê xwe qayîm kîr, bî çavên lavakar lî nêçirvên nîhêrt û deng lê kîr. je ra got:

— Lo lo nêçirvanê dîlovan, te çîma weha anî serê mîn û ez xîstîm davîka xwe?

Nêçirvên kenîya û got:

— Lê lê Çivîka reben, tu şaşî ku tu jî mîn ra dîbêjî dîlovan. Tu dîbîni ku ez nêçirvan îm. Nêçirvan ne dîlovan î, çu car jî nabîn dîlovan. Dîlê nêçirvanan req e û dîvê ku req be. Kesê ku dîlê wî req nebe, nîkare nêçirvani bîke.

Qasek lî Çivîkê nîhêrt, paşê peyva xwe domand, got:

— Tu dırsi ku çıma mın tu xısti davıka xwe. Ma tu nızani ku ez nêçirvanek ım, karê nêçirvanan ji ew e ku teyran û lawırên di têxin davıkan, wan bıgırın û goştê wan bıxun!

Çıvikê pırsi, got:

— Nexu tu dıxwazi goştê mın bıxwi, ne wısa?

Nêçirvên lê veğerand, got:

— Belê, ez'ê te serjêkım û goştê te bıxum.

Bı vê peyvya nêçirvên tırsa Çıvikê jı berê zêdetır bû. Têgihişt ku niyeta nêçirvên bı rasti jı xırab e. Lı dijê niyeta wi ya xırab, wê jı di dilê xwe da bıryar da ku lı sêrê nêçirvên dekek çêke, wi bıxapine û xwe jı lepê wi rızgar bıke. Disa deng lı nêçirvên kır û got:

— Ma goşte min rêbena Xwedê çi heye ku tu'yê bıxwi! Goşte mın tewr binê zımanê te jı nagire.

Nêçirvên got:

— Goştê te binê zımanê mın bıgire negire, ez'ê te serjêkım û goştê te bıxum. Madem ku tu hati keti davıka mın, ez'ê te serjêkım. Êdi xılasıya te jı destê mın tune.

Çıvikê lı gora deka xwe, vêca jê ra got:

— Bınêre, ku tu mın serjê ki, du sê pırûş goştê ku bı hestiyên mın ên bıçûk ve heye, tu'yê bavêji devê xwe û dê bıqede here. Lê belê eger tu mın beradi, ez'ê sê şıretên wısa gırıng lı te bıkıım ku, heta tu lı vê dınê sax bı dê jı te ra lazım bıbın û tu'yê jı wan mefadar bıbi.

Nêçirvên disa kenıya û got:

— Lê lê Çıvıka reben, ez mırov ım, tu jı Çıvik i. Tu'yê çawa bıkari bı wi serê xwe yê Çıvıki şıret lı mın bıki!

Çıvikê got:

— Naaaa, wısa mefıkıre û wısa mebêje. Şıretın hene ku dı eslê xwe da hêja ne û rûmetbılınd ın. Ew şıret bı devê Çıvıkek jı bën gotın, tışteğ jı rûmeta wan kêın nabe.

Nêçirvên dema ku ev peyv jı devê Çıvikê bıhist, fam kır ku serê Çıvikê ne vala ye û hunerek tê da heye. Bı wi awayı dıle wi nerm bû û xwêst ku Çıvikê berade. Lê belê xwe ragırt û viya ku berê soz jê bıstine. Jê ra got:

— De soz bıde mın ku dema ez te beradıım û azad bıkıım, tu de bı rasti sê şıretên hêja lı mın bıki.

Çıvikê got:

— Belê, bı soz u bext, ez'ê sê şıretên wısa gırınbuha lı te bıkıım ku, heta tu lı vê dınê bıji dê jı te ra lazım bıbın û fêde bıdıın te.

Lı ser vi sozê Çıvikê, nêçirvên mısta xwe hêdi hêdi sıst kır. Paşê jı bı tevayı vekır. Mısta mêrik çawa vebû, Çıvikê hema bı lez û bez got “fırrrr” û jı nava mısta wi fıriya, çû lı ser dara

hevberê wi venişt. Lı wır jı kêfan du sê car baskên xwe weşandin û kır "çive-çiv", bı wi awayi adeta azadiya xwe piroz kır; paşê deng lı nêçirvên kır û jê ra got:

— Gelek sıpas ku te ez beradam û azad kırım. De vêca baş guhê xwe bıde mın; ez'ê her sê şîretên xwe lı te bıkı. Lê divê ku tu wan şîretên mın bıki guhar û têxi guhê xwe, wan qet jı birneki, haaaa.

Nêçirvên got:

— Guhê mın lı te ye; de şîretên xwe jı mın ra bêje.

Çıvikê got:

— Şîreta pêşin ev e: Tiştê ku çû, mede dû.

Çıvikê qasek lı merik nihêrt, paşê got:

— Şîreta dıduyan jı ev e: Peyv û galegalên ku ne maqul ın û li aqıl nayên, çu car jı wan bawer meke.

Disa qasek lı nêçirvên nihêrt, paşê got:

— Şîreta sısiyan jı ev e: Tiştê ku tu nıkari bı destê xwe bıxi, bı pey mekeve û bela xwe tê mede û mexebite ku tu illa wi bı destê xwê bıxi.

Çıvikê piştê ku ev her sê şîretên xwe lı nêçirvên kırın, vêca xwest sıhêti bıke ku ew şîret ketin sere mêrik yan na. Bı wê daxwazê, disa deng lê kır û got:

— Nêçirvano, tu dızani. mın tu xapandi ha!

Nêçirvên bı meraq jı jêr ve le nihêrt û pirsı, got:

— Çawa te ez xapandım?"

Çıvik kenıya û got:

— Tu dızani, dı çiqaneka mın da mırariyek heye; rûmeta wê bı hezaran zêr e. Eger te ez beranedama û serjê kırıma, te'yê ew mırari bıdita û jı çiqaneka mın derxısta û jı xwe ra bıfirota. Hıngê te'yê komek dırav qazanc bıkira û tu'yê gelek dewlemend bıbüyayi.

Nêçirvên ku navê mırari'yê bıhist, hema şıklê komên dıraivan hat ber çavên wi û xıyala dewlemendiyê çavên wi tari kırın. Bı wê xıyalê, pıçıka aqlê wi yê ku hebû jı jı serê wi derket, pıçıka hışê wi yê ku hebû jı jı sêrê wi çû. Poşman bû ku Çıvik berada. Hêrsa wi hat û bı wê hêrsê qiriya, got:

— Gıdı çıvıka pisık a bızdûr, nexu te ez xapandım, ne wısa! De tu bısekinê, ez'ê nuha bêm nişanê te bıdım ku xapandın çawa ye û cezayê xapandınê çı ye. Ez'ê bêm disa te bıgırım, serê te jı laşê te hılqetinım û wê mırariyê jı çiqaneka te derinım û bıbım jı xwe ra bıfiroşım.

Nêçirvên bı wê peyva xwe ra hema jı ciyê xwe hılfiyaya û çû ber wê dara ku çıvik lı serguliyeke wê veniştı bû. Bı qurma darê da hılkişıya û xwest ku hêre xwê bıgıhıne çıvikê û disa vê bıgire. Hılkişıya hılkişıya, çu nêzikê wê guliya ku çıvik lı ser'ê veniştı bû. Hıngê çıvikê got

“firrrr” û firriya, çu ser guliyeka jî wê guliyê berjortir û li wir venişt. Berê bî mêrik kêniya, paşê jî wir deng lê kîr û jê ra got:

— Binere, tu nikari bigiji min. haaaa!

Lê nêçirvên dev jê berneda; dîsa li pey wê hilkîşiya û xwest ku vê bigire. Çivik vêca firriya û çu ser guliyeka dî. Nêçirvên ber bî wê guliyê jî hilkîşiya. Lê tam dî wê demê da lingê wi şiqitî û jî darê ket xwarê û got “gurmmmm”lî erdê ket. Dema ket, lingeki wi jî şikiya. Hingê bû “aye ay”a wî û bî lingê xwê yê şikiyayî girt.

Çivikê jî jor ve lê nihêrt. qasek pê kêniya, paşê got:

— Kuro, tu miroveki çî qas dinik û kêmaqîl î! Aqîlê te jî xwe tune; ew her sê şiretên ku min li te kîrin, ew jî bî sere te neketin û tewş çûn.

Nêçirvên jî vê peyva çivike tîşte fam nekîr; pîrsî, got:

— Çawa şiretên te bî serê min neketin?

Çivikê bersîva wî da, got:

— Binere, şireta min a peşin ev bû: “Tîştê ku çû, mede dû”. Lê te çî kîr? Ez jî destê te firiyabûm û çûbûm. Tu bî pey min ketî û te xwest ku tu min dîsa bigîri. Yanî tîştê ku çû, te da dû. Nexu ew şireta min bî serê te neketibû û tewş çûbû.

Çivik qasêk huskut bû, paşê got:

— Şireta min a diduyan jî ev bû: “Peyv û galegalên ku ne maqûl in û li aqîl nayên, çu car jî wan bawer meke”. Lê te çî kîr? Min jî te ra got: Dî çiqaneka min da mîrariyek heye; te jî wê peyva min bawer kîr. Ma ev ne kêmaqîlî û diniki ye! Ma tu qet nefikîrî ku here wêre ez Çivikek îm! Jî bo ku ez rastê zeviyeka garîs yan gîlgîl bêm û çend tene garîs yan gîlgîl bixum, ez bî saetan difirim. Ma tu qet nefikîrî ku eza rêbena Xwedê de mîrariyek jî ku binim û texim çiqaneka xwe! Dîviya ku lê fam bikîra ku ew peyva min ne maqûl e û li aqîl nayê. Lê belê te fam nekîr û te jî wê peyva ne maqûl bawer kîr. Nexu ew şireta min jî bî serê te neketîbû û tewş çûbû.”

Çivik dîsa qasêk huskut bû, paşê got:

— Şireta min a sîsiyan jî ev bû: “Tîştê ku tu nikari bî destê xwe bixî, bî pey mekeve û bela xwe tê mede û mexebite ku tu illa wi bî destê xwe bixî”. Lê te çî kîr? Jî bo ku tu min bigîri, tu rabûyî bî darê da hilkîşiyayî. Hal ew hal e ku ez çivik îm, tu jî mirov î. Dîviya te bîzaniya ku mirov nikarin bî destan çivikan bigîrin. Lê belê te bir bî vê yekê nebîr. Jî bo ku tu min bigîri, tu bî darê da hilkîşiyayî. Jîxwe te ez negirtim; bî ser da jî tu jî darê ketî û lingê te şikiya. Nexu ew şireta min jî bî serê te neketîbû û tewş çûbû.

Çivik pîştê vê peyva xwe firriya û jî nêçirvên ra got:

— Ev gişt jî nezaniya te û kêmaqîliya te bu ku weha hat serê te. Kesê ku aqîlê wi tunebe û şiretan jî negire, weha tê serê wi (Bozaslan, 2005: 7-12).

DİK Û ROVÎ

Hebû tunebû carek jî caran, rehme lî dê û bavên guhdaran, xeyn jî cendirme û tehsildaran.

Roviyek hebû. Mina hemî roviyan ew jî fenek û dekzan û xasûk bû. Rojek jî rojan, rovi bîrçî bû, û derket nêçirê. Geriya geriya, tîşteke bî destan neket. Bî hêviya ku dikek yan mîrîşkek bîgîre û bîxwe, berê xwe da gundek û bî rê ket çû. Hêdika, bê ku dengê derxe, ber bî gund çû. Xwe dî pîştî deviyan da, di ber sêncan da, di nava newalan da veşart û firîzi. Bî wi awayî xwe gihand perê gund.

Aha tam dî wê gavê da, dikeki sîpî yê qoqo yê qelew jî çû ser dareka tûyê û bang da, got:

“Qiqîla qiqîîî, qiqîla qiqîîî!”

Çavê rovi çawa bî dik ket, pê ra jî av bî devê wi ket. Dî dilê xwe da got: “Gelo ez çawa bîkîm ku ez vî dikê qelew bîxapînim û nêçir bîkîm?”

Hêdî hêdî çû bînê wê darê. Xwest ku xwe lî xavitiyê dayne û dek lî serê dik çêke, wi bî xapê bine xwarê û jî nişka ve lî stûyê wi sîwar be, wi bîgîre û yallaaaah, berê xwe bîde çolê, lî wîr bî kêfa dilê xwe wi bîxwe. Bî wi hesabî deng lî dik kîr û got:

— “Xoce, gelo nivro bûye ku te bang da?”

Lê belê dik jî dî xasûki û fenekiyê da jî rovi kemtir nebû. Dî ku hal xîrab e. Wi jî dest bî dekan kîr û bersiva rovi da, got:

— Belê bîrakê rovi, nivro bûye.

Rovi disa xwe lî xavitiye dani û got:

— De kerem bîke dakeve, bîde pêşîya mîmî imamî bîke, em jî xwe ra bî cemaet nîmêj bîkîm.”

Dîk fîkîrî ku niyeta rovi bî rasti jî xîrab e. Zani ku bê xwarê, rovi de bî qîrîka wi bîgîrê û yallaaaah, wi bîbe û lî çiyek bîxwe. Lê belê dile wi qet tunebû ku têkeve zîkê rovi. Wi jî got:

—Bîrakê rovi, tu dîzani ku cemaet çî qas pîrr be, xêra wê jî ew qas zêde ye. Ez jî ser darê dîbînim ku du taji wa ne jî jor ve tîn. Bîla ew jî bîn, hêj ez’ê dakevîm û em’e tev bî hev ra nîmêja xwe bîkîm.

Ku qala tajiyan bû, zîrravê rovi kîr ku bîqete. Zani ku lî şûna ku ew dik nêçir bîke, taji de wi nêçir bîkîm. Wi jî jî dik ra got:

— De baş e, nexu hêta ew bèn ez'ê ji biçim devê newala ha, lı wir desmêja xwe teze bıkm û vegerım.

Bı wê peyva xwe ra hema duvê xwe xıst navbera lingên xwe, dı dile xwe da got: “Seriyo, tu bı qurbana lingan bı” û yallaaaah, bı lez û bez jı wir reviya û çû hey çû.

Dik ku dit rovi reviya, jı kefan kır ku bıfire. Lı pey rovi nihêrt, baskên xwe weşandın û disa bı dengeki bıınd bang da, got:

— “Qiqila qiqiiii, qiqila qiqiiii!” (Bozarıslan, 1999a: 8-11).

ZIRA KERÊ Û LOTA DEVÊ

Hebû tunebû carek jı caran, rehime lı dê û bavên guhdaran, xeyni jı cendırme û tehsildaran.

Demek jı deman kereki cedewi û deveyeki pıştıkul hebûn. Herdu jı hıngi dıxebıtın, hıngi barên gıran hıldıgırtın dıguhastın û her roj jı sıbê heta êvarê dı bıne bar da bûn, kêmhêz bûbûn û jı hal ketıbûn. Jı ber hılğırtın û guhastına barên gıran, pıştı kerê cedewi bûbû, pıştı devê jı kul bûbû.

Xwediyê wan zılameki gelek xızan bû. Nedıkari têr êm bıde wan. Êvaran ew dı axura xwe da lı ser afirên wan gırêdıdan û lepek ka davêt ber her yekê jı wan. Dıravên wi tunebûn ku jı wan ra ce, kızın, welaf û tıştên wısa bıkıre û têr bıde wan. Ew lepa kaya ku wi dıda wan jı bı rasti têra wan nedıkır, tewr bıne zımanê wan jı nedıgırt. Jı ber wê yekê, ker jı, deve jı tım û tım bırcı bûn.

Şevək jı şevan, disa herdu jı bırcı bûn û “qure qur” jı zıkê wan dıhat. Jı ber ku bırcı bûn, dıkırın nedıkırın xewa wan jı nedıhat. Dest pê kırın jı xwe ra peyıvin û qala derdê xwe jı hev ra kırın. Paşê devê pırsi, got:

— Bırakê ker, tu nabêji em'ê çawa jı vi derdi xılas bıbın?

Ker qasek fıkrı, da hışê xwe û xwest ku tışte bêje. Lê belê tışte nehat aqılê wi. Lı devê vegerand û got:

— Bırakê deve, ma ez'ê ji ku bızanım ku em'ê çawa xılas bıbın! Tu dızani ku hışê mın nagıje meselên weha zor. Here were ez kerek ım. Dıvê tu bızani û jı mın ra jı bêji ku em çawa bıkm da ku jı vi car û cefayi xılas bıbın. Tu jı mın ra bıbe rêbır, ez jı lı pey te bêm.

Devê dit ku ker bı rasti jı ker e û hışê wi nagıje tışte. Fam kır ku dı wê meselê da jı barê gıran dê bê ser mılê wi. Jê kerê ra got:

— Bırakê ker, ku tu bî peyva mîn bîki, em'ê ji xwe rabirevîn û bî wi awayî jî vê bîndestiyê, jî vê zeliliyê rîzgar bîbîn. Hemîn jî destê me nayê ku em lî ber xwediyê xwe rabîn û lî dijê wi têkevîn serhîldanê. Lê belê qena em dîkarîn birevîn. Çawa ku pêşyan jî gotiye, “Şerteki mêraniyê jî rev e”.

Kerê got:

— Baş e Bırakê deve. Tu çawa bîxwazi, ez bî te ra.

Paşê soz û bext dan hev ku dî fersenda pêşin da bî hev ra birevîn. Du sê roj derbas bûn, rojek xwediyê wan ew jî binê bar derxîstîn û bîrîn ser mêrgeka tîji nefel bera dan, da ku lî wîr qasek bîçêrîn. Deve û ker jî wê keysê mefadar bûn û piştê ku xwediyê wan jî ser mêrgê vegeyriya, hêdika firizîn, jî mêrgê derketîn, berê xwe dan rêlek û çûn hey çûûûûn. Qasek paşê tarîti bî ser wan da hat. Zanîn ku xwediyê wan êdî hew dîkare wan bîbine û bîgire. Bê ku bîzanîn dîçîn kêderê, dî tarîtiyê da meşyan û çûn û çûn û çûûûûn, heta ku lî wan bû sîbe û dînê ronî bû.

Dema bû sîbe û dînê ronî bû, dîtin ku heyloooo, gihiştîne navsera çiyayeki xalî yê ku tê da ne ins heye, ne cîns. Bala xwe danê ku lî hevberê wan jî mêrgek heye ku nefela wê dîda çokê. Lî qeraxê mêrgê jî kaniyek hebû. Aweka zelal a wek neynîk jî wê kaniyek dîherîki û dîçû. Ku çavê devê bî wê mêrgê û bî wê kaniyê ket, jî kêfan kîr bîfire. Bî wê kêfê zîvîri ser kerê û jê ra got:

— Bırakê ker, çavê mîn û te tev ronî be. Em jî wi xwediyê xwe yê zulîmkar û jî binê barê wi yê gîran û jî zordestiya wi xîlas bûn, gihiştîn vê mêrga tîji nefel. Êdî em'ê lî vîr bîxun, vexun û lî kêfa xwe bînêrîn. Kêfa kerê jî ya devê pîrtîr hat. Jî devê ra got:

— Wey mala te û heft bavên te ava be, Bırakê deve. Ez jî bî xêra te û saya te xîlas bûm. Eger ne bî alîkariya te û rêbîriya te bûya, mîn çu car nedîkari ez bî vê kerîtiya xwe birevîn û bê mî bîgîjim van deran.

Devê qasek lî dora xwe nîhêrt, da ku bîzane ew cî çiyeki ewle ye yan na. Hîngê dî ku lî jêrê wan dî lehfe çiyê da riyeka karwanan heye. Jî wê yekê fikar kîr û bî 'wê fikarê zîvîri ser kerê, jê ra got:

— Bînêre Bırakê ker, lî jêrê me riyeka karwanan heye. Tê zanîn ku ev der jî ne çiyeki pîrr ewle ye. Dîvê ku lî vîr haya me jî me hebe û em qet deng jî xwe neynîn. Lewra eger deng jî me derkeve, dîbe ku hîm rêwî mêwî hîngê dî rê da herîn, dengê me bîbîhîzîn û bê nî me bîgîrîn, disa wek berê me bîbîn têxî bînê bar. Dîbe ku xwediyê me

ji lı me bıgere, heta ser vê riya jêrin ji bê. Eger deng jı me derkeve, belki ew ji dengê me bıbihize û bê me bıgire. Hingê dê jı berê xırabtır bine serê me.

Kerê ji lı lehfê çiyê nihêrt û bala xwe da wê rê. Wek devê fikar ket dilê wi ji. Qasek fikiri, paşê bersiva devê da, got:

— Rast e bırakê deve. Divê em qet deng jı xwe neynın.

Devê got:

— Bınêre Bırakê ker, ê mın, dengê mın ne bılınd e. Lê belê dengê te pırr bılınd e, divê tu lı xwe mıqat bi, lı vır qet nezırı. Eger tu bi xwe nekari û bıızırı, dengê tedê lı hawırdor belav bıbe û heta wê rê here. Hingê dibe ku mırovın jı me haydar bıbın û bèn me bıgırın, bıbın têxın bıne bar û bi çovan li hêt û qorikên me xın.

Ker şêleka jiritiyê da xwe û li devê veğerand, got:

— Na Bırakê deve, jı aliyê mın ve fıriqet be. Ez'ê çawa bi xwe nekarım! Ma ez din im! Êrê, ez ker im. Lê ez ne ew qas jı bêhiş im ku ez xwe û te tev têxim talûkê.

Paşê kerê û devê hev piroz kırın, çûn rûyên hev û berê xwe dan ser mêrgê. Jı wê rojê pê ve êdi kêf kêfa wan bû. Nefela sor dıxwarın, ava zelal vedıxwarın, xwe dıgevızandım û bı kêfa dile xwe dijıyan. Demek paşê cedewa pıšta kere û kula pıšta devê xweş bû. Herdu ji qelew bûn û pırça xwe ya kevin weşandın. Hingi qelew bûn, pıšta wan û hêtên wan êdi dıbrıqın. Axir, “fıke fıq” jı wan dıhat. Bı wi awayı du sê meh bı ser wan ra derbas bûn.

Rojek jı rojan, besta kerê rabû, Kêfa wi, mina şırê ku bıkele û bı ser beroşê ra bıfure, bı ser dilê wi ra fıriya. Ker bi wê kêfê rabû çargavê û lı dora mêrgê beziya. Du sê qor çû û hat, çû û hat çû û haaat, paşê rawesta û deng lı devê kır, got:

— Bırakê deve!

Devê got:

— Ha, Bırakê ker!

Kerê got:

— Bırakê deve, ez dıkım bıızırım.

Dılê deve jı tırsan got “kulp”. Bı wê tırsê deng li kerê kır, got:

— Çawa dibe, Bırakê ker! Ma tu din bûyi ku tu diki bıızırı! Nê te qaşo soz dabû ku tu'yê bı xwe bıkari û nezırı! Kanê, sozê te lı ku ma!

Kerê serê xwe bılınd kır. Bû “fıre fıra” a wi û ji devê ra got:

— Erê, mın soz dabû. Lê nuha zıra mın hatiye. Ez nıkarım nezırım.

Devê vêca dest bî lavan kîr û got:

— Bîrakê ker, ez jî te tîka dîkîm tu nezîrî, ez dî bextê te da me tu nezîrî. Malxîrab, ma nayê bîra te ku em dî çî halî da bûn! Eger tu dînitî bîkî û bîzîrî, hîngê yan xwedîyê me yan jî hîn kesên dî dê bî me bîhîsîn û bê n me jî vîr bîbîn, disa têxîn bî nê bar û bî çovan lî qorîkên me xî n.

Kerê got:

— Rast e rast. Lê ez ker î m; dema zîra mî n bê, dîvê ez bîzîrî m. Ez be zîr nîkarî m bîtebî tî m. Eger ez nezîrî m ez'ê dî n bî bî m.

Devê got:

— Bîrake ker, ma nayê bîra te ku dî bî nê barê n gî ran da pî şta te cedewî bû bû, pî şta mî n jî kul bû bû! Tê r ka jî bî destê me nedî ket ku em bî xun! Ma tu dî xwazî ku disa wî sa bê serê me û em disa tê kevî n wî halî!

Kerê got:

— Ne ku ez dî xwazî m em disa tê kevî n wî halî. Lê ez çî bî kî m, zîra mî n hatiye. Çî dî be bî la bî be, dîvê ez bîzîrî m.

Devê got:

— Bîrakê ker, bî nê re em lî vî r jî xwe ra tê r dî xun, tê r vedî xun û tê r xwe dî gevî zî nî n. Çu derd û kulekî me jî tune. Wî sa meke, kumê şeytê n mede serê xwe û serhî şkî meke. Eger dî lê te bî mî n naşewî te jî, bî la dî lê te bî te bî şewî te. Ma tu dî xwazî ku disa tê kevî bî nê bar û pî şta te cedewî bî be!

Axî r, devê kî r nekî r tewş bû; ker jî î nate xwe nehat xwarê. Ne bî lavan dî lê wî nerm dî bû, ne jî bî şî retan hî şê wî dî hat serê wî. Dî got “Zîra mî n hatiye” û tî şteki dî nedî got. Devê hê vî ya xwe jê bî rri û got:

— Ne sû cê te ye ku tu weha kerî tî dî kî. Sû c sû cê mî n e ku ez bû m hevalê te kerî. Mî n got qey bî şî retan dê hî şê te bê serê te, yan jî bî lavan dê dî lê te nerm bî be. Lê mî xabî n ku jî keran ra ne mefa şî retan heye, ne jî fê da lavan heye. Ez dî zanî m ku tu'yê bî kerî tî ya xwe û bî zîra xwe serê me tê xî belayek. Lê ez çî bî kî m ku ez bî te nî karî m. Hê vî ya mî n jî Xwedê ew e ku bela bê serê te tenê.

Kerê bersî v da, got:

— Bîrakê deve, tu dî zani ku ez ker î m û xwî yê mî n jî xwî ye kerî tî ye ye. Kerî tî ya mî n dî xwaze ku ez bîzîrî m. Ez çî bî kî m, ez nî karî m xwî ye xwe bî guherî m. Ez ker î m hah! Dema zîra mî n be, î lla dî ve ez bîzîrî m.

Kerê paşê dest bî zırine kır û heta ku hêza wi hebû bî dengê bîlind zırıya. Pırri ku demeka dırej lı ser wê mergê nefela sor xwarıbû û ava sar vexwarıbû, qelew bûbû û dengê wi ji gırr bûbû. Dema zırıya, wi dengê wi ye gırr danganeka gelek bîlind da zınar û şikêrên hawırdor û lı her derê belav bû. Jı ber ku jı mêj ve nezırıyabû, besta wi ji hingê têr rabûbû. Aha bı we bestê jı kêfa dılê xwe ra got: “zırrrr” û “zırrrr” û “zırrrr...” tera xwe zırıyaaaa. Deve ji dı ciye xwe da rawestabû, bı dıleki tiji tırs lê dınhert û guhdariya wi dıkır.

Ewxu çıma tam dı wê demê da karwanek ji dı we riya bınıya wan ra derbas nedıbû! Ew karwan karwanê bazırganeki pırr dewlemend bû û jı riyeke dûr dıhat, ber bı bajareki dûr dıçûûû. Hesp û hêstırên karwên tev barkırı bûn û dı binê baren xwe da pırr betlıbûn, bı zorê dıkarin bımeşın. Ku dengê zırına kere çû karwên, serbazırgên hema deng lı xulamên xwe kır û ferman da wan, got:

— Ka du sê kes herin bınerın ew deng jı ku hat. Lı van deveran çu avayi mavayi tunın. Dıbe ku ew kereki beradayı be û lı van deran bêxwedi mabe. Eger wısa be, wi bıgırın bınerın. Qena em dıkarın zewade mewada xwe lê bar kın.

Lı ser wê fermana serbazırgên, du sê xulam ber bı dengê kerê çûn û gerıyan gerıyaaaaan, paşê rastê kerê û devê hatın. Hema herdu ji dan peşıya xwe û rast bınerın cem serbazırgên û bı kêf jê ra gotın:

— Me dı şûna kerek da kerek û deveyek ditın.

Dema çavê serbazırgên bı kerê û devê ket, wısa kêfxweş bû ku, jı kêfan devê wi vekırı ma. Paşê xulamana bı fermana serbazırgên, barên yek du hesp û hêstırên betlı jı ser pıştı wan danın û anın lı kerê û devê bar kırın, ew dan peşıya xwe û yallaaah, dıgel hesp û hêstırên xwe ajotın û lı riya xwe çûn. Hingê devê hêdika deng lı kerê kır û got:

— Kero, tu dıbını te çı anı serê me, ne wısa! Pırri mın jı te ra got “mezıre mezıre”, mû lı zımanê mın hat. Lê tışteket neket serê te yê kerın. Axır, te bı kerıtiya xwe em careka dı ji xıstın bınerın bar.

Ker hem xemgın bûbû, hem jı lı hevberê devê fedıkar bûbû; nedıkarı tışteket bêje. Jı ber wê yekê, huskut bû û qet bersıva devê neda.

Demek lı rê çûn, ker betlı. Jı ber ku çend meh bar hılnegırtıbû û lı riyan nemeşıyabû, xam bûbû. Nedıkarı dı bınerın bar da bımeşe. Dema serbazırgên dit ku ker nıkare dı bınerın bar da here, ferman da xulamên xwe ku barê kerê jı lı devê bar kın. Hingê

xulaman barê kerê jî ser pişta wi ani xwarê û avêt ser pişta devê. Bî wi awayi barê devê girantir bû. Paşê ker vala dan pêşiya xwe û lî riya xwe meşiyaaaaan.

Qasek çûn, ker disa betlî. Jî ber ku pîrr xam bûbû, nedikari vala ji bimeşe. Serbazirgên vêca ferman kîr ku wi ji bavêjin ser barê devê. Xulaman herdu lingên wi yen peşin bî hev ve, herdu lingên wi yê paşin ji bî hev ve gîredan û ew avetin ser barê devê. Barê deveyê reben hingî giran bû, bî zorek û du bela dimeşiya. Pişta wi dikîr bîşike.

Pîrr çûn hindîk çûn, dî navsera çiyayek da riya wan rastê geliyek haaaaat. Ew geli wîsa asê û kûr bû ku, mirov bî zorê dikari tê da bimeşe. Riya ku tê da dî meşiyar jî, bî rasti ne rê bû; le şiverê bû. Ew jî lî nivê çiyê bû. Seriya wê şiverê çiya bû, bîniya wê jî nişiveki wîsa kûr bû ku, mirov nedîweri lî bîniya xwe binêre. Aha tam dema ku karwên dî wê şiverê da dimeşiya, devê deng lî kere kîr û got:

— Bîrakê ker!

Kerê jî ser pişta wi bersiva wi da, got:

— Ha, Bîrakê deve!

Devê got:

— Bîrakê ker, tu dîzani, lota mîn hatiye, mîn dive ez nuha lotek bîdîm xwe,

Jî wê peyva devê zîrravê kerê kîr ku bîqete. Lî nişivê bîniya xwe nîhert. Jî tîrsan çavên wi tari bûn. Dest bî lavan kîr û got:

— Eman yeman Bîrakê deve! Tu çawa bêbextiyeka wîsa lî mîn dikî! Tu dibîni ku em lî ciyeki çawa nîn. Ku tu lot bîdî xwe, ez'ê bîkevîm û dî vi nişivi da ger bîbîm, parça mezîn de guhe mîn bîmine.

Deve got:

— Dîxwazi bîla parça mezîn guhê te bîmine, dîxwazi bîla dûve te bîmine; jî mîn ra qet. Ma nayê bîra te, dema mîn jî te ra dîgot “Mezîre”, te dîgot “Zîra mîn hatiye”! Ê mîn jî, nuha lota mîn hatiye; dîvê ez lotek bîdîm xwe.

Axîr, kerê çîqas lava û dexalet kîr jî ku deve lot nede xwe, tewş bû; devê jî inata xwe nehat xwarê. Ê kerê, çawa hingê keritîya wi hatîbû û zîriyabû, e devê jî nuha devetîya wi hatîbû û wi jî bîryar dabû ku lot bîde xwe.

Paşê devê lotek da xwe, xwe bîlînd avêt û lî erdê xîst. Bî wê lota wi ra, ker hema jî ser pişta wi pekiya û çû çû dî nişiv da gêr bû, teqle lî ser teqlê avêt, heta ku çû ket

nava çemê bîniya nişiiiiiv. Karwên hêj jî geli derbas nebûbû, hîn sisalek lî ser termê kerê geriyan jî. Dema ku çavê devê bî wan sisalekan ket, xwe bî xwe got:

— Ker bî keritiya xwe hem bû sebebe mîrîna xwe, hem jî bû sebabê ku ez jî nû ve ketim binê bar. Hal ew hal bû ku ez û ew tev di wê mêrgê da çî xweş dijiyan û dîçeriyên, kêfa me çî qas lî ci bû! Eger wi wîsa dîniya û keritî nekira, weha nedîhat serê wi jî, nedîhat serê min jî.

Deve qasek lî ser rewşa xwe jî fikîrî û disa xwe bî xwe got:

— Lê bî rasti ez jî di dîniyê da jî wi ne kêmtîr bûm. Dîniya min jî ew bû ku min bawerîya xwe pê anî û ez bî wi ra bûm heval, min piştî xwe pê girêda û ez pê ewle bûm. Ya baş ew bû ku ez bî wi kerî ra nebûma heval û hevrê; yan tenê bireviyama, yan jî min jî xwe ra hevaleyê jî devan peyda bikira. Eger ez bî deveyek ra bîbûma heval, jî ber ku ew jî dê wek min bûya, dê serê min jî, serê xwe jî weha nexîsta belayê. Lê belê min dîniya kîr ku ez bî kerek ra bûm heval. Ku mirov bibe hevalê keran, dê weha bê serê miroooooov (Bozarşan, 2000a: 21-34).

PÊVEK 2: Wêneyek M. Emîn Bozarslanî



Çavkanî: http://www.snipview.com/q/Mehmed_Emin_Bozarslan (ragihanî, 14.10.2015)

PÊVEK 3: Wêneyek Dî Yên M. Emîn Bozarlanî



Di 26 ê Gulana 2012ê de li Kitêbxaneya Kurdî ya Stockholmê M. Emîn bozarlan, di semînerekê de dema ku derbarî ferhenga xwe a bi navê “Ferhenga Kurdî (A-D)” di diaxifê.

Çavkanî: <http://www.fkks.se/details.aspx?an=248> (ragihanî, 14.10.2015).

PÊVEK 4: Wêneyên Pirtûkên Rêzeçîrokên “Meselokên Lawiran”



M. Emin Bozarslan

GURÊ BILÛRVAN



Weşanên DENG

M. Emin Bozarslan

KÊZ XATÛN




Weşanên DENG

2005

M. Emin BOZARSLAN


Serketina Mişkan



Weşanên DENG

M. Emin BOZARSLAN

PEPÛK



Weşanên DENG

Çavkanî: Ji Arşîva Muzaffer EKÎNCÎ

PÊVEK 5: Nameya Ku Ji Bo Bersivdayina M. Emîn Bozarlanî Re Hatiye Şandin.

16/ 10/ 2015 –Xarpêt

Ez silav û hirmetên xwe ji seydayê delal, mamosteyê kedkar brêz M. Emîn Bozarlan re pêşkêş dikim. Brêz Bozarlan navê min Muzaffer EKÎNCÎ ye. Ez niha li Zanîngeha Mûşê di beşa Çand û Zimanê Kurdî de şagirtê mastirê me. Ez mijara teza xwe li ser berhema we ya hêja ya bi navê “ Meselokên Lawiran” dimeşînim. Navê tezê jî “Lêkolîneke Li Ser Motîfên Lawiran Ên Ku Di Berhema M.Emin Bozarlan Ya Rêzeçîrokên Lawiran A Bi Navê "Meselokên Lawiran" De Cih Digirin” e.

Mamosteyê hêja hûn di gelek behrem û axaftinên xwe de tînin ziman ku, we ev çîrokên zargotinî dema ku li welat jiyane ji nav gel berhevkirine û dawiyê jî bi awakî edebî ji nû ve afirandiye (Bozarlan, 2011: 145).¹ Lê belê dema ku ez li ser teza xwe ketim di nava lêkolînan de min dît ku hin çîrokên rêza “ Meselokên Lawiran ” weke çîroka “Beza Kusî û Kîloşkê”² di çîrokên Ezop de, çîroka “Şerê Çivîkê û Fîl”³ jî di çîrokên Beydaba de di berhema wî ya bi navê “ Kelîle û Dîmnê” de di çîroka “Çûkê Toygar û Fîl”⁴ de hatiye vegotin. Dîsa çîroka “Çivîka Jîr û Nêçîrvanê Kemaqîl”⁵ jî di Mesneviya Mevlana ya bi navê “Sê Şîret”⁶ de derbas dibe. Her wiha çîroka “Biratiya Rovî û Mar”⁷ jî di di berhema “Baharîstan”ê ya Mola Camîî de dibin sernavê “ Hikayê” serguzeşta “Kûsî û Dûpîşk”⁸ de eynî bûyer lehengê wan cihêreng, heman mijar bi awakî nû lê bi waryanteke cuda hatiye hûnandin. Ev çîrokên ku min anîne ziman ya wek hev in, yan jî bi awakî cîherengîn in.

Mamosteyê hêja sedema nivîsandina vê nameyê ewe ku di pêşerojê de hin xwendevan û lêkolîner bikevin di gumanan û bêjin gelo çîrokên ku di rêza “ Meselokên Lawiran” de derbas dibin, ji hin berhemên biyanî hatine wergerandin yan jî ev çîrok gencîneya Kurdî ne ku belavî edebiyatên din bûne.

Ger di derbarê vê mijarê de hûn min rohnî bikin û ev gumanên ku min diyar kirine hûn ji holê rakin ezê gelek kêfxweş bibim. Her wiha ji bo ku ez di teza xwe de bikarbînim ger hûn çend wêneyên xwe yê taybet ji min re bişeynin hûnê min şad bikin. Silav û hirmet

Çavkanî û Pêvek

¹ M. Emîn Bozarslan. (2011). İlmê Tûrik. İstanbul: Weşanên Deng

² M. Emîn Bozarslan. (1999). Mir Zor. -Beza keroşkê û Kûsiyê- İstanbul: Weşanên Deng, (Çapa Duyem), Rûpel: 35-41.

³ M. Emîn Bozarslan. (1999). Serkeftina Mışkan.- Şerê Çivîkê û Fîl - İstanbul: Weşanên Deng, (Çapa Duyem), Rûpel: 7-12

Pêvek-1. : ⁴ Beydaba. (1958). Kelîle ve Dimne. (Werger: Ömer Rıza Doğrul)- Toygar Kuşu ile Fil Hikayesi. İstanbul: Ahmet Halil Yaşaroğlu Kitapçılık ve Kağıtçılık T.L.Ş. Rûpel: 19-20

⁵ M. Emîn Bozarslan. (1999). Serkeftina Mışkan.- Çivîka Jîr û Nêçîrvanê Kemaqîl - İstanbul: Weşanên Deng, (Çapa Duyem), Rûpel: 23-31

Pêvek-2. : ⁶ Mevlana. (2007). Çiroken Mesnewiya Hz. Mewlana. (Werger: Sadık Yalsızuçanlar)-“ Sê Şîret”. Stênbol: Weşanên Nûbihar. Rûpel: 21-23

⁷ M. Emîn Bozarslan. (1999). Mir Zor.-Biratiya Rovî û Mar İstanbul: Weşanên Deng, (Çapa Duyem), Rûpel: 54-60

Pêvek-3.: ⁸ Camî. (1985). Baharistana. (Werger: M. Nuri Gençosman) –Hikaye, İstanbul: Milli Eğitim Basımevi. Rûpel: 169-170

Muzaffer EKİNCİ

PÊVEK 6: Bersiva M. Emîn Bozarlanî Ya Di Derbarê Nameya Ku Hatiye Şandin De.

Uppsala, 11-11-2015

Rewşenbirê hêja Muzaffer Ekinci,

Nameya te ya bî tarixa 16-10-2015'an û pêvekên ku te dîgel wê şandibûn, demek berê ghiştin destê mîn.

Ez hem bî nameya te, hem jî bî xebera amadekirina teza te ya dî heqê "Meselokên Lawiran" da gelek kêfxweş bûm. Pîrr pîrr sipas jî te ra.

Dî heqê "Meselokên Lawiran" da bersiva mîn ev e:

Wek ku mîn daye zanin, mîn ew meselok gişt lî Kurdistanê jî nava gel berhev kirine. Ew meselok jî wek çirokên geli, pêkenokên geli, çivanokên geli, stranên geli û wd, dî demên pîrr berê da jî aliyê gelê Kurd ve devki hatine afirandin, devki hatine belavkirin û bî sedan sal devki hatine parastin û bî wi awayi, bûne malê gel û her tîm dê malê gel bîn.

Tîşteki gelek balkêş e û jîbo me serbîlîndî ye ku, gelê Kurd ewqas hilberên rûmetblîndî û hêja yê çandeyî û folklorî, bî sedan sal devki parastine û gihandine vê demê. Cara pêşin mîn ew nivîsîn û anîn ser rûpelên kîtêban.

Kesek nîkare iddia bike ku ev hilberên geli yê Kurdî, jî hîn welat û zîmanên biyani hatine girtin û bî Kurdî hatine wergerandin.

Wek ku tê zanin, dî demên pîrr berê da tîkîliyên gelê Kurd dîgel gelên di tunebûne. Kurd neçûne hîn welatên di, da ku hîn hilberên folklorî yê wan welatan girtibin û guhastibin welatê xwe, wergerandibin zîmanê xwe û belav kiribin.

Disa wek ku tê zanin, dî demên pîrr berê da pîrraniya Kurdan nexwendî bûne, nekarine navên xwe jî bînivîsin. Lê dîgel wê yekê jî bî hêgîniya xwe ya sîrîştî, bî qabîliyeta xwe ya tebiî, karine ewqas hilberên folklorî yê giranbuha û hêja devki bîafirînin, devki bîparêzî û jî neslên pey xwe ra miras bîhêlin.

Tîşteki di yê gelek balkêş jî ev e ku, hîn peyvên meselokên lawiran, bûne peyvên pêşiyân û dî zîmanê Kurdî da ci girtine. Mesela, dî meseloka "Bîratiya Rovi û Mar" da peyva paşin a rovi weha bûye: "Bîrati xweş e rasta-rast, ne bî fetlî û fîtûl". Ew peyva rovi bûye peyveka pêşiyân a Kurdî. Her wîsa, dî meseloka "Çivîka Jir û Nêçirvanê Kêmaqîl" da yek jî şîretên çivîkê ev bûye: "Tîştê ku çû, mede dû". Ew peyva çivîkê jî bûye peyveka pêşiyân a Kurdî. Ev rewş jî dibe delîleka ku ev meselok jî aliyê gelê Kurd ve hatine afirandin.

Wek hîn peyvên meselokên lawiran, hîn peyvên pêkenok û çirokên geli jî bûne peyvên pêşiyân, jî hîn peyvên wan jî idyomên Kurdî hatine çêkirin. Ev jî tîşteki gelek balkêş e.

Bî vê munasebetê, mîn divê ez vê yekê jî bîdîm zanin ku dî bernameya mîn a pêşedemê da, xebata lî ser idyomên Kurdî, peyvên pêşiyân ên Kurdî û stranên geli yê Kurdî jî heye. Mîn ew jî hemî, dî wextê xwe da lî Kurdistanê jî nava gel berhev kiribûn. Pîştê temamkirina "FERHENGA KURDÎ", eger hêza mîn a xebatê bîmine, ez dîxwazîm lî ser wan jî bîxebitîm. Hîngê, idyom û peyvên pêşiyân ên ku bîngehên wan hîn meselokên kawîran yan jî hîn pêkenok û çirokên geli bûne, ez'ê wan bîngehan hemî diyar bîkîm û bî xwendevanên Kurd bîdîm zanin.

Mın divê ez careka di ji diyar bikim ku, mın ev hılberên folklori yê Kurdî gıst ji nava gel berhev kirine û mın qet yek ji wan ji ji ciyekî di negirtîye. Yanî ev hılber bî tevayî, ji aliyê gelê Kurd ve hatine afirandin û malê gelê Kurd in. Mın heta nuha qet nebîhistûbû ji ku hin meselokên lawîran ên weha, di hin kîtêbên bî hin zımanên di da hene.

Dibe ku di demên berê da hin geştyar (seyyah) ji nava gelên ciran hatibin Kurdistanê û hin ji van hılberên folklori bîhistûbin, ji Kurdî wergerandibin zımanên xwe û bî wi awayî ew di nava gelên xwe da ji belav kiribin. Ev ihtimal ne dûrê aqıl e.

Te di jêrenotên nameya xwe da navê pirtûka 4'an a Meselokên Lawîran, "**Serkeftina Mîşkan**" nivîsiye. Lê navê wê pirtûkê "**Serkeftina Mîşkan**" e. Eger tu di teza xwe da qala wê pirtûkê biki û ci bîdi navê wê, ji kerema xwe navê wê "**Serkeftina Mîşkan**" binivise, ne "**Serkeftina Mîşkan**". Lewra awayê rast ê beşê pêşin ê wi navî "ketin" e, ne "keftin" e. Welew ku li hin herêman wisa bê gotin ji, ew awa ne rast e.

Awayên wê kîrarê (wê fi'lê) weha ne: Bêdem "ketin", mêjedema nêzik "ket", mêjedema dûr "ketiye", nûdem "dikeve", pêşedem "dê bikeve", fermana yekser "bîkeve", fermana neyekser "bîla bikeve". Peyvîka "serketin"ê ji ji navê "ser" û "ketin" a forma bêdem a wê kîrarê hatiye saz kirin.

Mın divê ez li ser wê kîrarê çend minakan binivîsim. Weha:

Şêx Evdîrehmanê Axtepeyî di "**Rewdunneim**"ê da weha ci daye wê kîrarê: "Çi agir kete cergê mın, pırr şedîd/ Huseyn û Hesen her du bûne şehîd!"

Mela Xelîlê Sêrtî ji di "**Nehcul'enam**"ê da kîrar weha bî kar anîye: "Ku qenci kete qelbê te, lez bike!/ Xîrabi ji şeytani ye, wê meke!"

Kîrarê di qesideyeka geli ya dema Şerê Pêşin ê Cihanê da ji weha ci girtîye: "Heylo l'mın hewar e, delîl halê nîzamê!/ Seferek li me rabû, sefera xas û amê/ Kafîr ket Hesenqelê, heyfa dinê Îslamê!/ Heyfa dinê Mihemed, hati qıra Îslamê!"

Kîrarê di hin peyvên pêşîyan da ji ci girtîye. Mesela, weha: "Ketin û rabûn, ji mêran ra ye", "Deve ji devetiyê ketiye, ji hope-hopê nakeve", "Şêr ji kendalan ket, rovi bî şekalan ket".

Ji wê kîrarê û hin pêşekên wek "da"yê, "ra"yê û wd, hin kîrarên sazber ji hatine çêkirin. Mesela, di straneka geli da "daketim" û "raketim" û "ketim" weha bî kar hatine anîn: "Yadê rebenê, ez çûme çemê Bîşêrika şewîti, lê, ez daketim!/ Yadê rebenê, xewka mî hat, vê sibekê, lê, ez raketim!/ Ez di nava heval û hogirên xwe da çiqas bîlînd firim, nîzîm li erdê ketim".

Her wisa, ji wê kîrarê û pêveka "i"yê, salixnavek (sifetek) ji hatiye saz kirin. Ew salixnav ji "keti" ye. Mesela, Melayê Bateyî di "**Mewlûd**"ê da weha ci daye wi salixnavî: "Merheba ey bedrê alem, ya munîr!/ Merheba, xelqê keti ra destegir!"

Siyahpoş ji di "**Seyfulmulûk**"ê da weha gotîye: "Ku ev rengî bîhist Şehzadeê mir/ Ji wi kalê keti, dehqani yê pir".

Wi salixnavî Di peyveka pêşîyan da ji weha ci girtîye: "Dostên ketiyan tunin".

Digel sılavan û daxwazên pêşketin û serketinê.

M. Emin Bozarslan

PÊVEK 7: Rapora Dirûvtiyê / İntihal Raporu

Turnitin Orijinallik Raporu

M. EMİN BOZARSLAN'IN MESELOKÊN LAWIRAN ADLI HAYVAN MASALLARI SERİSİNDE YER ALAN HAYVAN MOTİFLERİ Muzaffer_Ekinci_1 tarafından

M. EMİN BOZARSLAN'IN MESELOKÊN LAWIRAN ADLI HAYVAN MASALLARI SERİSİNDE YER ALAN HAYVAN MOTİFLERİ (y) den

- 30-Kas-2016 11:07 EET' de işleme konu
- NUMARA: 744719732
- Kelime Sayısı: 54800

Benzerlik Endeksi

%4

Kaynağa göre Benzerlik

Internet Sources:

%4

Yayınlar:

%0

Öğrenci Ödevleri:

N/A

JÎNENÎGARÎ

Muzaffer EKÎNCÎ, di sala 1988an de li navenda Batmanê Xwedê ew daye. Dibistana seretayî li Batmanê di Dibistana seretayî ya Hürriyet'ê de xwend. Piştî jî di sala 2004an de Lîseya Cumhuriyet'ê ya Batmanê mezûn bû. Di 2008an de li Zanîngeha Firatê Beşa Perwerdeyiya Tirkî de dest bi perwerdeyê kir û vê beşê di sala 2012an de qedand.



ÖZGEÇMİŞ

Muzaffer EKİNCİ, 1988 yılında Batman'da dünyaya gelmiş. İlk eğitimine Batman - Merkez Hürriyet İlköğretim Okulu'nda başladı. Daha sonra 2004 yılında Batman - Merkez Cumhuriyet Lisesi'nden mezun oldu. 2008 yılında Fırat Üniversitesi Eğitim Fakültesi Türkçe Eğitimi Bölümüne kayıt hakkı kazanarak bu bölümden 2012 yılında mezun oldu.

